



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
SAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

VENAVANDINA CIHÛWARAN LI KOMARA
TIRKIYEYÊ: MÎNAKA AGIRIYÊ

Amadekar

Ömer DELİKAYA

TEZA DOKTORAYÊ

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

Bîngol - 2021



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
SAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

VENAVANDINA CIHÛWARAN LI KOMARA
TIRKIYEYÊ: MÎNAKA AGIRIYÊ

Amadekar

Ömer DELİKAYA

TEZA DOKTORAYÊ

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

Bîngol - 2021



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

TÜRKİYE CUMHURİYETİ'NDE YERADLARININ
DEĞİŞTİRİLMESİ: AĞRI ÖRNEĞİ

Ömer DELİKAYA

DOKTORA TEZİ

Danışman

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl - 2021

NAVEROK

BÎLÎMSEL ETÎK BÎLDÎRÎMÎ.....	III
SPASNAME	V
KURTE	VII
ÖZET.....	VIII
ABSTRACT.....	IX
KURTEBÊJE	X
LÎSTEYA TABLOYAN	XI
LÎSTEYA ŞIKILAN	XII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	14
VENAVANDINA CIHAN DI PÊWENDA SIYASÎ Û DÎROKÎ DE	14
1.1. Neteweperestî, tirkîkirina pir-rehendî û kurd(î)	15
1.2. Paşxaneya navguhertinê	21
1.3. Nêrîneke dîrokî li venavandinên li Tirkîyeyê	27
1.4. Ji zozanan heta aranan: guhertina cihên siruştî	40
1.5. Metodolojî.....	44
BEŞA DUYEM	53
NAV, HÊZ Û BÎR: ÇARÇOVEYA TEORÎK	53
2.1. Onomastîk	53
2.1.1. Toponîm	58
2.1.2. Toponîmî	60
2.3. Rewşa toponîmiyê û toponîmiya rexneyî li Tirkîyeyê	61
2.4. Lîteratura toponîmiyê di kurdî de	65
2.5. Bingeha teorîk û pêşketina nêrîna rexneyî ya toponîmiyê	68
2.5.1. Navê cihan di pêwenda mekan û hêzê de.....	70
2.5.2. (Ve)navandin û bîra hevpar.....	75
2.5.3. Navê cihan di çarçoveya neteweperestî û netewesaziyê de	82

2.5.4. Navê cihan wekî amrazeke (ve)derkirinê.....	86
2.5.5. Navê cihan û nasname.....	89
2.5.6. Deqa bajêr û nivîsandina wê	93
BEŞA SÊYEM	95
VENAVANDIN, HELWEST Ê VEGÊRAN: TOPONÎMÊN LI AGIRIYÊ	95
3.1. Agirî, sînor û nav(andin).....	96
3.2. Nêrînek li ser rêbazên venavandinê yên li Agiriyê	103
3.3. (Hewla) danîna navên kurdî li park û kolanan	110
3.4. Dubendiyên navê cihan: dûmena zimên û berxwedana sembolîk	113
3.5. Pratîkek kêmpayda: navên duzimanî li rawestgehên taksiyan.....	122
3.6. Guhê li guhdariyan: vegêran, çîrok û helwestên toponîmîk	125
3.6.1. Vegêranên toponîmîk	128
3.6.2 “Te nav rakir, tu wê çîrokê xira dikî”: çîrok, bîranîn û zanîn	134
3.6.3. Helwest û ramanên li beramber navan	138
3.6.4. “Xeber gi çûn, erd dûmîne”: navên bi serhatiyên kodkirî.....	146
BEŞA ÇAREM	149
NEXŞEYÊN DEVKÎ YÊN NAVAN DI KILAMÊN DENGÊJAN DE.....	149
4.1. Navê cihan û zanîna xwecihan.....	151
4.2. Dengbêj(î) û gera daimî û kilam	157
4.3. Rol û erka binyadî û wateyî ya navan di kilaman de	161
4.4. Rêjeya toponîmên kilaman û şopa têkiliyên çandî û civatî.....	177
4.5. “Topogeny”: bi seredorî vegêrandina navê cihan	186
4.6. Nav wekî avakerên mekanê bîrê: “Geliyê Zilan”	191
4.7. Navguhertin û rola dengbêj a berxwedêr	204
4.8. Welatê ku di kilaman de tê sêwirandin: “welatê me Serhed e”	208
ENCAM.....	220
ÇAVKANÎ.....	227
PÊVEK.....	255

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkîyeyê: Mînaka Agiriyê* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

22/ 03/ 2021

Ömer DELİKAYA

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Ömer DELİKAYA tarafından hazırlanan *Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkîyeyê: Mînaka Agiriyê* başlıklı bu çalışma, 22.03.2021 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği/oy çokluğuyla*] başarılı / ~~başarısız~~ bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan: Doç. Dr. Metin YÜKSEL	İmza:
Danışman : Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza:
Üye: Doç. Dr. Abdurrahim ÖZMEN	İmza:
Üye: Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD	İmza:
Üye: Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

SPASNAME

Amadekirina vê xebatê bo min bû rêwitiyeke xweşik. Min serê ewil pêşbînî nedikir ku kêfa min dê ew qas nivîsandina vê xebatê re bê. Bi saya serê vê xebatê min gelek hevrê û mamosteyên hêja nas kirin ku guh dan gotinên min û fikrên xwe bi min re parve kirin. Belkî ew ne di wê ferqê de bûn lê xeberdan, nîqaş û pêşniyazên wan bo min bûn ilham ku tim motîvasyona min zêde kirin.

Qenciya gelek kesan gihişte min. Berê beringa, ez dixwazim spasiya mamoste û şêwirmendê xwe yê hêja Doç. Dr. Zahir Ertekin bikim ku bi sebr û dilxwazî rê li ber min xist û pêşniyazên xweş li min kir. Ez ji dil spasiya Doç. Dr. Metin Yüksel dikim ku di fikra terxandina beşekê ji bo dengbêjiyê de, ez teşwîq kirim. Vê yekê hişt ku ez bi dilrihetî bikevim pey nav û nexşeyên kilamên dengbêjan. Herwiha wî tim bi sebr guhdariya min kir û fikrên xwe yên xweşik ve rê li ber min xist. Dîsan, ez spasiya Doç. Dr. Canser Kardaş û Dr. Hikmettin Atlı dikim ku anîn beşa vê xebatê ya li ser kilamên dengbêjan xwendin û fikrên xwe bi min re parve kirin. Herwiha, mamoste Şerif Güzel û Zafer Atlı bi xwendinên xwe ve alîkarî bi min kirin û derfet dane min ku ez gelek caran li cem wan bixebitim. Mala wan ava be.

Ez li vir dixwazim qenciya Dr. Zafer Açar bînim ziman. Wî anî ji serî heta binî tez xwend, yeko yeko nîşeyên xwe li ser nivîsê û pêşniyazên gelek maqûl li min kirin. Herwiha dixwazim spasiya Dr. Hemin Omar Ahmad, Doç. Dr. Abdurrahim Özmen û Dr. Bedrettin Basuğuy bikim ku bi pêşniyazên xwe ve rê li ber min xweş kirin.

Kahraman Aksu, Eylem Süleymanoğlu, Ahmet Subaşı, Mem Artemêt û birayê min Harun Delikaya û gelek kesên din ez bi tenê nehiştim, mala wan ava be. Bi taybetî keda Kahraman Aksu winda nakim, wî gelek alîkarî da min. Bi xeberdan û hevaltiyên xwe ve Hasan Polat, Hasan Akboğa û Adem Bulut tim daxwaza xebatê ji min kirin û xwendin û nirxandinên xwe piştgiriya min kirin. Mamosteyê min ê dibistana navîn Îbrahîm Qijikareş, bi pêşniyazên li ser têgih û wergeran, bi sohbetên xwe yên li ser ziman û etîmolojiyê ve dilê min xweş kir û ilham da min.

Piştî tercîha min a li ser navê cihan diyar bû, mamoste Yusuf Baluken gelek caran piştgirî da min û ez teşwîq kirim. Di merhaleya nivîsandina vê tezê de, ez bi

gelek pisporên onomastîk û toponîmiya rexneyî şewirîm û min ji wan istifade kir. Bi taybetî, Prof. Dr. Frédéric Giraut, ji bo teza min lêgerîneke navê cihan di nav vegêranan gelêrî de maqûl dît û fikr û pêşniyazên xwe bi min re parve kirin. Dîsa, Dr. Vincent Jenjekwa û Łukasz Maciąg, Dr. Melissa Wanjiru bi dilxwazî hin hin jêder, tecrîbe û xebatên xwe bi min re parve kirin. Herwiha, ez dixwazim spasiyên bêhevta ji wan hemû beşdarên hevpeyvînan bikim ku çîrok, serhatî û tecrîbeyên xwe, ji dil bi min re parve kirin. Bi rastî, bêtî vê beşdarî û piştgiriya wan, ev xebat wê gelek kêmbêr bûya.

Dawiya dawî dixwazim spasiya malbata xwe bikim. Di maweya vê xebatê de, gelek eziyeta min kişandin. Bi taybetî hevîna min bi fedakariyên mezin derfet da min ku ez bi saetên dirêj li ser vê xebatê hûr bibim. Wê herwiha kedeke zêde da vê xebatê û nexşeyên pêwîst xêz kirin. Herwiha, diayên ji dil ên diya min Nenêya Reşîd li ber dilê min gelek ezîz in, tim şukra Xwedê dikim ku dayîkeke ewqas dilrehm daye min.

KURTE

Navê cihan, bi wateyên xwe yê sosyo-çandî û sembolîk ve, bi fonksiyona xwe ya bîranîna raborî û veguhastina çanda devkî ve parçeyekî bi qîmetê mîrasa çandî ne. Nav tenê bi taybetmendiya xwe yê dewlemend ên bibîrxistinê ve di jiyana rojane de ji bo merivan bi rola xwe ya civakî ranabin, herwiha ew di dewamdariya nasnameya çandî de jî roleke giring digêrin.

Nav û (ve)navandin ku hesas e ji têkiliyên hêzê re, ew çend kompleks in ku nabe bi tenê boçûneke masûm a zimanî ve bînsengandin; ew kiryarêke polîtîk e ku encamên cuda yê çandî, dîrokî û yê têkildarî bîrê nîşan dide. ‘Toponîmiya rexneyî’ ya ku çend deheyên dawî di xebatên nava de lîteratureke giring pêk aniye, cextê dibe ser têkiliyên hêzê ku ev demeke dirêj bû hatibûn paşguhkirin. Tirkiyeyê wekî rengvedan û encama netewedewletsaziyê polîtîkayê navandinê ji Komeleya Yekîtiyê û Pêşveçûnê mîras wergirt ku di vê çarçoveyê de hezaran cih û war (ve)navand, vê kiryarê armanc dikir ku mekanê bajêr û gundewar li gorî îdeolojiya daxwazkirî ji nû ve hilberîne û bixê bin kontrola xwe. Di vê hevtevnê de, di encama polîtîkayê venavandinê de ku bi dehan salan kişand, toponîmên “nû” yê ku nasnameya neteweyî nîşan didan li ser hezaran deverên avadan hatin kodkirin. Herçend ev kiryarên navbirî qadeke giring bo ‘toponîmiya rexneyî’ dabûn kiribe jî, heta îro vê qadê bi tîrê xwe bal nekêşaye ser xwe.

Ev xebat di nimûneya bajarê Agiriyê (Qereklîs) de rê û rêkarên cihnavandinê dide ber xwe û dixwaze li navenda bajarê Agiriyê hin nimûneyên navandinê bi boçûneke rexneyî ya toponîmîk ve vekole bîyê ku pêwenda polîtîk û dîrokî ya polîtîkayê (ve)navandinê yê li Tirkiyeyê jî piştguh bike. Fêm û têgihiştina li hember wan navên “nû” ku ji jor ve hatine (da)sepandin û helwestên û formên berxwedanê yê li hember nava çêdibin ji bo keşîfkirina dînamîkên civatî û çandî gelek girin in. Ev xebata ku di vê çarçoveyê de li sehayê encamê da, navê cihan, vegêranên cihêreng ku bi wate û çîrokên wan re derdikevin meydana bi metodeke etnografîk nîqaş dike.

Herwiha, rol û fonksiyonên ku nav hiltînin di çanda devkî ya kurdî de di çarçoveya kilamên dengbêjan de hatine nîrxandin. Ev xebata ku giringiya vegêranên dîrokî û topogenyê (*topogeny*) yê dengbêjan diyar dike ku bi rêya “nexşeyên devkî” li ser mekanê hatine neqîşandin û herwiha cextê dibe ser wê xisara ku bi navgihertinê re li ser vegêranan derdikeve mexderê û mekanê bîrê ku bi rêya navê cihan saz dibe.

Peyvên Serekî: Navê Cihan, Toponîmiya Rexneyî, Agirî (Qereklîs), Dengbêj, Kilam, Venavandin, Kurdî

ÖZET

Yer isimleri, sahip oldukları sosyo-kültürel ve sembolik anlamları, geçmişi hatırlatma ve sözlü kültürü taşıma işlevi ile kültürel mirasın değerli bir parçasıdır. İsimler sadece zengin çağrışımsal özellikleriyle günlük hayatta insanlar için sosyal rollerini sürdürmekle kalmaz, aynı zamanda kültürel kimliğin devam etmesinde de önemli bir rol oynar.

Güç ilişkilerine duyarlı bir yapıya sahip olan isim ve isimlendirme sadece masum dilsel bir yaklaşımla ele alınamayacak kadar karmaşık; farklı kültürel, mekânsal, tarihsel ve hafızaya ilişkin sonuçları olan politik bir eylemdir. Son birkaç on yıl içinde, ortaya çıkan ‘eleştirel toponimi’, isimlendirme çalışmalarında uzun süredir ihmal edilen güç ilişkilerini de göz önünde bulundurarak önemli bir literatür oluşturdu. Ulus devlet inşasının bir yansıması olarak Türkiye’nin İttihat ve Terraki’den devraldığı isimlendirme politikalarını devam ettirerek binlerce yeri yeniden isimlendirmesi eylemi, kentsel ve kırsal mekânın ideolojik kaygılar doğrultusunda yeniden üretilmesi ve kontrol altına alınması gibi bir dizi amaca hizmet etti. Bu doğrultuda, onlarca yıla yayılan yeniden isimlendirme pratikleri sonucunda, binlerce yerleşim yerine ulusal kimliği yansıtan ‘yeni’ toponimler kodlandı. Tüm bu gelişmeler, ‘eleştirel toponimi’ye önemli bir inceleme alanı oluşturmasına rağmen, günümüze kadar bu alan Türkiye’de hak ettiği ilgiyi görmedi.

Bu çalışmanın amacı Türkiye’de (yeniden) isimlendirmenin politik ve tarihsel bağlamı göz ardı etmeden, Ağrı ili örneğinde yer isimlendirmesinde izlenen stratejileri, Ağrı kent merkezinde son yıllarda çıkan bazı isimlendirme örneklerini eleştirel toponimi bağlamında incelemektir. İnsanların tepeden dayatılan yeni isimlerini alımlama biçimi ve bu isimlere karşı geliştirdikleri tavır ve direniş formları toplumsal ve kültürel dinamikleri keşfetmek için oldukça önemlidir. Bu doğrultuda yapılan saha çalışmasında, yer isimleri, anlamları ve hikâyeleri ile ortaya çıkan farklı anlatılar, etnografik bir metod benimsenerek tartışıldı.

Ayrıca Kürt sözlü kültüründe isimlerin üstlendiği önemli roller de dengbêj kılımları çerçevesinde incelendi. Dengbêjlerin, “sözlü haritalar” yoluyla mekâna işlediği tarihsel ve topojenik anlatıların önemi, isim değişikliğiyle bu anlatıların uğradığı hasarı da tartışan bu çalışma yer isimleri yoluyla oluşturulan mekânsal hafızaya da vurgu yapmaktadır.

Anahtar Sözcükler: Yeradı, Eleştirel Toponomi, Ağrı, Dengbêj, Kılam, İsim Değiştirme, Kürtçe

ABSTRACT

Placenames are a valuable part of cultural heritage with their socio-cultural and symbolic meanings, the function of reminding the past, and carrying oral culture. Names not only maintain their social roles for people in daily life with their rich associative features but also play an important role in the maintenance of cultural identity.

Names and naming that include power relations are too complex to be addressed only with a purely linguistic approach; It is a political action with different cultural, spatial, historical, and memory consequences. In the last few decades, the emerging "critical toponym" has created an important literature, taking into account the long-neglected power relations in naming studies. As a reflection of building a nation-state inherited from the Committee of Union and Progress, Turkey's policy related to (re)naming thousands of places served a number of purposes such as the reproduction and control of urban and rural space in line with ideological concerns. Accordingly, as a result of renaming practices spanning over decades, 'new' toponyms reflecting national identity in thousands of settlements were coded. Although all these developments have provided an important area of study for 'critical toponymy', this study area has not received the attention it deserves in Turkey until today.

The purpose of this study is to examine the strategies followed in the place naming in Ağrı province along with some examples of naming in Ağrı city center in recent years as a part of critical toponymy without ignoring the political and historical context of Turkey's (re)naming policies. The way people perceive their new names which were imposed and the attitude and forms of resistance they develop against these names are very important in exploring social and cultural dynamics. In the fieldwork carried out in this direction, different narratives emerging with place names, meanings, and stories were discussed by adopting an ethnographic method.

In addition, the important roles of names in Kurdish oral culture were examined within the framework of dengbêj kilams (songs). This study discusses the importance of the historical and topogenic narratives that Dengbêj gave to the place through "verbal maps", and also examines the damage on these narratives with the re-naming by emphasizing the place memory created through place names.

Keywords: Toponyms, Critical Toponymy, Re-naming, Ağrı, Dengbêj, Kilam, Kurdish

KURTEBÊJE

bin	: binêrin/binêre
b.n.	: bo nimûne
j.	: jimare
r.	: rûpel
rr.	: navbera van rûpelan de
hwd.	: her wekî din
yd.	: yê din
wer.	: werger
vgz.	: veguhêz

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1. Dabeşkirina pratîkên navguhertinê li gorî ökte (2008)	28
Tablo 2. Çend navên tirkî ku ji aliyê Bulgaristanê ve hatine guhertin	30
Tablo 3. Li gorî parêzgehan hejmara gundên ku navên wan hatine guhertin....	34
Tablo 4. Texmînên li ser deverên navguhertî (1957 – 1978)	36
Tablo 5. Di heyamên cuda de navên bajarê Agiriyê bi kurdî û tirkî	101
Tablo 6. Navên navçeyên Agiriyê	102
Tablo 7. Hejmara navê guhertî li gorî navçeyan	103
Tablo 8. Nimûneyên wergera yekser a cihnavan.....	106
Tablo 9. Nimûneyên wergera qismî ya cihnavan	107
Tablo 10. Nimûneyên wergera bereks a cihnavan.....	107
Tablo 11. Wergera ku pêwendiyê wê ya wateyî bi navê kevn re heye.....	108
Tablo 12. Nimûneyên adaptasyonên dengsazî, rênivîsî û keyfî	108
Tablo 13. Nimûneyên afirandina cihnavên nû.....	109
Tablo 14. Nimûneyên cihnavên ku nehatine guherandin	110
Tablo 15. Navên erêkirî, redkirî û serrastkirî yên li Diyarbekirê	111
Tablo 16. Navên ku ji aliyê şaredariyê ve hatine pêşniyazkirin.....	115
Tablo 17. Hin qalibên navê cihan ku li destpêka kilaman cih digirin	166
Tablo 18. Hejmara navê cihan li gorî senifandina tematîk a kilaman	178
Tablo 19. Senifandina tematîk a kilaman li gorî du kategoriyên serekî.....	179

LÎSTEYA ŞIKILAN

Şikil 1. Rêjeya navên guherandî li Komara Tirkîyeyê.....	37
Şikil 2. Belavbûna gundên navguhertî. Nîqteyek pênc gund e.	38
Şikil 3. Navendîtiya nisbî ya hin cureyên navan.....	57
Şikil 4. Nexşeya Agiriyê (Qerekilîs).....	96
Şikil 5. Nexşeya sînorê Bayezîdê ya destpêka sedsala bîstan û eşîrên kurd.....	99
Şikil 6. Tabelayên duzimanî yê rawestgehan: Berfîn û Welat.....	123
Şikil 7. Gundê/Taxa Zengezûrê (bi Tirkî berê <i>Sarıdana</i> , paşê <i>Sarıgül</i>)	139
Şikil 8. Tabelaya duzimanî ya Mengeserê (<i>Yazılı</i>), 2021.	142
Şikil 9. Liv û tevgerên demsalî li Anadolîya başûr-rojhilat.....	184
Şikil 10. Vegêrana topojenîk a ji gundê Navîkê heta Çatê	190
Şikil 11. Nexşeya Geliyê Zîlan û mintiqaya ku gundên Kindûk û Milkê.....	199

DESTPÊK

Di destpêka sedsala 20an de, bi damezirandina gelek netewedewletên nû ve, di nav sînorên neteweyî yên van dewletan de gelek proses û pratîkên curbicur ên netewesaziyê ketine meriyetê ku hewl didan ji aliyê çand, nasname û ziman ve kom û cemawereke yekreng pêk bînin û bi vê; xwe bigihînin wê armanca ku Anderson (2020) wekî “cimaeta muxayel” terîf dike. Li Komara Tirkîyeyê, neteweya ku hate xeyalkirin/hizirkirin û îdeolojiyên netewepereset ên hevterîb li gel vê xeyalê hatin sazûmankirin û pêşxistin bi temamî bi têgiha Anderson a navbirî re li hev tê. Wekî netewe-dewleteke modern a nû avabûyî, Komara Tirkîyeyê kete rêya duristkirina neteweyeke yekreng ku ji tirkan pêk dihat û bi gelek amrazên cihêreng ên zimanî, çandî, dîrokî û nasnameyî emel dikir da ku xwe bigihîne armanca xwe ya daxwazkirî. Di duristkirina neteweyeke yekreng de, pirzimanî û pirçandiyê rêgirî ji netewesaziyê re dikir û nedihîşt ku bigihe serî. Bi vê armancê, gelek polîtîka û stratejiyên vederker û homojenîzasyonê li ser hêlên vê pirrengiyê hatin ceribandin ku yek ji wan wekî kevîrê takêşê tim *ziman* bi xwe bû. Jixwe, ji gelek vekolînên li ser rewşa zimanê kurdî û polîtîkayên zimanî yên li hember kurdî (Haig, 2004) tê fêmkirin ku prosesên netewesaziyê yên li Tirkîyeyê tim cexteke xurt dane li ser zimanê tirkî û zimanên xeyrî-tirkî, bi taybetî kurdî, di nav pergala yasayî de nehatiye pesendkirin, bi serbarê ser, tim ew rastî rêgirî û qedexeyan hatiye. Lewra, pratîkên zimanî yên heta niha tetbîqkirî, wê rastiyê nîşan didin ku neteweperestiya li Tirkîyeyê di nav fêm û feraseta neteweperestiyeke zimanî de şikil girtiye. Ji ber ku înkara ziman û hebûna kurdan, guvaşên li ser ziman û çanda kurdî gelek salan şikil û şêwe daye helwesta dewletê ya li ser kurdan (Zeydanlıoğlu, 2012: 101).

Di bin tesîra nêrîna neteweperest a zimanî de, gelek amrazên bi girêdayî hêz, îdeolojî û hegemonyayê di çarçoveya polîtîkayên zimanî yên tund de hatine tetbîqkirin ku yek ji wan jî tune kirina diyarî û dîtbariya zimanan bû ji ser rûyê erdê an jî ji dîmena zimanî (*language landscape*). Di vê çarçoveyê de, li Tirkîyeyê, bi bingeheên yasayî ve lijneyeke taybet hatiye avakirin bi navê *Ad Değiştirme İhtisas Kurulu* (Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê) û vê lijneyê bi hezaran navên cihan ên ji zimanên xeyrî-tirkî guherandiye û di dewsa wan de navên nû yên tirkî cîbicî kiriye.

Ev pratîk di cewher de, vedigere heta dewra dawî ya Dewleta Osmanî ku Jon Tirk li ser hukim bûn. Herçî piştî avabûna Tirkiyeyê, ev mîras bêxwedî nemaye û bi rengekî xurttir berdewam kiriye. Herçiqas, hikûmetên ji îdeolojî û nêrînên cuda hatibin ser hukim jî, awayên destwerdanên li pergala navan zêde neguheriye û wekî pratîkên dewamdar ên navguhertinê her pêş de çûye û bi demê re bûye yek ji polîtîkayên zimanî yê dewletê. Di encama van kiryarên dewamdar ên “bêdengkirina toponîmîk” (*toponymic silencing*) (Harley, 2001: 99) û “mihendisiya toponîmîk” (*toponymic engineering*) (Öktem, 2008) de di medyayê de pratîka navguhertinan û egera îadekirina navan çend salan carekê ji nû ve dibe mijara gelek nîqaş û gengeşeyên curbicur ku raya giştî pê re mûjil dibe. Wate, ji salên ewil ên guhertina navan heta niha, ev babet her tim bûye yek ji wan babetan ku timî caran çî bi hewlên siyasetmedaran, çî jî bi hewlên rêveberiyên herêmî dibe sebebê nelihevî û dubendiyan di nav kom û cemawerên cuda yên li Tirkiyeyê de. Ji ber hindê, ev babeta ku di gelek astên cuda de gelek caran tê nîqaşkirin, babeteke bi têra xwe rojane û giring e ku divê bi hemû cihetên xwe ve bê vekolîn.

Di halê hazir de, dema ku meriv li nexşeyan dinêre, ji sînorên rojava yên bi Yûnanistan, Bulgaristanê bigire heta sînorên rojhilat û başûr ên bi Gurcistan, Ermenistan, Îran, Iraq û Sûriyeyê re hemû nexşe bi navê “xwerû” tirkî ve tijî ne (Field, 2013: 1). Ya rast ev nexşe, sed sal berî niha ne ew çend *xwerû* bûn, wekî rengvedana pêkvejiyana gelek netewe û zimanên li Tirkiyeyê, pergala toponîmîk bi nav û nîşanên rengorengo ve tijî bûn. Lêbelê, piştî ku navê cihan hatin guhertin, xisareke mezin giha vê mîrata toponîmîk a pirrengî û pirzimanî. Mîrata pirçandî, pirzimanî û pirdînî ya Dewleta Osmanî ku di toponîman de jî xwe eşkere dikir, ji bo netewedewleta nû dibû sebebê tevlihevî û nerazîbûnê. Ji bo serketina dewleta nû, diviya nav û nîşanên “kevn” bihatana paqijkirin ji bîra hevpar a gel(êrî) da ku paşê nebûna sebebê dawakariyên “bitalûke” yên kêmineyan.

Gelek şêwaz û temsîlên ku di prosesa polîtîkayên zimanî û (ve)navandina li Tirkiyeyê de rû dane, ji aliyê dîtbariyê ve destnîşan dikin ku navê cihan wekî parçeyeke zimanî para xwe ji hemû wan zext û destwerdanên li ser ziman wergirtiye. Lewra, li seranserê Tirkiyeyê behra bêtir ji wan toponîmên ku bi rengekî bi tirkî re nehatine têkildarkirin, bi gelemperî ji pergala navan a adetî hatine (ve)derkirin û

rêgirî li wan hatiye kirin da ku di qada giştî de neyên dîtin û bihîstin. Di çarçoveya polîtîkayên zimanî yên tund de ku li Tirkiyeyê xwe gihandiye asteke rûxîner ya “zimankujî”yê (*linguicide*) (Hassanpour, 2020; Skutnabb-Kangas 2006), (ve)navandina navê cihan jî nehatiye jibîrkirin, bi vî karî, zimanê kurdî bi firawanî ji pergala navan(dinê) a li bajarên kurdnişîn hatiye vederkirinê ku şîyanwerî dida zimên (da) ku bikaribe bi rengekî civatî û mekanî dîtbar û diyar bibe. “Nedîtbarkirin”a (*invisibilisation*) zimanê kurdî (Skutnabb-Kangas & Bucak 1995; Haig 2004) û vederkirina kurdî ji pergala perwerdehiya fermî, digel sîordarkirina mafê zimanî, gelek polîtîkayên din ên tadeyî (Arslan, 2015) jî hiştiye ku texrîbateke mezin bigihe ziman û têgihiştina zimên a qisevanên wê.

Bêyî ku pêwenda sosyo-polîtîk a li jor destnîşankirî bihê piştguhkirin ku li dor qedexê û destwerdanan teşe girtiye, navê cihan (toponîm) ji gelek aliyan ve roleke navendî digêre di vê xebata berdest de. Çi wate û giringiya navan heye ji bo vegêranên gelêrî yên kurdî, navguherîn di asta civatî û hestiyarî de çawa tesîrê li ser cemawerên cuda dike, helwest û reaksiyonên civatî yên li ser navên guhertî li bajarê Agiriyê bi çi rengî ne? Bi giştî, pirsê navdar a Romeo û Julietê li seranserê vê xebatê de, ew pirs e ku bersiva wê di gelek rehendên cuda cuda ên navan û navguhertinê de tê vekolîn: “çi heye di navekî de?” (*what’s in a name?*).¹

Li dû bersiva vê pirsê, di vê xebatê de diviya ku em ji dîsîplînên cuda istifade bikin. Jixwe, xebatên toponîmîk gelek dîsîplînên cihêreng dixwe xizmeta xwe (Vuolteenaho & Berg, 2009: 2). Wekî ku tê zanîn, cihên nav (*placenames*) tenê ne çavkaniya zanyariyên zimannasiyê ye, lêbelê zanyariyên cografîk, dîrokî, antropolojîk, etnografîk, civatî, psîkolojîk jî dikarin pê re gelek pêwendîdar bin û ji ber hindê gelek xebat hene ku nîrxê boçûneke înterdîsîplîner (*interdisciplinary approaches*) a vê qadê nîşan didin (Helleland, 2012: 98). Ji ber eleqedariya toponîmiyê bi gelek dîsîplînên din re û ji ber veguherîna wê ya van salên dawî ku wekî *toponîmiya rexneyî* tê zanîn, xebateke bi vî rengî nedigihî armanca xwe eger

¹ Vê jêgirtina ji Romeo û Juliet ilham daye gelek vekolînên cûrbicûr ên toponîmiyê (toponomastîk). Bo nimûne, bin. Kostanski, L. (2009) “‘What’s in a Name?’: Place and Toponymic Attachment, Identity and Dependence. A case study of the Grampians (Gariwerd) National Park name restoration process’, Unpublished PhD Thesis, University of Ballarat.

serî li dîsîplînên din neda û ji wan kelk wernegirta. Helbet, vê pir-layeniyê bi xwe re gelek zehmetî jî anîn di prosesa vê xebatê de. Lewma, ev xebat ne tenê destwerdanên wekî navguhertina li Tirkiyeyê dide ber xwe, ne jî tenê bi nêrîneke dîrokî li babetê hûr dibe. Digel van xalan, ev xebat bi perspektîfeke etnografîk tevdigere û guh dide helwest û nêrînên ji nav gel û ji nav vegêranên gelêrî. Û dîsa hevterîb li gel vê yekê, li ser materyalên etnografîk û folklorîk ên kurdî jî vekolînekê dike û giringî û rola navê cihan a nerîtî di nav kilamên kurdî de keşif dike.

Toponîmiya rexneyî (*critical toponymy*) di pêşketina vê xebatê de roleke giring werdigire. Nexwe, toponîmî çi ye û çima ji nav vegeerîneke rexneyî (*critical turn*) re derbas bû? Û ji hêla bingeha teorîk ve çawa ber û pêşiya vê xebatê xweş kir? Bersivên van pirsan ji bo zelalkirina çarçoveya giştî ya xebata berdest mihim e. Toponîmî (toponomastîk) bi wateyeke giştî ew qad e ku li ser navê cihan vekolînan dike. Bi awayê xwe yê adetî toponîmî, wekî zanistêke binbeşa onomastîkê (navnasî) ya zimannasiyê bala xwe dida etîmolojî, derketina cihenavan, rêzikên avabûnên wan, berhevkirin, senifandin û nirxandina navan ango zêdetir eleqeya xwe bi xebatên taksonomîk û ansîklopedîk dikir. Para pirtir, ev xebatên adetî yên toponîmîk jî bi gelemperî ji aliyê zimannas û etîmologan ve dihatin meşandin ji bingeheke teorîk bêpar bûn (Vuolteenaho & Berg, 2009; Kearns & Berg, 2009). Van vekolerên navê cihan, miameleyek li gel nava dikirin wekî ku nav nîşanderên bêkêşe yên nerîtî û çandî yên deverê bin û wan ehemiyet nedidan rola dubendî ya di navandin û bîranînê de (Kearns & Berg, 2009) rû dida. Piştî wextan, bi taybetî ji salên 1990î û pê de xebatên toponîmîk bûn xwedî riwangeheke rexneyî ku wekî vegeerîna rexneyî tê zanîn. Vegeerîna rexneyî hişt ku xebatên navê cihan berê xwe ji xemên etîmolojîk û taksonomîk ên adetî veguhêze li ser lêpîrsîneke rexneyî ya polîtîkayên cihnavandinê (Rose-Redwood, Alderman and Azaryahu, 2010: 455).

Xebatên li ser navê cihan, piştî vegeerîna rexneyî bi rengekî vebirî lêkcudakirî nebin jî, li ser du parên vekolînî dabeş bûn; beşek jê bi dewamdarî etîmolojî, senifandin û hûrgiliyên dîrokî û wateyên navê cihan vedikole ango li ser rêya xwe ya adetî dikudîne, beşek jê bi rengekî rexneyî bal û cexta xwe dide ser prosesên (ve)navandinê û pratîkên sosyo-mekanî yên nivîstekên toponîmîk. Rose-Redwood û yd. balê dikişînin ser “berfirehbûna asoya têgihî (çemkî) ya xebatên rexneyî yên li

ser cihenavan”, destnîşan dîkin ku “para pirtir vekolînên toponîmîk êdî dêsman/binyadên hêzê pişt guhê xwe navêjin ên ku piştgiriye didin prosesa navandinê û egera berxwedana sembolîk” (2010: 466). Rast e ku meriv bibêje, xebatên toponîmiya rexneyî piştî ku bal û berê xwe dan têkiliyên desthilatê dirûv girtin û wekî qadeke serbixwe ji toponîmiya klasîk veqetiyên.

Berê binavkirina cihan, bi rengekî adetî ji aliyê gel bi xwe ve pêk dihat û di guherîna navan de dîsa xwediyê bîryardanê gel bi xwe bû. Ango, navandin sebarê bi guherîn, qewam û cihguhastinên komên merivan çêdibû, ne ku bi destê îdareyê û bi darê zorê. Lêbelê, di dinyaya modern de, bi taybetî li hin netewedewletan pergala navandinê bi rengekî zexm ji aliyê desthilatên navendî û herêmî ve hatine kontrolkirin/birêvebirin û bêtî pesendkirina desthilata siyasî guhertineke li ser deqa bajêr (*city-text*) ne hêsan e. Tam di vê xalê de, rehendên hêzê yên li ser navandinê diyar dibin. Binavkirin, di destê desthilatê de dibe amraza avakirina pergal û hegemonyayê. Çawa ku Michel de Certeau balê dikişîne ser, “her desthilat toponîmîk e û lê dixebite bi binavkirinê ve pergala xwe ya cih ava bike” (1984: 130). Binavkirina cihan nîşan dide ku çawa desthilat erdê kontrol dike û bi vê kirina xwe ve çawa kontrola xwe berdewam dike (Giraut & Houssay-Holzschuch, 2016: 2). Kontrola erdê bi rêya zimên pêk tê –çûnku navê cih pêkhênereke ziman e– û di nav vegêranên zimanî de wekî parçeyeke jiyana rojane navê cihan jî tesîrê li têgihiştina me dike.

Gelek amrazên hêzê hene ku qismek ji wan li ber çavan wisa xuya dîkin ku tu eleqeya wan a bi siyasîyê re tune. Lêbelê, di cewher de, tê dîtin ku ew amrazên manîpulyasyonê yên bi hêz in ku meriv dikare kiriyara binavkirinê ji wisa qebûl bike. Li vir konseptên hêzê ya “hegemonya”yê ku ji aliyê Antonio Gramsci (1891–1937) ve hatiye pêşxistin, dikare ronahiyê bide ser mahiyeta têkiliyên hêzê yên siyasî. Li gorî wî, hêz tenê proseseke yek-rehendî nîne ku ji rajor ber bi rajêr kar bike (Vuolteenaho & Puzey, 2018: 75). Ji ber ku li gorî Gramsci, gelek amrazên ku pê têkiliyên hêzê yên civatî diyar dibin û cemawer pê tînan manîpulekirin, bi awayekî yekser çavkaniya xwe ji desthilat/hêza serdest wernagirin. Ji ber hindê ye ku Gramsci amaje bi wê yekê dike ku kokên hêzê yên çandî û pêkve-hebûna prosesên zext û rizayê divê baş

bên fêmkirin ji ber ku ew teşe didin têkiliyên serdest û bindest (Vuolteenaho & Puzey, 2018: 75).

Herwiha di pêwenda îdeolojîk a venavandinê de navê nû bi navê kevn re rewşeke nakok û duberî hasil dike. Di têgihiştin û helwesta li hember navan de paşxaneya kiryara binavkirinê mebestên siyasî derdixe meydana û wan berçav dike. Lewma, binavkirin bi tevî pêkhênerên xwe li ser wê yekê karîger in ku destnîşan dikin bê ka çi divê bê bibîranîn û çi xwedanbiryar e derheq rê û rêkarên meşrûkirina bîrê bi xwe de (bin. Alderman, 2015). Li ser cemaweran û bi taybetî jî bi perspektîfa mekanî li ser qada giştî hêza kontrolkirinê ya sembolîk tê hafa meşrûiyetê. Heke meriv bi gotinên Berg û Kearns bibêje, siyaseta binavkirina cih û deveran hem siyaseta li ser mekan e (ku diyar dike kê mekan dinavîne û kontrol dike) hem jî siyaseteke mekanî ye (ku saya serê mekan terîf dike kê xwediyê meşrûiyeta axaftinê ye) (2007: 35). Jixwe, ji ber hindê ye ku nav dibin amraza meşrûkirina hêza desthilatê. Bi gelemperî, hilberîna gotarî ya mekanê, ji bo ku nasname û huwiyeta mekan misoger bike, dibe par û parçeyekê wê yekê ku sînoran xêz dike. (Rose-Redwood, 2008). Lêbelê, di venavandinekê de ku dimîne ser motîvasyonên siyasî li ser xetê du-layenî bi rêve diçe; yek “temsîlên raboriyê bi bîr dixê” (*commemoration*) û wê di qada giştî de berçav dike, vajî vê, ya din nav û “bîranîna heyî ji navbeynê dibe” (*decommemoration*) û qesta jêbirina wê dike (Azaryahu, 1996: 317). Ji ber ku berî dasepîna navê nû, yeke kevn hebûye ku di bîra civatî de cih girtiye. Dema ku navê nû tê dewsa navê kevn, li ser mekanê ku ji bo referans û beralîkirinê dibe xwediyê navekî (bîr û temsîlên) navên kevn û navên teze di rewşeke nakok û dubendiyê de li hev nakin û ji ber vê yekê meydana nû ya berxwedanê vedibe ku tê de li ser bikaranîna navên berî guhertinê helwestek tê encamdan.

Li dor çarçoveya li jor behskirî, van sê deheyên dawî bi nêrîna rexneyî ya li ser nav û navandinê di pêwenda polîtîkayên mekanî û civatî yên hêzê de, milkê teorîk ê vê qadê her çûye binemayeke xurttir girtiye.² Bi van xebatan ve, êdî nav ne bi tena

² Bo nimûne, bin. Giraut & Houssay-Holzschuch (2016), Kearns & Berg (2009), Vuolteenaho & Berg (2009), Konstanski & Puzey (2016), Yeoh (1992), Rose-Redwood & Alderman (1996), Alderman & Azaryahu (2010), Azaryahu, (1996; 2011), Myers (2009).

serê xwe, lê kir(yar)a *navandinê* bi dînamîkên hêzê û gotarên serdest ve bûn babeta xebatên toponîmiya rexneyî (Konstanski & Puzey, 2016). Dema ku bal tenê li ser *nav* be lê ihtimamê nede *navandinê*, wê hingê prosesên civatî yên navxweyî baş dernakevin meydanê ku roleke giring digêrin di kiryarên navandinê de û ev jî dibe sebeb ku bal li ser encamê be ne ku amrazê (Winters, 2000: 533).

Di berpêbûna qada toponîmiyê ber bi pozîsyona wê ya niha de, tesîra gelek xebatên pêşeng çêbûye ku têkiliyên hêzê yên sosyo-mekanî teorîze kirine. Jixwe berbelaviya hêzê (desthilat) li ser xeta sosyo-mekanî ji aliyê teorisyenan³ ve ji berê de hatine destnîşankirin, xebatên cihnavan jî ji hêlekê ve pala xwe dan wan teorîsyenên pêşeng ku li ser hêz, mekan û zanînê bingeheke teorîk ava kiribûn. Yanê, bi rêya diyaloga bi teoriya civatî (*social theory*), vê qadê çand û mekan ji nû ve teorîze kir (Alderman, 2008: 198). Bi demê re milkê teorîk ê vê qadê dewlemend bû, li ser gelek deverên dinyayê, vekolerên vê qadê bi nêrîneke polîtîk, sosyo-onomastîk û civatî ya li ser navguhertinê ve lê xebitîn pratîkên navandinên li ser erdnîgariya gelên xwecih û kêmnîeyan keşif bikin û wan bi çavekî rexneyî binirxînin.⁴ Herwiha piştî salên 1990î û vir de, lîteratura toponîmîk a li ser wateyên çandî yê navan jî bere bere qebareya xwe fireh kir. Xebatan li ser toponîmiya çandî tevkariyeke mezin kirin.⁵

Bi rengekî giştî meriv dikare bibêje ku valahiyek heye di lîteratura li ser toponîmiyê de hem li seranserê dinyayê, hem jî sebarê bi kurdan û cihnavên kurdî, ermenî, rumî, lazî û hwd. ên li Tirkîyeyê. Li ser kiryarên navandinê ên gelek welatên dinyayê xebatên toponîmîk hene ku bi nêrîneke rexneyî hatine kirin. Li Tirkîyeyê ji nav sedan xebatên li ser toponîmiyê, gelek kêmxebat hene ku navan bi riwangeheke rexneyî di pêwenda çand, ziman, nasname û polîtîkayên navandinê de bi cih dikin. Li Tirkîyeyê, “nexasim, xebatên toponîmîk ên di qadên wekî dîrok, folklor, zimannasî û cografyayê de, ji perspektîfeke rexneyî bêpar in” (Özberk, 2018: 667). Li dinyayê gelek pratîkên navguhertinê û restorasyona navan ên ku bûne babeta toponîmiya

³ Bo nimûne, bin. Foucault (1980), de Certeau (1984), Tuan (1991), Massey (1995), Lefebvre (2014).

⁴ Bo nimûne, bin. Pipitone (2019), Diego Gordon (2019), Herman (2009), Nash (2019), Jenjekwa, (2018), Ainiala & Östman (2017).

⁵ Bo nimûne, bin. Feld (1996), Berg & Kearns (2009), Kostanski (2009).

rexneyî dişibin wan pratîkên tund ku li seranserê Tirkiyeyê li beramber zimanên xeyrî-tirkî hatiye meşandin. Ji ber vê hindê, meriv pêşbînî dike bi qasî ku toponîmiya rexneyî li wan welatan li rewacê ye, ew çend jî li Tirkiyeyê bal kişandibe ser xwe. Lêbelê, dema meriv li rewşa xebatên heyî dinêre, tê xuyanê ku vê di qadê de valahiyeke diyar a akademîk heye û ev valahî bi têra xwe balkêş e.

Digel valahiya li diyarî çav a di vê qadê de, hin tevkarîyên biqîmet sebarêt bi toponîmiya rexneyî li Tirkiyeyê hene. Pêşiya ewil, pêdivî pê heye ku meriv behsa Öktem (2008) ya bi navê *The Nation's Imprint: Demographic Engineering and the Change of Toponymes in Republican Turkey* bike ku rê li ber xebatên li pey xwe vekirîye. Li Tirkiyeyê çar tez hene ku bi nêrîna toponîmiya rexneyî hatine amadekirin ku hemû jî bi îngilîzî ne. Rê û rêkarên ku wan babet daye ber xwe biguherin jî, tevkarîya ku wan pê valahiya heyî dagirtiye bêguman biqîmet e: İbrahim Kuran (2010). *The Practice of Renaming Places in Turkey: An Anthropological Perspective on Spatio-Temporal Politics*, Unpublished Master's Thesis, Boğaziçi University; Fields Daniel (2013), *State Imposed Place Name Change in Turkey and Response of Giresun Residents*, Unpublished Master's Thesis, Sabancı University; Merve Akgül (2017). *Ethnic Homogenization in Turkey: The Case of Toponymic Practices in Istanbul*. Unpublished Master's Thesis, İstanbul Bilgi University. Doğuş Düzgün (2020). *The death of the author in the streetscape of Ankara: A Barthesian intervention into critical toponymy*, Unpublished Master's Thesis, Middle East Technical University. Xêncî tezên navbirî, li Tirkiyeyê bi sedan xebatên toponîmiya klasîk hatine kirin ku pareke wan a giring bi hewldanên înkare ve toponîmên ji zimanên kurdî, ermenî û rumî dinirxînin û ji xemên zanistiyê dûr in.

Li ser esasê nebûna xebatên derheq toponîmiya kurdî de û nedîtbarkirina kurdî di nav xebatên toponîmîk ên tirkî de, berê pêşîn niyet ew bû ku em bi berhevkariyeke berfireh a toponîmên kurdî yê li Agiriyê ji aliyê zimanî, etîmolojîk û çandî ve binirxînin. Lêbelê, pey re li gorî qenaeta ku li me hasil bû, çêtir bû ku wekî pêngaveke ewil paşxane û milkê teorîk ê toponîmiyê bi tevî geşekirinên vê dûmahîkê yê li qadê bîn ravekirin û pê re jî lîteratura heyî li ser toponîmiyê û toponîmiya rexneyî bê pêşkêşkirin. Lewma di vê xebatê de ne di nav arşîv û belgeyên fermî yê dewletê de vekolîneke navê cihan hatiye kirin, ne jî li qadê nav hatine berhevkirin.

Jixwe ev yek, hem ji hêza me der bû û hem jî sînorkirineke metodolojîk/rêbazî bi xwe re dianî. Çunku vekolîna li ser wate û naveroka kiryar an jî fikrekê digel reaksiyonên ku ew fikr û kiryar di nav civakê de çêdike cuda ye ji wan vekolînên teswîrker û etîmolojîk ên ku bala xwe didin korpûseke navan a berfireh.

Li gor sebebên li jor diyarkirî, di vê xebatê de berhevkariya navan nehate kirin lê nirx û wateyên navan hatine destnîşankirin. Bi vê armancê, ji bo tetbîqkirina xebata sehayî ya rewşê bajarê Agiriyê hate hilbijartin û li wir xebateke etnografîk, folklorîk û sosyo-onomastîk hate meşandin. Li vir, mebest ew bû ku tesîra navguhertinê ya li ser civatê û helwesta civatî ya li beramber navan û navguhertinê bê nîşandan. Herwiha ji bo zelalkirina paşxaneya navguhertinê, merhaleyên serekî yê navguhertinê ku li Komara Tirkîyeyê pêk hatine di pêwenda dîrokî û siyasî de tên pêşkêşkirin. Dema meriv li awayên navguhertinên li Tirkîyeyê binêre û wan binirxîne, pêdivî pê heye ku paşxaneya teorîk a rexneyî di pêwenda hêz, desthilat, netewesazî, nasname, bîra hevpar de bê zelalkirin û li ser van çemkan û pêwendîdariya wan a li gel navan analîzek bê kirin ku di vê xebatê de berdest e.

Destwerdana li pergala toponîmîk a kurdî ku zirar û ziyan gihandiye bîra hevpar û zanîna gelêrî ya kurdî ku ji vekolînên toponîmîk re diyardeyeke nû pêşkêş dike. Ev xebata ku cihetên esasî yê nav(guhertin)ê analîz dike, di wê hewlê de ye ku pencere û nêrînekê pêşkêş bike li ser vê destwerdana li toponîmiya kurdî. Ji ber ku piştî navguhertinê, diyardeya du-naviyê û rengvedana wê di nav civatê de, bi têra xwe rewşeke nû û problematîk bi xwe re derxistiye meydanê. Lewma di vê çarçoveyê de bertek û helwestên li beramber navan (kurdî-tirkî) ên xwecihên li bajarê Agiriyê û awayê ku navguhertin li wir pêk hatiye ji vê nêrîna rexneyî û etnografîk a vekolînê re dibe girêyek ku divê were verîsîn.

Ev xebat kar bo bicihanîna wê armancê dike ku bi nêrîna toponîmiya rexneyî, wate û prosesên di paşxaneya navguhertinê de derxe meydanê, helwest û kiryarên netewe-dewletê yê li ser navê cihan di pêwenda polîtîkayên hêz û nasnameyê, avakirina û hilweşîna bîr û hizrên mekanî, netewesazî û nasnameyê de binirxîne. Digel van yekan, bi rêya hevpeyvîn û çavdêriyan, ev xebat dixwaze li hember navguherînan, bi nêrîneke etnografîk helwest û pozîsyona xwecihên li Agiriyê

destnîşan bike. Di vê çarçoveyê de, helwestên lokal –çi îdarî çi jî şexsî- li hember venavandinê tên nirxandin. Di vê xebata etnografîk a sehayî de cext li ser bîra civatî ya kurdî ye ku têkiliya kurdan û erdên wan destnîşan dike; hest û ramanên kurdan ên sebarek bi cihên venavandî de derdikeve holê.

Ji bo destnîşankirina nirx û wateyên navê cihan ji bo çanda kurdî û zanîna kurdî ya gelêrî, di nav kilamên dengbêjan de rol û fonksiyonên navê cihan -çi wateyî, çi jî dêsmanî (binyadî)- destnîşan dike. Lewma, piştî navguhertinê rola dengbêj a di parastina *nexşeyên devkî* yên navên kurdî de giring e û wan di veguhastina zanîna gelêrî û bîra raboriyê de hin formên berxwedanê nîşan dane ku meriv dikare wan di pêwendêke sembolîk û bîra mekanî de binirxîne. Çawa ku li jorê jî hate diyarkirin, di vê xebatê de bi rengekî toponîmiya klasîk berhevkarîya navê cihan nîne, şûn û şopa zimanî ya navan nagerîne, li dewsa wê rol û giringiya navên kurdî derdixe meydanê, helwest û têgihiştina li hember navguhertinê destnîşan dike. Rê û rêkarên ku lijnaya navguhertinê ji bo venavandina gundên Agiriyê de bi kar anîne, bi hin nimûneyan ve tê destnîşankirin û ji bo dabînkirina wêneyeke giştî yê navên guhertî listeya navê gundan li pêvekê hatiye çêkirin.

Ev xebat derheq tesîr û karîgeriya prosesa venavandina cihên navên kurdî li Tirkîyeyê de çend pirsên serekî dide ber xwe. Di pêwenda prosesên navguhertinê û dubendiyên (*conflict*) li ser navan de, kiryarên zimanî û dîtbarî yên li ser şêwezarên kurdî, berxwedana sembolîk a kurdî, nirxê navan di vegêranên gelêrî yên kurdî de vedikole. Bi boçûneke toponîmiya rexneyî, bi nimûneyên li bajarê Agiriyê, xebata berdest lê dixebite van pirsên jêr bibersivîne:

- 1) Navê cihan û venavandin çi ye û venavandina bi hezaran toponîmên kurdî divê çawa bê fêmkirin?
 - A) Gelo kurd (di nimûneya bajarê Agiriyê de) navên tirkî çawa pêşwazî dikin û heta çi radeyê wan navan di jiyana xwe ya rojane de bi kar tînin?
 - B) Venavandina erdan heta çi radeyê tesîr li ser avakirina nasname û paşxaneyê çandî ya kurdan dike?
 - C) Toponîmên nû di tirkandina (tirkîkirin) dîmena erdê (*language landscape*) de û nedîtbarîkirina kurdî de roleke çawa dilîze/lîstiya?

- 2) Bi çi karî toponîmî bûye amrazeke bihêzkirina desthilatdariyeke polîtîk di nimûneya kurdan û bajarê Agiriyê de?
- 3) Kurd bi erdê xwe re di têkiliyeke çawa de ne û navandina erdê wan di folklorê wan de bi çi rengî rû dide?
 - A) Çi giringiya navan heye?
 - B) Gelo navê cihan bi çi rengî xaleke vegêrana xwe û ew çi formên berxwedanê li hember navê nû bi pêş dixin?
- 4) Helwest û berxwedanên lokal ên li hember navguhertinê çi bûn û wan çawa encam da?
- 5) Gelo ji bo xwecihên li Agiriyê û têkiliya wan a bi erdê wan re, nav dibin xwedî çi wateyên takekesî û civatî di nav jiyana rojane de?

Di lêgerîn û bersivandina pirsên navbirî de, ev xebat babeta xwe ji çend aliyan ve bisînor dike. Ya yekem, xebata rewşê (*case study*) tenê bi bajarê Agiriyê re bi sînor dike. Helwestên lokal ên cemawerî li hember venavandinê û pratîkên venavandinê li vî bajarî bi rêya hevpeyvînan bi dest dikeve. Lewma, xebata rewşê ya ku tê kirin, tenê navenda Agiriyê û navçeyên wê dide ber xwe, bêtir ku tecrîbeyên giştî ya kurdan a zimanî û polîtîk jî bi temamî ji bîr bike.

Di vê xebatê sînordarkirina duyem, li ser nerîta devkî ya kurdî hate kirin. Ji ber ku di tezê de cihê xebata rewşê wekî Agirî hatiye hilbijartin, nimûneyên ji folklorê kurdî ji dorhêla berfireh a Agiriyê bi giştî ji nav hewzeya Serhedê hatine hilbijartin. Ev yek maqûl bû ji ber ku bi vî rengî hevgeriyêke materyalan dihat bidestxistin. Di vê çarçoveyê de, ji bo hilsengandina rol û wateya navan û bi taybetî ji bo statîstîkên navê cihan di nav kilamên kurdî de ji xebatên Güneş û Şahin hate istifadekirin ku bi berhevkarî û bernivîsandina kasetên Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro hatine amadekirin: *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso* (2019a) û *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro* (2019b). Vekolîne hejmarî ya navê cihan tenê li ser herdu kitabên navbirî hate çêkirin. Lêbelê di cihên pêwîst de bi taybetî ji bo varyantên kilaman, ji çavkaniyên din jî hate istifadekirin, bi taybetî jî ji kitaba Gültekin (2013) a bi navê *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. Ji aliyê tematîk ê nirxandina kilaman de, du nimûne di vê xebatê de bi

berfirehî hatine nirxandin. Yek jê kilamên li ser qira Zîlanê ye ku tê de rola navan a avakirina mekanê bîrê de tê vekolîn, a duyem kilama Elî Xarziya ye ku tê de şûn û şopên topojeniyê tên vekolîn.

Ev xebat ne bi awayekî nerîtî lê belkî bi nêrîna nû ya rexneyî û çandî ku di qadê de her diçe serdest dibe helwest û tecribeya kurdan a bi nav(guhertin)an re derdixe meydanê. Hemaheng digel vê, ji rehendên çandî û etnografîk ên navê cihan bigire heta nirxê navan di pêwendike civatî û çandî de dide ber xwe. Ji ber hebûna bi hezaran navên cihan ên di vegêranên kurmancî de, nirx û qîmeta navê cihan di dêsman û vegotina kilaman de jî ji bîr nake û dixwaze rola giring a navê cihan nîşan bide. Ji ber vê lêgerîna etnografîk û folklorîk a li ser kilamên kurdî, xebata berdest ji gelek xebatên di vê qadê de vavêr dibe.

Li ser kurdan çi toponîmiya klasîk çi jî ya rexneyî/çandî gelek kêr xebat hene. Yekem xebata birêkûpêk a li ser toponîmiya erdê kurdan di sala 1957an de ji aliyê Minorsky ve hatiye çekirin: *Mongol Place-Names in Mukri Kurdistan* (Navê Cihan ên Moxolî li Kurdistanê Mukriyan). Ji xebata Minorsky vir de, li ser cihên navên kurdî pêşketineke berçav pêk nehatiye ku tevkariyekê li toponîmiya kurdî bike. Îcar, dema meriv xebatên toponîmiya rexneyî dide ber çavan, xebatên toponîmiyê yên ku li ser kurdan hatine kirin gelek kêr in. Lewma, meriv dikare bibêje ku li ser toponîmiya kurdî xemsariyeye akademîk a diyar heye û hêvî ew e ku ev xebat ji bo berterefkirina vê xemsariyê rolekê bigêre.

Xebata berdest ji çar beşên serekî pêk tê. Di parvekirina van beşan de, rehendên cuda yên navan û nêrîna metodolojîk a xebatê tesîr kir. Beşa yekem, li Tirkiyeyê di pêwendike siyasî û dîrokî de serencama pratîkên navguhertinê û (da)sepandina wan vedikole. Beşa duyem, bi nêrîneke rexneyî navê cihan di pêwenda hêz/desthilat, bîra hevpar, netewesazî, nasname û deqa bajêr de dinirxîne û paşxaneyê teorîk û lîteraturî pêşkêş dike. Beşa sêyem a derheq Agiriyê de wekî du binbeşan parve bûye; yek jê ji jor ber bi jêr ve dasepandinên navguhertinê li Agiriyê vedikole, ya din ji jêr ber bi jor helwestên li beramber navên guhertî bi vekolîneke etnografîk û sosyo-onomastîk derdixe meydanê. Li gel vê yekê, di asta lokal de, hin helwestên li dijî venavandîna derketine holê û dubendiyên li ser navê kolanan û hwd jî di çarçoveyê analîtîk de

tên nîrxandin. Beşa çarem bi taybetî ji bo dengbêjiyê hatiye terxandin. Ev beş, toponîmên di kilamên dengbêjan de ji aliyê wate, fonksiyon û dêsmanê (binyad) ve analîz dike.

BEŞA YEKEM

VENAVANDINA CIHAN DI PÊWENDA SIYASÎ Û DÎROKÎ DE

Li ku derê bimirî, li wê derê heltînin niha her kesî. Navê gund jî giran giran ji qalan derdikevî. Navê ku hikûmetê kiriye nasnameyan, wekî kevirê ser mezelan xuya dike.

Mehmet Topuz, Rû û Kûr.

Venavandina cihan li Komara Tirkiyeyê ku pê bingegehên netewedewleta nû avabûyî hate qewîkirin ji nêzîk ve bi hokarên nasnameyî, neteweyî û polîtîkayên zimanî ve girêdayî ye. Li milekî serrastkirinê li mekan û cografyaya netewedewletê, li milekî din jî meşandina polîtîkayên tirkîkirinê ku tesîr li çendîn cihetên civakî û mekanî kiriye hiştiye ku destwerdan xwe bigihîne pergala toponîmîk a ku ji Dewleta Osmanî wekî mîraseke pirzimanî mabû. Bi vî rengî komarê re bîr, dîrok û zimanekî nû yê neteweyî hate fesilandin û pareke pir a temsîlên ziman û rêça cemawerên ne tirk di vehilberîna cografyayê de hatin paqijkirin. Di encama wan yekan de, li seranserê Komara Tirkiyeyê li gorî pergala îdeolojîk a dewletê bi hezaran navê bajar, gund, çiya û robaran rastî guhertinan hatin.

Ji destpêka navguhertinê heta îro, gelek nîqaş li dor paş ve vegerandina navan (restorasyon) derketine. Hindek ji wan nîqaşan li ser hewldanên vegerandina navê hin navçe, bajarok û gundan çêbûne, hindek ji wan jî wekî (ne)razîbûn derheq tabela/lewhayên duzimanî ango du-navî yên bajar û gundan çêbûne. Piraniya navê cihan wekî xwe mabin jî, bi demê re hinek navçe û gund vegeriyane ser navê xwe yê berê. Bi giştî, ji destpêkê vir de ev pratîka ku di destê dewletê de bibû amrazê xurtkirina yekîtiya neteweyî û pêşxistina hişmendiya neteweyî, ne bi demê re bi temamî bi dawî bû, ne jî rastî restorasyoneke toponîmîk hat ku li hin welatan pêk hatiye. Ji bo diyarkirina serencama pratîka venavandinê ku her ji destpêkê vir de xwe nikare ji nîqaş û dubendî siyasî bide alî, divê motîvasyon û dînamîkên li paşxaneyê û merhaleyên serekî yên vê pratîkê baş bîn eşkerekirin. Ev beş, ji ber van sedeman, zêdetir bi nêrîneke dîrokî û siyasî bi regekî giştî venavandinê li Komara Tirkiyeyê, pêngavên serekî yên vê prosesê digel hokarên paşxaneyî dide ber xwe.

1.1. Neteweperestî, tirkîkirina pir-rehendî û kurd(î)

Wekî parçeyeke ji posesa demdirêj a avakirina nasnameya neteweyî ya tirkî polîtîkayên tirkîkirinê⁶ (*türkleştirmek/turkification*) bi dewra ewil a Komara Tirkîyeyê ve dest pê nekir, tovên vê polîtîkaya homojenîzasyona zimanî hîn di sedsala 19 û 20an de ji aliyê rewşewbîrên neteweperest ên *İttihad ve Terraki Cemiyeti* (Komeleya Yekîti û Pêşveçûnê) ve hatibûn reşandin. Fikra neteweperestiyê û serederîkirina gelên ne-tirk ku nîqaşên rewşenbîr û piştgirên ITCyê bû di weşanên wê dewrê de gelek bi eşkereyî tê xuyanê. Rewşenbîrên neteweperest ên ITCyê ku fikra wan bi guherîn û lihevanîna nû ve di komarê de jî serdest bûn bo nimûne nîqaş dikirin ku ziman û dirokeke cuda ya kurdan tune ye lewra nabe ku wekî miletekê resen bîn qebûlkin (Zeydanlıoğlu, 2012: 101). Xebatên derheq kovar û saziyên wê dewrê de, destnîşan dikin bê ka geşekirin û veguherîna fikra neteweperestiyê tirkî û nîqaşên li ser osmanîparêziyê yê wê dewrê bi çi rengî pêş ketine (bin. Arai, 2008; Dündar, 2013; Yıldız, 2001).

Neteweperestiyê ku ji Fransayê derdiket armanca wê di prosesa netewesaziyê de teşkîlkirina civateke yeksan û azad bû, xwedî cihetên negatîf ên wekî asîmîlasyona kêmineyan bû (Arai, 2008: 17). Dema ku fikra neteweperweriyê li Dewleta Osmanî belav bû, bi vê hatinê re, gelek milletên li perê Ewropayê yê xaka Osmanî ji hêla netewetiyê ve hişyar bûn û dawaya xaka xwe kirin ku nîqaşên li dor osmanîbûn û tirkbûnê jî bi vê yekê re kete rojeva rewşenbîrên wê serdemê. Di bin tesîra van boçûnên nû de, Dewleta Osmanî ji bihureke veguherandinê re derbas dibû. Êdî rewşa xwe ya pêkvejiyanê bere bere terk kir a ku hembêza xwe ji taybetmendiyên wekî pirdînî, pirçandî, pirzimanî û pîrçewmî re vedikir û ber bi îdeolojiyeke neteweperest ve veguherî. Ya rast, tevgerên neteweperest ên li Balkanan derketibûn, gelek tesîra xwe hene li ser hişyariya neteweyî ya tirkî û jixwe neteweperestiyê tirkî wekî bertek û bersiva vê yekê bi pêş ket (Aydingün & Aydingün, 2004: 422). Bi hişyariya neteweyî re, helandina cemawerên din di nav yekûna millet û zimanê tirkî de wekî

⁶ Di tesewira neteweyê de ziman, li rexekî, wek nîşane û îsbata nasnameya hevbeş û şîûra “em”ê hate hisêbkirin, li rexê din jî, gava ew tesewir li meydana siyasî hate sepandin, wek amrazê eslî hate bikaranîn ji bo veguherîna xelkê netewedewletê.

fikreke xurt derket meydanê. Yek ji wan rewşenbîrên wê dewrê, Namîk Kemal li ser babeta pişaftina gelên kêmnîne di nav yekûna mezin a osmanî de, fikrên xwe bi vî rengî tîne ziman:

Ji destê me bê lazîm e ku em xêncî tirkî hemû zimanên welatê xwe tune bikin, hemî/jixwe em vê yekê nakin, îcar ser de jî em alfabeyan radestî arnawid, laz û kurdan bikin ku wekî çekeke manewî ya cudakariyê bi kar bînin?... Ziman, ji dîn zêdetir rêgiriyeke zexm ya wê yekê dike ku nahêle qewmek di nav qewmekî din de bihele (Arai, 2008: 18).

Fîr û boçûnên neteweperest ên serdema dawî ya Dewleta Osmanî piştî veqetîna piraniya gelên ne-tirk ji Osmanî ji bo damezrandina netewe-dewletê derfetên baş dan destê Komarê ji ber ku her diçû nifûsa tirkan li parçeyê mayî de –Anadolî– dibû zorîne.⁷ Jixwe piştî ku Komara Tirkiyeyê ava bû, êdî xêncî kurdan û nifûseke biçûk a ermenî, ereb, gûrcî, rûm û hwd. gelên kêmnîne pir kêman bûn. Lêbelê ev heterojeniya zimanî ya biçûk jî wekî kêşe dihate dîtin (Bayar, 2011: 115). Ji ber hindê, bi armanca mihkemkirina yekitiya homojen a neteweya tirk û helandina çand û neteweyên cuda, neteweyên kêmnîne bûn armanca desthilata nû ya ku îdeolojiya Kemalîzmê ji xwe re dikir palpişt. Netewedewleta Tirkiyeyê piştî ku ava bû, damezrînerên komarê cext didan li ser sê xalên giring: sekularîzm, *ziman* û dîrok. Bi taybetî ziman û dîrok ji wan pêkhênerên giring bûn ku wekî amrazên xurt di avakirina nasname û bîreke hevpar a tirkî de dihat şuxilandin (Aydingün & Aydingün, 2004: 417; Yüce, 2019: 101). Lewma ziman û dîrok her çû zêdetir ketin ber vekolînan û dezgehên xisûsî hatin avakirin ji bo pêşketin, xwerûkirin û standartkirina zimanê tirkî û duristkirina dîroka tirkan. Berê pêşîn, di sala 1931an de *Türk Tarihi Tetkik Cemiyeti* ku paşê bû *Türk Tarih Kurumu* (Saziya Dîroka Tirkî) hate avakirin û di sala 1932an de jî *Türk Dil Kurumu* ji aliyê Atatürk ve hate avakirin. “Teza Dîroka Tirkî” îdia dikir ku medeniyetên dêrîn ên Rojhilata Navîn, Asya, û Balkanan ji binyadê xwe de tirk in (Yüce, 2019: 101). Di wan deman de, angaştên seyr ên tirkbûneke dêrîn derdikevin pêş ku mîrîsa xwe ya ji dîroka nêzîk a osmanî red dikir û dixwast vegere kokên xwe yên li raboriya berî îslamiyetê. Pêşxistin û îcadkirina dîroka nû ya berî îslamê ku

⁷ Ji bo nîrxandineke birêkûpêk a vê veguherîna îdeolojîk a ji osmanîparêziyê ber bi tirkperestiyê bin. Dündar (2002: 30-38).

dikete xizmeta netewesazî û nasnamesaziya netewedewleta nû, ji demên dêrîn heta siberojê berdewamiya “serfiraz” a tirkî cext dikir ku Eric Hobsbawm (1992) bi têgiha nerîtan îcadkirî (*invented traditions*) ve van pratîkên pêşxistina dîroka qedîm û hewlên avakirina dewamdariya raboriyê rave dike.⁸ Bo nimûne, fikrên balkêş ên ku îdia dikirin ku tirkî nivîsa mîxî hînê asûriyan kirine di vê dewrê de dikevin rojevê (Maksudyan, 2016: 67).

Wextekî paştir, zêdegaviyên wekî *Güneş-Dil Teorisi* (Teoriya Roj-Ziman) hate pêşxistin. Li gorî vê teoriyê zimanê tirkî zimanekî serekî bû û gelek peyvên ji zimanên din ji tirkî hatibûn qerzkirin.⁹ Li dû gotina Yüce (2019: 102), nabe ku meriv gotarên van her du sazîyên navhatî yê fermî ji hev cuda bifikire. Ji ber ku Teza Dîroka Tirkî ji bo nîqaşê zimanê dibû palpişt. Vê tezê di avakirina nasnameya neteweyî de roleke giring dilîst. Dîroka ku di vê çarçoveyê de teşe digirt ji bo nîşên siberojê armancê berpêş dikirin û ji bo cîbicîkirin û zexmkirina hişmendiya neteweyî wekî amraz dihat bikaranîn (Maksudyan, 2016: 56).

Di çarçoveya çaksaziya zimanê tirkî de, Teoriya Roj-Ziman, mihtemelen radîkaltir projeya mihendisiya civatî bû ku xwe dispart piştevaniya dîrokê û pêkhatê serekî bû di prosesa netewesaziyê de. Bi vî rengî, tezên derheq ziman û dîroka dêrîn a tirkî de hevdu temam dikirin. Lewre, îdiaya ku tirkî çavkaniya hemû zimanan e, ji bo îsbatkirina berdewamiya ziman û nijadê tirkî bû, têkiliya roj-ziman jî, hewlek bû ji bo armanca çareserkirina meseleya zimanê li ser bingeheke laîk û bi rêya esasgirtina hêza xwedênenas a rojê ya di nav civatên seretayî de (Coşkun û yd., 2010: 31) Şemsettin Günaltayê yek ji rewşenbîrên girîng ên Komarê, di van gotinên xwe de radigihîne ka teza navhatî xwedanê çî armancekê ye, “Bi teoriya roj-ziman, zimanê tirkî ji bin nîrê îslamê hatiye rizgarkirin” (Coşkun y.d, 2010: 31). Fikreke gelek xurt a derheqê zimanê tirkî de di nav netewa tirkî de dihat çandin ku pê gelên ji etnîsîteyên cuda cuda bin bandora prestîj û rola nû-keşîkirî ya zimanê tirkî de

⁸ Eric Hobsbawm ber û balê dide rola îcadkirina nerîtan û pêkanîna pêkhatê neteweyî ku bi pratîkên berdewam û rêûresmî dubarekirî yê çandî û sazûmanî ve tê qewîkirin. Bo hûrgiliyên vê têgihê, bin. Hobsbawm (1983:1-14).

⁹ Bo nîqaş û vekolînên sûdmend li ser vê teoriyê û çaksaziya zimanê tirkî û neteweperestiya zimanê bin. Lewis (1999), Aytürk (2009), Aytürk (2004), Yüce (2019), Maksudyan, (2016).

diman. Lewma, neteweya xeyalkirî ya nû re, zimanek diviya ku gotî neşîbiya zimanê osmanî yê ku gelek peyv ji erebî û farisî qerz kiribû. Bi vî rengî, ne tenê ziman ji peyv û termên biyanî hate paqijkirin, herwiha ew zimanê ku raboriya îslamî dianî bîra gel bere bere ji nav meriyetê hate rakirin.

Li gorî pênaseya etnîkî ya netewe û dîroka neteweya tirkî dîroka qewmên qedîm ên li Anadolîyê jî vedigirt nav xwe. Di vê pêwendê de, arezûya sînornenas a qedîmkirina ziman ku ji terefê pisporên neteweperest ve dihatin pêşxistin dida zanîn ku neteweya wan “vedigere heta şaristaniyên herî dêrîn” (Hobsbawm, 1983: 14). Li ser vê îdiayê û cîbicîkirina wê ji aliyê dîrokê ve, kadroyên ewil ên komarê “dest bi sepandina bernameyeke tirkkirinê kirin. Mîmarên vê bernameya hêrîşkarane ya tirkkirinê, hema di her civatê de û bi her helkeftekê, ‘tirkbûn’ wekî îmtiyaz û serdestiyekê, û ‘tirknebûn’ jî wekî kêmasiyekê, wekî bêşansiyekê, heta wekî rewşeke şermazariyê pêşkêş kirin” (Coşkun û yd., 2010: 21).

Rewşa zimanê kurdî û zimanên din ên kêmnîyên li Tirkiyeyê kê-m-zêde tê pêşbînîkirin di demekê de ku zimanê tirkî wekî serçavkaniya zimanên dinyayê dihat dîtin. Jixwe, salên piştî damezirandina komarê, ziman û nasnameya kurdî, erdnîgariya Kurdistanê hate înkarkirin û argumentên fermî dihatin bipêşxistin ku digotin li Tirkiyeyê kurd tune ne, tenê ew kes hene ku “tirkbûn” a xwe ji bîr kirine. Bi vî rengî, înkara ziman û hebûna kurdan, guvaşên li ser ziman û çanda kurdî gelek salan şikil û şêwe da helwesta dewletê ya li ser kurdan (Zeydanlıoğlu, 2012: 101). Wextekî paştir, zext û guvaşên li ser ziman û hebûna kurdan ew qas zêde bûn ku êdî di vegêranên desthilatê û weşanên xwedêgiravî “zanistî”¹⁰ de qedexe dihat li ser peyvên wekî “kurd” û “kurdî” û “Kurdistan”ê.¹¹ Berê beringa, vê projeya înkare, giringiya bingeşê ya lingê xwe yê zimanî eşkere kir ku di vê çarçoveyê de rayedarên tirk di kiryarên xwe yên zimanî yên jirêzê de, lê xebitîn ku siyaseta înkara qewmî ya hebûna kurdan rê ve bibin û berbelav bikin û wan herwekî bi heman amrazên zimanî

¹⁰ Di dewra ewil a Komarê de ji bo qewîkirina fikrên neteweperestî û nijadperestiyê, zanist di destê desthilatê de dibû ew amraz ku pê armancên îdeolojîk dihatin bi rê xistin. Bo vekolîneke berkeftî li ser *Türk Antropoloji Mecmuası* û pêşxistina fikrên zanistî-aşopî yên wê dewrê, bin. Maksudyan (2016).

¹¹ Bo nirxandina van peyvên di vegotina zanistî ya tirkî de, bin. Akin (2013: 233-253)

xwestin lawazxistina wêranker a welatê kurdan rewa bidêrin û bingheke yasayî daynin ji bo hemû qedexeyên li ser raderbirîna nasnameya kurdî (Akin, 2013: 235). Li ser çendîn cihetên jiyane prosesa tirkîkirinê hatiye meşandin û yek ji girîngtirîn rehendê polîtîkayên tirkîkirinê ew bû ku xaka cografîk a tirkî veguhere dêsmeneke bi temamî biritîye ji tirkî (Aktar, 2010: 23). Li ser vê paşxaneyê, delîveyên zêdetir dikete destê zimanê tirkî, beramber vê, zimanên xeyrî tirkî, hebûn û dîtbariya wan li ser xakê an jî bikaranîna wan di qadên giştî de wekî tehdîdekê dihate fêmkirin. Prosesên demdirêj ên encama polîtîkiyên li hember zimanê kurdî û hewlên tune kirina wê hişt ku rê û rêkarên ku li ser kurdî dihatin sepandin wekî “komkujiya zimanî” an jî “zimankujî” bêne binavkirin ji aliyê gelek zanyaran ve (Hassanpour, 2020; Skutnabb-Kansas & Bucak, 1995).

Di çarçoveya tirkîkirina navan de, gelek rehendên jiyana rojane bi qanûnan ve carcar bi kiryarên dezgeyî û medenî ve dihatin tirkîkirin ku yek ji wan jî *Soyadı Kanunu* (Qanûna Paşnavan) a bi hejmara 2471 bû. Vê qanûnê bi rêya tirkîkirinê, rê li ber qertafên ji paşnavên ji neteweyên din ên wekî “yan, of, ev, viç, is, dis, pulos, aki, zade û hwd” digirt, bi vê kiryarê ve, dixwest neteweyên xeyrî tirk dîtbar û eşkere nebin û hesta tirkbûnê li wan peyda be.¹² Vê qanûnê mecbûr dikir ku her tirkek ji bilî navê xwe, paşnavê jî hilgire, benda sêyem jî diyar dikir ku nabe “nav û paşnavên nijad û milletên biyanî bî bikaranîn û di wê çarçoveyê de paşnavên tirkî li pêkhateyên li Tirkiyeyê kirin (Coşkun û yd., 2010: 33). Qanûna Paşnavan di sala 1934an de derdikeve, di maweya du salan de ji hemwelatiyan tê xwestin ku di çarçoveya qanûnê de ji bo xwe paşnavan hilbijêrin: navên ku îşaretê bi neteweyên beyanî, regez, eşîran¹³ dikin û navên ku ji aliyê exlaqî ve neminasib û xerab in di vê çarçoveyê de tên qedexekirin û hemwelatiyên ku bi dilxwazî neçûbin paşnav ji bo

¹² Bo nîqaşek li dor van paşnavan, bin. Szurek (2020).

¹³ Ev qanûn wekî amrazê bîşîrkirinê (*detribalization*) hate bikaranîn. Rejîm bi wê baweriyê de bû ku eşîr nîşaneyê paşdemayîne ne, serekê eşîran jî xwedî desthilat in ku dikarin hikimraniya dewletê bixin zorê. Dewletê eşîr wekî kom û cewawerekê didît ku di navbera dewlet û hemwelatiyê wê de rêgirî dike û nahêle ku dewlet hukim bike. Lewma navên bi eşîran re tîkildar hatin qedexekirin (Aslan, 2009: 9). Herwiha divê neyê jîbîrkirin ku wê dewrê pergala eşîrtiyê ji bo kurdan gelek mihim bû û ji bo derbirînên nasname û aidiyetê di nav kurdan de li kar bû, bi vî rengî hêleke din a eşîrtî û kurdûnê jî dibû armanc.

xwe tomar nekirin ji aliyê memûrê herêmi ve paşnav bo wan tên danîn (Türköz, 2018: 1).

Di çarçoveya qedexeya qanûna navbirî de dihat pêşbînîkirin ku navên ne-tirkî ji bo paşnavan neyên bikaranîn, bi giştî navên bi tirkî bên tercîhkirin û navên fermî yê herkesî hebe. Lêbelê dewletê ev qanûn wekî amrazekê bi kar dianî ku pê jiyana civatî durist dikir û welatîyê xwe di nav yekîtiyeke homojen û neteweyî de diheland (Aslan, 2009: 9). Helbet ev yek tenê bi paşnavan re ne sînordar bû, gelek navên kurdî jî rastî rêgirî û astengiyan dihatin û li ser navlêkirina zarokan nelihevîkirin û gengeşî derdiket.¹⁴ Li gorî Türköz, piştî ku qebûlîkirina qanûnê tê dîtin ku hejmareke sînordar a navên tirkî hene, lê beramber vê bi qasî 15 mîlyon welatî hene ku pêdiviya wan bi paşnavan heye. Li ser vê meseleyê, çendîn kitêbokên paşnavan bi tevî wate û şiroveyên wan derdikevin ji aliyên dezgehên hikmî û medenî ve (2018: 95). Van kitêbokan ji bo xizmeta rih û dawaya neteweyî ya tirkî, peyvên *öztürkçe* (xwerû tirkî) pêşniyaz dikirin, nêrîtên navlêkirinê yên tirkên dêrîn rave dikirin û rê û rêkarên peyvسازی *öztürkçe* destnîşan dikirin bi rêya listeyên paşgir û pêşgiran. Di duristkirina navên xwerû tirkî de sê metodên Çaksaziya Ziman dihat bi kar anîn: (a) deynkirina ji metnên qedîm ên tirkî (b) deynkirina ji axaftina rojane (c) eger tu bergind tune be, peyveke sazîkirina peyveke nû (Türköz, 2018: 95-96). Li vir ji bo berçavbûna babetê meriv dikare metodên navlêkirinê li bajarê Çewlîg/Çolîgê wekî nimûne bide. Li bajêr gelek gund hene ku paşnavên hemû xwecihên wê bi awayekî alfabetîk hatine rêzkirin ku hin ji wan navên kevn ên tirkî ne, hin jê di ferhengên berhevkarîyê ên wê dewrê de cih digirin herçiqas wateyê wan bi giştî neyên zanîn jî, hin ji wan bi temamî bê wate ne.¹⁵ Bi giştî, dema ku meriv li tirkîkirina dîmena

¹⁴ Bo xebateke li ser lêkirina navên kurdî li zarokan û astengên li pêşîya wê bi nimûneyan, bin. Aslan (2009). Herwiha ji ber navên xwe yên biyanî kêmineyên xeyrî muslîm ên li Tirkîyeyê jî gelek tengasî kişandine û ew rastî gelek nîrxandinên derêkekirinê hatine, bo hînbûna tecîbeyên wan ên li ser navan, bin. Ender (2016).

¹⁵ Bo nimûne Yıldırım û Dursunoğlu (2012: 805) di xebateke xwe ya li ser navên li Çolîgê destnîşan dikin ku gelek paşnavên ku li wir hatine danîn tenê bi herfekê ve ji yên din vediqetin. Bo nimûne, Barcadurmuş, Barçadurmuş, Barcedoğmuş, Barçedoğmuş, Barçturmuş, Basatuğrul, Basayoğlu, Basılğan, Basılğanay, Basugay, Basuğuy, Başuğuy, Burtaçkıray, Burtakoçin, Burtakuci, Burtakucin, Burtakuçi, Burtakuçin, Burtankoçi Burtankoçin, Burtkoçin.

zimanî (*linguistic landscape*) û asîmîlasyona zimanî ya li Tirkîyeyê dinêre, tê dîtin ku ev polîtîkayên ku bi armanca “netewesazî”yê (Bayar, 2011) li kar bûn, li gelek cihetên jîyanê serdest in û cihên nav jî yek ji wan pêkhêneran e ku ketiye ber vê polîtîkayê. Bi demên dirêj bi pêlên cuda cuda yên navguhertinê pergala toponîmîk a li Tirkîyeyê li lehê zimanê tirkî de hate duristkirin ku li jêr merhaleyên serekî yên van polîtîkayan tên ravekirin. Serqîse, vê qanûnê hemû nasnameyên etnîk ên ne-tirk û welatîyên xeyrî muslîm da zorê ku ew xwe bispêrin nasnameyeke ku ne aidî wan e (Çağaptay, 2006: 98-99).

1.2. Paşxaneyê navguhertinê

Gerandina şopa navguhertinê li Tirkîyeyê bi rastî gelek zehmet e. Çunku ne statîstîkên li ser vê qadê li hev dîkin û ne jî weşanên fermî yên dewletê piştî guhertinan bi rengekî birêkûpêk ev weşandine. Îcar bi ser de jî bi koçberiyê re (çi bi darê zorê, çi jî bi dilxwazî) guherîna statuya gundan ber bi mezrabûnê û bi pêşketina bajaran re guherîna statuya gundên li perên bajêr wekî tax û gelek hokarên din bi erdhej, bendav û sererastkirinên mekanî encam didin, vî karî zehmettir dîkin. Helbet, dîsa jî li ser statîstîkên navên guhertî û mahiyeta wan xebat hene.

Guherîna nava, vedigere dewra Dewleta Osmanî û bi taybetî dewra ku Îttîhad û Tereqî tê ser hikim. Di wê serdemê de, bi heman armanca û xisletê dewrên ewil ên Tirkîyeyê nebe jî, bi taybetî di dewra sultaneta Abdulazîz û Abdulhamîdê II. de navguhertin dest pê dike (Nişanyan, 2010: xv). Lêbelê, zêdetir navê padişah an jî endamê malbata wî tê danîn li dever an jî navçeyan. Li gorî Nişanyan derdora 1870an de komê navên *Aziziye* peyda bûne û di navbera salên 1876-1879an de bi dehan navên wekî *Hamidiye*, *Umranihamid*, *Eserihamid*, *Bunyanihamid* û hwd. zêde bûne. Bo nimûne, di dawîya sedsala 19an navê neviyê V. Mehmed, Mehmed Nazim Efendi wekî *Nazimiye* (navê berê bi tirkî *Kızılkilise*, bi kurdî Qisle/Heyderan) didin navçeya Dêrsimê.¹⁶ Navkirinên bi vî rengî, di dewrên cuda yên osmaniyan de rûdaye lêbelê ew guherîn bi armancên wekî neteweperestî û nasnamesaziyeke tund ve bi pêş

¹⁶ BOA, İ.DH. 1487.10 (03.04.1329) “Dersim dahilinde Kızılkilise kazasına padişahın torununun isminin verilmesi.”

neketine. Lewma meriv nikare hemû navguhertinan bi serdema piştî Komarê re girê bide, bi sedsalan di bin îdareya Osmanî de jî gelek nav wekî prosedureke asayî ya sîstema bacwergirtin, serjimarî (*nüfus tahriri*)¹⁷, îskana muhaciran¹⁸ û tevliheviyê¹⁹ hatine guhertin an jî li gorî rêzimana zimanî osmanî hatine tomarkirin. Di arşîva osmanî de li ser binavkirina gund, tax, eczane mizgeft, dibistan²⁰ û nexweşxaneyên nû bi sedan belge hene.²¹ Navên herî zêde tîr bikaranîn navên padişahên wê dewrê ne.

Herwiha, paşxaneya hewla binavkirinê de babeta mihaciran heye ku ji aliyê balkanan ve ber bi Tirkîyeyê bi rê dikevin an jî li Tirkîyeyê ji cih û warên xwe hatine sirgûnkirin. Lewma ev babet yekem car di *İskan-ı Muhacirin Nizamnamesi* (1913) de di belgeyên fermî de xuya dibe. Li gorî vê nîzamnâme yê gundên ku ji bo kesên muhacir tîr avakirin, divê bi navê guncer ve bîr binavkirin. Ji ber ku di maweya Şerê Cihanê yê Yekem de gundên ku xwediyê wan ên xeyrî-muslîm ber bi herêman mayîn hatibûne koçberkirin, tê de misilman bi cih dibûn. Ev gundên ku xwediyê wan ên nû hebûn divê navên wan ên berê bihata tirkîkirin (Dündar, 2002: 82), bi vî rengî hem xwedîtiya mêvanên nû li ser gundan mihkem dibû hem jî navên ku bi zimanê yûnanî, bulgarî û ermenî bûn ji holê radibûn ku bi gelemperî xwediyê gundan ên kevn bi bîr dixistin. Piştî ku gelên ne misilman ji cih û warên xwe hatin derxistin, di havîna 1915an de, bere bere navên şengeh û deverên meskûn hatin guherandin,

¹⁷ BOA, DH.KMT. 918.8 (19.10.1322) “Develi kazasında eski bir karye harabesi bulunan Senrak adlı mahalde yirmi seneden beri kendi kendine yerleşmiş olan yirmi sekiz hane halkının yeni nüfus tahririnde tescilleri lüzumu işar kılınmış ise de teşkil ettikleri karye henüz isimlendirilmemiş olduğu cihetle karyenin teşkil ve tevsimi babında icabının ifası.”

¹⁸ BOA, ŞD 1717.36 (02.06.1310) “Kafkasya muhacirlerinin Saidili nahiyesinde teşkil ettikleri karyenin Sultaniye namıyla tevsimi.”

¹⁹ BOA, ŞD 2223.25 (12.08.1310) “Zor ve Şehr-i Zor sancaklarının isimlerinde olan müşabehetten dolayı vuku bulan yanlışlıkların men’i için nam-ı kadimleri olan Deyr ve Kerkük isimleriyle tevsimi istizanı.”

²⁰ BOA, I.DH. 1248.97802 (26.03.1309) “Genç sancağı merkezinde inşa olunan caminin Hamidiye ve mektebin de Burhaniye namlarıyla tevsimi.”

²¹ BOA, BEO. 572.42879 (21.08.1312) “Erzurum vilayeti Pasinler kazasının Subhan Kalesi mevkiinde ve mahall-i sairesinde muhacirin iskanıyla müceddeden teşkil edilen yedi karyenin Hamidiye, Selimiye, Kadiriye, Teşvikiye, Orhaniye, Osmaniye ve Sultaniye namlarıyla tevsimi.”

lêbelê ji ber ku ev kar ji aliyê desteya îdarî ya parêzgehan ve dihate kirin, ji pergala û rêkaran dûr bû (Dündar, 2002: 82).

Enver Paşa di vê prosesê de roleke berçav gêraye. Jixwe babeta navên “ne tirkî” wekî îradeyeke siyasî di salên 1913-1916an de bi serperîştîya Enver Paşa derdikeve holê. Enver Paşa 15 çileyê 1916an de talimatnameyekê derdixê derheq guherandina navên ji milletên ne misilman;

Biryar ew e ku navên parêzgeh, navçe, bajarok, gund, çiya û çeman bê guherandin ên bi zimanê ermenî, yûnanî an bûlgarî angû navên ji zimanê milletên ne-misilman in. Divê demûdest kelk ji vê dema misaid bê wergirtin û ev meqsed divê bi rê ve biçe (Dündar, 2002: 82; Nişanyan, 2011: 41).²²

Çawa ku tê dîtin, di hewla fermî û daxwaza guherîna sistematîk a Enver Paşa de navên ku aidî gelên misilman in, bi taybetî navên kurmancî, zazakî, erebî û hwd. di vê telîmatnameyê de cih negirtiye. Enver Paşa dewra bikêşe û nediyar a Şerê Cîhanê yê Yekem wekî derfeteke baş dibîne ku navan biguherîne ji ber vê yekê, wê dewrê wekî “dema misaid” bi nav dike. Bi taybetî piştî Şerê Balkanan ku rêjeyeke mezin ji axa Balkanan ji destê Osmanîyan derdikeve, Enver Paşa 23ê Çileyê 1913an de bi tevî hevalên xwe yên îttîhadparêz hemû mekanîzmayên qerardayîne yên politîk bi maweya pênc salan bi dest dixin û wekî projeyeke siyasî ya plankirî dixwazin li Anadolîyê welatekê çêbikin ku tê de tirkbûn lê dewamdar be (Dündar, 2013: 62). Üngör destnîşan dike ku di destpêkê de Jon-tirk ne di wê armancê de bûn ku civaka osmanî ji hev cihê bikin û jê neteweperestîyeke tirkî biafirînin. Li gorî wî veguherîna wan di du pêngavan de pêk hat yekem de, ev tevger ji neteweperestîya osmanî ber bi neteweperestîya misilmanîyê çû ku pê re derekekirina xeyrî-muslîman encam da. Di pêngava duyem de, ji misilmanparêziyê ber bi neteweperestîya tirkî ve çû ku vê jî nepejirandina kesên ne tirk ve encam da (Üngör, 2016: 73).

²² “Memalik-i Osmaniyyede Ermenice, Rumca ve Bulgarca, hasılı İslam olmayan milletler lisanıyla yad edilen vilayet, sancak, kasaba, köy, dağ, nehir, ilah. bilcümle isimlerin Türkçeye tahvili mukarrerdir. Şu müsaid zamanımızdan süratle istifade edilerek bu maksadın fiile konması hususunda himmetinizi rica ederim.”

Herwiha Îttîhad û Terrakî di demekê de ku çareseriyekê digeriya ji bo koçberiya ku bi sed hezaran ve rû dida, 27ê Gulana 1915an de “Tehcir Kanunu” derdixê ku di encama wê de bi sed hezaran kesên ku “di rewşa şerî de li hember dewletê derketin” bi taybetî ermenî, rûm û kurd²³ ji wargeh û cihên xwe hatin derxistin (Dündar, 2013: 63). Prosesa bêcihûwarkirinê û bicihkirina mihaciran li dewsa wan ku wekî “mihendisiya demografîk” (*demographic engineering*) tê binavkirin, di heman demê de rê li ber “mihendisiya toponîmîk” (*toponymical engineering*) dixê, lewma ev dewra ewil wekî pêla navguhertinê ya yekem tê binavkirin (bin. Öktem, 2008). Ango piştî bicihkirina mihaciran, tirkîkirina navên cih û warên ku wan lê hêwir daniye, bi awayekî bi destê Enver Paşa tê destpêkirin ku ew bixwe bi taybetî derheq venavandinê de xwedî fikr û biryaran e. Herwiha li ser awayê binavkirina wan cihan û taybetmendiyên navlêkirina wan di xalên din ên talîmatnameya navbirî de derbas dibe. Li gorê wê, navên ku wê bîr danîn divê iftixar û şanaziya leşkerî bigire nav xwe û “rûdanên navdar bi bîr bixê”²⁴ ên ku li wir qewimîne. Tiştê balkêş, di talîmatnameyê de hatiye pêşniyazkirin ku navên nû ji aliyê deng û wateyê ve nêzîkî yên kevn bin da ku rewşa adetî ya berê (*ülfet-i sabıka*) re li hev bê. Lêbelê rê û rêkarên navguhertinê yên dewra komarê bi temamî berevajî vê rewşê ye. Di pratîkên navguhertinê yên dewra Komarê de bi taybetî amaje bi wê yekê dibe ku navên nû

²³ Kanuna Tehcîrê tenê ji bo ermeniyên nehatibû derxistin, ji ber ku “rûm û kêminyên din û misilman (jî) yê ku li hember dewletê kar dikin pabendê vê qanunê bûn” (bin. Dündar, 2013).

²⁴ “Yeni konacak isimlerin daima çalışmakta ibret ve miyar olacak tarihi mefahir-i askeriyeimizi şamil olması mültezemdır. Gerek şimdi ve gerek evvelce vakayi-i hayriyeye maruz kalmış olan mevkiler oraya mahsus şanlı hadisatı hatırlatması ve bu vaki değilse en namuslu ve memleketine nafi hizmetlerde bulunup da vefat etmiş zatların isimleri zikredilmeli veyahut mevkiiin daima mebzul ve maruf olan mahsulat, sanayi ve ticaretine, daima sabit kalacak ve sanat ve şekl-i coğrafisine yakışan isimler bulunmalı, velhasıl mekteb hocaları talebelerine coğrafya öğrettikleri sırada vatanımızın her parçasını zikrederken onlara aynı zamanda her mevkiiin şanlı tarihine, iklim, mahsul, sanat ve ticaretine ait faideli mevzular bulabilmelidir. Bir de öteden beri yabancı da olsa nasılsa lisanen ülfet edilmiş isimlerin birdenbire başka lafzen hiç müşabeheti olmayan isimlere tahvili hem bazı yanlışlıkları ve hem de ala halihi ahali ağzında eski isimlerin dolaşmasını mucib olacağından ahalinin kabiliyet-i fitriyesi nazar-ı mülâhazaya alınmalı ve ona göre isim bulmaya itina edilmelidir. Mesela, bu zikredilen esas dahilinde isim bulmak kabil olmaz ise “Ereğli”ye Ergili veyahud “Erikli”, Gelibolu’ya “Velibolu” demekle herhalde ülfet-i sabıka ihlal edilmemiş olur” (Nişanyan, 2011: 41).

divê ji aliyê teşe û wateyê ve neşibin yên kevn û wan bi bîra gel nexin. (Gökçeer, 1984: 4) Di vê derbarê de, çawa ku diyar dibe boçûn û pratîkên dewra komarê radîkaltir in ji boçûnên Enver Paşa ji ber ku komarê bi tu rengî nexwestiye navên kevn bi şibînê be jî bê bîra gel (bin. Nişanyan, 2011: 42).

Ev pêşniyazên guherandina navan ji ber rewşa nearam û tevlihev a heyî dibe arîşe. Ji ber ku di muxabereyên leşkerî de nelihevî (*mübâyenet*) û tevlihevî (*teşevvüşât*) derdikevin, tê daxwazkirin ku heta dawîya seferberiyê navê gund û bajarokan neyê guherandin û guherandinên ku pêk hatine divê heta dawîya seferberiyê bê texîrkirin (Dündar, 2002: 83). Ji ber hindê, sercemê guherandinên vê dewrê wekî lîsteyên kamil tune ne, lê bi giştî xêncî hin navçeyên Rîzeyê, guherandinên wê dewrê bi ser neketine. Gelek daxwazên tirkîkirina navan ên wê dewrê ji ber rewşa aloz a şer û rûdanên siyasî cîbicî nebûne, qismet ji navan ên ku vê dewrê hatine guherandin, piştî wextan di dema Komarê de ji nû ve hatine binavkirin. (bin. Nişanyan, 2011)

Tirkîkirina navan ku di dema Şerê Balkanan de Îttîhadparêzan dabû destpêkirin di Şerê Cîhanê yê Yekem de jî dabûn dewamkirinê wekî nîqaşeke germ her li rojevê ma. Salên ewil ên Komara Tirkiyeyê jî bi taybetî di dewra meclîsa yekem û ya duyem de nîqaş û hewlên guherandina navan neqediyan (Koraltürk, 2003: 98). Dîsa wan deman ku li meclîsê gelek nîqaşên gurr çêdibin li ser navan, ji mebûsekî teklîfeke qanûnî (projeyasa) tê pêşkêşkirin li ser guherandina navên bajarên ku eslê xwe ecnebî ne û herwiha mebûsê Entabê Yasin Bey jî bi heman rengî daxwaz dike ku navê qezaya *Rumkale* ya bi ser Entabê wekî *Halfeti* bê guherandin. Dema ku ev teklîf li meclîsê tê guftûgokirin, xwediyê projeyasayê Yasin Bey pêşniyaza xwe wiha diparêze:

Welatê ku esl, nesl û neseba wê tirk e û tenê rûmek jî lê namîne jê re gotine qezaya *Rumkale*. Di wextê de ji rûman hatine hildan îcar çi bûye? Navê rûm li vê keleyê kirine. Ev meseleyeke gelek besît e. Wekî kesekî ji wî bajarî ez navê wî miletî naxwazim hilgirim ku îro mîna kûçikan dest davêjin namûs, hebûn û dahatiya me...Ez rica dikim ku ev peyva rûm demûdest bê rakirin (Koraltürk, 2003: 98).

Ev daxwaza Yasin Bey, di sala 1984an de li Sempozyûma Cihênawên Tirkî (*Türk Yer Adları Sempozyumu*) de ji aliyê Cemal Arif Alagöz ve tê nîqaşkirin. Li wir Alagöz destnîşan dike ku tu eleqeya navê Rumkaleyê bi rûman re tune ye. Li gorî Alagöz peyva *Rumeli* îşaretê bi hikimraniya Dewleta Romayê dike û ew xwe dispêre *Kāmûsü'l-A'Lâm* a Şemsettin Sami ku dibêje Rumkaleya nêzîkî Xelfetiyê (bi tirkî *Halfeti*) jî bermayiya dewra Romayê ye. Dewleta Romayê bi destê Fatîh Sultan Mehmed hatiye hilweşandin (Alagöz, 1984: 23). Li gorî Yıldız (2001: 82) li Dewleta Osmanî du xêzên serekî li ber çavan diketin ku dixwestin li dor tirkbûnê homojênîzasyoneke (yekrengkirin) etnîk pêk bînin. Yek jê polîtîkayên tirkkirina xeyrî-muslîmên ne tirk bû. Di çarçoveya tirkkirina wan de, kiryarên ku nav û nîşanên bîra neteweyî ji holê radikirin ên wekî hîndekariya tirkî ya mecbûrî, tehcîra navxweyî (îşkana bi darê zorê), *tirkîkirina navên herêmî* û qedexekirina bikaranîna van zimanan li qada giştî hatin sepandin. Xêza duyem, derheqê wan kêmbûnêyan de bû ku ne-tirk bûn lê misilman bûn. Asîmîlasyona vê komê çiqas biketa tengasiyê ew qas tedbîrên bi zext û zor zêde dibûn. Wisa diyar e ku di vê dewrê de jî hê daxwazên guherîna toponîmên ji zimanên “ecnebî” li bin tesîra şer de ye ku piştî wextan bi rengêkî sistematîk wê derkeve holê. Lê bi giştî, dema ku meriv li nifûsa piştî avakirina Komara Tirkiyeyê dinêre, tê dît ku pir-çandîbûn û pirzimanîya dewra Osmanî bi piranî ji holê rabûye û yên mayîn jî di prosesa polîtîkayên cihêreng de bere bere ji aliyê ziman û nasnameyê ve dihelin.²⁵

Ji bilî navguhertinên serdema dereng a Împaratoriya Osmanî ku wekî berdewamkirina vê mîrasê bû para Komarê, bi giştî di dewra Osmanî de pratîkên navendî û herêmî yên navguhertinê nayê zanîn. Li ser navguhertinên piştî avabûna Komara Tirkiyeyê gelek xebat hene. Lêbelê lêgerîneke berfireh a dîrokî tune ye li ser dewra Împaratoriya Osmanî ku bikaribe wan (ve)navandinan vebikole ku bi însiyatîfa rêveberên navendî û herêmî hatine kirin. Lewra, guhertina navan li Anadolîyê ne tenê vê sedsala borî pêk hatin û ne jî tenê meriv dikare wan di çarçoveya teng a neteweperestiyê de bi sînor bike. Herçiqas bi rengêkî neteweperest nebe jî, ji ber pergala rêveberiyê û tomarkirinên ji bo bac û sistema hiqûqê gelek nav

²⁵ Ji bo nîrxandîneke li ser nifûsa Tirkiyeyê û rêjeya kom û zimanên xeyrî tirkî, bin. Dündar, (2000).

dema ku dihatin nivîsandin bi telafûz û rêkarên zimanê tirkî dihatin qeydkirin û navên bi ziman û dîalektên herêmi eger neyên guhertin jî li gorî rêzikên zimanê tirkî dihatin serrastkirin. Û van qeydên ku mohra dewletê li ser bû, helbet bi derbasbûna sedsalan re gelek navên deverên ji zimanên din guhertin an jî li ser telafûz û berbelaviya forma wan a tirkî tesîr kir.

1.3. Nêrîneke dîrokî li venavandinên li Tirkîyeyê

Pratîkên guhertinên navan ên li Tirkîyeyê, ji aliyê Öktem (2008) ve li ser çar pêlên serekî hatine parvekirin. Ev dabeşkirin hin kêşeyan bihewîne jî (bin. Field, 2013) bi awayekî giştî hatiye qebûlkirin. Li gorî Öktem hevterîp li gel mihendisiya demografîk û toponîmîk pêla ewil a navguhertinê di navbera salên 1915-1922 pêk hatiye ku salên ewil ên bingeş û damezrandina komarê ne. Pêla duyem, heyama tek-partiyê digire nav xwe ya ku ji sala 1922an dest pê dike û heta 1950an dewam dike. Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê ku bi rengekî rêkûpêk guherînan pêk tînin (ji sala 1950 heta salên 1980yî) wekî pêla sêyem tê destnîşankirin. Pêla dawî jî li ser mihendisiya demografîk û toponîmîk re Sempozyûma li ser Cihênavên Tirkî ya salên 1980an û valakirina bi hezaran gundê kurdan şikil digire (Öktem, 2008: 18). Heyama dawî ya piştî salên 1980yî ku tê de gelek gundên kurdan bi darê zorê tê valakirin, bi xwe re guhertinên navê deveran jî tîne. Ev guhertinên navan li kêlekekê, texrîbateke berçav li ser hafizaya toponîmîk a gundên valakirî/wêrankirî çêbûye. xwecihên wan gundan ku qismek ji wan piştî wextan li gundê xwe venegeriyan, bi hezaran navên erd, mêrg, newal, gelî û warên xwe ji bîr kirin û derbasî nîşên xwe yên teze nekirin. Li gorî dabeşkirina Öktem (2008) meriv dikare xetên serekî yên van her çar pêlan wiha nîşan bide (**Tablo 1**):

Dabeşkirina Pratîkên Navguhertinê li gorî Öktem (2008)	
Pêla Yekem (1915-1922)	Komeleya Yekîti û Pêşveçûnê (ITC) bi kiryar û tamîmnameyan ve paşxaneyê fikrî ya vê dewrê pêk tînin. Rewşenbîrên neteweperest ên ITCyê fikr û ramanên xwe tînin ziman û hin navan diguherînin. Bi taybetî piştî koçberkirin û bêcihûwarkirina sed hezaran a bi qanûna tehcîrê ve pêk hatiye,

	navê deverên meskûn ên valakirî hatine guhertin. Lewra Öktem (2008) vê dewrê li ser çemkên wekî mihendisiya demografîk û mihendisiya toponîmîk şirove dike.
Pêla Duyem (1922-1950)	Kiryarên vê dewra ewil ku karîgeriya kadroyên Kemalîst de şikil digirin, bo nimûne <i>Halkevleri</i> (Xaniyên Gel) ku bi tevî <i>Türk Ocakları</i> (Ocaxên Tirkan) beşdariyê li prosesa navguhertinê dikin. Herwiha kitaba bi tîpên latînî û erebî ya bi navê <i>Yeni teşkilat-i mülkiyede köylerimizin adları</i> diweşe û tê de navên gundan bi du rênivîsan tîpên rêzkirin.
Pêla Sêyem (1950-1980)	Wekî dawîya dewra dirêj a tek-partiyê û destpêka dorhêleke nispeten demokratîk, ev dewr bi kiryarên Demokrat Partiyê (DP) ve digihîje bingeha qanûnî. Avabûna Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê prosesê ber bi birêkûpêkiyê dibe.
Pêla Çarem (1980-...	Di dewra piştî 1980an de ku bi taybetî bi hezaran gundê kurdan hatin valakirin û rewşeke kaotîk a şidetê li dar bû, gelek bajaran navên neguherandî yê kurdî hatin guhertin. Herwiha di vê dewrê de, li navenda bajaran jî êdî dubendî li ser tercîha navên kolan û taxan rûdan.

Tablo 1. Dabeşkirina pratîkên navguhertinê li gorî öktem (2008)

Neteweperestiya dewra dawî ya Dewleta Osmanî û Komara Tirkîyeyê li ser heman helwest û boçûnan ava nebibûn. Di dewra Osmanî de, neteweperestî xwediyê rehendekî dînî bû û dihat hêvîkirin ku rêgiriya ji hilweşîna dewletê re bike. Lê piştî ku Dewleta Osmanî hilweşiya û dewsê de Komara Tirkîyeyê hate avakirin, boçûnên neteweperestiyê jî pêrgî guherînên naverokî bûn.

Bi hatina sed hezaran tirkên ji Balkanan û bi şandina ewqas kesan jî ji nav Tirkîyeyê, li ser esasê netewedewleteke yekreng û homojen neteweperestî kete xizmeta helwest û naverokeke cuda. Rast e ku fikra kadroya îttîhatparêz gelek karîger bû di damezirandina Tirkîyeyê de lê dîsa jî pratîkên navguhertinê van herdu dewran jî wekî neteweperweriya wan ji hev cuda bûn. Di merhaleya nû ya piştî pir-neteweyî û pir-rengiyê de, ji bo pêkanîn û parastina dewletê ji “cudatî”yan ku

bibûn sebebê parçebûna Osmanî, li Tirkîyeyê polîtîkayên tirkîkirinê bi rengêkî sîstematîk ketin dewreyê ku tirkîkirina navê deveran jî ji wan yek bû.

Guhertina navê cihan çawa ku di destpêka vê beşê de jê çêl bû ne rewşeke xweserî Tirkîyeyê bû ku tenê li wir pêk hatibe. Bi pêçevane, di avabûna netewedewletên cînar de jî pratîkên gelek manend ên navguhertina rû dane ku hin ji wan bi rengêkî hevdemî (*simultaneously*) û di pêwendeke hev-karîger de bi du-layenî pêk hatine, hin ji wan jî di nav netewedewletên nû-avabûyî de peyda bûne ku dîsa meriv dikare bibêje ku pratîka navguhertinê ya li Tirkîyeyê ji aliyê wan ve hatiye deynkirin an jî tesîr li wan kiriye.²⁶ Ev jî yek ji wan hokaran e ku divê di çarçoveya paşxaneyê navguhertina li Tirkîyeyê de bê fikirîn. Lewra di belgeyên arşîvê de tê dîtin ku navguhertinên li Bulgaristanê bi başî tên teqîbkirin. Di belgeya di sala 1934an de Wezareta Karûbarên Derve (Hariciye Vekâleti) ji guhertinên li Bulgaristanê yên ku di Rojnameya Zorayê de tê agahdarkirin. Di belgeyê de tê gotin ku Rojnameya Zorayê ku li Bulgaristanê weşana xwe dike radigihîne ku wê navê hin deveran biguherîne.²⁷ Navên ku dê bîna guhertin di belgeyê de hatine rêzkirin bi tevî navên xwe yên kevn ku bi zimanê tirkî ne. Wisa diyar e ku navguhertinên li Tirkîyeyê di pêwendeke hevbandorkirinê de pêk hatiye û ji helwestên raqîb ên dewletên cîran jî tesîr girtiye. Hin navên ku ji tirkî bo zimanê bulgarî hatine guhertin, bi vî rengî ne;

Navê Kevn (bi tirkî)	Navê Nû (bi bulgarî)
Osman Pazar	Omortag
Eski Cuma	Targovirche

²⁶ Li Yûnanistanê, dîroka navguhertinê vedigere heta salên ewil ên 1830an. Herwiha di sala 1909an de lijneyeke fermî tê damezirandin ji bo navguherinê. Bi hezaran gundên ku “bi zimanekî barbarî xeber didin” di çarçoveya helenîzasyonê de di prosesa navguhertinê re derbas dibin. Navên ku raboriya tirkî bi bîr dixin ên “heyamên tarî” ji dîroka neteweya grekî tên paqijkirin. Bo nîqaşê li ser vê babetê, bin. Liakos (2008: 201-236). Herwiha ji bo guherîna navên tirkî, kurdî û rûsî yên li Ermenistanê bin. Ghulyan (2020) û bo heman prosesa navguhertinê ya li Azerbeycanê, bin. Saporov (2017).

²⁷ BCA, 30.10.0.0/240.624.2 (01/08/1932) “Bulgaristan’da münteşir Zora gazetesi mezkûr memleketteki bâzı isimlerin değıştirileceğini haber vermektedir.”

Mestanlı	Momtchilgrad
Koşukavak	Kramovgrad

Tablo 2. Çend navên tirkî ku ji aliyê Bulgaristanê ve hatine guhertin

Bi giştî armanca guhertinê navan ne tenê tirkîkirina dîmena xakê bû (*language landscape*) wekî ku beşa raborî de hate diyarkirin netewesazî, neteweperestî, nasnamesazî û hwd. di destwerdanê li pergala toponîmîk de roleke giring gêrane. Fikra “tirkîkirina navan” wekî mîras ji îttîhatparêzan mabû û di salên ewil ên komarê de jî xwedî piştgiriyeke îdeolojîk bû herçiqas di pratîkê de xêncî take-nimûneyan gavên zaf giring nehatin avêtin. Lewra, pratîkên salên ewil ên komarê ji pergal û sistemeke xurt bê par bû. Piştî wextan, boçûnê neteweperest encam dan û ji dezgehên wekî *Türk Ocakları* kampanyaya navan hatin meşandin. Dîsa jî, li hember dawakarî û guvaşên ku ji teref *Türk Ocakları* û *Halkevleri* dihatin, rayedarên siyasî bi piranî bi hişyarî tevdigeriyan. Ber bi dawiya emrê Atatürk li Rojhilatê çend hewldanên berçav ên tirkîkirina navan çêbû; lêbelê di serdema İsmet İnönü de hema hema qet guhertinê navan pêk nehatin (Nişanyan, 2011: 13). Lêbelê, derdora salên 1930î de wisa tê xuyanê ku dawakariyên tirkîkirina navan ên kadroyên *Halkevleri* (Xaniyên Gel) ku bi tevî *Türk Ocakları* kar dikirin berçav dibe. Xaniyên gel, bi armanca tirkîkirina navan ku qismek jê kurdî ne, navên bi sedan gundî diguherînin ango dikin tirkî. Wer xuya ye ku navên ku vê dewrê tînin guhertin zêde pêrgî karûbarên burokratîk nayên, ew bi awayekî yekser ji aliyê Mustafa Kemal Atatürk û İsmet İnönü ve tînin pesendkirin (Kuran, 2010: 36). Hin navên ku vê dewrê hatine guherandin ên giring ev in: Alaiye wekî *Alanya*²⁸ (1933), Bayazit wekî *Ağrı*²⁹ (1935), Dersim wekî *Tunceli* (1935), Mamüretülaziz wekî *Elazığ*³⁰ (1937) û herwiha

²⁸ BCA, 30.18.1./36.38.12 (23.05.1933) “Antalya’ya bağlı Alaiye kazası adının Alanya’ya çevrilmesi”

²⁹ BCA, 30.18.1.2/54.33.16 (04.05.1935) “Bayezid vilayeti adının Ağrı ve Karaköse ilçesi adının Doğu Bayazit olarak değiştirilmesi”

³⁰ BCA, 30.18.1.2/80.100.14 (10.12.1937) Atatürk navê *Mamuretülazizê* pêşiyê wekî ‘El’azık’ bi nav dike ku tê wateya ‘bereket/adanî’ paşê nav wekî *Elazığ* serrast dikin ku bi kurdî wekî Xarpêt û Elezîz tê zanîn.

Gevar wekî *Yüksekova*³¹ tê binavkirin. (Herwiha bin. Kuran, 2010: 36; Nişanyan, 2010)

Polîtîkayên zimanî yên dewra avabûna Komarê, bi xêra dezgeh û çalakîyên xwe yên sazûmanî rehê xwe berda di kûratîyên dewlet û civatê. Lewma, di dewr û heyamên piştî wê de jî, bingeh û cewherê polîtîkayên zimanî wekî xwe ma, guherîneke zêde tê de pêk nehat (Coşkun û yd., 2010: 34). Piştî ku Komara Tirkîyeyê hate avakirin, hin navçe, bajar û gundan, carcar navên hemû gundên bajarekî hatin tirkîkirin. Bo nimûne, di sala 1925an de navê hemû gundên Artvînê ku para pirtir bi zimanê gürçî ne û di sala 1938an de hemû gundên *Hatayê* bi biryara *Meclis-i Umumiyye-i Vilayet* hatin guhertin. Guhertinên ku sercemê navên parêzgehekî vedigire yên di navbera salên 1923-1960an de, bi van her du bajarên navhatî re sînordar bûn (Nişanyan, 2011: 13).

Li gorî Tuncel (2000: 27) kiryarên guhertina navên deverên meskûn, bi taybetî jî yên gundan, bi biryarnameya Wezaretê Karûbarên Navxweyî ve di sala 1940an de gihişte huwiyeteke fermî. Piştî vê biryarnameya hejmar 8589an, ew navên cih û warên meskûn, bi tevî navên tebiî yên esl û kokên wan jî zimanên biyanî ne û di bikaranînê de dibin sebebê tevliheviyeke mezin, hatin tirkîkirin. Li ser talîmatên vê biryarnameyê, ji aliyê parêzgehan ve derheq navên deverên meskûn ên ji kok û zimanên biyanî tî, gelek dosye tî amadekirin, lêbelê ji ber Şerê Cihanê yê Duyem nehatine encamdan (Tuncel, 2000: 27). Li ser navber û qutbûna ku ji ber şer dikeve prosesa navguhertinê Gökçeer li destpêka *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* de wiha xeber dide:

Di salên 1940an de eleqeya babetê ya nêzîk bi mewcûdiyeta me ya millî re hatiye dîtîn û navên deverên meskûn û deverên tebiî wekî polîtîkaya dewletê bi navên tirkî ve hatine binavkirin. Di wan salan de, ji aliyê wezaretê me ve, bi tamîmekê ve ji parêzgaran hatiye xwestin ku cihên navên ji kok û zimanên biyanî bî destnîşankirin û dosyeyên dagirtî ji wezaretê re bî hinartin. Ji sala 1942an û pê ve, dosyeyên parêzgehan hatine nirxandin, lêbelê ji ber tengasî û tevliheviyên Şerê Cihanê yê Duyem, derfet çênebûye ku xebatên navguhertinê pêk bî (Gökçeer, 1984: 1).

³¹ BCA, 30.18.1.2/60.91.10 (29.11.1935)

Dawiya dawî, di sala 1949an de, guhertina navên cografîk bi qanûna hejmar 5442an bi xala 2(D) ve bingehêke qanûnî bi dest dixe û heqê guhertina navên ne tirkî yên gundan dide Wezareta Karûbarên Navxweyî. Heman qanûn, herwiha rê li ber guhertina navên dîrokî yên çiya, robar, gir û hwd. jî xweş dike (Bayer, 2013, 106-107).

Di heyama İnönü de, çawa ku li jorê jî hate behskirin, tirkîkirina navan qismen kêmbûye, lê bi awayekî balkêş di salên 1950an de di dewra Demokrat Parti (*Partiya Demokrat*) de, pêngava herî sistematîk ji bo guhertina navan tê avêtin. Danîna bingeha fikrî û dezgehî ya “paqijîya mezin” ya navên ne-tirkî dibe para serokwezîrê wê dewrê Adnan Menderes (Nişanyan, 2010: xvii). Herçiqas ev heyama bi pir-partîbûnê ya bi Demokrat Partiyê ve dest pê dike, nisbet bi îktîdarên berî xwe yên tek-partiyê dibe şahidê hin polîtîkayên lîberal jî, beramber vê, di babeta navguhertinê de, pêngavên hişk û berfireh tên avêtin ku pê re jî dezgehîkirina navguhertinê encam dide.

Di wê dewrê de lijneyeke taybet tê avakirin ji bo guhertina navan: *Ad Değiştirme İhtisas Kurulu* (Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê). Li gorî gelek kesan ev lijne di sala 1957an de hatiye avakirin (Tunçel, 2000; Kuran, 2010) li ser esasê Biryara Lijneya Wezîran bi roja 19/10/1957, bi hejmar 4/9595an. Li gorî Field (2013:76) li ser mêtûyê avakirina vê lijneyê lihevkirinek xuya nake û dîroka ku ji bo vê yekê tê dayîn ne ya avakirina wê ye, lê ya mûçedana wan kesan e ku li ser guhertina navan dixebitin.³² Herwiha li gorî Bayer (2013: 107) ev lijne di sala 1952an de ji aliyê Wezareta Karûbarên Navxweyî ve ji bo standartkirina navê deveran hatiye avakirin. Xêncî navê rê, kolan, parkan ku guhertina wan di bin hikmê şaredariyan de ne, lijneya navbirî bibû xwediyê wê selahiyetê ku hemû navên cografîk ên din biguherîne. Ev lijne ji pisporên sazî, zanîngeh û wezaretan pêk dihatin û derveyî saetên mesaiyê dihatin wezîfedarkirin li ser guherandina navên biyanî. Saziyên ku di lijneyê de dihatin nimandin ev bûn: Saziya Zimanê Tirkî, Fakulteya Ziman û Dîrok-Cografyayê ya Zanîngeha Ankarayê, Wezareta Karûbarên Navxweyî,

³² Field (2013: 76-82) bi dirêjî behsê tîne li ser dîroka vê lijneyê û dîrokan bi berawirdî li gel belgeyên fermî yên wekî *Köylerimiz* (1968) û *Yeni Tabii Yer Adları* (1977) dinirxîne.

Wezareta Perwerdehiyê, *Genelkurmay Başkanlığı* (Serekatiya Giştî ya Erkanê Leşkerî), Wezareta Parastina Neteweyî (Bayer, 2013: 107).

Berê beringa lijne heftê du roj, wextek paştir li gor ihtiyaca heyî heftê sê roj li derveyî saetên mesaiyê li Wezareta Karûbarên Navxweyî, Gerînendetiya Giştî ya Îdareya Parêzgehan dicive, ewil li ser navê deverên meskûn ên ne bi tirkî hûr dibin. Navê gundan û mezrayên wan, navê stasyonan (îstgeh), navê qereqolan, fanosa deryayê, kevî, kendav, kendavik, li ser nexşeyên cihêreng hatine kontrolkirin û navê deverên siruştî hatine nirxandin. Ji wan navan ên ku ne bi tirkî ne, biryara li ser wan ji lijneya berpirsiyar ya parêzgehan tê wergirtin, li gor qanûna hejmar 5442 ya Kanûna Îdareya Parêzgehê pesendkirin û qerarnameyên wan tên derxistin û ew nav tên tirkîkirin (İçişleri Bakanlığı, 1977: 3).

Carcar navber ketibe nav jî bi giştî xebatên vê lijneya navbirî heta sala 1978an berdewam kiriye. Di sala 1978an de ji ber ku “navên xwediyê nirxên dîrokî jî” hatine guhertin, dawî li xebatên vê lijneyê tê. Di maweya 1956/7 û 1978an de navê 75 hezar deverên meskûn hatine nirxandin û ji nav wan qedera 28 hezar nav hatine guhertin (Tunçel, 2000: 27). Tunçel navê 12211 gundî dide ku hatine guhertin ku qedera 35 jî sedî ya hemû gundên li Tirkîyeyê pêk tînin. Guhertina navan para pirtir li herêmên Anadolîya Başûr-Rojhilat û Anadolîya Rojhilat û Herêma Behra Reş hatiye sepandin ku navên li van herêman zêdetir bi zimanên lazî, kurdî, erebî, ermenî û rûmî ne. Jixwe di tabloya li xwarê de ku serê her bajarî hejmara navguhertinan pêşkêş dike, bi rihetî tê dîtin ku guhertina navan zêdetir li her sê herêmên navbirî pêk hatine. (Bin.

Tablo 3)

Navê Parêzgehê	Hejmara Gundan	Navê Parêzgehê	Hejmara Gundan	Navê Parêzgehê	Hejmara Gundan
Adana	169	Erzincan	366	Mardin	647
Adıyaman	224	Erzurum	653	Muğla	70
Afyon	88	Eskişehir	70	Muş	297
Ağrı	374	Gaziantep	279	Nevşehir	24

Amasya	99	Giresun	167	Niğde	48
Ankara	193	Gümüşhane	343	Ordu	134
Antalya	168	Hakkâri	128	Rize	105
Artvin	101	Hatay	117	Sakarya	117
Aydın	69	Isparta	46	Samsun	185
Balıkesir	110	İçel	112	Siirt	392
Bilecik	32	İstanbul	21	Sinop	59
Bingöl	247	İzmir	68	Sivas	406
Bitlis	236	Kars	398	Tekirdağ	19
Bolu	182	Kastamonu	295	Tokat	245
Burdur	49	Kayseri	86	Trabzon	390
Bursa	136	Kırklareli	35	Tunceli	273
Çanakkale	53	Kırşehir	39	Ş. Urfa	389
Çankırı	76	Kocaeli	26	Uşak	47
Çorum	103	Konya	236	Van	415
Denizli	53	Kütahya	93	Yozgat	90
Diyarbakır	555	Malatya	217	Zonguldak	156
Edirne	20	Manisa	83		
Elazığ	383	K. Maraş	105	Sercem	12211

Tablo 3. Li gorî parêzgehan hejmarê gundên ku navên wan hatine guhertin³³

Rast e ku di dewra Partiya Demokrat (*Demokrat Parti*) de cext li ser wê yekê ye ku bi lijneya navhatî ve dezgehîkirina navguhertinê teşe girt û guhertin li ser rê û rêkareke sistematîk bi rê ve çû. Lêbelê li gorî Öktem ji ber ku hikûmet piştgiriyeke zêde nade stratejiya guhertina navan, prosesa navguhertinê wî çaxî hêdî dewam dike. Herçiqas Demokrat Partiyê (DP) bi awayekî eşkere nerazibûna xwe li hember guhertina navan a lijneyê nedabe jî, tê pêşbînîkirin ku elîtên wê yên mihefezekar ku bi dijayetîya xwe ya li hember çaksaziya zimanê tirkî ve dihatin nasîn, bi rengekî

³³ Tunçel (2000).

heweskar pabendî tirkîkirina toponîman nebûn û ji meylên sekuler dûr bûn (Öktem, 2008: 38).

Lêbelê zêde nekişand bi derbeya leşkerî ya 27ê Gulana 1960an polîtîkayên tund dîsa li ser gelek rehendên civatî zal dibin û pê re jî di hikûmeta bin siwanê hêza leşkerî de prensîbên çaksaziya zimên û polîtîkayên navguhertinê bîn xurtkirin (Öktem, 2008: 38). Dîsa di heman salê de, peyvên biyanî tîn qedexekirin ên ku bergindê wan ê tirkî berdest e (Lewis, 1999: 157). Bi hewldanên desthilata leşkerî tê pêşbînîkirin ku neteweperestî di wê dewrê de dîsa xurt û geş bûye. Bi qewlê Çoşkun û yd., piştî derbeya 1960an, Saziya Zimanê Tirkî, hinek temîm belav kirin ji bo handana bikaranîna tirkîyeke resen, lêbelê ev dewr ji dewra avabûna Komarê cuda bû ji ber ku di vê dewrê de rewşa pir-partîbûnê hebû û vê yekê sîrayetî polîtîkayên zimanî jî dikir. Êdî beramber alîgirên eniya tirkîya resen, birreke muxalifan hebû ku, bi îdiaya ku têkghiştin û danûstandina navbera neslan qut kiriye, rexne li çaksaziya zimanî digirtin (2010: 35). Çaksaziya zimanî û tirkîkirina navan jî bi awayekî yekser tesîra xwe hebûn li ser hevdu.

Di salên piştî derbeya leşkerî ya 1960î de, prosesa navguhertinê ber û bala xwe dide navguhertinên deverên ne meskûn û vê carê li sertaserê Tirkîyeyê gelek nav tîn guhertin. Îcar vê dorê, tenê navê deverên meskûn (avadan) lê herwiha navê cihên tebiî jî tê guhertin. Bi taybetî, navên çem, robar, gir, zozan û çiyayan tîn guhertin û ji bo her yek jî wan lijne navekî nû yê tirkî peyda dike. Prosesa tirkîkirinê ya bi berdewamî êdî ne tenê deverên meskûn ji xwe re dike armanc, ew di heman demê de heta dereceya mîkrotoponîman dadikeve. Di navbera salên 1965-1970, 1975-1976an de bi destê Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê 1819 navê deverên tebiî/siruştî hatine guhertin û ev nav di kitaba bi navê *Yeni Tebiî Yer Adları* (1977) de tîn weşandin.

Piştî çend salên navberê, di sala 1983an de lijne dîsa karê xwe dewam dike li ser esasê rêzîknameyekê ya bi navê *Ad Değiştirme Uzmanlar Kurulu Kuruluş ve Çalışma İlke ve Usulleri Hakkında Yönetmelik* (Rêzîknameya Derheq Avabûn, Prensîb û Isûlên Xebatên Lijneya Pisporan ji bo Navguhertinê) navê 280 gundî

diguherîne. Rêzickname di sala 1985an de tê hilweşandin bi hinceta ku berhemdariya hêvîkirî bi dest ve neaniye (Bayer, 2013: 107).


Gelek zehmet e ku meriv listeyeke kamil a hemû navguhertinan bi dest bixe ji ber ku di dewrên cuda de ev guhertin pêk hatine û hin ji wan piştî wextan cardin li xwediyê xwe vegeriyane. Ji ber vê hindê, hejmarên ku vekolerên qadê didin carcar hinekî ji hevdu cuda dibin. Li gorî Tunçel (2000) sercem gundên ku navê wan hatine guhertin digihîje 12,211. Lê Tunçel vê hejmarê tenê ji bo gundan dide, navên deverên meskûn ên din tev li vê hejmarê nake. Herwiha ew dibêje qedera 28 hezar navê deverên meskûn hatine guhertin (Tunçel, 2000: 28). Li gorî Jongerden (2009: 38) bi giştî ji 85,000 navên deverên meskûn ên li gundewar (45,000 gund + 40,000 mezra) hatine nirxandin di heyama 1957-1978an de û ji wan serhev 25,000î zêdetir nav (12,884 mezra + 12,211 gund) hatine guhertin. Li gorî weşana bi navê *Köylerimiz* a ku di sala 1968an de hatiye weşandin, di bin serpereştiya “Lijneya Guhertina Navên Biyanî” de, li ser kanûna hejmar 7267 navê 12,000 gundî hatine guhertin. Herwiha di xebardana xwe ya destpêka Sempozyûma Cihênawên Tirkî (*Türk Yer Adları Sempozyumu*) de Gökçeer (1984) teqezîyê bi wê yekê dike ku ji nav 75,000 navên nirxandî de 27,889 nav hatine guhertin. Li gorî agahiyên ku Emiroğlu ji katalogên Wezareta Karûbarên Navxweyî ya 1977an bi dest dixê; lijneyê sercem ji 35,917 gundan 12,750 nav ji nû ve bi nav kiriye (Emiroğlu, 1984: 181-200). Li gorî Nişanyan (2011: 13) heta sala 1965an nêzîkî parek ji sê paran, hemû navên deverên meskûn hatine guhertin.

	Hemû cihênawên ku hatine nirxandin	Sercem hejmara navê guherandî	Sercem hejmara gundên ve-navandî
Gökçeer	74000	27887	14817
Tunçel	75000	28000	12211
Jongerden	85000	25000	12211

Tablo 4. Texmînên li ser deverên navguhertî (1957 – 1978)³⁴

³⁴ Kuran (2010: 52).

Bi giştî hejmarên navguhertinan nêzîkî hevdu bin jî hîn jî hejmareke teqez ne berdest e ku hemû guhertinan bi miqayeseyî destnîşan kiribe û navên deverên meskûn û tebiî bi zelalî derxistibe holê. Di tevliheviya hejmarên dayî yên vekolerên cuda de gelek hokar hene ku yek ji wan guherîna statuya deverên meskûn e. Bi hezaran deverên meskûn ku berê wekî gund hatibûn tomarkirin, piştî wextan ji ber kêmbûna xwecihên xwe ji wê statuyê tîn derxistin. Herwiha, bi pêşketin û berfirehbûna bajaran re gelek gundên li dorhêla bajar û navçeyan tev li bajaran dibin û statuyên taxan hildigirin û navên wan jî bi gelemperî ji aliyê şaredariyan ve tîn destnîşankirin. Lewra hin ji wan nikarin navên xwe yên kevn mihefeze bikin. Bêyî ku li ser etîmolojiya navê gundan bê rawestan, navên deverên kurdnişîn ên ku hatine guhertin bi başî nehatine tesbîtkirin û xebat li ser çawaniya guhertin û tirkîkirina wan tune ye.




Şikil 1. Rêjeya navên guherandî li Komara Tirkîyeyê³⁵

Heta sala 1968an nêzîkî 30 ji sedî navên gundan gatine guhertin di demekê de ku hejmara gundan wekî 45,000 hatine destnîşankirin. Di sala 1973an de lijne biryarê dide ku li ser nexşeyên mezintir kar bike û navê 2,000 gundî û 13,000 mezrayî ku biritî bû 30 ji sedî di nav 40,000 mezrayî de (Jongerden, 2009: 37). Dema ku serê her navê gundekî niqteyek tê danîn, tê dîtin ku li sertaserê Tirkîyeyê navguhertin pêk

³⁵ Nişanyan (2011).

hatiye, lê reşahî li ser navên kurdî, ermenî û rûmî zêdetir e. Navê mezrayan ku nêzikî nîvî hemû navguherinan pêk tînin di nexşeyan de bi gelemperî nehatine nîşandan. Tunçel (2000) di xebata xwe de ku li ser babeta navguhertinê pêşeng e, nexşeyeke bi vî rengî amade dike:



Şikil 2. Belavbûna gundên navguhertî. Nîqteyek pênc gund e.³⁶

Pêla navguhertinê ya çarem di demekê de pêk tê ku bi sedan gund tînin valakirin û gelek bajarên kurd li rastî koçberiya bi darê zorê tînin. Di encamê de sed hezaran kurd bi mecbûrî ji gund û warên xwe li paş xwe dihêlin û li bajarên mezin bi cih dibin. Di vî dewrê de pêla navguhertinê herî zêde tesîra xwe li ser kurdan heye. Lewra para pirtir nav li herêmên Anadolîya Başûr-Rojhilat û Anadolîya Rojhilat tînin guhertin ango zêdetir navên kurmançî û zazakî dibin armanca pêla dawî. Ji ber ku ev pêla çarem a dawî ya tirkîkirina nava bi valakirina gundan, guherandinên demografîk re hemaheng pêk tê. Öktem (2008) vî pêlê jî wekî pêla ewil a dewra damezrandina Komara Tirkiyeyê di çarçoveya “mihendisiya demografîk” de dinirxîne.

Li ser esas û rêzikên navguhertinê, di dewrên cuda de hin agahî hatibin dayîn jî bi giştî meriv dikare bibêje ku lihevkarîneke rêkûpêk di nav endam û nûnerên lijnaya navguhertinê de çênebûye. Dîsa jî navguhertinê de hin pîvanên serekî bi giştî hatine sepandin. Bi taybetî peyvên ku mensubiyeta qewmî nîşan didin û yê ku baweriya xirîstîyan bi bîr dixin an jî yê bi rengekî wate û îmajê “ne baş” didin gund bi tirkî bin jî dikevin ber pêlên guhertinan:

³⁶ Tunçel (2000: 30).

“Guhertinên hin navan tenê ji du-sê herfan pêk dihat ji ber ku bi vî rengî ew nav diket şiklê zimanê nivîskî. Şih wekî *şeyh* [şêx], viranlar wekî *örenler* [xirabe], ağılar wekî *ak* [spî], yörükler wekî *yürük* [koçer] hatine guhertin, van guhertinan wateya heyî winda nedikir an jî nediguherand. Herwiha navê wan gundan jî hatine guhertin ên ku tê de peyvên wekî *kızıl* [sor], *çan* [zengil], *kilise* [dêr] hebûn. Xêncî van, navê wan gundê ku tê de peyvên kurd, gurmî, teter, çerkez, laz, ereb û mihacir hebûn bi armanca ku li dorhêla xwe rê nedin cudaxwaziyê hatine guhertin” (Tunçel, 2000: 28).

Peyvên ku mensubiyete qewmî nîşan didin ên li jorê hatine destnîşankirin diyar e ku bi hokarên neteweperestiyê ve hatine guhertin. Lê diyar e ku ne tenê neteweperestî lê hesasiyeteke dînî jî serdest e, ji ber ku hemû deverên ku navê wan de sembol û îşaretên dînî heye rastî guhertinê hatine. Navên ku peyvên wekî “xaç”, “keşîş”, “qizil”, “dêr”, “manastir” di vê çarçoveyê de hatine guhertin. Bo nimûne gundên Elaşgirê Xaçîl wekî *Goncalı*, gundê Agiriyê (Qerekilîs) Keşîş wekî *Baloluk*, dîsa gundê bi navê Keşîşê Elîbegê wekî *Akbulgur* hatiye guhertin û mînakên bi vî rengî ne kêmtir in. Xêncî van gelek navên ku peyvên wekî *ağıl* (axil), *oba* (war, warkoz), *kom* (gom), *mezra* (gundik), *çiftlik* (çewlik) di hewînîna bi tirkî bin jî pêrgî guhertinan hatine. Hinek gundên ku navên wan bi tirkî ne lê wateyê wan xweş nînin an jî tiştine xerab tînin bîra meriv hatine guhertin.

Lijneya ku navan diguherîne, çawa li jorê jî amaje pê hatibû kirin, bi maweyeke dirêj karê xwe dimeşîne û gelek caran ji ber hin sedeman qutbûn û navber dikeve nav xebatên wan. Endam û hejmara nûneran, saziyên cuda yên ku endam jê tên hilbijartin jî guherbar in lêbelê bi giştî sebebên esasî yên navguhertinê bi zelalî nayê eşkerekirin (Kuran, 2010: 72) û tenê çend risteyên qerarnameyê di gelek weşanan de tên dubarekirin. Ji ber ku di hin pratîkên navguhertinê yên li dinyayê de gelek bi dirêjî behs tê ser sebebên guhertina navan û carcar yeko yeko navên guhertî ji aliyê etîmolojî, ziman û çandî ve tên nirxandin, prosesa navandinê tên ravekirin û ew wekî belge û kitêbok tên weşandin.³⁷

³⁷ Pipitone (2019) destnîşan dike ku gelek nîqaş li ser prosesa (ve)navandina cihên navên li Parka Neteweyî ya Gracîerê çêbûne ku di nav weşanên cihêreng ên salên cuda de weşiyane.

Li Tirkiyeyê ev proses wisa diyar e ku bi rengekî cuda bi rê ve çûye, ji ber hindê jî em kêr tiştan dizanin derheq serhatî û prensîbên ku endamên lijneyê pê kar dikirin. Endamên lijneyê yên ku bi salan navê cihan guhertine an jî bi rengekî çalak beşdarî li vê vî prosesê demdirêj a giring kirine, li pey xwe an zêde serhatî û belge nehiştine.³⁸ Heta nayê zanîn ka çend endaman di lijneyê de kar dikir, çiqas jî wan di lijneyên nû de cih digirtin, navên nû ji kîjan çavkaniyan dihatin bi destxistin an jî li ser esasê peyvsaziyeke çawa hatibûn avakirin.

1.4. Ji zozanan heta aranan: guhertina cihên navên siruştî

Xebatên ku heta niha li ser guhertina navan hatine kirin, zêdetir bala xwe dane guhertinên ku li ser deverên meskûn pêk hatine (bin. Öktem, 2008, 2004; Tunçel, 2010; Nişanyan, 2011). Xebateke kamil a statîstîkî ku sercem navên guhertî yên siruştî destnîşan bike û rêjeya wan diyar bike di nav hemû navguherinan de nîne. Destnîşankirina hejmarê navên tebiî nisbet navên gund û mezrayan zehmettir e ji ber ku navê deverên tebiî û yên mîkrotoponîmîk gelek in û nexşeyên gelek mezin de encax tên dîtin. Dîsa jî meriv dikare bibêje ku qasî ku destkarî li ser navê deverên meskûn û mezin çêbûye, li ser navên mîkrotoponîmîk çênebûne, ji ber hindê ew zêdetir taybetmendiyên çand û zimanê lokal diparêzin.

Navê deverên tebiî/siruştî jî helbet hatine guhertin. Gelek belgeyên li ser guhertina navên deverên tebiî di arşîva dewletê de xuya dibin. Ev belge zêdetir derheqê navên deverên siruştî yên mihim in ango navê gir, çiya, robar, zozan û hwd. de ne ku heta demeke dereng nehatine guhertin. Kuran amaje bi wê yekê dike ku

³⁸ Gelek kêr bin jî hin istisnayên vî rewşê hene. Bo nimûne, di serdema dawî ya Dewleta Osmanî de û di salên ewil yê Komara Tirkiyeyê de, pêdiviya durustkirina tabelayên kuçeyan û nexşekirina Stenbolê, nîmarekirina xaniyan û pê re jî venavandin an jî navlêkirina kuçeyan dertê holê. Li ser vî yekê, 10ê Nîsana 1927an de qanûna hejmar 1003 a bi navê Nimrekirina Avahiyan û Navlêkirina Kuçeyan dertê (Ölçer, 2014: 24). Di çarçoveya vî prosesê de, Osman Nuri Ergin ê ku wekî midûrê numerotajê tê wezîfedarkirin, tena serê xwe nêzîkî 6.200 kuçeyî bi bi nav dike û derheq vî prosesê da li pey xwe hin rapor û bîranînan dihele (Ölçer, 2014: 94). Osman Nuri Ergin destnîşan dike ku prosesê venavandinê navê wan kuçe û kolan hildigire nav xwe ku “dubare, ne neteweyî û komîk” (*mükerrer, gayr-ı milli ve gülünç*) in. (Ölçer, 2014: 40).

polîtîkayên guhertina navên deverên tebiî cara ewil li herêmen devê behrê hatiye sepandin û van polîtîkayan armanca wê yekê kirine ku şûn û şopa raboriya grekî (rûm) ji ser xakê bê paqijkirin (bin. Kuran, 2010: 64). Di sala 1962an de navê 29 tengav, kepî, giravên li kendava Edremitê tên guhertin, di sala 1965an de 363 cihênavên tebiî –pirranî tengav û kepî– tên guhertin li Giravên Bozcaada û Îmrozê û di sala 1966an de proses sist dibe û tenê 11 cihênavên tebiî li Balıkesir, Bursa û Kırklareliyê tên guhertin (Kuran, 2010: 64).³⁹

Herwiha di sala 1969an de gelek guherînên din jî li Anadolîya Başûr-Rojhilat pêk tên bi taybetî bajarên wekî Wan (89), Hekarî (83), Bitlîs (43). Dîsa di sala 1971an de, di belgeyeke li ser navên tebiî de tê dîtin ku Çewlîgê (45) Erzirom (165) jî di nav de li deh bajaran cihênavên tebiî tên guhertin. Di vê belgeyê de tê gotin ku Gerîndetîya Giştî ya Nexşeyê bi standartên NATOyê nexşeyeke nû amade dike ku wê li dinyayê bê belavkirin. Lijneyê navên li ser nexşeyê nirxandine; guncan dîtine ku ji wan ên ku ne bi tirkî ne û ji kokên biyanî ne bîr guhertin.⁴⁰ Bi giştî ev cihênavên lokal ên siruştî jî bûne armanca polîtîkayên tirkîkirinê ku îşaretê bi şûn û şopa zimanê xwecihê devera xwe dikin. Bi paqijkirina wan ji ser rûberê erdê, zimanên wekî kurmancî, zazakî, ermenî û rûmî jî hatine nedîtbarkirin û xuyabûna wan a di nav nexşeyên mezin de jî bûye cihê aciziyê.

Li ser cihênavên kurdî yên tebiî (gir, çiya, zozan, robar û hwd) ku ji bo bîra gel bi maneyan barkirî ne, texrîbateke du-rehendî pêk hatiye; yekem, guhertinên yekser ên bi destê lijneyê ve pêk hatine û duyem, bi rêya koçberiyê nav winda bûne û ji bîr bûne. Rehendê ewil, bi rêya qerarnameyên navguhertinê, bi awayekî yekser li ser

³⁹ Bo listeya navên tabîî yên ku li bajarên navbirî hatiye guhertin û nirxandineke li ser wan bin. Çelik (2018, rr. 445-228).

⁴⁰ BCA, 30.11.1.0/369.45.15 (08.09.1971) Di vê belgeyê de li gelek bajaran listeya navên mewkî û niqteyên mihim ên wekî gir, çem, robar û hwd bi tevî navê kevn û yên nû tên rêzkirin. Li gorî vê belgeyê li Uşakê *Kürt Dere* (Çemê Kurd) wekî Başkaya Deresi hatiye guhertin. Herwiha dîsa li bajarê Erziromê gelek nav hatine guhertin. Ji wan nava hin bi vî rengî ne: *Delav Dere* (Çemê Delavê) wekî Arpa Dere, *Hişîşîk Dere* (Çemê Xişîşîkê) wekî Sesli Dere, *Darabi Dere* (Çemê Darabiyê) wekî Degirmenli Dere, *Zivik Tepe* (Girê Zivikê) wekî Akkuş Tepe, *Kureş Tepe* (Girê Kureşê) wekî İnci Tepe, *Kotegevreban Dere* (Çemê Kortê Gewrebanê) wekî Çatalucu Dere hatine guhertin.

kodên pir-rengiya çandî texrîbateke armanckirî encam daye. Vê encamdanê, bermayiyên çand û zimanên cuda bi neyînî destnîşan kiriye, lewra ew “biyanî” bûn û ji maqûlbûna daxwazkirî (ya qanûnî) dûr bûn da ku li ser nexşeyan cih bigirin. Li ser erdê û di bîra gel de, hebûna wan bi carekî de jê neçûbe jî hukm û fikra nediyariyê –divê xuya nekin- li ser wan navan hate sepandin. Ev cihenavên tebiî yên ku hatine guhertin di navbera salên 1965-1976an de bi destê Lijneya Pîsporan ji bo Navguhertinê pêk hatine. Di navbera wan salan de sercem 1819 navên deverên tebiî/siruştî tî guhertin ku pareke wan a mezin jî bi kurdî bû. Ev navên guhertî wekî liste di kitaba bi navê *Yeni Tabîî Yer Adları* (1977) de tî weşandin. Navên ku di vê kitabê de tî weşandin bi gelemperî ew navê cihên tebiî ne ku herçiqas herêma bin jî di nav gel de qîsman tî zanîn. Bi taybetî navên çiya, çem û zozanan ku li dorhêleke berfireh tî zanîn ango hin jî wan bi temamî nakevin kategoriya mîkrotoponîman (*microtoponym/silikyeradi*). Mîkrotoponîm ew nav in ku tenê ji aliyê xwecihên herêmekî an jî meskûnekê ve tî zanîn; lêbelê ji aliyê xwecihên meskûnên din ve nayên zanîn û ji ber vê yekê jî li ser nexşeyan cih nagirin, ji kesekî bo kesekî din tî neqilîkin. Navên çiya, gir, mera, zevî, mewkî, şeklên tebiî yên balkêş, qelşên lehiyê, girik, bîr, çivanekên çem, germiyan, kanî, holikên li nav baxçeyan, ji navên mîkrotoponîmîk re nimûne ne (Şahin 2013: 49).

Krîtera mîkrotoponîmbûnê ne li ser cureyê navan e lê li ser berfirehiya zanîn û nasîna wan di nav gel de ye. Di kitaba fermî ya bi navê *Yeni Tabîî Yer Adları* de çiyayên ku navên wan ê berê û yê nû (tirkî) hatine rêzkirin, çiya an jî girên naskirî ne. Di vê kitabê de seranserê Tirkiyeyê nav hatine guhertin lê hin bajarên navguhertinê zêde bûye bi taybetî bajarên ku li deverên çiyayî ne û sînorên wan berfireh e.

Çawa li jorê jî amaje pê hatibû kirin guherîna li ser cihenavên siruştî hatiye kirin, di çarçoveya biryarnameyên fermî yê dewletê de wekî polîtîkayên ser bernameyên partîyan re pêk hatiye. Lêbelê rehendê duyem ê texrîbata li ser navan bi rêya koçberiya bi destê zorê bi renekî neyekser pêk hatiye û di encamê de bi deh hezaran nav tûjî metirsiya windabûnê bûne. Öktem (2008) ji bo navguhertinê salê piştî 1980yî balê dikişîne li ser “mihendisiya demografîk” ya ku hevdem bûye digel

valakirina gundan û di encamê de koçberiya bi destê zorê ya sed hezaran. Jixwe para pirtir a toponîmên li Anadolîya Başûr-Rojhilat û Anadolîya Rojhilat heta sala 1967an hatibûn guhertin, lêbelê deverê meskûn ên li jêr statuya gundan de neguherandi mabûn yê wekî gundik, zozan, mêrg û cihûwarên ku eşîr lê hêwir datînin. Ev war navendên jiyana kurdên koçber bûn ku di nav herêmên çiyayî yê Kurdistanê de cih digirtin û çavkaniyeke gelek sembolîk bû ji bo politîkayên nasnameyî yê kurdî (Öktem, 2008: 50). Herwiha ev guherîn di demekê de pêk tên ku di encama şer û pevçûnên demdirêj li ser jiyana civatî zext û tadeyeke mezin heye û kurd bajarên mezin ên wekî Stenbol, Mersîn, Îzmîrê xwe re dikin stargeh.

Gotî bê gotin ku heta nika gelek xebat li ser babeta toponîmiyê hatine kirin, lêbelê tu xebateke etnografîk çênebûye li ser wan navên ku di encama valakirina gundan, koça bi darê zorê de hatine jibîrkirin an jî êdî li ber windabûnê ne. Ev diyarde di vekolînan de jî bi gelemperî hatiye piştguhkirin. Navên mîkrotoponîmîk ku li hin gundan xwe digihîne hejmareke gelek bilind, kodên çandî vedihewîne ku tê de çand û zimanê herêmî tê de gelek bi zindî tê temsîlkirin. Ew nav gelek caran li ser qeyd û nivîsan de jî peyda nabin, tenê li ser bîr û zimanê gel hatine neqîşandin. Wekî heyînen ku bîr û hafîzaya toponîmîk ji nîşekî bo nîşekî din tên neqîlkin bi rêya çanda devkî, didin babetên gelek efsaneyan, gelek çîrokan bi xwe ve digire ku îşaretê serhatiyên şexsî û cemawerî dikin. Dema meriv hebûna gelek vegêranên efsaneyî yê li ser şêklên fîzîkî yê balkêş, gol, çiya, newal û kendalan dide ber çavên xwe, wê hindê tê dîtin ku di encama koçberî û bêcihûwarkirinê de çendîn zirar digihe bîra hevpar a ku bi sedan sal e ferhenga xwe ya li ser navan diparêze.

Navên mîkrotoponîmîk eynika çand û zimanê herêmî ne û ji aliyê gel ve başbaş tên zanîn û tên emilandin. Bi taybetî di nav kurmancên li Serhedê de, di nav karên rojane yê wekî giyaçînîn, paletî, pezcêrandin, bêrîvantî, zevîrakirin, genimhêrandin, giyakişandin, avêtin û rakirina zevîyan û qorixkirina erdan derbiharan de navê erdan cihekî gelek giring digire. Bo nimûne, şivan û gavanê biyanî dema ku tê gundekî, berê beringa gotî navê erdê gund hîn bibe û divê bizanibe ka ku der mêrg e, ku der erdê beytûn e û ku der bi çi navî tê zanîn di nav gundiyan de. Ev yek ji bo birêvebirina karên ajalvaniyê mihim e.

Bi awayekî giştî di vê beşê de armanc ew bû ku ji destpêka kiryarên navguhertinê vir de, prosesa berdewam a destwerdana li pergala toponîmiyê bi tevî paşxaneyê wê ya siyasî zelal be. Wisa diyar e ku navguhertin jî di prosesa demdirêj a tirkîkirina gelek cihetên jiyanê de cihekî giring digire û ew bi polîtîkayên demkî yên partiyan re girêdayî nîne. Ji destpêka Komara Tirkîyeyê heta niha kiryarê dewamdar a navguhertinê her bi şêwazên cihê û li mekanên cihê li kar e. Ev yek jî nîşan dide ku lêkirina navê nû li cih û waran ku “di nav cemawere pir-etnîk de neteweperestiya tirkî sembolîze dike” (Üngör, 2016: 400) şêwaz guherandibe jî wekî polîtîkaya dewletê cihekî qayîm girtiye.

1.5. Metodoloji

Di vê xebatê de, sûd ji hin bingeheên metodolojîk hatiye wergirtin. Xebatên ku li ser navan tên kirin, ji ber gelek sedeman xebatên aloz in. Çunku, têkildariya berfireh a navan bi qadên din re û pir-rehendîya wan dihêlin ku xebatên wihareng serî li etnografya, folklor, sosyo-lînguîstîk, toponîmiya rexneyî û hwd. bidin. Ji ber taybetmendiya înterdîsîplînî ya toponîmiyê, di vê xebatê de pêdivî pê hebû ku ev rehendên cuda yên navê cihan bi metodên cuda bîr nîrxandin. Hevaheng digel vê û bi rengekî ji gelek xebatên di qadê de cudatir, di vê xebatê de vekolîneke etnografîk û folklorîk jî tê kirin û di vê çarçoveyê de nîrx û wateyên navan ji bo vegêranên gelêrî yên kurdî, di pêwenda kilamên dengbêjan de tê tehlîlkirin. Jixwe di xebatên toponîmîk de, bi gelemperî metodên tîkel tên teşwîqkirin da ku hin rehendên veşartî yên navê cihan derkevin meydana. Li ser vê yekê, Myers (2009) rêbazên klasîk ên vê qadê kêmbêr dibîne û li gorî wî divê ji gelek kombînasyonên wekî vekolîna arşîvan, çavdêriya beşdar, hevpeyvîn û metodên etnografîk sûd bê wergirtin. Ji bo zelalkirina metodolojiya xebatê, li jêr ew metod û rêbaz tên ravekirin ku di vê xebatê de ji wan hatiye istifadekirin.

Di çarçoveya xebata berdest de, ji ber ku grûpek hatiye hîlbijartin û herêmek ji bo vekolînê hatiye destnîşankirin, bi kurtî be jî rêbaza *xebata rewşê* bê şîrovekirin dê baş be. Xebata rewşê ku bi îngilîzî wekî “*case study*” tê zanîn, yek ji wan rê û rêkaran e ku pê xebata civatî ya zanistî pêk tê û sebarê bi pêdaçûnan wêneyekî giştî derdikeve mexderê li ser rewşa ku dibe çavkaniya vekolînê. Crowe û yd. (2011)

destnîşan dikin ku çend cure rêyên pênasikirina xebata rewşê hene, lêbelê li ser hevberîyek heye ku ew vekolîneke berfireh a diyardeyekê ye di pêwendeke jiyana rastîn (*real life context*) de. Xebata rewşê, boçûneke metodolojîk e ku tê de ji bo fêmkirina xebata sîstemekê komkirina daneyên cihêreng heye (Chmiliar, 2010: 582). Li gorî Hyett û yd. (2014: 2), vekoler xebata rewşê ji bo diyarkirina tiştê hevpar û spesîfîk a derheqê rewşê destnîşankirî de bi kar tînin. Yin eşkere dike ku xebata rewşê dikare alîkariyê bide me, ji bo em rave bikin bê ka çima û çawa tiştêk qewimiye (2014: 16). Yin dema ku behsê tîne li ser wergiriya xebata rewşê, destnîşan dike ku ew ezmûnî (*empirical*) ye ku diyardeyeke hevdem (“rewş”) bi kûrdirêjî û di nav peywenda wê ya jiyana rastîn de lêdikole, bi taybetî jî dema ku sînorên di navbera diyarde û peywendê de bi zelalî berçav nebin” (2014: 16).

Rêbaza xebata rewşê dewsa ku nimûneyên mezin bi kar bîne û guherbarên (*variable/varyabl*) bisînor bişopîne, li ser take-nimûne an jî qewamekê bi kûrdirêjî hûr dibe. Xebata rewşê nêrîneke sîstematîk e li ser tiştê ku diqewime, berhevkariya daneyan, pêdaçûna malûmatan û derpêşkirina encaman. Berhema di encamê de derdikeve bi vebirî fêmkirina van du pirsan e: Çima nimûne wihareng qewimiye û ji bo vekolînên siberojê çi mihim e ku divê meriv li ser hûr be (Davey, 1991: 1). Ev rêbaza vekolînê gelek bikêrhatî ye, wekî ku ji vekoleran re şiyanweriyekî dabîn dike da ku bikaribin ji birrek merivên di rewşekê de bi lez û bi rengekî ekonomîk nimûneyan werbigirin (Chmiliar, 2010: 126).

Ev xebat, di rewşa bajarê Agiriyê de xebateke sehayî ya etnografîk, *xebata rewşê* li ser nimûneya bajarê Agiriyê tetbîq dike û çend rêyên serekî yên vê rêbazê ji bo bidestxistina armanca xebatê bi kar tîne. Îcar, ji bo tetbîqkirina çend rêyên serekî yên vê rêbazê xebata sehayî ya etnografîk jî bi xwe tê kirin. Myers balê dikêşe li ser wê yekê ku xebata sehayî (*fieldwork*) ji bo hêlên performansê yên navan xwediyê roleke serekî ye (2009: 86). Herwiha, di vekolînên derheq toponîmiyê de Kearns (2005) destnîşan dike ku çavdêrî dikare nirxekî bide şirovekirina serpêhatiya cihekî.

Ji bilî van, hin xebat û tezên ku bi rengekî rexneyî toponîmiyê vedikolin û di qadê de jî pêşeng in, wekî xebata rewşê cihek an jî pratîkek/qewamek hilbijartine. Herman (2009) toponîmiya federedewleta Amerîkayê Hawai dixebite û pêşniyaza

navguhertina kolaneke bajarê payîtext Honoluluyê wekî xebata rewşê dinirxîne. Yeoh (2009) helwesta Hikûmeta Singapûrê dinirxîne ku dixwaze bi rêya pratîkên binavkirina cihan fikra neteweya Singapûrî damezirîne. Hiltermann û Koopman (2003) prosesa venavandina kolanên li Pietermaritzburg, Afrîkaya Başûr dinirxînin. Konstanski (2009) di teza xwe ya doktorayê de restorasyona navên xwecih (*indigenous names*) ên li Parka Neteweyî ya Grampians ya li Awistiralyayê hîlbijartiyê û wekî xebata rewşê li ser bernameya restorasyonê ya 1989/1990an dixebite ku tê de navên gelên xwecih ên li herêmê ji ber hincetên ku gelekî “dirêj” in an jî “nayên telafûzkirin” ji ser rûyê erdê hatine paqijkirin.

Herwiha vê axiriyê Jenjekwa (2018) di çarçoveya teoriya postkolonyal de Reforma Erdê ya Piştî 2000î ya Zîmbabweyê bi nêrîneke toponîmîk dinirxîne. Pipitone (2019) guherîn an jî danîna cihên navên li Parka Neteweyî ya Graciere ya li Amerîkayê di çarçoveya îdeolojiya ziman (*language ideologies*) de xebitiye. Wê, ev xebata xwe li ser derbirîn û nîqaşên li ser cihên navên xwecih ên eşîrên li parkê di çarçoveya şeş çavkaniyên nivîskî de nirxandiye û îdeolojiyên ziman ku ji aliyê Irvine û Gal (2000) hatine pêşxistin, wekî bingeha teza xwe daniye.

Di vê xebatê de bi giştî vekolîna çawayî hate emilandin ji ber ku di vê xebatê de pirsname (*questionnaires*) nehatin bikaranîn. Sê rê û rêbazên serekî yên vekolînê hene ku meriv dikare wekî çawanî (*qualitative*), çendanî (*quantitative*) û metodên tîkel rêz bike (Yin, 2014; Creswell, 2007). Bi raya Denzin û Lincoln, wekî boçûneke (*approach*) ravekar û siruştî vekolîna çawaniyê ji çend qorên pratîk ên şirovekar û materyal pêk tê ku dinyayê dîtbar dikin û bi guherîna ra wê dixin nav çend temsîlên wekî nîşeyên qadê; hevpeyvîn, sohbet, fotograf, qeyd û kurte-nîşeyan. Li gorî wan, bi vî karî, vekolerên çawaniyê tiştan di nav pêwenda wan a tebiî de dixebitin û di wê hewlê de ne ku ji diyardeyekê wateyê darijînin an jî şirove dikin li gorî/têkildarî wateya ku merivan li ser wan bar kiriye (2011: 3).

Li gorî Creswell em vekolîna çawaniyê bi kar tînin ji ber ku di xebatekê de, em dixwazin derfetê bidin takekesan ku çîrokên xwe parve bikin, dengên xwe bidin bihîstin û tîkiliya hêzê kêmtir bikin ku di navbera vekoler û beşdaran de heye (2007: 40). Vekolîna çawaniyê ku ji bo destnîşankirin û keşîfkirina mijarekê tê xebitîn, ji

ihtiyacekê hasil dibe ku tê de xebata li ser grûpekê tê kirin da ku di nav vê grûpê de guherbar (varyabl) bên diyarkirin û pîvandin an jî dengê wan kesan bên bihîstin ku hatine bîdengkirin (Creswell, 2007: 39-40). Rêbaza çawaniyê ji berahiyê zêdetir bi kûrahiyê re mijûl e, ew di dewsa ku li ser nimûneyên ji aliyê temsiliyetê va berfireh raweste, lê dixebite ku di derheqê komeke piçûktir a merivan de agahiyên kûrdirêj bi dest ve bîne. Vekolîna çawaniyê bi keşîfkirinê re mijûl dibe (Ambert, Adler & Detzner, 1995: 880-881).

Di çarçoveya van gotinan de meriv dikare bibêje ku vekolîna çawaniyê⁴¹ bingeha xwe ji analîza van jêrxalan digire:

- a) Peyvên devkî çî di sohbet, hevok an jî monologan de;
- b) Peyvên nivîskî yên ku di rojname, name, otobiyografi, destnivîs, deq, kitab, raporên fermî, çavkaniyên dîrokî de;
- c) Nîşeyên qadê yên kesê çavdêr an jî beşdarê civîn, merasim, rîtuêl û jiyana malbatî;
- d) Bi şêweyê devkî an jî nivîskî, dîroka jiyana an jî vegêranên çîrokî;
- e) Çavdêrî, fotograf û video û daneyên din ên ku bi rêya çavdêriyên dîtbarî bi dest dikevin (Ambert, Adler, & Detzner, 1995: 880).

Rê û rêbazên kêrhatî ku bi gelemperî di çarçoveya nîrxandina navan de hatine pêşxistin, di vê xebatê de tên emilandin. Bi gelek beşdaran re hevpeyvîn hatin kirin. Di van hevpeyvînan de pirsên bervekirî (*open-ended questions*) hatin bikaranîn, bi vî rengî, vegêranên etnografîk bi dest ketin ku derfetê didin ku meriv naveroka bersivan û meylên serekî yên bersivan analîz bike. Pirsên ku di pirsname û hevpeyvînan de tên pirsîn dikarin bergirtî bin ku tê de tenê bersiva hin pirsan heye, an jî dikare bervekirî be ku beşdar li gorî dilê xwe bersiv didin (Chmiliar, 2010: 126).

⁴¹ Jenjekwa (2018: 91) ku di xebata xwe ya doktorayê de beşeke mezin ji bo metodolojiya xebatên li ser cihnavan terxan dike, amaje bi wê yekê dike ku piraniya xebatên toponîmiyê –ên rexneyî jî tevayî– ku di qadê de pêşeng in ên wekî Azaryahu (1996; 1997; 2011), Rose-Redwood (2011; 2018), Rose-Redwood û yên din (2010; 2011; 2018) û Kadmon (2004) û gelek kesên din rêbaza çawaniyê bi kar tînin di xebatên xwe yên li ser toponîmiyê de.

Di amadekirina hevpeyvînan de, pirsên serekî bi gelemperî hatin pirsîn, lêbelê li gorî xebardana beşdar û babetê carcar pirsên nû yên têkildarî xebardane ji lê hatin zêdekirin. Bi vî rengî, formateke pirsan a nîvsazkirî û bervekirî hate ceribandin ku pê derxistina têgihiştin û helwestên li hember navan a bikarhêneran hate tesbîtkirin. Bi temamî, bi 15 kesan re (4 jin û 11 mêr) bi fikr û helwestên xwe yên li ser navan ve beşdarî li vê xebatê kirin. Piştî hevpeyvînan ji beşdaran hate pirsîn bê ka wekî din kê dikare ji bo vê babetê xeber bide. Bi vî rengî, hejmara beşdarên hevpeyvînan zêde bûn. Lewma, vê xebatê nimûnegirtina bihemdî/biarmanc (*purposive sampling*) hilbijart ku tê de vekoler seba xebata xwe takekesan diyar dike ku bi armanc agahiyan didin derheq diyardeyên serekî yên vekolînê de (Creswell, 2007: 125). Nimûneya biarmanc, ji bo rewşên ku ji hêla agahiyan ve dewlemend in, bi kêr tê (Patton, 2002: 230). Nimûnegirtina biarmanc xwediyê çend bin-beşan e ên wekî nimûnegirtina giloka berfê (*snowball sampling*), nimûnegirtina homojen (*homogeneous sampling*) nimûnegirtina kotayê (*quota sampling*) (Mack û yd. 2005: 5). Di vê rêbaza giloka berfê ya nimûnegirtinê de, derbarê babeta xebatê de agahîderê çavkanî ji vekoler re dibe alîkar da ku kesên din ên têkildar ji peyda bibin (Biernacki & Waldorf, 1981: 152). Rêbaza nimûnegirtinê ya giloka berfê li gorî Mark û y.d “beşdar û agahîderên ku ji berê de bi wan re têkilî hatiye danîn, bi saya serê pêwendiyên xwe yên civatî vekoler bi merivên din re dide nasîn ku di xebatê de tevkarî û beşdariyê dikin (2005: 5-6). Di vê xebatê de ji ev rêbaza metodolojîk hatiye hilbijartin ji ber ku gelek kesên ne têkildarî van qadan an ji pêwendîdar, gelek bi kêr li ser babeta nav û navandinê xeber didan. Ji ber hindê lazim bû ku ev rêkar were hilbijartin.

Bi giştî, ji ber ku babet hinkî taybet bû, herkesî bi dilxwazî nedixwast xeber bide an ji hin kesan gelek pirsên hevpeyvîne bêbersiv dihiştin. Bi vî rengî, gelek xebardane dirêj dihatin kirin ku tenê qismek ji wan têkildarî navan û guherîna wan bû. Piştî ku hevpeyvîn qediyar, ji aliyê medetolojiya nîrxadinê ve hin rêkarên serekî yên vê xebatê ji guherîn. Ev guherîn berî ku xebata sehayî were kirin, nehatibûn pêşbînîkirin. Ev yek aliyekî de baş bû, lewre li gorî materyalan awayê nîrxadinên wan divê bihatana guhertin. Berî her tiştî, di axaftinan de gelek çîrok, serhatî, efsane û meseleyên têkildarî navan û materyalên dîroka devkî derketin meydanê, lewma ji ji

bo nirxandina wan metodolojiyek hate hilibjartin ku pišta xwe dispart etnografiyê. Wate, di pêşketina vê xebatê de li gorî hewcedariyan, ji aliyê metodolojîk ve guherîn pêk hatin.

Ji bo ewlehiya beşdaran, agahiyên derbarê beşdaran de hatin korkirin û veşartin. Ev yek, di prosesa hevpeyvînê de bi beşdaran re hate parvekirin û ew ji bi vê yekê hatin agahdarkirin. Ji bo beşdarên mêr, BM-, ji bo beşdara jin BJ- hate bikaranîn û ji yekê heta 15an hejmar lê hate zêdekirin, wekî BM-1, BM-2, BJ-8, BJ-9 û hwd. Qisevan ji hemû navçeyên li Agiriyê hatin hilibjartin, lê zêdetir beşdar li Agiriyê bûn. Ji ber rewşa awarte ya pandemiyê derfet çênebû ku hemû hevpeyvîn rûbirû bên çêkin. Lewma, piraniya hevpeyvînan rûbirû, hin ji wan bi rêya telefonê, hin jî bi rêya mailê hatin kirin. Di maweya xebata sehayî de, tenê çend qisevanên biemr re hevpeyvîn hate çêkin, qisevanên din temenê wan ji 25an heta 60î diguherî. Nav û paşnavê qisevanan, agahiyên wan ên taybet, di vê xebatê de xuya nakin. Agahiyên ku ji van beşdaran bi rêya hevpeyvînan hatine wergirtin tenê di beşa sêyemîn de hatin bikaranîn û analîzkirin.⁴²

Li ser daneyên ku bi dest dikevin bi rêya pirsên bervekirî, analîza gotarê (*discourse analysis*) cihekî mihim dadigire ku di xebatên toponîmiya rexneyî de, ji bo bidestxistina gotara serdest û dij-gotaran tê bikaranîn. Analîza deqî û gotarî amrazeke jênegar a etnografîk a çawaniyê (*qualitative*) ye. Helwesta reaksiyonel a ku gel di derheqê navên guherandî de dide bo xebata berdest, bi rêya hevpeyvînan berçav dibe. Îcar, ji ber vê yekê ye ku analîza gotarê çalak dibe di prosesa pêderxistina helwesta li hember navan di pêwenda tevgerên civatî û dîroka devkî de.

Analîza gotarê wekî amrazeke metodolojîk di gelek qadan de li rewacê ye, ji edebiyatê heta hiqûqê, psîkolojî, antropolojî, dîrok, zanistên polîtîk ketine wê ferqê ku meriv bi rêya çîrokên ku saz dikin, wateyê didin jiyana xwe (Lakoff, 2001:211). Gotar (*discourse*) di vir de çî nivîskî çî jî bi devkî birîtiye ji her cure tekstan. Analîza

⁴² Hevpeyvînen ji bo beşa sêyem hatine kirin bi gelemperî li ser navan û navguhertinê bû. Xêncî van, sê hevpeyvîn jî ji bo beşa dengbêjiyê hate kirin. Di van hevpeyvînan de navê axêver nehate veşartin, ew bi zelalî hate eşkerekirin.

bi rêya gotarê pêk tê armanc dike “çima”ya metnê derxe holê û paşxane û wateya wê li ser tebeqeyêke fêmbariyê raxe.

“Heft erkên sazker” ên ku ji aliyê Gee ve hatiye danîn (2005:10-13) dikarin rênimahiye bikin ji bo analîza gotarê ku bi kurtî bi vî karî ne:

1. Giringî (*Significance*): awayê ku ziman tê bikaranîn ji bo giringiyê bide hin tiştên diyar an jî wan bêqîmet bike.
2. Çalakî (*Activities*): çalakî an jî çalakîyên ku ziman dixwaze bi pêş bixe.
3. Nasname (*Identities*): çi cure nasname bi rêya bikarhênerê zimên tê ragihandin.
4. Tekilî (*Relationships*): ziman çi cure têkilî an jî têkiliyên diyar di navbera bikarhêner û kes an jî tiştên din saz dike.
5. Polîtîka (*Politics*): ziman çawa nîşan dide di sehên bikarhêner de çi tişt ‘normal’ e û tişt divê çawa li gorî vê yekê bin.
6. Girêdan (*Connections*): analîz dike bê çawa zimanê bikarhêner girêdanan saz dike di navbera tiştan de ku ji aliyê wan ve eleqedar hatine destnîşankirin.
7. Zanîn (*Knowledge*): eşkere dike ku çawa ziman rêyeke cuda ya zanîn û bawerkirinê nîşan dide di derheqê dinyayê de.

Di vê xebatê de, pirsên li jor ji bo analîza gotarê tê xebitandin bi taybetî di beşa sêyem de. Ji ber ku gelê Agiriyê derheqê venavandina erdê xwe de xwediyê bîr û ramanan e, ku dixwaze bi civata mayî re hest û têgihiştina xwe bîne ziman. Lewma ev vegêranên ji nav gel, dibin bingeha analîza gotarê ku tê de têgihiştina gel a li ser xalên wekî cihên nav, navandin û venavandinê de dikeve ber nirxandina gotarî. Analîza gotarê, bere bere ji bo zêdetir xebatan dibe amraza nirxandina seh û têgihiştina (*perception*) gel ên li ser cihên navan ku ev xebat jî yek ji wan e. Li gorî Phillips û Hardy ‘rastiyên civatî bi rêya gotaran tê hilberîn û dibin rastî û hevkarîgeriya civatî bi temamî nikare bê fêmkirin bêyî referansê bide li gotarên ku wateyê dide wan” (2002: 3).

Şayanê qalkirinê ye ku Berg û Kearns jî di nivîsara xwe ya etnografîk a li ser binavkirinê li Zelandaya Nû (*Aotearoa*) de vê metoda analîza gotarê (*discourse*

analysis) bi kar tîne û destnîşan dike ku ji bo bidestxistina fikra hevpar bi rêya diyalogên di nav gel de ên sebareti bi binavkirina cihan, bikaranîna vê metodê bi kêrtê (2009: 22). Herwiha, Laura Kostanski di doktoraya xwe ya bi navê “*‘What’s in a Name?’: Place and Toponymic Attachment, Identity and Dependence*” (‘Çi Hene di Navekî de’: Cih, Girêdana Toponîmîk, Nasname, Girêdan) de vê rêbaza nirxandinê bi kar tîne û li ser restorasyona Navên Parka Neteweyî ya Grampiansê bi hevpeyvînan ve materyalan ji bo analîza gotarê bi dest dixe. Ji bilî van xebatên navbirî gelek vekolînên li ser toponîmiya rexneyî hene ku serî li vê rêbazê didin (Alderman, 2009; Kuran, 2010; Palonen, 2018).

Vegêranên ku bi hevpeyvîn û çavdêriyan bi dest ketine, ji bo helwest, fikr û ramanê civatê nîşan bide, tînin analîzkirin. Analîza gotarê, li ser vegêranên şexsî yê li ser navan nêrîneke navxweyî ya ji nav civatê dabîn dike. Bi vekolîn û xebatên bi hûrbijêr ên li ser vegêranên takekesî û civatî dihêle ku meriv têgihîştîneke kûr a navxweyî bi dest ve bîne li ser rehendê civatî û zimanî yê helwestên gel, bi taybetî di babeta navê cihan û venavandinê de. Bi vî rengî, ji xeberdan û vegotinên takekesî yê jiyana rojane, piştî navguherînan seh û fêma li ser wan, keresteyeke resen bi dest dikevin.

Heta nika bi rêya hevpeyvînan, temsîlên vegêranî yê etnografîk/antropolojîk bi kêmtî be jî li Tirkîyeyê hatiye kirin. Bi taybetî, Kuran (2010) di xebata xwe ya qadê li Batman û Diyarbekirê helwestên xwecihên van bajaran destnîşan dike û guh didêre xwecihên kurd ên li van bajaran. Herwiha, Fields (2013), bi heman rengî li Giresûnê xebata xwe ya qadê meşandiye û xwestiye helwest û nêrîna xwecihên vî bajarî bipêve û xisletên helwestên li vî bajarî derxe mexderê (Bo nirxaneke kurt li ser wan, bin. Beşa Sêyem). Herwisa, xebata Türkoğlu (2018) a li ser Bomontiyê û xebata Erkinay Tamtamiş (2019) a li ser tesnîfa navên li Mêrdînê jî hêjayê qalkirinê ne. Herçiqas, hindek xebatên din bala xwe bidin ser navên berê û navên nû, ji ber nêrînên yek-alî û klasîk ku di wan de cext zêdetir li ser etîmolojî û dêsmana navan e, bi rengekî giştî gelek dînamîkên din ên civatî û çandî yê tesîra guherînê li ser xwecihên bajaran û fêhm û îdeolojiyên zimanî yê ku pê re çêbûne tînin piştguhkirin. Xebatên bi vî rengî, lewma di çarçoveyeke sosyo-lînguîstîkê de li Tirkîyeyê gelek kêmtî in ên ku sosyo-onomastîkê de rehendên civatî û çandî yê navan didin ber xwe.

Li ser awayê nirxandina vegêranên şexsî rê û rêkareke gişgir tune ku li bejn û bala hemû vekolînan bihê û bê bikaranîn. Lewma, divê meriv eşkere bike ku ne take-rêyeke dirust heye ji bo xwendina deqan û ne jî take-rastiyek heye ku bi rêya van nêzîktêdayîn bê keşîfkin, wate, analîza gotarê xwe dispêre şîyanwerî û cîhanbîniya şirovekar (Berg & Kearns, 2009: 22). Di nav xebata xwe de bi taybetî ji bo beşa sêyem me pê metoda analîza gotarê emel kir dema ku deqên hevpeyvînan hatin nirxandin û şirovekin.

BEŞA DUYEM

NAV, HÊZ Û BÎR: ÇARÇOVEYA TEORÎK

Babeta navan ji mêj ve serinc kêşaye ser xwe û hatiye nîqaşkirin ji aliyê gelek zanyarên ji qadên cuda ve. Wekî qadeka zanistê û binbeşeke zimannasiyê, onomastîk (*onomastics*) bi giştî vekolînan li ser hemû cure serenavan dike. Onomastîk an jî bi navê xwe yê kurdî *navnasî* du çekên xwe yê serekî hene ku yek jê toponîmî (*toponymy*) (xebata li ser navên cihan) ya din jî antroponîmî an jî kesnavnasî (*anthroponymy*) (xebata li ser navên merivan) ye (Hough, 2012: 213). Helbet, ev her du beşên serekî yê onomastîkê jî di nav xwe de ji gelek binbeşan pêk tên û her yek ji wan binbeşan, bi pêşketin û geşekirina vê qadê re, bûne xwedî pisporî û berfireh bûne.

Beşa berdest, ji milekî ve dixwaze têgihên serekî yê teorîyê ji hevdu veçirîne û serhatiya toponîmiyê ya guherbar ku nasnameya wê ya îro berdest dike ji layê hokarên serekî ve bide ber pirs û pirsiyaran, ji milekî din ve jî dixwaze wergirî/hewîneriya xwe fireh bigire ji ber ku berî wê di vê babetê de xebat li ser vê mijarê kêr bûn, bi taybetî bi kurdî. Lewra îzahat û pênaseyên lazim li gel toponîmiya rexneyî û têkiliya wê bi gelek hokarên din re tên şirovekirin bêtir ku çemkên wekî binavkirin, “toponîmî”, “onomastîk” jî bihê paşguhkirin ji bo selameta wêneyê giştîgîr ê qada vekolîna berdest. Dîsa ji bo bi hemû rehendên xwe ve navnasî û xebatên li ser navnasiyê di çarçoveya qada onomastîkê diyar bibin, pêşketin, sazî, civat, kovarên neteweyî û navneteweyî yê qada onomastîkê li gel geşedana qadê hatine nirxandin.

2.1. Onomastîk

Navnasî, onomastîk an jî onomatolojî (bi îngilîzî *onomastics*, *onomatology*) beşeke serbixwe ya zimannasiyê ye ku vekolînan li ser hemû cure serenavan ango navên taybet dike. Onomastîk ji berê de wekî qadeke vekolînên zimannasiyê hatiye dîtin lê hîn jî ew bi awayekî qewî bi gelek qadên din re di nav danûstandinê de ye. Digel zimannasan, etnolog, felsefevan, dîroknas, arkeolog, antropologên çandî, vekolerên edebiyatê, civatnas, derûnnas, aborînas, vekolerên bazarkirinê, dadnas û

hwd. ji ber sedemên cihêreng bala xwe didin navan. Onomastîk ji ber taybetmendiyan xwe xwedan rehendê înterdisîplîneriyê ye. Ji ber ku nav parçeyên çandê ne. Nav, her tim bi danûstandinên meriv û di cemawereke zimanî de li dorhêlekê derdikevin meydana (Ainiala û yd., 2016: 17).

Onomastîk hemû cure navan – navên merivan (b.n.; nav, nêvnav, paşnav, bernav), navên cihan (b.n.; welat, herêm, bajar, bajarok, gund), navên rûqalê dinyayê (b.n.; behr, robar, çem, gol, çiya, girik, gelî, daristan, dehl, şewl, avzê), navên avahiyan (b.n.; xanî, dêr, kolan, bar, dibistan, balafirgeh, otel, rawestgehên rêasinan), navên rêyan (b.n.; rê, kolan, şiverê, pîr, bihur, co, rêyên gemiyan), navên ajalan (b.n.; dilberîk, tajî, hespên berebaziya, dewar), navên etnîsîte û komên civatî (b.n.; netewe, eşîr, partiyên siyasî, klûb, klûbên sporê), navên çalakiyan (b.n.; pêşbazî, pêşangeh, misabîq), heyberên astronomîk (b.n.; gerstêrk, stêrk), navên navgînan (b.n.; balafir, lokomotîv, keştî), navên berhemên ticarî (b.n.; çîkolata, sorav, şerab), navên berhemên afirîneriyê (b.n.; kitab, fîlm, lîstîk, helbest), navên aşopî û navên rasteqîn-bi vî karî lîste didome (Hough, <http://onomastics.co.uk/>). Onomastîk navan ji aliyê etîmolojî, kultur, ziman û werera dîrokî ve vedikole û pîr şaxên onomastîkê (*navnasî*) hene ku ji wan çend hebên serekî meriv dikare bi vî karî rêz bike:

- a)** Antroponîmî (*Anthroponymy*): Li ser nav û awayê navlêkirin/navdanîna merivan vekolîne dike.
- b)** Toponîmî (*Toponymy*): Li ser cihnavan (*placenames*) dixebite.
- c)** Oronîmî (*Oronymy*): Li ser navê çiyayan vekolînan dike.
- d)** Hîdronîmî (*Hydronymy*): Li ser navê çem û robaran vekolînan dike. Bo nimûne; Erez, Dicle, Şeryan û hwd.
- e)** Etnonîmî (*Ethnonymy*): Navên nijad, eşîran lê dikole.
- f)** Çoronîmî (*choronymy*): Li ser navên herêmên îdarî an jî cografîk vekolînan dike, b.n. Xerzan, Serhed, Botan, Xoçvan.
- g)** Mîkrotoponîmî (*Microtoponymy*): Li ser navê deverên biçûk vekolînan dike.

Herwiha, antroponîm (*anthroponym*) tê wateya navên kesan; toponîm (*toponym*) navên cih û waran; oronîm (*onym*) navên çiyayan, hîdronîm (*hydronymy*) navên avan (çem, behr, gol), mîkrotoponîm (*microtoponym*) navên deverên biçûk.

Mîkrotoponomî navên cih an jî deverên biçûk lê dikove ku ji aliyê her kesî ve navên wan nayê zanîn an jî li dorhêleke teng de tê zanîn.⁴³

Di çarçoveya antroponîm, toponîm û etnonîmê de bête nihêrîn –bi binbeşên din ra pirs zêdetir dibin- hin pirsên ku onomastîkvan, di vekolînên xwe de li bersiva wan digerin ev in: “Awayê lêkirina navan çi ne, populerbûna navan çiqas e, rêjeya navê mirovan ên guhertî û yên wek hev çiqas in, navekî cinsî çawa dikare bibe navekî taybet, leqeb û nasnavên mirovan çawa çêdibin, koka navan ji hêla etîmolojiyê ve çi ye, wateya navan çi ye, raborî û prosesa lêkirina navan çi ye, navê gund û bajaran çawa li wan hatine kirin, navê qewm, kom û miletan çawa çêbûne, têkiliya navê komên etnîkî û cihan çi ye, têkiliya navdayînê bi çandê re, bi siyasetê re, bi ol û baweriyên re, bi derûniya kesan û civatê re, bi netewayên biyanî re, bi awayê hilberînê aborî re çi ye? û hwd.” (Öçal, 2016: 7-8).

Xebata li ser navan ku wekî “onomastîk” tê zanîn, hem za nisteke kevn e hem jî ciwan e (Hough, 2016: 1). Ev zanista kevn e, ji ber ku gelek ji mêj ve bûye mijara nîqaşan. Hê di serdema Yewnana Kevnare de nav ji bo xebatên li ser zimên di merkezê de dihate hesibandin ku Sokrates, Plato, Aristotle û yên din bi heweskarî bala xwe dabûne têkiliya di navbera nav û ya qestkirî de (*referent*) û ev mijar bi berdewamî bûye babeta serekî ya lêgerînên felsefî û zimannasiyê di dinyaya fikrî ya Rojavayî de (Hough, 2016: 1). Herwiha bi gotina Coates (2006: 7) meriv dikare bibêje ku teoriya nav mihtemelen qedîmtirîn mijar e di hemû zimannasiyê de ji ber ku yekem car ji aliyê Platon ve di *Cratylus* wî de tê nîqaşkirin.

Behsa navan di kitabên pîroz de jî derbas dibe. Mijara binavkirinê di Peymana Kevin (*Old Testament*) de bi vî rengî derbas dibe:

“Û Xwedê ajalên dirinde û hemû çivîkên li ezman ji axê çêkirin, û hemû ji Adem re anîn da ku bibîne ew ê çi navî li wan bike; Adem her çi nav li wan kir êdî ew bû navê wan. (19) Adem nav li hemû ajalên kedî û li çivîkên li ezman û ajalên kovî kir; lêbelê ji bo Adem alîkareke guncan nehate dîtin.”
(Genesis 2: 19-20)


⁴³ Bo zêdetir kategoriyan û cihetên kompleks ên xebata navan, bin. Anderson (2007: 77).

Heman mijar di Qur'ana Pîroz de di sureta Beqereyê de heye ku tê de Xwedê dibêje: (Xwedê) navê hemû tiştan bi Adem da hînkirin". Û paşê ew nîşanî melaîketan da û ji wan re got: "Eger hûn di gotina xwe de rast in, ka navên van ji min re bibêjin?" (31) (Melaîketan) got: (Ya Rebbî) em te ji sifetên kêr tenzîh dikin, zanebûna me tune ji xeynî tiştên ku te bi me daye zanîn. Bêşik yê Elim û Hekîm (Xwedî Hukm û Hikmet) tenê tu yî. (32) (Li ser vê yekê Xwedê ji Adem re) got: "Navê van tiştan ji melaîketan re bibêje" û Adem jî navên wan (tiştan) ji wan re got. (Xwedê ji wan re) got: "Ma min ji we re negotibû; miheqeq bi sirra erd û ezmanan ez dizanim û tiştên hûn li xwe mikur tên û yên we veşartine jî, ez pê dizanim".

Li gor kitabên pîroz piştî şiyana navlêkirinê destkeftinek ji bo merivan peyda dibe. Li gor Qur'anê melek ji bo Adem diçin secdeyê ango serdestiya wî û hêza wî dipejirînin; li gor Tewratê jî Hawa ji bo wî tê afirandin, ji ber ku ew bêyî Hawa kêr e û bi tenê vê kêmasiya xwe, piştî hikimkirinê ango bidestxistina hêza nevlêkirinê dikare temam bike" (Subaşı & Geyik, 2017: 238). Herwiha, Ong (2002: 32-33) destnîşan dike ku nav di çanda devkî de hêzê dide heybera binavkirî û li gorî wî navlêkirina heywanan a Adem tiştêkî giring e û nabe ku meriv pişt guhê xwe re bavêje, ji ber ku bêyî zanîna berfireh a navan meriv nabe xwedî ilmekê û nav li ser tiştê binavkirî hesta xwedîtîyê dide meriv.

Herwiha heman mijara navan di gelek mîtolojiyên kevn de bi rengêkî tê dîtin ku Hajdû di vê biwarê de wiha dibêje: "Di Çar Vedayên Hindî de, di Mahabharata û Ramayana de, herwiha di Avestaya Îranî ya Kevn de û Poetic Edda ya Îzlandiya kevn de, di Kalevalaya Fînî û çend çîrokên mîtî yên qedîm de şirovekirinên li ser navan gelek in" (Hajdû, 2002: 12).

Gelek vekolînên navnasiyê navan li binbeşên cuda parve dikin. Herçiqas li ser kategoriyên cuda dabeş bibin jî, gelek şaxên navan li gorî Anderson (2002) divê bi hev re bên nirxandin. Anderson şemayekê raber dike ku navên kesan di çarçoveya îzafeta navendîbûnê de, bi tevî şaxên din ên navan tê nirxandin. Li gorî şemayê (**Ş.1**) navên deverên meskûn ku li navenda cihên de tê xuyanê bi awayekî serekî bi navên kesan re têkildar dibin û divê bi hev re bên nirxandin.



Şikil 3. Navendîtiya nisbî ya hin cureyên navan⁴⁴

Çawa ji şemayê diyar dibe, kesnav bi rengekî îzafî di navenda şaxên din ên navan de cih digire, bi rengekî kesnav an jî serenav dikarin di dewsa şaxên din ên navan jî bîn bikaranîn. Xetêke teqez ne berdest e ku meriv li ser sinifandina navan dayne û şaxên navan bi temamî ji hev vavêr bike. Lêbelê, li gorî taybetmendiyan cihenavan, avadaniya wan, cureyên wan û hwd bi dehan polîkirin hene ku behsa wan li vir ne hewce ye.

⁴⁴ Anderson (2002).

2.1.1. Toponîm⁴⁵

Nav an jî *isim* ku di şêwezarên kurdî de formên wê yên wekî bi soranî *naw*, bi hewramî û zazakî *name* an jî *nome*, bi lekî *nam* heye xwediyê dîrokeke qedîm e ku xwe heta proto-hindûewropî digihîne. Lewma formên wê yên cuda di zimanên hind-ewropî de bi rihetî tên dîtin; avestayî *naman*, latînî *nomen*, îtalî *nome*, almanî *name*, swedî *namn*, spanî *nombre* û fransî *nom* û hwd. (Ainiala û yd., 2016: 13).

Cihenav an jî navê cihan ku tê wateya toponîmê di îngilîzî de wekî *placename* an jî *toponym* di tirkî de wekî *yeradı* derbas dibe. Toponîm wekî çemkekê ji peyvên yewnanî *tópos* (cih) û *ónoma* (nav) pêk tê. Wekî ku ji wateya peyvê ve jî dertê holê navên cihan babeta serekî ya toponîmiyê ye (bi tirkî, *yeradbilim*). Ji berê de, merivan nav li zarokên xwe û cih û warên derdora xwe kirine. Ji cihekî piçûk heta herêmên mezin, bi tevî deverên meskûnê yên wekî bajar, gund, mezra, tax, çiya, gol, behr, newal û geliyên li derdora xwe li gorî erf û adetên xwe yên çandî û zimanî bi nav kirine. Kiryara binavkirinê ku nerîteke qedîm a merivan e, ji bo nav û nîşankirinê, vavêrkirina cihekî ji cihekî din, ji bo serrastkirina mekanî û civatî hatiye emilandin.

Di prosesa demdirêj û dewamdar a navandinê de, taybetmendiya fîzîkî û têkiliyên sosyo-kulturî, zimanî û çandî, nîrxên nêrîtî, kar û mijûliyên serekî, flora, faûna, bawerî û gelek hokarên din rola xwe digêrin. Herwiha, merivan di nav warê xwe yê binavkirî de, qadeke jiyanê ya ku erf û adet, bûyerên dîrokî, dîrokbêjîyeke

⁴⁵ Ji bo vê xebatê meseleya hîlbijartina navekî ji bo *placename/yeradı* bi kurdî gelek serêşî derxist. Ji bo vê yekê gelek alternatîf hebûn û bi şêwira bi gelek kesan re hin nav zêdetir berçav bûn. Navên ku ji bo *placename*ê dihatin pêşniyazkirin bi vî rengî bûn: Navê cihan, cihenav, devernnav, cihwarnav, erdname, erdnav, navcih. Piştî nîqaşan, me di destpêka xebatê de biryar da ku em bo peyva *placename*, bi kurdî *navcih* bi kar bînin. Lewre peyva cihnav an jî cînav di dîvîla zemîr (*pronoun*) de dihat bikaranîn û dikaribû tevlihevî çêkîra. Li vir me ilhama xwe ji peyvsaziya van peyvên wekî *destîtevir* (destiyê tevir), *sîdar* (siya darê) û ji navê gundekî Elâşgirê *Karpalo* (pala Kara). Lê wekî biyara dawî, piştî ku vê xebatê encam da, me anî “navê cih” û “**cihenav**”ê tercîh kir ku dikaribû baştir bê fêmkirin û bi navgira “-e-”yê ve jî ji cihnav/cînavê (zemîr) dihat vavêrkirin. Ji bo heman peyvê Botî peyva “devernnav” bikaraniye û wiha şirove kiriye: “Devernnav, cugirrafînav, navên deveran. Wek: berwarîbala, berêgare, navkurê, Barzan, Badînan” (2006: 14). Herwiha peyva “cihenav”ê ji bo vê xebatê nehate dariştin, ev peyv ji aliyê Akin ve jî berê hatibû bikaranîn (2013: 281-292).

devkî pêk anîne; derûdora xwe li gorî çand û zimanê xwe, ji bo tesbîtkirina hêsan ya deveran û ji bo ragihandinê kifş kirine û navandine. Binavkirin, taybetmendiyeke serekî ya mirovan e, ji ber ku bo ragihandin, nasyarî û pênasakirinê, mirovan ji hemû pêkhateyên dinyayê re li gorî fehma xwe navek dîtiye û ew bi hev û din re dane nasandin.

Toponîm ango cihên nav li ser şêwe û kategoriyên cuda parve dibin: xwerû (*simplex*) dema ku nav tenê ji peyvekî pêk tê; hevedudanî (*composite*) dema ku ji du yekeyan pêk tê; eponîm (*eponym*) dema ku navek ji navê kesekî didirije; hacionîm (*hagionym*) dema ku cihek navê xwe ji navê xwedawendekî digire; bîranîn (*commemorative*) dema ku navek ji piştî bûyereke taybet li cihekî tê dayîn; teswîrker (*descriptive*) dema ku navek cihê ku sembolîze dike, terîf dike (Kostanski, 2009: 45).

Di hemû dinyayê da, civatên cihêreng bi rengekî nav didin dormaleya xwe ya fîzîkî û dixwazin bi vê binavkirinê ve, cihekî ji cihekî dîtir veqetînin û wekî pêgeha (*location*) wê destnîşan bikin bi rêya referans û îşaretan. Keith Basso di kitaba xwe de ku vekolîneke berfireh e li ser Apaçiyên Rojavayî (*Western Apache*), amaje bi wê yekê dike ku navên cihan “di nav hemû sembolên zimanî de yên herî têrûtije ne û gelekî ji aliyê bîranînê ve dewlemed in (*richly evocative*)” (1996: 76) û girîng in ji bo hesta civatekê ya xwebûnê û cihê wan ê di dinyayê de. Ji ber girêdana wan a necudabar a bi hin pêgehên diyar heye, navê cihan dikarin gelek bîrxistinên zihnî û hestî bînin bîra meriv, bi taybetî bîrxistinên dem û mekan, ên dîrok û qewaman, ên meriv û çalakiyên civatî, ên takekesî û merhaleyên di jiyana kesekî de (Basso, 1996: 76). Di heman demê de, cihên derheqê şûn û şopa dîrokî ya paşxaneya wê cihî û gelê xwecih de dikare melûmatên bikêr pêşkêş bike. Cih wate û nirxê bi rêya navê xwe bi dest dixê, ji ber ku ew bi rêya binavkirinê ve di nexşeya zihnî ya merivan de dîtbar dibe û wateyeke sembolîk bi dest derdikeve mexderê.

Toponîmên ji hafizeya nîfşên berê wekî mîraseke kulturî ya ji çanda qedîm tê dizên, bi neqîlkirineke çalak bi rêya bikaranînê derbasî nîfşên nû dibin. Meriv hilgirê hafizeya toponîmîk a erdê xwe ne û di wê hewlê de ne ku ev hafîze ji nav neçe û bibe milkê nîfşên siberojê jî. Mîrasa navan di pêwenda hest û ramanên civatî û tecrîbeyên takekesî de, xwedî gelek rehendan e û gelek tiştan tînin hafa hişê meriv. Lewra, ew

di demên dirêj de, bi tecrîbe, cîhanbînî û feraseta gel re çêdibin, dibin xwedî çîrok û serhatî.

2.1.2. Toponîmî

Toponîmî an jî cîhenavnasî zanista navên cihan e ku bi îngilîzî wekî *toponymy* an jî *toponomastics*, bi tirkî wekî *yeradibilim* tê zanîn. Ew binbeşeke onomastîkê ye ku bi giştî hemû navên cihan (toponîm) vedikole. Onomastîk jî binbeşeke zimannasiyê ye ku tê de hemû cure serenav (*proper names*) û toponîm –serenavên ku têkildarî erdê ne- tên vekolîn. Peyv –di nimûneya me de serenav an jî cîhenav– di nav milkên zimannasiyê de tê qebûlkirin û bi giştî ji aliyê hevoksazî, watenasî, teşenasî, etîmolojiyê û hwd. ve tê nirxandin. Hemû serenav bi rengekî dikevin bin zanista onomastîkê –çi navên merivan çi jî navên cih û waran– hemû serenav in. Ji serenav qesit ew nav in ku ji bo nîşandana heyîn, cih an jî kesekê tê bikaranîn û bêmanend in ango tekane ne. Toponîmî wekî binbeşeke onomastîkê (navnasî) vekolînan li ser derketina cîhenavan, qanûnên avabûna wan, wezîfeyên ku hildigirin û werara wan di prosesa dîrokî de vedikole (Şahin, 2013: 49).

Piştî ku wekî dîsîplineke serbixwe derket holê, toponîmî zêdetir wekî binbeşeke zimannasiyê bû mijara xebatên etîmolojîk û berbelavbûna zaravayan. Pey re, toponîmî bû qadeke berfireh a tesbîtkirina navên erdan û bikaranîna wan a wekî termên cografîk û nexşekirina gelên cuda bi rêya binavkirina zimanên wan û hwd. Bi xebatên li ser bîr û mekan û hêza polîtîk ve berê toponîmiyê ber bi antropolojiyê ve jî guherî û ew bû qadeke pîrhêl a ku bi gelek dîsîplînên din re dikeve têkiliyeke sûdmend. Bi gotina Willems, “navên taybet wekî nîşanên têkel bi zimannasî, pragmatîk, mentiq, felsefî, semîotîk, dîrokî, derûnnasî, civatî û taybetmendiyên adlî re têkiliyê datîne û ji ber vê yekê jî temsîliyeta qadeke înterdîsîplîner a gewre dike” (2000: 86). Xebatên di vê qadê de, çend deheyên dawî di nav berhemdariyekê de ye û pêşdeçûna xwe ya rexneyî/çandî bi gelek qadên curbicur re bi dewamdarî direxsîne.

Bi geşekirin û rûdanên dawî yên di vê qadê de, derî jê re vekir ku toponîmî bi têkiliyên civatî û siyasî re jî mijûl bibe. Heta destpêka sedsala 20an, xebatên li ser

navan bi rengekî ji hewldanên kategorîzekirinê û nêrînên etîmolojîk û tîpolojîk pêk dihatin, piştî wextan, qada toponîmiyê berê xwe ber bi zanistên civatî ve kir. Îcar, ji vê şûn de, girêdanên ku di navbera cihên nav û raboriyê de pêk tên, tesîra qewamên sosyo-kulturî û siyasî li ser navan, têkiliya pêkhateyên wekî nasname, hest û aidiyeta cih û mekanê bi cihên nav û (ve)navandinê bûye bala serekî ya xebatên toponîmîk digel gelek hokarên din ên ku di binavkirinê de xwedan rol in. Li gelek welatên dinyayê ev qad zaf pêş ketiye û sazî û cavatên taybet ji bo navan hatine avakirin.⁴⁶

2.3. Rewşa toponîmiyê û toponîmiya rexneyî li Tirkîyeyê⁴⁷

Xebatên toponîmiyê li Tirkîyeyê her diçin zêdetir dibin lê dîsa jî di halê hazir de di qada toponîmiyê de kêmasiyeke cidî ya çavkaniyan heye (Şahin, 2010: 156)⁴⁸. Lê li Tirkîyeyê kêmasiya ji wê mezintir ew e ku lîteratura heyî ya toponîmiyê ji “nêrîneke rexneyî” bêpar e. Di vê derbarê de Özberk radigihîne ku di xebatên

⁴⁶ Li dinyayê derheq navan de, ji mêj ve eleqeyeke akademîk heye û ev eleqe bi civat, sazî, dezgeh, kovar û enstîtuyan ve ji xwe re bingehe sazûmanî ava kiriye. Bi taybetî, hin sazî, kovar û desteyên ku li ser navê cihan kar dikin sedsalekê zêdetir e bi dewamdarî karên di warê onomastîk û toponomastîkê de dimeşînin. Bi awayekî giştî, di xebatên toponomastîk û onomastîkê di nav van weşanan de, bi hev re bi rê diçin û ew weşan giringiyê didin berhevkirin, tomarkirin, arşîvkirin û parastin û nîrxandina toponîm û mîkrotoponîman ji ber ku ew wekî parçeyekî binîrx yê çand û zimên tê dîtin. Di heman wextê de, pêşketina di warê toponîmiyê (toponomastîk) de, wekî “şaxa zanistekê serxwebûn û birêkûpêkbûna xwe herî baş bi hebûna kovarên xwe yên taybet ve diyar dike” (Hajdú, 2002: 32). Xêncî, weşanên periyodîk û sempozyumên salane yên navneteweyî di asta cihanî de sazî hene ku bi standartkirina navê cihan re dimûjilin. Saziya ku li seranserê dinyayê ji bo standartkirin û yekkirina (univocity) navan han dide Neteweyê Yekbûyî (NY) ye. *United Nations Group of Experts on Geographical Names* (‘Koma Pisporan a Neteweyên Yekbûyî ya li ser Navên Cografîk’) ku bi kurtî wekî UNGEGN tê nasîn, li her welatî li ser kêşeyên standartkirina toponîman dixebite û li ser van mijaran pêşniyazan dike.

⁴⁷ Lîteratura li ser toponîmiya klasîk alî Tirkîyeyê, her roj xurttir dibe. Herçendî gelek kêmasiyên îdeolojîk ên van xebatan hebin jî, tevkarîyeke gelek mezin di vê qadê de dikin. Ji aliyê bingeheên teorîk ve gelek ji wan xebatan dişibin hevdu. Xebatên antropolojîk/etnografîk ên li ser navan, bi taybetî li ser navên kurdî gelek kêr in.

⁴⁸ Şahin (2010) destnîşan dike ku sercem 284 berhem (tez, nivîsar, kitab hwd) hene. Ji xebata Şahin û vir de, di maweya deh salan de gelek berhemên nû li vê qadê zêde bûn. Bin. *Türkiye’de Yapılmış Toponimi Çalışmaları*.

toponîmîk ên di warên wekî dîrok, folklor, zimannasî û cografyayê de tên kirin mehrûm in ji perspektîfeke rexneyî, li gorî wî ev xebatên navhatî mîna “zimannasiya nerîtî û vekolînên binavkirinên çandparêz ji polîtîkayê ditirsin, xwe ji têkoşînên desthilatê dûr didin û ji aliyê teorîk û polîtîk ve boçûneke ampîrîk a naîf dipejirînin” (2018: 667). Herçiqas navê cihan û guherîna wan di pêwendên din de serinceke mezin rakêşabe li ser xwe jî gengeşeyên rexneyî û gişgir pir bi kêmî li ser wê hindê bûye bê li Tirkiyeyê guherînên navan çawa pêk hatine û bertekên li hember van guherînan çi bûye (Fields, 2013: 4). Bi helwesteke bi zanebûn, xebatên toponîmiyê ku bi gelek qadan re têkildar e, li Tirkiyeyê bi rengekî serincrakêş bi awayekî rexneyî bala xwe nedaye guherîn an jî venavandina bi hezaran navên deveran ku bi taybetî ji aliyê etîmolojiyê ve ne tirkî ne. Heta ev yek hatiye wê radeyê ku hin xebatên li ser navguhertinê bêyî ku rola wê ya texrîbkar destnîşan bikin, piştgiriya didin wê pratîkê û vê yekê wekî pêdiviyekê dinirxînin (bin. Çelik, 2018: 496-528).

Ihtimal e kêmbûna berdî û bergeheke rexneyî li toponîmiyê ji ber rewş û atmosfera sosyopolîtîk a li Tirkiyeyê bû ku berawird li gel van salên dawî, salên ewil ên komarê zêdetir xwediyê nêrîneke neteweperest û tund bû. Jixwe gelek xebatên di vê warî de bi bergeheke hişk a neteweperest ve hatine nivîsandin ku lê dixebitin “tirkbûn”a Anadolîyê nîşan bidin (Fields, 2013: 4). Ango ew bi rêya stratejiyên mekanî dil dikin navandinê wekî tirkkirina dîmena zimên bi kar bînin ku pê dawaya xwedîtiyê (*claiming ownership*) dikin (Berg & Kearns, 2009: 19) û çi nivîskî çi jî peyvîkî êdî wisa tê fêmkirin ku hem bi madeyî hem jî bi awayekî sembolîk dawaya xakê (*territory*) pê tê kirin (Alderman, 2008: 199).

Bi taybetî xebatên toponîmîk ên li Tirkiyeyê tirkbûna axê û navên li ser wê dupat dikin bi delîl û bi hewlên darê zorê şiroveyên ne-ilmî û zir-etîmolojîk ve argumentan berpêş dikin û dixwazin “tirkbûn”a cihnavan bipeyitînin. Bo nimûne, di vê warî de, hîn di salên ewil ên komarê de Hüseyin Nihal Atsız û Ahmet Naci (1928) nivîsareke bi navê *Anadoluda Türklere Ait Yer İsimleri* (‘Li Anadolîyê Navên ku Aidî Tirkan in) weşandine ku tê de lê dixebitin fikra tirkbûna navan serdest bikin. Nimûneyeke din a xebatên bi vê rengî ya Prof. Tüncer Gülensoy e ku bi navê *Türk Dünyasında ve Anadolu’da Ortak Yer Adları* (‘Li Dinyaya Tirkî û Anadolîyê Cihnavên Hevpar’) ku yekem hevok bi vê rengî ye: “Anadolî berî tarîxa 1071an jî welatê tirkan bû.” Çawa

ku tê dîtin, bêyî ku wekî parçeyêke bîra hevpar a pirçandî, pêkvejiyanê dupat bike cihenav bi awayekî yekser wekî mohr û amrazeke tirkîkirin/tirkîbûna xakê hatiye nirxandin û li ser wê dawaya xakê (*territory*) tê kirin. Ji derdorên zanistî û bi pileyên herî bilind ên akademîk ve nivîsarine bi vî rengî hatine nivîsandin.⁴⁹

Bi giştî, wekî gelek xebatên etnografîk û zimannasiyê ku pêrgî texrîfateke berçav dihatin, xebatên toponîmiyê jî li gorî polîtîkayên înkare şikil girtine. Bi taybetî xebatên ku di çarçoveya toponîmiya klasîk de hatine amadekirin bi perspektîfên xwe yê neteweperest dertên pêş û gelek ji wan, toponîmên kurdî yan nabînin an jî bi rengê xelet şirove dikin. Înkareke berçav a zimanê kurdî û kurdan di nav gelek xebatên akademîk ên toponîmiyê de xuya dike. Bi dehan xebatên wihareng hene ku di bin banê zanîngehan de wekî tezên doktora û masterê hatine amadekirin, lê di bin barê îdeolojî û gotara desthilatê de bi îdiayên “zanistî” xebatên toponîmiyê berdewam dikin ku tê de meriv nikare rastî rêça zimanê kurdî bê. Di nav kategorîzasyona kokên toponîman de gelek tezên doktorayê cih didin zimanên wekî tirkî, farisî, erebî, moxolî, ermenî, rumî, yewnanî, sogdî, çînî, fransî, îbranî û wan şirove dikin, lê bi tu awayî di nav kategoriyên zimanî de cih nadine kurdî (bin. Şenel, 2013; Kalkan, 2014; Pilancı, 1996).

A rast, xebatên berbehs û gelekên din ên bi vî rengî, tenê di nav kategoriyan de behsa kurdî nakin, carcar di seranserê xebatên xwe de peyva kurdî bi xwe jî nanivîsin. Bo nimûne Kalkan (2014) di hemû xebata xwe de ya bi navê *Gaziantep İli Yer Adları Üzerine Bir İnceleme* (Nirxandinek li ser Navê Cihan li Parêzgeha Intabê) lê dixebite ku qet behsa zimanê kurdî neke û peyvên kurdî dispêre zimanên din. Dîsan, di xebata xwe ya bi navê *Elazığ İli Yer Adları* de Şenel (2013) dora 11.000 navê navçe, bajarok, gund, mezra, çem, gir, çiya, mewkî û hwd. berhev dike û wan dinirxîne. Ew navê cihan ji aliyê kok, binyad û wateyê ve tesnîf û tehlîl dike, lê bi hezaran navên kurmançî û zazakî nabîne û wan di bin kategoriyên farisî, erebî û kokên nediyar de nîşan dide. Herwiha Şenel (2013: 433-436) xwe dide zorê ku gelek

⁴⁹ Divê bê bibîrxistin ku nivîskarê navhatî xwediyê kitaba bi navê *Kürmanci ve Zaza Türkçeleri Üzerine Bir Araştırma, İnceleme –Sözlük* (1983) û gelek rêzegotarên bi vî rengî ne ku tê de zazakî û kurmançî tî jêdestkirin û wekî zaravayekî tirkî tê dîtin.

toponîmên kurmancî û zazakî yê wekî Berojê Dirêj, Mêrgasor, Kerrî Gayan, Kevirê Reş, Kevirê Spî, Çavreşan, Deşta Reşan, Serê Şikeftan, Kuna Rovî û hwd. farisî nîşan bide. Çawa ku ji mînakên li jorê jî diyar dibe, gelek xebatên li ser toponîmiyê ne bi nêrîneke rexneyî li babetê dinêrin, ne jî li dû qaîdeyên zanistî yê maqûl in. Di bin barê îdeolojiyan de dimînin û gelek ji wan bi armanca neteweperestî an jî nasnamesaziyê hatine kirin. Etîmolojiyên ku ji rê û rêbazên zanistî dûr in, xema mebestekê dixwin, lewma xebatên kêmbêr ên vê qadê jî bi rengekî şêlû dikin.

Van salên dawî, kêmbêr be jî xebatên toponîmiya rexneyî li ser toponîmên Tirkiyeyê zêde dibin. Yek ji wan, xebata Kerem Öktem e ku di vê qadê de pêşiya gelek xebatên nû vekirîye. Öktem (2008) di nivîsara xwe de ya bi navê *The Nation's Imprint: Demographic Engineering and the Change of Toponymes in Republican Turkey* [Mohra Neteweyê: Mihendisiya Demografîk û Guherîna Toponîman li Komara Tirkiyeyê] bi gelek rehendên navguhertinê dide ber pirsîyaran. Herweha, çend tezên masterê ku li Tirkiyeyê di vê qadê de hatine amadekirin şayanê qalkirinê ne. Ya ewil, teza İbrahim Kuran (2010) e ku li Zanîngeha Boğaziçiye amade kiriye bi navê *The Practice of Renaming Places in Turkey: An Anthropological Perspective on Spatio-Temporal Politics* [Pratîkên Venavandina Cihan li Tirkiyeyê: Bi Perspektîfeke Antropolojîk li ser Polîtîkayên Mekanî-Demî]. Teza duyem ya Daniel Fields (2013) li Zanîngeha Sabancı hatiye parastin bi navê *State Imposed Place Name Change in Turkey and Responce of Giresun Residents* [Guherînên Cihnavan ên bi Zora Dewletê Hatine Kirin û Bertekên Xwecihên li Giresunê]. Teza sêyem li Zanîngeha İstanbul Bilgi hatiye pêşkêşkirin ji aliyê Merve Akgül (2017) ve bi navê *Ethnic Homogenization in Turkey: The Case of Toponymic Practices in Istanbul* [Homojenîzasyona Etnîk li Tirkiyeyê: Rewşa Pratîkên Toponîmîk li Stenbolê]. Herweha xebata Beril Çakır (2013) a bi navê *Crafting Symbolic Geographies in Modern Turkey: Kurdish Assimilation and the Politics of (Re)Naming* [Hilberîna Cografyayên Sembolîk li Tirkiyeya Modern: Asîmîlasyona Kurdan û Polîtîkayên (Ve)Navandinê] jî giring e. Xêncî xebatên navbirî vê taliyê xebata Doğuş Düzgün (2020) a bi navê *The Death of the Author in the Streetscape of Ankara: A Barthesian Intervention into Critical Toponymy* li zanîngeha ODTUyê hatiye parastinê.

Xêncî tezên navbirî, hin xebatên din jî li Tirkiyeyê weşiyane ku di vî warî de valahiyeke berçav dagirtine. Li vir divê meriv behsa Sevan Nişanyan bike ku bi hezaran navên gundan ên kevn katalog kirine û bi hin xebatên etîmolojîk ve jî li ser koka navan malûmat dane. Herçiqasî, meylidar e ku etîmolojiya gelek navan bi rengekî dispêre ermenî jî xebata wî ya bi navê *Adını Unutan Ülke: Türkiye’de Adı Değiştirilen Yerler Sözlüğü* (2010) gelek navên deveran dide ku hatine guherandin. Dîsan, ev xebata wî wekî malpereke înteraktîf bi navê *Index Anatolicus: Türkiye Yerleşim Birimleri Envanteri* (2011) (<https://nisanyanmap.com/>) li ser înternetê bi beşdariyên kesên din ve xurttir dibe. Lêbelê, rapora Nişanyan a ku wî ji bo TESEVê amade kiriye, zêdetir dikare bikeve bin sîwana toponîmiya rexneyî: *Hayali Coğrafyalar: Cumhuriyet Döneminde Türkiye’de Değiştirilen Yeradları* (2011). Ev rapor, prosesa venavandinê wekî xwendineke rexneyî li ser navên cografîk dike. Herwiha hin xebat hene bi rengekî di çarçoveya avabûna netewedewlet, bîra hevpar, nasname, siyaseta rêveberiyên lokal û hwd de tevkarîya qada rexneya toponîmîk dikin; (Jongerden, 2009; Tunçel, 2000; Koraltürk, 2003; Günal, 2012; Kara, 2012; Özberk, 2018).

2.4. Lîteratura toponîmiyê di kurdî de

Kesê ewil ê ku bi awayekî yekser bala xwe daye cihnavên li Kurdistanê Minorsky e. Nivîsara Minorsky ya bi navê *Mongol Place-Names in Mukri Kurdistan* (Navê Cihan ên Moxolî li Kurdistanê Mukriyan) di sala 1957an de hatiye weşandin. Minorsky di vê nivîsara xwe de bi navên moxolî re sînardar dike lê tê de behs tê li ser cihnavên kurdî. Moxol dema ku Kurdistanê dagîr dikin wekî germiyan li herêma Mukriyan hêwir datînin. Bi vekolîneke berfireh li ser kitab û belgeyên dîrokî yên farisî û erebî Minorsky destnîşan dike ku moxolan gelek nav li herêm û gundên kurdan kirine û qismek ji wan hê jî li kar in. Di dawîya nivîsara xwe de ew lîsteyekê amade dike ku ji navên moxolî pêk tînin. Ji vekolîna Minorsky diyar dibe ku piştî ku moxolan Kurdistanê mukriyan dagîr kiriye, şûn û şopa zimanê xwe li pey xwe hêlane.

Xebatên zanistî yên li ser cihnavên kurdî an jî navlêkirinên kurdan gelek kêr in û nispet bi gelên din, kurdan bala xwe zêde nedane xebatên onomastîk û toponîmiyê.

Bi taybetî xebatên bi şêwezarê kurmançî yê bi rengêkî yekser navê cihan ên kurdî re têkildar in, gelek kêr in. Li vir lazim e ku meriv behsa wan xebatên berdest bike ku bi kurmançî ne. Teza ewil ya li ser onomastîkê ku bi kurmançî hatiye nivîsandin, teza Serdar Öçal (2016) e. Navê tezê *Awayê Lêkirina Navan li Herêma Dêrikê (Vekolîneke Onomastîk-Sosyolojîk)* e û di sala 2016an de li Zanîngeha Mardin Artukluyê, li Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê hatiye parastin. Teza ku wekî xebata rewşê herêma Dêrika Çiyayê Mazî daye ber xwe, bi boçûneke sosyo-onomastîk (*socio-onomastics*) navê merivan (*anthroponym*), navê jîngeh û teşeyên erdnîgarî û navê eşîr û malbatên (*ethnonym*) li wir, awayên navlêkirinên kurmançên herêmê vedikole. Öçal di teza xwe de ji bo navên merivan li du dibistanan bi şagirdan re anket çêkiriye û xwestiye helwestên wan ên derheq navan de binirxîne. Herweha li çar gundan jî navên di Lijneya Bilind ya Hilbijartinê de li gorî rêjeya navên kurmançî, tirkî, erebî, farisî û navên ji zimanên din, rêjeya dunavan, li gor temenê merivan rêjeya navên kurmançî, sedemên guhertina rêjeya navan li gor temenê mirovan û hwd. hatiye vekolîn (2016: 11). Li rexê din, Öçal (2016) berhevkirin û nirxandinên toponîmîk kiriye li ser navên tax, kolan û kuçeyên Dêrikê, li dû wê jî wekî jîngeh, navên gund û mezrayên Dêrikê. Beşeke taybet ji bo navê eşîr û malbatên li herêmê hatiye terxandin. Bi giştî, meriv dikare bibêje ku ji bo xebatên onomastîk û bi taybetî jî toponîmiya klasîk ên kurdî ev xebata nimûneyeke baş e. Ev xebat, tevkariyekê li ferhenga kurdî ya erdnîgariyê dike û taybetmendiyeke navlêkirinê yê herêma xebatê destnîşan dike. Lêbelê, ev xebat di çarçoveya toponîmiya rexneyî de nehatiye amadekirin.

Kuzey Kürdistan'ın Köyleri: İdari ve İdari Olmayan İsimleri ya nivîskar û cografyanasê kurd Abdulla Ğefûr (Ebdulla Xefur) ku yekem car 1994an de li Stockholmê derketiye û pey re çend çapên din jî derketine. Kitab piştî ku du rûpelên bi soranî tevî tirkîya wan dide, lîsteya navên gund û bajaran raber dike. Di pêşgotina wê de gelek bi kêr behs li navên guherandî hatiye kirin û tabloyên ku tê de nav hatine rêzkirin bi kurdî hatiye ravekirin. Kitaba ku gelek dûr e ji nirxandineke analîtîk, pêşkêşkirina paşxaneyê guherandinê, navên gundan ên tirkî û navên kevn bi tîpên latînî û erebî tîpên rêz dike bîyî ku formên kurdî ya cihnavan bê parastin an jî vekolînkirin. Bi awayekî giştî meriv dikare bibêje ku ev kitab xwe dispêre belgeyên

fermî yê dewletê ku wekî *Dahiliye Vekaleti Mahalli İdareler Umum Müdürlüğü, Köylerimiz* (1933) tê nasîn.

Xebata Abdurrahman Önen a bi navê *Erdnîgariya Kurdistanê-I: Agirî* (2020) di dema amadekariya vê xebatê de derket. Ji nava kitabên li ser navê gundan ên li Agiriyê, meriv dikare bibêje ku kitaba herî birêkûpêk e. Ji ber ku nivîskar, bi hevkarîya kesên ji Agiriyê amade kiriye û xebateke sehayî meşandiye û agahiyên ku ew li ser navên kurdî dide bi gelemperî ew nav in ku di nav civatê de tên bikaranîn. Kitab nexşeyên fîzîkî yê erdnîgariya Agiriyê, navê mezre, gund û navçeyên Agirî yê tirkî û kurdî û gelek agahiyên din ên têkildarî bajêr pêşkêş dike. Di gewher de, meriv dikare bibêje ku ev kitab di heman demê de wekî xebateke berhevkarîya toponîmên bi kurdî û ermenî ye ku berî Komarê piraniya wan toponîman di nav civaka pirzimanî ya li Agiriyê de dihatin bikaranîn. Herçiqas xebata Önen (2020) ne xebateke zimannasî û etîmolojiya navan be jî ew, di amadekirina lîsteya navê gundan de kategorîzekirineke qismen teng a “tirkî” û “kurdî” dike. Bi vî rengî, di rewşa pirçandî û pirzimanîya cografyaya Agiriyê de mîrasa toponîmên bi ermenî rastî nedîtbariyeke qismî tên. Ji ber ku bi dehan navên bi zimanê ermenî di nav lîsteyan de wekî kurdî tên kodkirin.⁵⁰

Ji bilî xebatên Öçal (2016, 2021) û Önen (2020) ên bi kurdî hin xebatên din jî hene ku li ser onomastîk û toponîmiyê hatine amadekirin. Akın (2013: 281-292) gotareke kitaba xwe ya bi navê *Vekolînên Zimannasiya Kurdî* ji bo binavkirina erdê kurdan terxan kiriye ku tê de li ser hin nimûneyên hilbijartî stratejiyên jinûve binavkirina gund bajarên kurdan li Iraq, Îran, Sûriye û Tirkîyeyê analîz dike. Delikaya (2015) li ser gundê Qopiza Jorê (Elaşgir), Fêro (2020) li ser gundê Fêrgayê (Silopya) xebatên mîkrotoponîmîk ên berhevkarîyê çêkirine. Dîsan, Muhammed

⁵⁰ Di amadekirina lîsteya navê guhertî de ku wekî pêvek li dawîya vê xebatê de cih digire, me bi temamî ji lîsteya Önen (2020) istifade kir. Lêbelê hin şaşiyên biçûk hatine rastkirin ên ku di navê gundan de hatine tespîtkirin û jî wekî “navê berê” û “navên nû” hatiye tomarkirin da ku navên bi zimanên cihê jî bi rengekî derveyî binavkirina lîsteyê nemîne, herçiqas ev binavkirin zêdetir xwe bispêre taybetmendiyên telifûza zimanê kurdî jî.

(2015) û Tarduş (2017) bi rengekî giştî hewl dane têgeha onomastîkê pêname bikin. Delikaya (2019) rola navê cihan û hesta aîdbûnê di nav kilamên de vekolaye.

Ji bilî van xebatên navbirî, helbet gelek xebatên cûrbicûr hene ku bi rengekî bi toponîman jî digirin nav xwe. Bi taybetî kitabên gerokên Ewropî ji aliyê toponîman ve dewlemend in. Herwiha pexşanên kurdî yê nivîskarên kurd ên pexşannivîs ji aliyê navê cihan ve gelek dewlemend in. Lê, bi awayekî giştî, meriv dikare bibêje ku xebatên toponîmiya kurdî hîn jî di pêngava destpêkê de ne û jê re tevkarîyeke mezin lazim e da ku xwe bigihîne dereceyeke bilind.

2.5. Bingeha teorîk û pêşketina nêrîna rexneyî ya toponîmiyê

Pêşketina qada toponîmiyê bi dehsalan, li ser rêya xwe ya adetî û klasîk dewam kir. Ji ber ku “adeten, toponîmî bi rengekî serekî li ser berhevkirin û wesifandina navên cihan hûr dibû, bala xwe nedida şîroveyan bi rengekî teorîk arastekirî yê li ser wate û prosesên ku di paş wan nava de hene” (Alderman, 2003: 163–173). Guherîneke bingehîn bi ‘vegerîna rexneyî’ (*critical turn*) ya qadê re pêk hat ku teqabilî salên 1980yan dikir û pê re jî êdî boçûnên adetî yê li ser toponîmiyê ketin ber pirs û pirsîyarên vekolerên qadê (Rose-Redwood, Alderman û Azaryahu, 2010: 456-458). Dema ku guherîna ber bi toponîmiya rexneyî dinirxînin Vuolteenaho û Berg dibêjin ji “dawiya salên 1980yan û vir de lêkolerên di qadên zanistên civatî û merivî de bala xwe daye li ser hewldanên ji bo fêmkirina têkiliya tevlihev a ziman û hêzê” (2009: 1) ku vê yekê rê li ber nêrîna rexneyî vekirîye ji bo xebatên li ser cihnavan. Wilbur Welinsky li ser toponîmiya adetî gazinan dike ji ber ku toponîmî, bi gotina wî di qonaxa pêşrew a berhevkarî, senifandin û lêgerîna koka nava de asê maye (1997: 465). Piştî ku rexne li pergala kevn a toponomiyê hatine girtin û zanyarên vê qadê bi nêrîneke rexneyî ve derketin pêş û li hember xebatên toponîmîk ên ansîklopedîk, taksonomîk û etîmolojîk derketin. Ji aliyê tarîxî ve bi piranî pêdaçûneke neteorîk hebû li ser polîbendîya toponîmîk û vê yekê bi karîgerî hewlên li ser polîtîkayên cihî ku bi gelemperî ji bo prosesên navandinê bingeh e, piştguh kir (Kearns & Berg, 2009: 153). Toponîmî ji ber vê rewşa xwe ya apolîtîk û neteorîk (Vuolteenaho & Berg, 2009) derveyî çarçoveyeke rexneyî dihate bicihkirin û dihate tawanbarkirin ji terefê zanyaran ve. Vekolerên qada toponîmiyê, mîameleyek li gel

navan dikirin wekî ku nav nîşanderên bêkêşe yê nerîtî û çandî yê deverekê bin û wan ehemiyet nedidan rola dubendî ya di navandinê û bîranînê de (Kearns & Berg, 2009).

Piştî wextan, bi taybetî ji salên 1990î û pê de xebatên toponîmîk bûn xwedî riwangeheke rexneyî ku wekî ‘vegerîna rexneyî’ tê zanîn. Vegerîna rexneyî, hişt ku xebatên navê cihan berê xwe ji xemên etîmolojîk û taksonomîk ên adetî veguhêze li ser lêpîrsîneke rexneyî ya politîkayên cihnavandinê (Rose-Redwood, Alderman û Azaryahu, 2010: 455). Ev vegera rexneyî ya di vê qadê de, xebata cihenavan (*place name*) ber bi xebata binavkirina cihan (*place naming*) bir. Xebata *navên cihan* li ser nava bi xwe hûr dibe - toponîmiya ku jixwe heye – dibe armanca serekî ya lêgerînê, lêbelê, xebata *binavkirina cihan* bala xwe dide prosedur û prosesên ku tê de navek li dereke diyar tê kirin (Giraut & Houssay-Holzschuch, 2016: 3-4).

Xebatên li ser navê cihan, piştî *vegerîna rexneyî* bi rengekî vebirî lêkcudakirî nebin jî, li ser du parên vekolînê dabeş bûn; beşek jê bi dewamdarî etîmolojî, senifandin û hûrgiliyên dîrokî û wateyên navê cihan vedikole angû li ser rêya xwe ya adetî dikudîne, beşek jê bi rengekî rexneyî bal û cexta xwe dide li ser prosesên (ve)navandinê û pratîkên sosyo-mekanî yê nivîstekên toponîmîk. Rose-Redwood û yd. balê dikişînin li ser “berfirehbûna asoya têgihî (çemkî) ya xebatên rexneyî yê li ser cihenavan”, destnîşan dikin ku “para pirtir vekolînên toponîmîk êdî dêsmannê hêzê pişt guhê xwe navêjin ên ku piştgiriya didin prosesa navandinê û egera berxwedana sembolîk” (2010: 466).

Dema ku Vuolteenaho û Berg (2009: 3) rewşa berî vegera rexneyî ya di lîteratura toponîmiyê de dinirxînin, destnîşan dikin ev veger li ser sê arasteyên vekolînê yê nerîtî (lê hîn jî karîger) dabeş dibe: (i) felsefî (*philosophical*), ji aliyê eleqeyê razber ve teşe digire ku bi giştî li ser navandinê; (ii) (teknîk–rayedarî) (*technical–authoritative*), pêşketina fêhma li ser standartkirin û birêkûrêkkirina toponîman da ku rêkûpêkiya geopolîtîk bi dest bikeve û navandinên mekanî li gorî mentiqekê pêk were; û (iii) dîrokî–çandî (*historical–culturalist*), cext zêdetir li ser etîmolojiya cihenavan e di pêwendekê sosyo-dîrokî de. Ji ber hindê, nîqaşên li dor kêmasiya toponîmiya rexneyî wê yekê tînin ziman ku ew rehendên siyasî û mekanî

hatine piştguhkirin ên li pişt prosesa (ve)navandinê de ne. Lewma, toponîmiya rexneyî êdî zedetir “binavkirina cihan wekî pratîkên mekanî yên binîqas dinirxîne ji dêvla ku wan wekî nîşankerên berçav (*transparent signifiers*) yên ku cih wekî “obje” an jî “berhem” di mekanekî cografîk ê pêş-diyarkirî de bi nav bike.”

Xebatên li ser navên cihan herçiqasî di qadên curbicur ên berfireh ên wekî bîr, zimannasî, antropolojî, cografya, dîrok de bîr bicihkirin û vekolîn jî her diçe bergehê xwe fireh dike û bi rengekî înterdisîplîner bi hin qadên din ên zanistên civatî ra jî dikeve têkiliyê. Li gorî Vuolteenaho û Berg, xebatên toponîmîk li ser birreke dîsîplînan belav bûye (2009: 2). Bi qewlê Zelinsky ji ber “îfradên dîroka akademîk” (1997: 465) xebatên li ser toponîmiyê li ser qadeke fireh a dîsîplînan belav bûye wekî antropolojî, nexşekêşî (*cartography*), erdnîgarî, dîrok, legal studies, xebatên edebî, felsefe, polîtîka, derûnnasiya dewrûberê û bi taybetî jî zimannasî ku di hemû qadên navbirî de vekoler hewl didin hesta navên cihan û navên li dorhêla me çêbikin (Vuolteenaho & Berg, 2009: 2). Dîsîplînên ku toponîmi bi rengekî pê re bûye pêwendîdar an jî di dor çarçoveya wan de hatiye nirxandin û vekolîn, gelek zêde ne û berfirehbûna qada toponîmiya rexneyî di nav dewamdariyekê de ye.

Rose Redwood û yd., amaje pê dikin ku “nav tenê îşaretê bi mekanekî nasyar nakin, ew de heman demê de dihêle ku derbarê kesayet an jî bûyera tarixî de vegêrana mekanî ya rejîma siyasî tev li bîra civatî bibe” (2018: 8). Bi giştî, nav hem ji bo mekanên bajêr bixwe, hem jî ji bo deverên gundewar hêmaneke giring e ku meriv dikare di çarçoveya gelek rehendên curbicur ên polîtîk, hêz, bîr, mekan û semiyotîkê de binirxîne. Herçiqas ji aliyê xwe yê fonksînel ve, em bi gelemperî ji bo destnîşankirina cih an jî hêlekê bi kar bînin jî, di prosesa lêkirina wan (navlêkirin/navandin) de gelek fonksiyonên din jî hene ku bi nêrîneke serveyî dernakevin mexderê.

2.5.1. Navê cihan di pêwenda mekan û hêzê de

Ev çend deheyên dawî, xebatên cihenavan ji çarçoveya xwe ya edetî derhat ku tê de êdî cihenav wekî nîşaneke basît û bêlayan a babeta berhevkarî, etîmolojî û senifandina klasîk nedihate terîfkirin, lêbelê dêvila wê, ew di pêwendê berfirehtir a

civatî, desthilatî, siyasî de hate cîbicîkirin ku berê xwe ji pêdaçûnên li ser pratîkên navguhertinê re vedikir, bi vê haleta xwe ve jî, bi regekî înterdîsîplîner her çû zêdetir kete ber nirxandinên hûrbijêr ên rexneyî ku nirxandinên siyasî, mekanê civatî, bîra civatî dida ber xwe. Lewre êdî binavkirin, mekansazî (*place-making*) û hêz (*power*) (Berg & Vuolteenah, 2009: 7) li ser çerxerêya toponîmiya rexneyî bi perspektîfeke rexneyî ve têkiliyên neyeksan ên hêzê dinirxîne ku xwe dispêrin bingeha prosesa binavkirinê.

Jixwe berbelaviya hêzê (desthilat) li ser xeta sosyo-mekanî ji aliyê teorîsyenan ve (Foucault, 1980; de Certeau, 1984; Lefebvre, 2014) ji berê de hatibû destnîşankirin, xebatên cihenavan jî ji hêlekê ve pala xwe dan wan teorîsyenên pêşeng ku li ser hêz, mekan û zanînê bingeheke teorîk ava kiribûn. Foucault cemawerên serdema me, wekî cemawerên muraqebeyê (*surveillance*) terfî dîke ku bi saya serê rê û rêkarên dezgehên modern, desthilat li ser cemaweran belav bûye, bi vî karî, desthilata ku ya li herderê ye, mekanîzmayên muraqebeyê li ser civatê binecîh kiriye ku bi wê bitûnê civatê dixê jêr kontrola xwe, lê em ne di ferqê vê “girtina mezin” de ne (bin. Foucault, 2013). Hêjayî behsê ku Foucault serê xwe bi mesele û metaforên mekanî re jî eşandîye û serperîştîya teoriyê kiriye di warê desthilat/hêz (*power*) û zanîn (*savoir*) de, bi vî karî wî gotara cografîk (*geographical discourse*) li ber çavan rontir kiriye. Foucault ê ku di heman demê de “nexşeya desthilatê ji nû ve xêz kiriye” (Harris, 1991: 674) wiha qala desthilat/hêzê dîke;

Têkiliyek heye di navbera desthilat (*power*) û zanînê (*knowledge*) de. Çi dema ku zanîn hate analîzkirin di çarçoveya herêm, milk, perpûkirin (*implantation*), bécîhkirin (*displacement*), veguhastin (*transposition*) de, wê demê kesek dikare wê prosesê bi dest bîne ku bi wê zanîn wekî formeke desthilatê kar dîke û tesîra desthilatê zêf dîke (Foucault, 1980: 69).

Foucault têkiliya di navbera desthilat (hêz), zanîn û mekanê de, di çarçoveya wateya avaker a civatî de dinirxîne. Hêza civatî ya ku bi rêya mekanîzmayên desthilatê tên sepandin bi gelemperî dijberiya civatî de rû dide. Ji bo Foucault desthilat (hêz) xwediyê pêgeheke (*location*) sabit nîne mîna di hikumranî û dewletê de, lêbelê zêdetir ew bi rêya gotarên kulturî ve hatiye belavkirin (Harris, 1991: 674). Ji ber vê hindê, “êdî hêza civatî li derveyî pêwenda wê ya cografîk nayê hizirkirin.

Hêzeke bi vî karî re mekan divê, tetbîqa wê dirûv dide mekan û mekan dirûv dide hêza civatî” (Harris, 1991: 678).

Mekan çawa ku tê dîtin, ji têkiliyên ji hêz û desthilatê re nikare bifilite; ew di pêwenda civatî de rêya xwe li desthilatê diqelibîne û arîşeyên sosyo-mekanî derdixe holê. Di çarçoveya têgiha James Duncan ya “ve-hilberîna çandî” de êdî mekan ne wekî heybereke dayî ye, ew di prosesa têkel a hêz û desthilatê de tê hilberandin. Ev hilberîn ku tê de desthilat (hêz) li ser mekanê rola serekî dilîze, mekanê jî ji aliyê civatî û jiyana rojane ve dixê bin hikmê xwe.

Lewma wekî nîşaneke li ser erdê û di ser zar û zimanê bikarhêneran “cihenav çavkaniyeke dewlemend derpêş dike li ser mekan û hêzê bi rêya stratejiyên curbicirên li ser nîqaşên li dor bikaranîna wan” (Myers, 2009: 86). Ji aliyê toponîmiya rexneyî ve, binavkirina cihekî, lewma tenê nabe mijara zimannasiyê, ew kiriyarek e ku têkiliyên desthilatê jî dihundirîne (Vuolteenaho & Berg, 2009). Lewra giring e ku bi rengekî rexneyî navê cihan wekî “dêsmenên hêzê yên ku diyardeyên civatî di nav gelek têkiliyên mekanî de bicihkirî” (Gambetti & Jongerden 2011: 376) bînin xwendin. Jixwe diyardeyên civatî nikarin ji pêwenda xwe ya mekanî bifilitin; ew di bin zeptûrepta desthilatê de ne ku dêsmenên cihêreng ên hêzê li vir dibin amrazeke xurt a veguherînê. Navê cih, bi qewlê Rofe û Szili wekî amrazên retorîk in ku “hesta mekanê radigihînin ku pê ra girêdayî ne” (2009: 362-3). Ne ku ew bi xeletî û keyfî/dûvdilî ne, bi pêçevane, ew nîşanker in ku bi wateyê ve bi dev re tijî ne û bi qestî wiha hatine hilbijartin (Rofe & Szil, 2009: 363).

Binavkirin di destê desthilatê de dibe amraza avakirina pergale. Bi qewlê Michel de Certeau ku dibêje “her desthilat toponîmîk e û lê dixebite bi binavkirinê ve pergala xwe ya cih ava bike” (1984: 130). Binavkirina cihan nîşan dide ku çawa desthilatdarî erdê kontrol dike û bi vî kirina xwe ve çawa kontrola xwe berdewam dike (Giraut & Houssay-Holzschuch, 2016: 2). Kontrola erdê bi rêya ziman ve pêk tê –çunku nav pêkhênerêke ziman e– û di nav vegêranên zimanî de wekî parçeyêke jiyana rojane cihênav jî tesîrê li têgihiştinên me dike. Di vî derbarê de, Battiste û Henderson di çarçoveya giringiya ziman de ku ziman fêhm û feraseta merivan diyar dike, amaje bi wê yekê dikin ku “kesê ku xwediyê hêzê ye ku biryarê dide li ser

tişteke bi çi rengî bête binavkirin, di heman demê de xwediyê heman hêzê ye ku biryarê bide bê ka çi rastî ye” (2000: 74). Ev rastî bi rêya tor û gotara berbelav a desthilatê (bi kotekî) dibe “fermî”, di vegêran û bi taybetî jî di bîranîn û dîroka xwe ya “rastî” jî pêşkêş dike bi rêya cihenavan. Lewma di rikeberiya civatî de şerê gotaran li ser “rastî”yan derdikeve; rastî carcar nabe rastiya her kesî lê dibe rastiya desthilata ku li ser mekanê bajêr xwediyê guherîn û mafê danîna navan e (*right to name*). Ji ber hindê, xebitandina cihenavan, nemaze di peywenda fermî de bi armancên pergalên siyasî re girêdayî ye (binêre b.n. Berg û Kearns 2009; Clark û Kostanski 2012; Wilkinson, Marika û Williams 2009; Jordan 2009). Dema ku nav ji bo bîranînê (*commemorative*) tên bikaranîn, navên kolanan û versiyona dîroka ku ew di qada giştî (*public sphere*) de didin nasandin ku aidî nasnameya neteweyî û dêsmanên hêz û otoriteyê ye dîroka fermî dixin nav torên danûstandinê yên civatî (Azaryahu, 2009: 53).

Herwiha di pêwenda îdeolojîk a navan û ji nû ve binavkirina wan de ku navê kevn û teze rewşeke nakok hasil dikin, ne ku nav bi xwe lê paşxaneyê kiriyar binavkirinê têgihiştinan derheq mebestên siyasî de berçav û ron dike. Lewma binavkirin bi tevî pêkhênerên xwe li ser wê yekê karîger in ku destnîşan dikin bê ka çi divê bê bibîranîn û çi xwedan biryar e derheq rê û rêkarên meşrûkirina bîrê bi xwe de (bin. Alderman, 2015). Li ser cemaweran û bi taybetî jî bi perspektîfa mekanî li ser qada giştî hêza kontrolkirinê ya sembolîk tê hafa meşrûiyetê. Heke meriv bi gotinên Berg û Kearns bibêje, siyaseta binavkirina cih û deveran ‘hem siyaseta li ser mekan e (ku diyar dike kê mekan dinavîne û kontrol dike) hem jî siyaseteke mekanî ye (ku saya serê mekan terîf dike ku kê xwediyê meşrûiyeta axaftinê ye) (2007: 35). Jixwe ji ber hindê, nav dibin amraza meşrûkirina hêza desthilatê. Bi gelemperî, hilberîna gotarî ya mekan, ji bo ku nasname û huwiyeta mekan misoger bike, dibe par û parçeyeke wê yekê ku sînoran xêz dike. (Rose-Redwood, 2008). Lêbelê di venavandineke ku dimîne ser motîvasyonên siyasî li ser xeteke dualî bi rê ve diçe; yek “temsîlên raboriyê bi bîr dixe” (*commemoration*) û wê di qada giştî de berçav dike, vajî vê, ya din nav û “bîranîna heyî ji navbeynê dibe” (*decommemoration*) û qesta jêbirina wê dike (Azaryahu, 1996: 317). Ji ber ku berî dasepîna navê nû, yeke kevn hebû ku di bîra civakî de cih digirt. Dema ku navê nû tê dewsa navê kevn, (bîr

û temsîlên) navên kevn û navên teze di rewşeke nakok û nelihev de, li hev nakin li ser mekanê ku ji bo referans û beralîkirinê dibe xwediyê navekî.

Îcar, piştî ku desthilat vegêrana xwe -fermî- dixê nav qada giştî ya civakî, xwe dispêre dêsmanên hêzê û ji bo bihêzkirin û mihefezekirina hêza xwe pişt dide navê ku rastiya wî (temsîlên raborî û siberojê jî di nav de) ya fermî radigihîne. Helbet dêsmanên hêzê û amrazên din ên sepandina desthilatê li ser vegêranên lawaz, pêdivî bi retorîkekê heye ku ava bibe. Hauser dibêje retorîk “bikaranîna *instrumental* a zimên e” ku bi gotina wî “armanca wê kartêkirina li ser tercîhên merivan e di derheq mijarên taybet ên ku pêdivî heye ku lêhûrbûneke lezgîn li ser wan çêbibe” (1986: 11).

Rose-Redwood, Alderman, û Azaryahu dema ku “berfirehbûna asoya çemkî (têgihî) ya xebatên rexneyî yên li ser navê cihan” dinirxînin, destnîşan dikin ku “para pirtir vekolînên toponîmîk êdî dêsmanên hêzê pişt guhê xwe navêjin ên ku piştgiriye didin prosesa navandinê û egera berxwedana sembolîk” (2010: 466). Rast e ku meriv bibêje, xebatên toponîmiya rexneyî piştî ku bal û berê xwe dan têkiliyên desthilatê dirûv girt û wekî qadeke serbixwe ji toponîmiya klasîk veqetiya.

Piştî ku xebatên rexneyî li ser mekan (*spatial turn*) hatin kirin û diyar bû ku mekan ne heybereke “dayî” ye û bi pê re jî di çemkandina mekan de guherîn pêk hatin, bi taybetî li ser fikra ku mekan wekî heybereke sabit, nêtar û bêhêz didît guherî. Henri Lefebvre bû yê ku ji nû ve mekan di nav çemkên wekî polîtîk, guherbar û dînamîk de cîbicî kir. Li gorî wî, mekan berhemeke hilberîna civakî ye û ji aliyê niştecihan ve tê afirandin “wekî amraza hiş û tevgerê xizmet dike ... ku ne tenê dibe amraza hilberînê, de heman demê de ew amraza kontrolkirinê ye û wisan jî ya tehekûm û desthilatê ye” (Lefebvre, 2014: 56). Lewma erd-nivîsîn ango nivîsa li ser mekanê di çarçoveya kolonyalîzmê de tê dîtin ku li seranserê Tirkiyeyê bi van cure nivîsan ve erd hate binavkirin û nexşekirin. Mekanê ku tê hilberandin û nivîsandin di nav jiyana civakî ya çalak de, di bin hêza veguherînê ya şidetê de teşe digire ku wekî parçeyeke navxweyî ya pratîkên dewletê rû dide.

Ji vê aliyê ve em dikarin bibêjin ku xebatên rewşenbîrên wekî Lefebvre, Soja, Massey, Harvey ku karîger û pişkdar bûn di ronîkirina milkê teorîk de ku teşegirtina

mekanî ya bi têkiliyên desthilatê rave kirin. Piştî xebatên nivîskarên navhatî, mekan hew kete nav terîfeke teng a ku wê di çarçoveya taybetmendiyên fîzîkî de asê dikir, bi pêçevane, wê pala xwe da guherbarî, her ku dînamîkên civakî ku di nav pêwenda danûstandinên civakî û bîrê de dihate nirxandin. Şayanê amajepêdanê ye ku mekan li her derê pêrgî heman hokar û encaman nayê û bajar an jî mekan ne masûm in bi qewlê Soja (1989: 6) ku dipêje:

Divê em bi îsrar di wê ferqê de bin ku çawa mekan dikare pêk bê bo encaman ji me veşêre, çawa têkiliyên desthilat û dîsîplînê di nav mekanîbûna masûm a jiyana civakî de nexşîrî/veşartî ye, çawa cografyaya merivan mişt îdeolojî û siyaseta.

Masûmiyeta mekanê ku li vir dikeve ber şik û gumanê, cografyayên merivan (*human geographies*) ku bi îdeolojî û siyaseta ve dagirtî ye bi meriv dide têderxistin ku di esasê xwe de mekan, nikare destê xwe ji siyaseta bişo. Li ser daxwaza hikimraniya li mekan, di navbera (gotara) serdest û dij-serdest de tim lihevnekirin û berxwedanek li dar dikeve di qada ku tê de sembolên cihêreng tên nîşandan. Lewra pêdivî ye meriv guh bide Gambetti û Jongerden (2011: 382) ku di xebata xwe ya li ser (ve)hilberîna mekanî ya têkildarî kurdan de, destnîşan dikin ku berxwedana li ser mekanê di formên wekî hegemonîk û dij-hegemonîk de derdikevin mextê ku dixwazin sembol û îşaretan bixin bin hikmê xwe.

2.5.2. (Ve)navandin û bîra hevpar

Li ser babeta bîra hevpar û civakî gelek zanyar û teorisyenan, serê xwe êşandiye. Ji nav wan zanyaran Maurice Halbwachs, Pierre Nora, Paul Connerton ji gelek aliyan ve di berfirehkirin û çemkandina bîra hevpar de roleke giring gêrane. Herçend ku li ser bîra hevpar pênaseyên teqez û diyar berdest nebin û çeperên bîra hevpar bi xweşîkî neketibin ber çarçoveyeke berçav jî, li vir hewlek tê dayîn ku têgeh bi hin xalên xwe yên serekî ve bê ravekirin. Maurice Halbwachs di du kitabên xwe de ku di vê qadê de bûne serçavkaniyên serekî, bîngeha teorîk daniye ku hevpariya bîrê cext dike. Yek ji wan *Les cadres sociaux de la mémoire* (1925) [Çarçoveya Civakî ya Bîrê/Li ser Bîra Hevpar] û ya din *La mémoire collective* (1950) [Bîra Hevpar] ku

piştî mirina wî weşiyaye.⁵¹ Yekem kesê ku balê dikêşe ser rehendê civakî ê bîrê, Halbwacsh,⁵² di nivîsên xwe de çarçoveyên civakî ji bo bîrê radixe ku tê de raborî û dema niha bi jiyana civakî re di nav têkiliyê de ne û xisletê (ve)avaker ê bîrê tê destnîşankirin (2007).

Li dû gotina Halbwacsh (ve)guherîn û pêkhatina bîra hevpar bi şert û mercên civakî ve girêdayî ye, ji pêkhatin û parastina bîra takekesî re çarçoveya civakî lazim e, dema ku takekes bi tena serê xwe be ango di nav tenêtiyeke mitleq de mezin bibe, bîrê bi dest naxe (Assman; 2018: 44). Michale Schudson jî mîna Halbwacsh cextê dibe ser taybetmendiya civakî û hevpar a bîrê û destnîşan dike ku bîr civakî ye, “ji ber ku berî her tiştî ew di zêhna takekesî ya merivan zêdetir, di dezgehan de bi formên rêzik, qanûn, qeyd û birrek pratîkên çandî ve cîbicî bûne ku meriv bi saya wan deynê xwe yê li raboriyê vedinasin (bi tevî têgeha deyn bi xwe) û bi raboriyê re dewamdariya xwe ya exlaqî vedibêjin (dab û nêrît, kariyer, karname) (1997: 246).

Herçend e ku meriv dikare bîra xwe lap bîreke takekesî bibîne jî ku wan qewimînan bi bîr tîne ku tê de tenê me beşdarî kiriye an jî me li qewam û eşyayan şahidî kiriye û tecrîbe kiriye, lê di rastiyê de, ew hevpar e ji ber ku meriv tenê be jî berhema danûstandinên civakî ye û bi rêya dêsmanên hevpar ên mîna ziman li dinyayê dinêre (Araújo & dos Santos, 2009: 78-79). Herwiha, bîra takekesî nikare ji bîra hevpar cuda bibe, ew di nav têkilî û danûstandinên bi civakê re ava dibe û ji ber hindê xwediyê rehendekî civakî ye. Bîr bala xwe dide danûstandin û çarçoveya civakî, aidîyet û nasnameya me bi rêya hilberîn û dewamdariyê xurt dibe, bi qewlê Halbwachs “em bîr(anîn)ên her serdemeke jiyana xwe mihefeze dikin û ew bi dewamdarî tînin (ve)hilberandin; bi rêya wan, wekî têkiliyeke berdewam, hesta nasnameya me tê dabînkirin (Halbwacsh, 1992: 47).

⁵¹ Kitaba Halbwachs ya bi navê *La mémoire collective* [Bîra Hevpar] di 1950an de diweşe, ango pênc sal piştî mirina Halbwachs di kampa Naziyan a bi navê Buchenwald de (Assman, 2018: 43).

⁵² Li vir divê bê bibîrxistin ku derketina “bîra hevpar” de tesîra Bergson û Duckheim gelek li ser Halbwachs çêbûye. Ji ber ku piştî ku ew dibe xwendekarê Bergson û herwiha Duckheim nas dike û pê re dixebite, lêdixebite ku bîrê di nav çarçoveyeke civatî de biçemkîne (Assman, 2018: 43).

Bîra hevpar, nikare xwe ji midaxele û destwerdanên çerxa desthilatê rizgar bike, ew jî dûçarê wêrankariyê dibe li gorî menfeeta kesên ku xwediyê hêzê ne. Li gorî Araújo û dos Santos, bîr “bi wan kesan re têkildar e ku tehekûmê dikin, çunku ew biryarê didin divê kîjan vegêran bê bibîranîn, mihefezekirin û belavkirin (Araújo & dos Santos, 2009: 81). Dema ku meriv têkiliya wê ya bi nêritê re difikire, bîra civakî hem berepêş hem jî paşepê kar dike. Bîr tenê raboriyê nahûne, ev di heman demê de dixwaze tecribeyên niha û siberojê jî durist bike (Yalım, 2002; 161). Gelek xebatên bi vî rengî eşkere dikin ku xebatên li ser bîra hevpar di destê rejîmên siyasî de dibin amrazek ku pê raborî tê bibîranîn deqene xizmeta armancên îro bike (Alderman, 2009; Dwyer, 2004; Pinchevski & Torgovnik, 2002). Serqise, Orwell negotî “her çi kesê ku raboriyê dixê bin hukmê xwe li siberojê jî hikim dike; her çi kesê ku dema nika dike bin hikmê xwe, li raboriyê jî hikim dike.”

Li gorî Halbwachs dîrok li herkeke wisa ye ku temamî bereksê bîra civakî ye. “Bîra civakî armanc dike ji hundir ve li cemawerê binêre da ku dîmena wê ya raboriyê bi awayekî wisa nîşan bide ku di hemû merhaleyan de bikaribe bê bibîranîn û (ew) guherînên bingehîn red dike, beramber vê, dîrok wan cure serdemên bêguherîn wekî valahiyan li derveyî resmê dihêle û wan wekî diyardeyên dîrokî dihesibîne ku wekî proses an jî qewaman amajeyê bi wan hêmanan dikin ku guherînê nîşan didin (Assman, 2018: 51). Nora (2006) jî bi rengekî ranêzîkî têkiliya di navbera dîrok û bîrê de dibe ku ne zêde ji boçûna (*approach*) Halbwachs (2017) cuda ye. Li gorî Nora civakan mekan ava kirin ku hesta berdewamiyê dabîn dikir û tê de bîra civakî dihat veguhastin, ji ber ku “koka hesta berdewamiyê li mekan e” (2007: 17). Di vê çarçoveyê de Nora dîrok û bîrê wekî hemwate nanirxîne û destnîşan dike ku gelek tişt hene ku wan ji hevdu vavêr dike, li gorî wî:

“Bîr ew jiyan bixwe ye, ku her gav ji layê cemawerê ve tê hilberandin. Ji ber vê hindê ye ku bîr ji diyalektîka jibîrkin û bibîranînê re vekirî ye, ji şikil-guherînên wan bêxeber e, li hember destkariyan qewî hesas e, ji nediyariyên demdirêj û vejînên demûdest re kêrhatî ye û bi dewamdarî geşe digire. Li berê din, dîrok vesazkirina wan tiştan e ku êdî bi dest nakevin, lêbelê her tim bikêşe û kême e: Bîr her tim qewameke berbehs e, girêdaneke ku bi dewamdarî di dema niha de li kar e; dîrok tesewira raboriyê ye [...] Dîrok karekî zihnî û vavêrker e (*ayrıştırıcı*). Bîr,

pîrozweriyê li bîranînê bar dike. Lêbelê dîrok bîranînê/xatirayê berederî dike, wî alelade dike: Bîr, çavkaniya xwe ji wê cemawerê digire ku ew lêkevandine” (2006: 19).

Bîr bi rêya vegotin, wergirtin û lêxwedîderketina li bîranînê pêk tê (Sancar 2016: 41). Vegêranên bîrê yên raboriyê xwe dispêrin danûstandin û hevkartêkirinên civakî yên li mekanekê pêk tên, dema ku tên neqîlkin bo nîfşekî nû, navê cih tev li veguhastinê dibin. Binavkirin di vê çarçoveyê de, tenê beralîkirinên mekanî dabîn nake, bi taybetî dema ku navên şexsiyet û rûdanên giring tê de beşdarî dikin, ew herwiha nêrîneke hûrbijar a raboriyê meşrû dike (Azaryahu, 1996; Alderman, 2009) ku tê de hindêk rûdan û şexsiyetên bîra hevpar ji ser ên din re tên neqandin û berçavkirin. Di bîrê de wekî referansên pêgeh û waran, cihên cihekî zexm bigirin ji ew bi demê re dibin parçeyekê jiyana çandî ya herêmî û ew beşdarên çalak ên bîra hevpar in ku raboriya hevpar û melûmatên dîrokî û zanîna giştî ne ku di bîranînên kom û civakê de cih digirin (Akgül, 2017: 10-11). Ji ber ku navê cihan ji raboriyê ber bi siberojê di nav bîra gel de tê sitirandin, bîr(anîn) pê re têkildar dibin, heta ew bîranînan bi bîr dixin, tev bîra hevpar dikin. Hingê meriv dikare bibêje ku navê cihan dibe amrazê baş ku meriv pê dişe vegêranên raboriyê di veguhastina bîrê de nasyar bike. Ji ber ku bibîranîn xwe naspêre qewamên rastîn, ew xwe dispêre wan qewamên ku piştî wextan ketine dilqê vegêran û çîrokê (Sancar, 2016: 43). Ango qewamên ku vegêran û çîrokên li ser wan di nav bîra hevpar de cih girtine, ew ne aidî dema niha ne, bi pêçevane, ew li raboriyê li mekanekê cihiyane. Mekan dema ku ji bo merivan dibe xwedî nirx û bîranînekê –eger berê navek lê nehatibe kirin– dibe xwedî nav jî. Lewma rehendekî navê cihan heye ku bi bîra hevpar û mekanên bîrê re bi rengekî dibe têkildar. Toponîm cihekî taybet in di lîteratura mekanên bîrê de; nav û bîra raboriyê ya ku di wî navî de heye yek ji pêkhênerên mihim e di gotara hevçerx a li ser mekanê bîrê de (Rybicka, 2012: 136). Mekan an jî bajar jî di nav dem û dewranan re derbas dibin, şûn û şopa qewamên dîrokî yên civakî li îmajê navê xwe bar dikin. Carcar, pêkhatiyên maddî yên çandeke qedîm bi temamî ji holê radibin bi tevî miletê ku ew avakiriye an jî zimanê wî miletî pê xeber daye lêbelê emrên navan carna ji emrê danerê xwe zêdetir dibe û piştî wextan jî dikarin hin zanyariyan derbarê danerên xwe de pêşkêş bikin. Ew nav jî carcar bi seqamgiriya xwe ve dibin

çavkaniyeke giring a dîroka merivahiyê, ew raboriya civakan û merivahiyê ronî dikin eynî mîna bermayiyên arkeolojîk, avahiyên dîrokî, kitabe, sîkke û kêlan (Nişanyan, 2011: 23)⁵³

Cemawer li gorî berfirehiya herêma xwe ya nasyar dibin xwediyê repertûareke zimanî li ser navê cihan ku di nav veguherîn û çalakiya berdewam ya civakî de, qewam û serhatiyên ku şûn û şopa xwe li paş xwe dihêlin –çi nasyar çi jî kêmnas– di bîrê de tîrêjandin. Lewma di diyardeya bibîranînê de, mekan dibe ew cihê ku lê qewamek pêk hatiye û bi qewlê Halbwachs “tu bîreke hevpar tune ku di nav çarçoveyeke mekanî de pêk nehatibe” (2017: 153). Ew tîkiliya bîrê ya bi zeman û mekan re jî destnîşan dike û ji bo bîra hevpar. zeman û mekan du pêkhatiyên serekî ne. Ji ber hindê, mekan di rola bîra hevpar de alîkariyeke pêwîst dabîn dike ji bo ku bîra hevpar lê bihêwire. Herwiha mekanê ku qewam lê rû dide ku şopa wê di hişê meriv de bibîrxistin derdixe, bîr(anîn)ekê bi pêş dixe. “Fîgurên bibîranînê, dixwazin di mekanekî diyar de bîrê bergewdekirin û di zemanekî diyar de bîrê rojanekirin, angê ne di wateya cografî û dîrokî de be jî her tim xwe dispêrin mekan û zemanekî şênber” (Assman, 2018: 46). Kiryara bîranînê, bi vî rengî dimîne ser zeman û mekanekî diyar ên ku bîr tê de cîbicî dibe, bîr jî bi hilgiriya cemawerekê ve aidiyetê dabîn dibe.

Desthilat, li ser mekanê tehekûmê disepîne, dixwaze ew di bin kontrola wê de be, lewma bi armanca ku wê tev li dîroknivîsiya xwe ya fermî bike, şûn û şopa gelên kêmnas ku hizir dike dê zîrê bigihîne wê û jê re bibin tehdît, ji ser erdê paqij dike. Di navbera meriv û mekan de hevkartêkirin û tîkiliyeke berdewam heye ku di encamê de bi hev re tîrêjandin, bi qewlê Halbwachs ku dibêje:

Mekan şopa civakê, civak jî şopa mekan hildigire. Angê, hemû tevgerên civatê dikare bi çemkên mekanî bê tercimekirin û mekanê ku ew lê dihêwire, ji lêkciwandina hemû çemkan pêk tê. Her layenên mekanê, her teferuata wê xwediyê wateyekê ye ku tenê ev civak dikare fêhm bike çûnku her beşa mekanê ku ji aliyê civakê ve hatiye dagirtin, beramberî binyad û layenên cuda yên emrê wê civakê bi ye, qet nebe ji bo wan kesan wisa ne ku di civakê de bêhtir bi istikrar in (2017: 142).

⁵³ Herwiha bin. Jett (1997: 481) û Nicolaisen (1961: 75).

Ev danûstandin û pevgirêdana di navbera mekan û merivan de, ji bo her civakê ne eynî be jî, bi giştî xurt e. Lewma, hevterîb li gel vê yekê, meriv dikare bibêje ku dema qesta guherînekê li mekanekî tê kirin, ew bi rengekî li ser civak û bîra civakî ya hevpar jî guherînekê çêdike. Jixwe ji ber hindê ye ku cihwar û mekan pêrgî lihevnekirin û dubendiyan tên li ser temsîlkirina vegêranan, ji ber ku desthilat mekanê wekî qadekê dibîne ku li ser dixwaze bîra xwe serdest bike û eger hebe dîtbariya temsîlên bîreke din a dijber ji holê rake. Îcar stratejî û pratîkên dixwazin şopa li ser erdê birûxînin û veder bikin (*exclusion*)—bixwîne wekî kurd û etnîsîteyên xeyrî tirkên-, di wê hewlê de ne ku bîra çandî/hevpar a civakê ji nav bibin. Dîsan, meriv dikare berxwedana toponîmîk a ku li ser dîtbarî û dîmena zimên (*language landscape*) li mekan kar dike, di vê çarçoveyê de bifikire, çunku ew jî di wê dawayê de ye ku bîra xwe ya toponîmîk nîşan bide an jî eger ji berê de toponîmek li kar be, wê demê dixwaze wê di xizmeta bîr û bîranîna xwe de bixebitîne ku meriv dişê guherîna navên gund û kolanan li Tirkiyeyê bi vî karî bixwîne ku dixwazin mekanê bîrê ava bikin. Mekanê bîrê bi qewlê Nora xwedî gelek rehendan e ku yek ji wan siyaset e di wateya wan hemû hêzan de ku dixwazin rastiye biguherînin (2006: 10). Li gorî wî bîr ji naverokê bêtir çarçove ye; kozeke ku her tim berdest e, bitûniya stratejiyan e, diyardeyek e ku ji hebûna xwe bêtir bi şêwaza bikaranîna xwe ve bi nirx dibe (Nora, 2006: 10).

Li Tirkiyeyê di bin banê resmîyetê de bi alîkariya midaxele û dîrokê bîrek hatiye avakirin ku zêdetir xizmeta fikra serdest a li desthilatê dike û vegêranên dijber bi destwerdanê ve “serrast dike” û “tepeser dike” an jî dide “jibîrkirin”. Jixwe bi fikra modernîzasyonê ve netewe-dewletan li hember gelên kêmnê “polîtîkayên jibîrkirinê” (Sancar, 2016: 35-38) an bi gotina Connerton “jinavbirina bîra hemwelatiyan” (2019: 29) meşandine ku ev jibîrkirin xwedî take-rehendekê nîne, bi pêçevane, ew ji raboriyekê çavkaniya xwe hildide, ji dema nika re derbas dibe û tesîrê li ser sazîkirin û texeyuleke siberojê jî dike. Tevî polîtîkayên ku lê dixebitin jibîrkirineke berdewam çêbikin li ser dîroka ku tê de qewam û karesetan rû daye,

netewedewlet û rejîmên totalîter di wê hewlê de ne ku li ser “dîrok”ê kar bikin da ku pê tadeyê li ser bîra civakên kêmîne çêbikin.⁵⁴

Connerton di xebata xwe de li ser têkiliya di navbera dîrok û bîrê de, bîra civakî bi giştî wekî vesazkirina dîrokê dinirxîne. Li gorî wî, *prosesa ve-sazkirina dîrokê* dikare ji bîra cemaweran palpişteke rênîşander dabîn bike, beramber wê, ew dikare tevkarîyekê li teşegirtina bîra komên civakî bike (2019: 29). Li gor vê nêrînê, dîroknas dikarin li ser şûn û şopên çalakîyên merivan hilsengandinan bikin û ji wan dîrokê saz bikin bêyî ku ji bîra hevpar kelk werbigirin ango “ve-sazkirina dîrokê pabendê bîra civakî nîne” (Connerton, 2019: 28), lêbelê pêdiviya bîra civakî bi dîrokê heye.

Herwiha netewedewlet, li ser mekan serweriya xwe berçav dike û hesta dewamdarî û seqamgiriye bi sererastkirinên mekanî ve dabîn dike bi rêya simbol, peyker û rêûresman jî dixwaze tev li bîra civakî be. Jixwe destwerdanên herî berbiçav ên li ser bîra civakî bi gelemperî li ser mekan rû didin û mekan jî wekî pêgeheke ku danûstandinên civakî lê gur û geş in û hevkartêkeriya merivan lê zêde ne, li bîra civakî tesîr dike. Lewma mekan yek ji wan pêkhateyên giring e ku desthilat bi wê, rê li ber xwe xweş dike ku li gorî daxwaza dilê xwe serrastkirin û destwerdanan çêbike ên ku bi rengekî bîr, nasname û aidîyetê re eleqedar in. Armanc ji serrastkirinên mekanî ew e ku şûn û şopa yên kevn bên rakirin, nasnameyeke nû ya ku xizmeta cimaeta muxayel de ye, bi xweşikî bê geşkirin. Ev nasnameya nû an jî simbol û temsîlên ku hebûna desthilata neteweya zorîne salix didin, li ser mekan bi berdewamî tên parastin û pêşxistin.

Schudson sê maweyên serekî yên berevajîkirina bîrê (*distortion of memory*) destnîşan dike; dûrxistin (*distanciation*), amrazkirin (*instrumentalisation*), vegêrandin (*narrativization*) û lihevkarin (*conventionalization*) (1997: 348). Li gorî wî meriv nikare rêgiriye li berovajîkirina bîrê re bike, ew bi rengekî pêk tê. Ji ber ku

⁵⁴ Helbet ev yek nikare rêgiriye li wê yekê bike ku kêmîne raboriya xwe ji bîr bikin, lê belkî bibîranîna wê ya “bideng” bi derengî dixin. Bo nimûne, Neyzi (2013) di xebata xwe de di hewldaneke xurt de ye ji bo rûbirûbûna bi raboriyê re, dengên wan kesan dide bihîstinê ku ji ber paşxaneyên xwe yên etnîk an jî dînî rastî tadeyan hatine.

dema ku tişteke ji ser tişteki din re tê hilbijartin, yek jê tê piştguhkirin û ya din tê berçavkirin. Ango dema ku em bi şewazekê tişteki dibînin û bi bîr dixin, em çavê xwe ji tişteke din re digirin û wê ji bîr dikin. Em ji nav gelek tiştan tişteki dineqînin û ev terciha me, tercihên din nedîtbar dike û wan li derveyî bîrê dihêle. (Schudson, 1997: 348). Dînamîkên berevajîkirinê li ser sê qadan kar dikin; bîra civakî, bîra hevpar, bîra çandî. Li gorî wî bîra hevpar ku qesit jê ne ew bîrên takekesî ye ku bi awayekî civakî pêk tê, lê ji wê zêdetir e wekî embara bîrê îşaretê bi wan berheman dike ku bi rengekî civakî hatine hilberîn ên mîna abîde, muze, cihên (toponîm) û hwd. Di berovajîkirina bîra hevpar de, lewma, cihên jî wekî gelek sembolên din ên mekanî dibin parçeyek an jî amrazek e ku li ser an jî bi wê berovajîkirinek pêk tê.

2.5.3. Navê cihan di çarçoveya neteweperestî û netewesaziyê de

Neteweperestî û netewesazî anga avakirina neteweyekê, di prosesa texeyul û avakirina netewedewletê de du çemkên serekî ne ku divê bîrên terîfîkirin, herçend gelek zehmet e ku terîfa wê bê kirin ku herkes pê qayîl be, lewra pîvan û pênaseyeke teqez ne berdest e. Neteweperestî gotarek e ku berî her tiştî şikil dide hişmendiya me, alîkariyê bi me dike ku em wateyekê bidine dinyayê; bi gotineke deqîqtir, ew awayekê îdraqkirin, şirovekirin û dîtinê ye ku nasnameya hevpar kifş dike, xebirdanên me yên rojane, hal-hereket û helwestên me beralî dike û bi rê ve dibe (Özkırımlı, 1999: 12).

Prosesên neteweperestiyê û prosesa ji nû ve hilberîna cografyayê li gel hevdu kartêkeriyê li ser welatekî nû dikin, di rewşa Tirkîyeyê de take-şênîyên wê yê xwedan heq tirk in, ji ber ku dewleta nû-damezrî kesên ne-tirk, ne misliman hem ji rastiya maddî hem jî ji bîra hevpar û muxayîleyê (ve)der kir (Öktem, 2003: 2). Li Tirkîyeya ku êdî amrazên netewe-dewleta etnokratîk ên ku midaxeleya gotarên dîrokî û çandî lê hatine sazûmankirin, li mekanên bajaran êdî desthilat û îdeolojiyên nû eşkere bûn. Helbet divê bermayiyên îdeolojî an jî dewra kevn jî ji ser mekanên bajar û nexşeyan rabûna ku edî xwediyeke wî yê nû yê xwedan heq heye. A rast, ev pratîkên (prêze) sosyo-mekanî ne xweserî Tirkîyeyê bûn, navên erebî yên li Spanyayê dikaribû bi dewra hukimraniya misilmanan re bihata girêdan an jî li Îranê piştî ku şah di sala 1926an de hate ser hukim navên gelek bajaran guherand bi tevî

navê dewletê bi xwe jî û ev navên nû dewlet û xanedaniya wî ya nû sembolîze dikirin (Lewis, 1982: 99). Meriv dikare îdia bike ku yek ji pratîka navlêkirinê ya herî sosret ji aliyê Îsraîlê ve li Filistînê rû daye. Ji bo ku erka xwe ya wekhevîkirin û pevgirêdanê rabe û armancên neteweyî û îdeolojîk pêşve bibe li Îsraîlê siyonistan deverên avadan ên li Filistînê binavkirin; çil ji sedî cihên navên ku hatin lêkirin di Încîl û Talmudê de derbas dibûn û ev nav amrazek bû ku bi wê şêniyên nû yên cihê reh û rîçalê xwe berdidan li welatê xwe yê qedîm ji ber ku wan nava berdewamiya siyonistan li xaka Îsraîlê temsîl dikirin.⁵⁵ Ji vê riwangehê, binavkirin dibe wekî stratejiyeke midaxeleyê li ser têkiliya ku di asta sembolîk û maddî de di navbera erd û merivan de heye. Ev midaxeleye carcar bi rêya watesazkirinê pêbendiya bi xakê re xurt dikişîne an jî bi pêçevane, ji bo gelên ku xwedî dezavantaj ên ku ji îdeolojiya hakim hatine derekekirin şiklê wêrankariyeke pir-rehend digire ku tê de ev berdest in; dîroka nû ya ku bi destê netewedewletê de hatiye sêwirandin, bîra hevpar ku bîrên gelên kêmkirî jêrdest û bîrxir dibe, nasnameya neteweyî ku nasnameyên din bi retorîkên neteweyî ve qels dibe. Şiklê de nîne ku pêrziyên ku Tirkiyeyê bi rê ve çûn, biserûberkirineke mekanî û sepandina toponîmiyeke nû bû û ev yek jî helbet bi tesîra neteweperestiyê derket holê.

Dîroka modern bi nimûneyên rejîmên nû tijî ne ku xwestine “delîlên ji rejîma kevn ji nav bibin” û sembolên netewedewleta xwe qewî bikin ku pê nasnameyekê ava bikin (Lewis, 1982: 99). Bi taybetî piştî ku netewedewlet hatin avakirin, ev cure pratîkên navguhertinê li gelek welatên dinyayê peyda bûn bi armanca ku netewe û nasnameya neteweyî di nav gel de qewî bibe û li bin banê prosesa îdeolojîk a sazkirina “cemaetê muxayel”⁵⁶ de (Anderson, 2020) yekrêzî û yekgirtîbûna civakî

⁵⁵ Ji bo lîteratura li ser ve-navandinên li Îsraîlê bin. Katz (1995), Cohen & Kliot (1992), Azaryahu & Golan (2001).

⁵⁶ Xebata Anderson ya bi navê *Imagined Communities (Cemaetên Muxayel)* ku li ser peydabûna neteweperestî û belavbûna wê ye, amaje bi wê yekê dike ku neteweperestî bi sînorên xeyalî ve tê destnîşankirin û ew neteweyan wekî cemaetên muxayel bi nav dike. Anderson pênaseyeke bi vî rengî ji bo neteweyê raber dike: “Netewe cemaetê siyasî ya xeyalkirî ye, cemaetê xeyalkirî ye ku hem bi awayekî tabîî bisînor e, hem jî xwediyê serweriyê ye. Ew xeyalkirî ye, lewra endamên neteweya herî biçûk jî dê tu carî endamên din ên neteweya xwe nizanibin, bi wan re nasîna xwe nedin hevdu,

li dor berjewendiyên hevpar bê mihkemkirin. Ji ber ku piştî avabûna gelek dewletan ev gelek pratîk û midaxeleyên mekanî rû dane “binavkirina cihûwaran bi awayekî jêneger bi netewesazî û avakirina dewletê re hatiye girêdan” (Cohen & Kliot 1992: 653). Herwiha li gelek welatan navê cihan hatine guhertin da ku wekhevbûn û pevgirêdanên di navbera îdeolojiya danerên navan û mekan de bê handan, bi armanca ku meqsedên neteweyî yên îdeolojîk bîn pêşxistin (Katz, 1995: 112).

Piştî ku Komara Tirkîyê ava bû, neteweperestîya tirkî ku ji *İttihat ve Terrakîye* (Komeleya Yekîti û Pêşveçûnê) hatibû qerzîkirin, her çû zêdetir şeweyeke sazûmanî girt, saziyên wekî *Türk Tarih Kurumu* (Saziya Zimanê Tirkî) ne tenê bi rêya dîroknivîsiya fermî gotara neteweperestiyê xurt kirin, wan di heman demê de bi rêya dîroknivîsiyê etnîsteyên dike nedîtbar kirin. Öktem dîroknivîsiya hegemonîk wekî pêkhateyeke navendî ya projeya netewesaziyê dinirxîne, destnîşan dike ku ew nêrîna dîrokî ya grûpa etnîk a serdest dabîn dike û nirxê ‘xwe’ berz, nirxên “ên dike” kêmtir dike (2004: 568). Helbet ne tenê bi armanca berzîkirina nirx û raboriya xwe dest bi vê projeyê kiribûn, lê di wê ferqê de bûn ku hêza dîrokeke hevpar a pevgirêdana merivan jî bi xwe re tîne û dîsa wan “baş dizanibû tiştê ku neteweyê saz dike raborî ye, tiştê ku neteweyekê li hember ên dereke meşrû dike raborî ye û dîroknas in ên ku wê hildiberînin (Hobsbawm & Kertzer, 1992: 3). Lewma Azaryahu dibêje (2009: 56) rejîmên siyasî û elîtên wê ji bo ku desthilatdariya xwe meşrû bikin û hikimraniya xwe zêde bikin dîrokê ji bo emelên xwe bi kar tînin.

Gelek stratejî û prêzeyên ku *İttihat ve Terraki Cemiyeti* (Komeleya Yekîti û Pêşveçûnê) dabûn destpêkirin lê nikaribûn bînine serî, wekî helwestên binyadî yên dewletê her tim li kar bûn, salên 1920î, 1930î û 1940î de dewletê hewl da ku navê cihan biguherîne û dawîya dawî 1956an de Komisyona Pisporan a Navguhertinê (*Ad Değiştirme İhtisas Komisyonu*) hate avakirin (Öktem, 2004: 569). Bi tesîra neteweperestiyê encamên ku li ser guherîna navan re bi dest ketin, rewşa pirçandî ya dîmena zimên ji zimanên wekî kurdî, ermenî, rumî û gûrcî û hwd hatin paqijkirin, vê; xisareke berçav gihand cografyaya merivan a ku pêkvejiyana gelên li Anadolîyê

heta dê ji wan haydar jî nebin, lêbelê dê hişê her ferdê vê cemaetê de xeyala cemaeta wan her zindî bimîne” (2020: 24)

temsîl dikirin. Ji ber hindê, meriv dikare bibêje ku prosesa netewesazî û neteweperestiyê ku gelek caran rûxîner e, kartêkeriyê li ser navê cihan jî çêdike mîna piraniya pêkhateyên din ên pirçandî. Çunku ev proses wekî projeyeke neteweperest birêkûpêk hate meşandin, çî tiştên ji çand û zimanên cuda yên ji berê mabûn pêrgî destwerdanan hatin, yek ji wan qadên ku destwerdaneke berçav çêbû qada “sembolîk” bû ku tê de para pirtir a cihên navên ne-tirkî ji şûn û şopa çandî, zimanî û dîrokî hatin şûştin. Bi van kiryanan ve, “rola sembolîk a navê cihan wekî derbirîneke nîrxên îdeolojîk” (Cohen & Kliot 1992: 653) zêdetir berçav bû.

Jixwe piştî avabûna komarê, zêde nekişand serdestiya îdeolojiya ku pala xwe dida Kemalîzmê li gelek qadên sembolîk dest bi navandina kolan û bajaran kirin. Bo nimûne, dawîya sala 1922an hin cihên ku navên yewnanî li wan bûn bi vî rengî hatin guherandin; *Kirmasti* wekî Mustafakemalpaşa, *Nif* wekî Kemalpaşa, *Selindiya* Antalyayê wekî Gazipaşa hatin guhertin (Nişanyan, 2010: xvi). Helbet ne tenê ev nav guherîn ku wateya wan a sembolîk xurt bûn lêbelê li seranserê Tirkiyeyê kolanên serekî yên bajaran ji merhaleyên binavkirin an jî venavandinê re derbas bûn, bi regekî eşkere sembol û vegêrana dewleta nû avabûyî xuya bûn li qadên civakî yên ku hatûçûna merivan lê zêde bû. Bi taybetî navên wateyên xwe yên sembolîk xurt ên wekî *Atatürk* û *Cumhuriyet* ku di heman demê de dewr û rejîma nû salix didan, li gelek bajar û kolan belav bûn. Wekî cihê îdeolojî, vegêran û sembolan mekan bû ew bingeş ku netewedewlet li ser dihat lêkirin û bi regekî hesta berdewamiyê bi rêya mekan dihat bidestxistin û ew bi gelek rêûresm û sembolan ve dihat nîrxdarkirin. Li gelek welatên cihanê rewş ev bû ji ber ku “netewedewlet ji bo dewamdariya hebûna xwe ya siyasî dikeve nav prosesa netewesaziyê. Ji hêlekê ve raboriya xwe saz dike, ji hêleke din ve jî wisa dike ku bîra civakî ya ku nîrxên xwe ji nû ve hildiberîne, di maweya serweriya xwe de bi pratîkên xwe yên pêşbînî kirî ve çalak be. Ji bo ku di vê yekê de bi ser keve, divê berê pêşîn sîstema nîrxên xwe bide terîfkirin (serxwebûn, serkeftin, neteweperestî, sêdaqet, peywîr û hwd.). Têgehên ku di qada giştî de vegêrana wan bergewde dibe ji bo ku tesîrê li jiyana civakê bikin, di dîlkê sembolan de tîr hilberandin da ku civak jê beşer bike û wan qebûl bike (bo nimûne kesekî diyar, gotin an jî dîrok). Paşê ev hêma, bi rêya pratîkên mîmarî an mekanî şênber dibin û di qada giştî de bi hejmara xwe ya zêde ve berçav dibin. Ji

neteweyê re salix dide ku li wan nirxan xwedî derkeve yê ku bi rêya bibîranînê hatine raberkirin; bi vî karî hêmayê ku şeweyeke temsîlê ye, wekî formeke şênber teşe digire” (Yalim, 2002; 164).

Di nimûneyên gelek welatan de “binavkirina cihan bi awayekî jêner bi netewesazî û avakirina dewletê re hatiye girêdan” (Cohen & Kliot, 1992: 653). Yeoh, rewşa sosyo-polîtîk a Sîngapurê ya piştî serxwebûnê di pêwenda nivîstekên toponîmîk ên ser xakê de dinirxîne û destnîşan dike ku ve-navandina kolanan di prosesa “netewe”, “nasnameya neteweyî” de roleke qewî giring gêraye. Li Sîngapurê prosesa venavandinê ku piştî rakirina navên Ewropî dest pê kiriye, bi rengekî wisa pêk hatiye ku tê de li ser esasê “cîhêreng lê yekseng” navên pîrçewmî û pîrçandî hatine handan (Yeoh, 2009) û li gel netewesaziyê rizgariya ji kolonyalîzmê jî bûye kakilê polîtîkayên toponîmîk ên li Sîngapurê herçiqas hê jî gel bi hin nava emel dike ku bermayiyên serdema kolonyalîzmê ne (Yeh, 2013: 148).

2.5.4. Navê cihan wekî amrazeke (ve)derkirinê

Di çarçoveya rejîma etnografîk a nû-damezrî de, li ser bingeheên îdeolojîk ên komarê fikra dewleta “neteweyî” hate handan ku tê de di hemû waran de serdestî aidî tirkbûn û neteweperestîya tirkî bû. Ji bo qayîmkirina îdeolojiya netewe-dewletê, bere bere civak li dor vê fikrê civiya û ji bo civakê jî gelek stratejî hatin pêşxistin da ku raborî û îdealeke hevpar bê dabînkirin ji bo takekesên ku xwediyê paşxaneyê hevpar bûn. Lêbelê, vê hevparî û hevgiriya di nav takekesan de, di heman demê de kesên din –ji bo Tirkiyeyê bixwîne kurd an jî kêmnê– ji nasnameya xwedî îmtiyaz a zorîneyê dereke dikir (*exclude*) ji ber ku li derveyî çarçoveya muxayîleya wan a civakî bûn an jî (ew) lêxebitîn ku wan bi kotekî daxil bikin (*include*) û eger hebe doz û dawakariyên çandî, zimanî û kulturî piştguh û tepeser bikin. Lewma “muxayîleyê sînor xêz kirin ku ‘xwe’ wekî hukimran daxil kir/vehewand û ‘ên dîke’ dereke kirin, di hundir û derveyê xaka desthilata polîtîk de (Öktem, 2004: 562). Neyzi (2013) hêlên daxilker ên Komarê bi rengekî cuda dinirxîne û ew destnîşan dike ku bi komarê re hêlên derekekirin û daxilkirina nasnameya tirkî pêkve derketine meydana. Li gorî wê, nasnameya ku bi Komarê re hatiye afirandin, ji ber ku giringî daye

hêmanên modern û sekuler, nasnameyeke daxilker û tevgir e, lê ji ber ku cextê dide ser yekîtiya ziman, dîn û grûba etnîk ew ne daxilker e.

Destnîşankirina yê 'navxwe' (*insider*) û ên dereke (*outsider*) bi destê neteweya zorîne de –bixwîne tirk– di heman demê de hewlek bû di duristkîra nasnameyeke cih de; li ser vê paşxaneyê, bi cih re toponîmiyek jî derket holê ku têgihiştin û îdrakeke bi wî rengî pêş dixist ku tiştê ku aidî 'navxwe' ye asayî û normal dikir, beramber vê, tiştê aidî dereke û biyanî ye terfî û destnîşan dikir. Di vê çarçoveyê de, pêbendiya cemawerê bi toponîmiyê re hate handan û ya ku bi hesta aidîyetê ve ji 'xwe' dihate dîtîn, bi rengê hate asayîkirin û hêz û quweta yê dereke/beyanî bi hêcetan ên wekî "nefêambar" û "neguncan" hate daxistin. Heke meriv bi gotina Manzo bibêje; "dînamîkên (ve)derkirinê û afirandina mekanê aidbûnê tesîreke xwe ya qewî heye li ser têkildariya hestî ya bi cih re" (2005: 83).

Tesîra neteweperestîya Komara Tirkiyeyê li ser gelek cihetên jiyana civakî berçav bûn, qada siyasî û civakî bi yekcarî kete bin hikm û kontrola netewedewletê; jîngeha civakî ya ku berê bi kêrî be jî rê li ber pêkvejiyan û cihêrengiya çandî xweş dikir, êdî di haleta nû de, rastî amrazên nû yê homojenker û vederker dihat ku pê cudatîyên etno-çandî dihate armanckirin. Li vir bi taybetî mekan derdikeve ber çavan ji ber ku sembol li lê bergewde dibin; aidî û xwedîtiya îdeolojîk û bîra hevpar bi rêya wê tê ragihandin. Aidî an jî gotina rasttir "polîtîkaya aidîyetê" bi gotina Antonsich bi gotar û pratîkên sosyo-mekanî yê wekî (ve)hewandin (*inclusion*) û (ve)derkirin/derekekirin (*exclusion*) re têkildar in (2010: 645). Ev polîtîkayên aidîyetê projeyên polîtîk ên taybet in ku armanc dîkin aidîyetekê ava bikin bi hevparîyên diyar re ku ew bi xwe jî hatine çêkirin di van projeyan de û di nav sînorên diyarkirî de (Yuval-Davis, 2011: 10). Li gorî Öktem dînamîkên neteweperestiyê û hilberîna cografya û mekanê wekî du prosesên bi rengê mihkem bi hev re pabend in ku layenekê serekî yê modernîteyê nîşan dide (Öktem, 2003: 1). De heman demê de, hilberîna mekan bi awayekî sembolîk dibe sebebê rageşî û dudilîyên zimanî û qewmî li ser navê cihan, lewma ew di navbera "me" û "wan" de sînorekê xêz dike. Û sînorxêzî jî di çarçoveya mekanî an jî bi gotina deqîqtir herêmgiriyê (*territoriality*) pêk tê. Bi qewlê Penrose, dema ku meriv deveran/herêman ava dîkin, ew sînoran jî xêz dîkin ku hem mekan digihîne hev hem jî wê diqetîne tevî hemû pêkhênerên wê.

Wexta ku bi hindek meriv û jêderên li hev dicivîne û wan ji meriv û jêderên din cuda dike, avakirina herêmê maddeya fîzîkî û wateyeke sembolîk raber dike ji fikra ‘me’ û ‘ew’ ‘ya me’ ‘ya wan’ (Penrose, 2002: 280).

Cihenav bi xwe bi rengekî yekser cih û mekanê merivan re têkildar e, ew bi xwe jî dibe amraza vederkirin û vehewandinê ya xwecihên ku li ser dijîn. Li vir meseleya yeksaniyê (*equality*) divê berçav be, lewre li ser heman mekanê ku ji yekî zêdetir qewm emir dikin, ji aliyê binavkirinan ve hevpariya temsîlan divê bi başî bê parastin. Ango dema ku her netewe bi qasî rêjeya nifûsa xwe li ser mekanê sembolîk ên bajêr anga deqa bajêr neyê temsîlkirin, wê demê nelihevî û nerazîbûn derdikevin meydanê. Ber hukmê gelek netewedewletan û bi “bingehên îdeolojîk û netewesaziyê” (Horsman, 2006: 279) re têkildar navê cihan dibin ew amraz ku parçeyeke civakê bi wê ji bîr û muxayîleya neteweyî tê (ve)derkirin.

Bi taybetî cihenavên ku bi mebesta bibîranîna şexsiyet û rûdanên mezin hatine danîn (*commemorative place-names*) bîra kom û cemawereke diyar bi meriv didin hisandin, bi vê yekê ve, fonksiyona wan dişibe ya muzexane, abîde, avahî, park, rêûresman (bin. Alderman, 2000; Rose-Redwood, 2008; Hoelscher & Alderman, 2004). Bi vî rengî, navên ku li mekan tên danîn, bi awayekî sembolîk bîra wî/wê kes an jî bûyerê bi mekan re dibestîne ku bi gelemperî ev bîranîn dikeve xizmeta xurtkirina gotara desthilatê. Binavkirinên bi vî rengî yên ji bo bîranînê bi gelemperî nav û nîşana kesên girîng di nav civakê de berçav dike û ji bo civakê mekanekî saz dike ku bîr lê bi cih dibe. Bi xebera Alderman (2009: 179), “danîna navên şexsan li cihan amrazeke girîng e ku raboriyê tîne dema niha, alîkariyê dide ku dîrok tev li tevna cografîk a jiyana rojane be û bi wê re bê honandin. Kolanên binavkirî, wekî hemû bîrên civakî, dikare tev li polîtîkayên şayesandina bîrê bibe yên ku destnîşan dike bê ka çi ji aliyê dîrokê ve giring e an jî çi layiqê bibîranîna civakî ye” Şik tê de nîne dema ku navê şexs û qewamekê ji nav gelek kesên navdar ji bo bibîranîna cemawerî tê neqandin, hemaheng digel vê yekê, navên hin şexs û bûyerên din ên “vederkirî” li derveyî bîra cemawerî dimîne ku di esasê xwe de ev tercîh dibe wekî amrazeke dîkekirina kesên din. Ji ber ku tercîha me, tercîhên din nedîtbar dike û wan li derveyî bîrê dihêle anga “rêya dîtina tiştêkî, di heman demê de rêya nedîtina tiştêkî din e” (Schudson, 1997: 348).

Di pratîka (ve)navandinê de navê ku tê tercîhkirin hebûna xwe li ser navê kevn dide sepandin, bi vî karî, ji nedîtî û nedîtbariyê wêdetir jinavbirineke dîrokê jî pêk tê. Bi qewlê Tuan, adeten tenê şoreşeke sosyo-polîtîk bi xwe ra guherîneke nav tîne, dema ku tîne jî, navê nû xwediyê wê hêzê ye ku dişê raboriyê ji nav bibe û yeke nû binecih bike di dewsa ya kevn de (1991: 688). Li ser vê paşxaneyê, şêwaz û temsîlên ku di prosesa venavandina li Tirkiyeyê de rû dane, bi awayekî berçav nîşan dide ku toponîmên ku bi rengê jî tirkî re *nebûye* mal û milk, di prosesa venavandinê de nehatine dîtin, bi temamî ji pergale hatine (ve)derkirin. Jixwe ziman(ên) kurdî ku di çarçoveya polîtîkayên zimanî de li Tirkiyeyê rastî hewlên “zimankujî”yê (*linguicide*) hatiye (Hassanpour, 2020) bi amraza (ve)navandinê ve bi firawanî hatine (ve)derkirin ji pergala navan(dînê) a ku wê şîyanweriyê dide ziman da ku karibe bi rengê civakî û mekanî dîtbar û diyar bibe. Herwiha vê hewla zimanî rê li ber wê yekê xweş kiriye ku qisevanên zimanê kurdî, di jiyana rojane de hestên wekî seqamgirî, dewamdarî û aidîyetê [bi navên kurdî re] bi dest nexin. Çawa ku diyar e, amrazên wekî (ve)derkirin û dîkekîrînê digel gelek qadên cihêreng di prosesa (ve)navandinê de jî rû dide. Lewma “jêbirina “ên dîke” (dereke) polîtîkayeke bi rengê îdeolojîk beralîkirî ye ku dixwaze dîrok û bîra mekan ji nû ve binivîse” (Öktem, 2020: 313).

2.5.5. Navê cihan û nasname

Têkiliyeke berçav heye di navbera navê cih û gelek rehendên cuda yên nasnameyê de. Di çarçoveya cih û mekan de, girêdan û pabendîya bi erdê re wekî “nasnameya cihî” (*place identity*) hatiye pênasekirin û di çarçoveya “nasnameya neteweyî” de hesta aidîyetê ji aliyê desthilatê ve tîndarî dan da ku cemawerên li ser xakeke bîsînor(kirî) bi hev girî û yekrêzî li armanc û taybetmendiyên hevpar bibestî li ser xeta vederker a li dor sînorexêziya “em” û “ew” dirêj dibe. Hesta aidîyet û pêbendîyê bi cih re geşê dike, lewra cih û war çemkên mihim in di avakirin û pêbendîya nasnameyî ya cemawerê de (bin. Relph, 1976; Tuan, 1974; Guyot & Seethal, 2007; Helleland, 2012, 2009; MacDonald, 2017). Herwiha nav jî “roleke giring dilîze di kifşkirina nasname, pêbendiyên çandî û dîrokê de; ew dikare komên merivan ji hev cihê bike an jî bîne ba hev” (Scott, Tehranian & Mathias, 2002: 6). Bi

nîşanên nasname, çand û dîrokê ve ew “tevkariyê li geşekirina hesta cih dikin” (Alderman, 2008: 196) ku hesta cih jî parçeyek ji nasnameya cih bi xwe ye.

Herwiha cih bi rola xwe ya hêwirgehbûnê ve yek ji pêkhatayên serekî ye di avakirin û xurtkirina hesta aidîyet û nasnameyê de. Li vir aidîyet û nasnameya bi cih re an jî li ser cih û warekî tê avakirin, di heman wextê de bi navê wî cihî re jî pabend e. Di vê çarçoveyê de, meriv dikare bibêje ku “navê cih” bi awayekî adetî (xwebere) dibe ku biguhere, beramber wê, pratîka “cihnavandin”ê bi rengekî çalak di destê desthilatê dibe ew amraz ku pê di rewşên sosyo-polîtîk de qesta guherîna nasnameyê tê kirin. Wekî amrazê desthilatê “binavkirin” li ser manîpulasyon û rêvebirina wêneyê cemawerî û intibayan kar dike ku ji bo avakirina civakî ya nasnameya cih giring e (Alderman, 2008: 201). Ji ber ku navê cih û nasname di pêwendekeke mekanî û civakî de digihine hev û bi qewlê Alderman “cihenav dinizile nav ferhenga me ya rojane, hem dîtbarî hem peyvî, xuya dike li ser tabelayên rêyan, adresan, bilbordên reklaman û (helbet) nexşeyan; ew ne tenê dîrokê tevî cografyayê dike, di heman demê de ew cih û nasnameya cemawerê digihîne hev bi saya serê pêwenda hevbeş a bikaranîna cihevanan” (2008: 196).

Alderman (2008) herwiha binavkirinê li ser du çarçoveyên çemkî ava dike ku dikare ji bo fêmkirina nasnameya hevpar alîkar be: “*sermiyana sembolîk*” û “*berxwedana sembolîk*”. Li gor Alderman (2008:196), “*binavkirin wekî sermiyana sembolîk* temayeke ku cudahî û statûyekê dixê nav erdan û merivên ku pê re têkildar e.” Pabendî û xwenasandina bi sermiyana sembolîk re xizmetê ji cudahiya civakî re dike ku pê re jî xwecudakirina ji cemawerên din rû dide. Di vê bareyê de, Jacobson-Widding nasnameyê li ser du rehendan dizane, “*eynîbûn/dewamdarî*” û “*vavêrkerî/tekanebûn*” (vgz. Helleland, 2012: 106). Li gor vê nêrînê, vavêrkerî îşaretê bi nasnameya takekesî dike, beramber vê, eynîbûn zêdetir bi hesta hevparbûnê re têkildar e di navbera wan takekesan de ku cemawerekê pêk tînin. Lewma di esasê xwe de, navê cihan ne tenê referansên mekanî ne; ew pala xwe dispêrin têkiliyên hêz û têkoşîna li ser erd û çavkaniyan û nasnameyên wan merivan ku li ser wî erdê hêwir danîne (Kearns & Berg, 2002). Bi taybetî li bajaran pratîkên (ve)navandinê rola amrazekê digêre ku pê duristkirina nasnameyekê ji gelek aliyan ve tê handan. Herwiha ew amrazê di destê daner de ji bo çêkirina nasnameya cih ya ku aramiyê

pêş dixe lê ji hêla civakî ve hin temsîlên dîrokî yê vederker (*exclusive*) derdixe meydanê; ev temsîl li hindek kom û pêkhateyan hesta rihetî û prestîjê peyda dike, beramber vê, wekî şêweyeke şideta sembolîk û perawêzxistinê (*marginalization*) kar dike li ser hindek pêkhate û paydarên (*stakeholders*) din ên ku dîrokê bi rengekî din bi bîr tînin (Alderman, 2008: 196-197).

Berg û Kearns di xebata xwe ya li ser xwecihên Zelandaya Nû de didin zanîn ku nasnameya maoriyan (gelê xwecih ê Zelandaya Nû) bi erd û cih re vebestî ye û lewma jî guherîna navên erdan roleke giring gêraye li ser cihanbîniya wan. (2009: 29) Ev rewşên ji deverên cuda ên dinyayê nîşanî me dide ku navê cihan nîşankerên giring ên wateyê ne û ew ji cemawer, cih û erdê re nasnameyeke sembolîk dabîn dikin; nasname di vê çarçoveyê de ne tiştekî “dayî” ye lê ew di prosesên (ve)hilberîna çandî de tê sazîkirin (Berg & Kearns, 2009: 44-45).

Gelek cureyên nasnameyê hene; nasnameya neteweyî, nasnameya cihî, nasnameya takekesî, nasnameya hevpar û hwd. Ji wan “nasnameya neteweyî” li gorî Smith, çarçoveya herî berfireh û firawan pêşkêş dike di nav hemû nasnameyên kolektîf ên merivan de (1994: 221). Smith diyar dike ku pêdiviya “nasnameya neteweyî” bi cemawereke siyasî heye. Ev cemawera siyasî amajeyê bi wê rewşê dike ku tê de ji bo hemû takên civakê dezgehên hevpar berdest in û ji bo civakê tenya yasayek heye derheq maf û wezîfeyan de (1994: 24). Ew taybetmendiya serekî yê “nasnameya neteweyî” bi van xalên bingeşî ve rave dike (1994: 31-32):

1. Erd/welat an jî warekî dîrokî
2. Mîten hevpar û bîra dîrokî
3. Çandeke hevpar a cemawerî ya giştî
4. Maf û wezîfeyên hevpar ên yasayî ji bo hemû endamên civakê
5. Aboriyeke hevpar ku tê de hemû endamên civakê xwedan wê derfetê ne ku bi awayekî serbest (tev)bigerin.

“Nasnameya neteweyî” ji gelek alîyan ve xwe dispêre hevparî û hevgeriyekê an jî di wê hewlê de ye ku ev hevgeriya cemawerî ava bibe, herwiha ew piştî xwe dispêre çarçoveyeke civakî û welatekê hevpar ku lê tê sazîkirin. Rast e ku werara berdewam a nasnameyê di nav çarçoveya civakî de pêk tê, lêbelê ew di heman demê

de pabendî herêma an jî xakekê ye jî ku lê tê avakirin bi rêya sînorxêziyê ya ku bi gelemperî “em” û “wan” ji hevdu qut dike da ku hevparî û cudatî baştir berçav bibin. Ji ber ku “nasname *bi awayekî herêmi/deverî* tê pênasakirin” (Penrose, 2002: 284) û li ser xakekê teşe digire, têkiliya nasnameyê bi erdê re, bi vî karî jî, bi navê cihan re bi rê û pratîkên zimanî çêdibe. Lewre ziman navê cihan jî digire nav xwe û navê cih dibe perçeyek ji repertuara zimanî/peyvî ya qisevanên cemawerê. Navê cihan jî wekî yekeyên girîng ên zimên, di asta takî û cemawerî de roleke berçav digêrin û tevkariyê li hest û îdraqa aidîyetê ya cemawerê dikin. Lewma dema ku navdanîn an jî jêbirina navan diqewime, pê re destwerdanek jî çêdibe li ser îdraqa me ya li ser nasnameya cih. Bi vî rengî jî pevgirêdana di navbera polîtîkayên nasnamesaziyê û destwerdanên toponîmîk de jî eşkere dibe. Çawa ku Saparov (2003: 179) diyar dike: “Navê cih yek ji sembolen neteweyî yê herî seqamgîr e. Ew ji gelek berhemên hunerî zêdetir dikare ‘emir bike. [Ew] taybetmendiyên girîng ên nasnameya neteweyî û terîtorîal e.” Parastina wê ji destwerdan û midaxeleyan, hest û îdraqa cemawerê ya derheq raboriya xakê mîsoger dike ku bi gelek serhatî û vegêranên gelêrî ve hatiye xurtkirin. Pospelov destnîşan dike ku “hebûna van navan bi zelalî herêma kom û cemawera etnîk destnîşan dike û ev yek jî girîngtirîn derbirîna nasnameya neteweyî ye. Bikaranîna toponîmiya neteweyî dewamdariya dîrokî û parastina dab û nêrîtên çandî yên miletekî dabîn dike. [...] toponîmiya neteweyî wateyên taybet bi dest dixê ji bo gelên biçûk ên bêdewlet ji ber ku tenê ew herêma wan a neteweyî kifş dike” (Vgz. Saparov, 2003: 179). Di vê çarçoveyê de, toponîma welatekî tesîrê li nasnameyê jî dike li ser gelek cihetên civakî, çandî û zimanî hestekê peyda dike ku carcar wekî “pabendiya toponîmîk” (*toponymical attachment*) tê terîfkirin (Bo zêdetir zanyariyan, bin. Kostanski, 2009). Li gorî Proshansky ji “nasnameya cih” qesit ew “rehendên takî (xwe) ne ku nasnameya şexsî ya kesekî bi rêya nexşên (*pattern*) aloz ên fikrên hişyar û nehişyar, hest, nirx, armanc, tercîh, şîyanwerî û meylên reftarî yên derheq dormaleya diyar, di çarçoveya dormaleya wî ya fîzîkî de terîf dikin” (1978: 155). Gotinên Proshansky dide xuyanî ku nasnameya cih ku xwediyê nexşeke aloz e, nasnameya takî vedihewîne û piştgiriya dide boçûnên ku nasnameya takekesî bi erdê ve dibestîne.

Çawa ku li jor jî hate diyarkirin, cihên di destê gelek desthilatên siyasî de dibe amrazê xurtkirin û vebestina cemaweran bi erdê re, bi taybetî bi rêya guherandinê, giringiya wan a neteweyî û etnîk baştir diyar dibe. Ev guherîn xwedan armancine polîtîk û nasnameyî ne, bi wan xwenasandin û destnîşankirina nasnameyê tê handan di navbera îdeolojiya desthilat û cihê ku guherîna nava lê diqewime. Di vê biwarê de, pratîkên navguhertinê yên bi destê siyonîstên li Îsraîl pêkhatiye nimûneyeke balkêş e. Katz dide zanîn ku siyonîzmê wekî tevgera neteweyî ya cihûyan navên nû îcad nekirin; navên resen ên ji Tewratê, ji Încîlê û metnên din ên qedîm wekî rê û rêkara herî baş hate qebûl kirin da ku xwenasandin û pevgirêdana cihû-siyonîst bi xaka Filistinê re bê dabînkirin (1995: 112). Ango li Îsraîlê cihên navên nû nedan erdê Filistinê, pratîkeke bi rengekî cuda hate meşandin. Navên ji kitabên qedîm, dan erdan. Bi vî awayî nava; xizmeta armancên neteweyî kirin, “nasname û pevgirêdana di navbera cihû û erdên wan ên dîrokî de kûr kir” (Katz, 1995: 112). Di wan civakan de ku taybetmendiyên wan ên pirçandî, pirzimanî hene û bi nîrxên çandî û polîtîk ên cihêreng ve şikil girtine –bo nimûne pêkvejiyana kurd û tirk– navê cihan dikarin rola yekkirin an jî vavêrkirinê bigêrin. Li gor vê nêrînê, navê cihan wekî sembolan dikarin bîr bîranîn da ku fêhm û hişmendiya nasnameya hevpar ya dîrokî û polîtîk mobilîze bikin û wê pêş bixin (Guyot & Seethal, 2007: 56).

2.5.6. Deqa bajêr û nivîsandina wê

Dormaleya bajêr, bi rengekî sembolîk wekî metn/deqekê ye ku bi meqsedên çandî, civakî, siyasî û nasnameyî pêrgî jêbirin û ve-nivîsînê tê. Bi qewlê Ferguson deqa bajêr (*city-text*) ku nîşankerê çandî ye, wekî “kaxezê destxetekê” (*palimpsest*) ye (1988: 392) ku li ser hatiye nivîsîn an jêbirin lê nivîsên kevn hîn jî li ser tên xuyanê. Ev tebeqeyên nivîsînê (cureyên deqa bajêr) ku temsîlên polîtîkayên raboriyê dide der, bi gelek serhatî, pratîkên cihêreng ên desthilatê ve neqîşandî ne; bi vî karî, bajar dibe ew mekanê semiyotîk ku ji aliyê danerên cuda ve bi berdewamî tê nivîsandin û jêbirin. Deqa bajêr ji îdeolojî, nasname, dîrok, çand û ziman re dibe jêder û gelek tebeqeyên wateyê saz dike ji bo wan xwecihên ku wê dixwînin. Li gorî Palenon, “deqa bajêr wekî sîstemeke temsîlkirinê û objeyeke nasname û xwenasandina polîtîk kar dike. Ew ne ku tenê îdeolojiyên ku xwedî hêz in hildigire,

ne jî tenê gotarên siyasî dide der” (2008: 220). Ango ew xwedan gelek fonksiyonan e, ji ber hindê binavkirin (nivîsandin) li vir dibe ew karê ku li ser gelek hêlên bajêr û xwecihên wê tesîr dike. Heke mirov lê bixebite ronkatiyê bixe ser rehendên binavkirinê, hindê dê berçav be ku ev kiryar li ser du rêç û rêkaran dikare bê pênasekirin (Pinchevski & Torgovnik, 2002: 366). Yekem, di kiryara binavkirinê de cext li ser têkoşîna siyasî û prosesên qerardayînê ye ku herdu jî di beşdariya li binavkirina kolanan de roleke girîng digêrin. Bi rêya baldana ser herdu mekanîzmayên amajekirî, ku li jêr hukmê desthilatê ne û pabend in bi îdeolojiya siyasî re, hakimiyeta li ser qada giştî û prosesên pêkhênerên sembolk ji bo civakê nasyar dibin, jinûve teşe didin bîra hevpar û wekî fail jî hêza serwer a îdeolojîk li ser mekanê berçav dibe. Duyem, cext li ser layenên deqa bajêr e ku rê û delîveyan ji bo xwendinên bikeys dabîn dikin, bi vê re jî, ew hizr bi pêş dikeve ku pûte bi deq-mekanê dide ya ku derheq hengam, cih û rêveberiyên siyasî de gelek wateyan dihevine bi taybetî ji bo wan xwînerên ku dil dikin perdeyê ji ser qaşo-masûmiyeta navê cihan bidin alî da ku hin heqîqet rontir bin (Pinchevski & Torgovnik, 2002). “Nivîsandina deqa bajêr proseseke demdirêj e ku egerên bajêr, şayîşên îdeolojîk, berjewendiyên siyasî digihîne hevdu. Deqa bajêr ne tenê versiyona dîrokekê dinimîne lêbelê ew ewelîyetên bibîranînê (*commemorative*) û gotarên serdest ên heyamên pêştir jî temsîl dike” (Azaryahu, 2009: 64).

Deqa bajêr li ser wê binyadê zanyariyan raber dike ku ew lê hatiye hilberandin. Ew ne ‘masûm’ in û ne eynikên ron û zelal in ku rastî tê de bêkêşe bên dîtin (Duncan & Duncan, 1988: 118). Mekan an jî dîmena xakê tevî ku metneke xwendinê ye ku rehê xwe berdaye nav çarçove û tevkeriyên çandî yên şirovekirinê, ew di heman demê de bi rê û rêkarên neyekser nîşanî cemawerê dide bê ka divê ew çawa birêxistî be (Duncan & Duncan, 1988: 123). Nivîsên li ser deqa bajêr, îdeolojiya kes û koma nivîsandine nîşan dide, nasnameya siyasî, bernameya wan a veşartî û vekirî, armancên wan dide der. Sembol ew amraz in ku civakê bi rê dixin, dibin damezrîner û dewamkerên hegemonyayê (Özberk, 2018: 664).

BEŞA SÊYEM

VENAVANDIN, HELWEST Û VEGÊRAN: TOPONÎMÊN LI AGIRIYÊ


Li hemû herêm û bajarên li Tirkiyeyê wekî kiryareke gişgir nav hatine guhertin. Helbet, ev navguhertin li her bajarî bi heman rengî çênebûye. Bi taybetî bajarên di dîrokê de paşxaneyê wan a etnîk, çandî û zimanî ne homojen in/bûne, ji yê din bêhtir rastî destwerdanên toponîmîk hatine. Çawa ku di beşa duyem de jî hate diyarkirin, vê destwerdana berbelav li ser herêma Serhedê jî tesîr kiriye. Ji ber raboriya pirzimanî û pirçandî ya vê herêmê gelek navê cihan hene ku bi zimanên kurdî, tirkî û ermenî ne. Rêjeya navguhertinên li bajarên Serhedê yê wekî Erzirom, Agirî, Qersê di navbera 50-74 ji sedî ye, beramber vê, navguhertinên li bajarên wekî Mêrdîn, Diyarbekir, Riha, Şîrnex û hwd ji ser rêjeya sed ji 75î re ye. Meriv dikare bibêje ku toponîmên Serhedê nisbet bi bajarên wekî Mêrdîn, Diyarbekir, Riha, Şîrnexê kêmtir hatine guhertin.

Ev beş, guhertinên nava en li parêzgeha Agiriyê (Qerekilîs) di du binbeşan de, li ser du cihetan bide ber xwe û wan dinirxîne. Binbeşa yekem, *ji jor ber bi jêr* (da)sepîna venavandinên navçe, gund û kolanên li wî bajarî pêşkêş dike. Li Agiriyê vê deheya dawî li ser temsîlên toponîmîk ên li qada giştî ya bajêr bi rêya venavandinên kolan û taxan hin kiryarên îdarî û polîtîk xuya dikin ku dixwazin bîrekê hilberînin. Ev dubendiyên siyasî û civakî yê li ser (ve)navandinê pêk hatine di vê binbeşê de tê nirxandin. Çawa ku Light (2004: 154) destnîşan dike navê kolanan -mîna gelek bîranînên cemawerî- tûşî xwendin û şirovekirinên cihêreng tê û lewma jî ew dikarin bibin navenda duberekî û berxwedanê li ser giringiya raboriya ku ew temsîl dikin.

Binbeşa duyem, *ji jêr ber bi jor*, helwest û vegêranên kom û cemawera li Agiriyê vedikole û li ser venavandinê radiweste ku ji jor de hatiye dasepandin. Bi vê yekê re, hewl dide nirx û giringiya nava ji bo civaka kurdî nîşan bide û bi vê armancê nêrîneke sosyo-onomastîk û etnografîk diceribîne. Gotarên serekî yê ku di nav vegêranên şexsî de derdikevin meydanê bi alîkariya van nêrînan tên nirxandin û analîzkirin.

3.1. Agirî, sînor û nav(andin)

Agirî an jî bi navê xwe yê ku niştecihên wir dibêjin Qerekilîs,⁵⁷ bajarekî Serhedê ye ku li ser sînorê Tirkiye û Îranê dimîne. Li bakurê Agiriyê Qers û Îdir, li başûr Wan û Bidlîs, li rojhilatê wê jî Makû dimîne ku dikeve nav erdê Îranê. Heft navçeyên Agiriyê yên bi navê Bazîd (Bayîzd), Elaşgir, Xamur, Giyadîn, Panos, Avkevîr hene ku ji wan Bazîd (bi tirkî, *Doğubayazıt*) berê navenda îdarî ya bajêr bû.



Şikil 4. Nexşeya Agiriyê (Qerekilîs)

Wekî bajarekî li ser sînor Agirî, ji dewra Împeratoriya Osmanî heta Komarê di bin îdareya wîlayeta Erziromê de hatiye birêvekirin. Bi navê xwe yê fermî yê wê dewrê Bazeyîd ji ber pêgeha xwe ya cografîk duçarî gelek pevçûn û bêistiqariyan tê û ji prosesên siyasî, leşkerî û civakî yên dema şer tesîr digire. Bayezid hem di

⁵⁷ Di vê xebatê de navê bajêr hem wekî Agirî hem jî wekî Qerekilîs (Qereklîs) hate bikaranîn. Ya rast ew e ku meriv tenê Qerekilîsê bi kar bîne, lê di nav raya giştî ya kurdî de navê Agiriyê hem ji ber çiyê, hem jî ji ber serhildanê zêdetir tê nasîn. Lewma ew hate tercîhkirin, lê cih cih di vê xebatê de ji bo navenda bajêr tenê Qerekilîs hatiye bikaranîn.

serdema dewletên modern de yê wekî Îran û Ermenistan, hem jî di serdema Dewleta Osmanî û Qecer de bi berdewamî bûye hemsînorê dewletên cuda cuda û şahidê têkiliyên hêzê yê di navbera van dewletan de ku bi gelemperî ji ber tevgerên eşîrên kurd û dubendiyên li ser sînoran çêdibûn. Gelek caran bi maweyên kurt be jî dethilatên cuda lê hukim dikin û dibin sebebê tevliheviyê di nav jiyana civakî de. Bo nimûne, bajar di şerê dawî yê osmanî û îraniyan de (1821-1823) bo demeke kurt dikeve bin desthilata îraniyan û dorbera sînora jî aliyê osmaniyan ve *darulherb* tê îlankirin ku xwecihên li wir jî dibin *ehlê herbê* (Ateş, 2013: 52-53; Koç, 2020: 98-106). Piştî ku Qers bi tevî Batum û Erdexanê dikeve bin hukmê rûsan Bayezîd wekî sancaxê vilayeta Erziromê, bi qasî 44 salan (1878-1918) dibe hemsînorê Împeratoriya Rûsyayê jî. Bi şeran re guherîna desthilata bajêr di navbera împeratoriyan mezin de, istiqrara civakî û siyasî xerab dike û vî bajarê Serhedê dike xwedî dînamîkên siyasî û civakî yê xweserî xwe.

Xwecihên kurd (çi binecî çi jî koçber) ên li ser sînora, bi taybetî jî yê li sancaxa Bayezîdê bi aliyên din ên sînora re di nav danûstandinê de bûn. Eşîrên kurd ên vê herêmê ku birên mezin ên pêz xwedî dikirin, hem li Rewanê, hem li Xoy û Makuyê dihêwirîn.⁵⁸ Bi gotina Ateş (2013: 4) niştecihên vê herêmê an jî kurdên celalî û heyderî yê herdu aliyên sînora, ne tenê bi torên civakî, dînî û eqrebatîyê ve lê herwiha bi erf û adetên serhedîbûnê yê wisa ve girêdayî bûn ku sînorê vê cografyayê derbas dikir. Herçiqas dewletên mezin di navbera xwe de sînorên nû xêz kiribin jî, ji bo kurdên koçber ên ku peza û dewar xwedî dikirin, ev sînora dibû bihurek ku tê re çûnûhatin çêdibû. Çûn û hatina eşîrên kurdan li ser sînorên osmanî û îraniyan gelek caran dubendiyên çêdike û heta ev babet di Peymana Erziromê de jî tê gotûbêj kirin (Ateş, 2013: 52-57). Di vê peymanê de maddeya sêyem ku bi taybetî derheq eşîrên koçber ên sipkî û heyderî de ye wekî *ekrad maddesi* tê nasîn (Koç, 2020: 102). Tevgerdariyên bi girseyî yê eşîrên kurdan ku di navbera împeratoriyan de pêk tên tenê nabin sebebê meseleyên siyasî yê di navbera hersê împeratoriyan de. Di heman demê de, kurdên koçer ên ku bi nifûseke mezin zivistanê li germiyanên

⁵⁸ Ji bo xebateke birêkûpêk a li ser liv û tevgerên demsalî yê zîlan, heyderan û celaliyan ku di navbera di navbera herdu împeratoriyan de pêk dihat, bin. Koç (2020).

Bayezid û dorberê wê dihêwirin, aboriya sancaxê xerab dikin û di nav binecihên wir de jî nerihetiyê çêdikin (bin. Aykun, 1995: 26-27; Koç, 2020: 104).

Bayezid ji ber rewşa xwe ya li ser sînor bi sedsalan di navbera herdu dewletên mezin de rastî gelek rûdanên siyasî, civakî û ekonomîk hatiye. Jixwe meseleya tevgerên kurdan a di navbera herdu dewletên mezin de, heta dema avabûna netewedewletên modern jî her berdewam kiriye. Bi taybetî, rewşa şer û bêistiqrar dibe sebeb ku Bayezîd bi tevî piraniya niştecihên xwe koçber bibe û kom û civakên din ên ji ber şer direvin li wir bisitirin. Wate, meriv dikare bibêje ku ji ber sedemên navbirî û ji ber ku ev bajar li ser xeta şer bû, pêkhatina demografiyê jî li gorî wan şert û mercan şikil girt. Bo nimûne, piştî şerê 1877-1878an ê di navbera osmanî û rûsan de bi sed hezaran misilmanên ji Qers, Erdexan û Batumê (*elviye-i selâse*) dibin mihacir (Hamed-Troyansky, 2018: 113). Parek ji wan mihacirên ku qerepapax, terekeme û tirkên azerî ne li Bayezîdê bi cih dibin, beramber vê, hin ermenî û kurdên êzidî jî qesta Rewan û Rûsyayê dikin (Kaya, 2008: 207). Dîsa bi taybetî di Şerê Cîhanê yê Yekem de, dema ku Rûsya, Erzirom û Agiriyê dagir dike, bi deh hezaran kurd û tirk ber bi Anadolîya Navîn û derên din koçber dibin. Meriv dikare bibêje ku demografiya Bayezîdê jî hevterîb li gel şer, pevçûn û hokarên siyasî û ewlehiyê yên sedsalên borî çêbûye û di encamê de nifûseke heterojen dertê holê ku ji kurd, tirk, ermenî, qerepapax, terekeme, azerî û êzidiyan pêk tên.

Ji ber rewşên ne asayî liv û tevgerên cemawerî yên ku ji ber şer û pevçûnan cihguhastî dibin bi awayekî rasterê tesîrê li toponîmên li wir jî dike. Çunku carcar dema ku kom û cemawerek li derekê bi cih dibe, bi xwe re navê erdê xwe jî tînin an jî dema ku bi carekê de ji herêmekê koçber dibin, navên erdên wan piştî wextan tên ji bîr kirin. Ji ber hatina mihaciran a bi komî ji Kafkasyayê ber bi Agiriyê û ji wir ber bi Anadolîya Navîn, li vê herêmê kêmbûnê be jî hin guherînên toponîmîk bi xwe re anîne. Bo nimûne, piştî şerê 1877-78an ê osmanî û rûsan ji eşîreke qerepapax Hecî Îsa bi tevî malbata xwe koçber dibe û tê li Agiriyê li gundê bi navê Dêrikê bi cih dibe û piştî wextan ku vir gundekî şên ava dike û navê xwe lê dike: *Îsaabat* (Kaya, 2008: 206). Ev gund bi kurmancî wekî Dêrika Hacî Îso tê zanîn û ji prosesa venavandinê re derbas nebûye. Wate gund hê jî bi navê Îsaabat derbas û bermayiyên dêreke

hilweşîyayî li gund heyê. Gelek gundên bi vî rengî hene ku bi hatina kom û grûbên cuda re bi navê eşîr an jî serekê malbatê ve hatine binavkirin.



Şikil 5. Nexşeya sînorê Bayezîdê ya destpêka sedsala bîstan û eşîrên kurd⁵⁹

Gund û deverên bi vî rengî hene ku di prosesa demê re çî ji aliyê îdareyê ve çî jî bi rengê adetî hatine binavkirin. Bajarê Agiriyê jî yek ji wan cihan e ku navê wê tim rastî guhertinan hatiye. Ji Dewleta Osmanî heta Komarê bajarê Agiriyê (bi tirkî *Ağrı*) bi rengê balkêş gelek caran ji ber sedemên cuda hatiye guhertin. Gundê

⁵⁹ BOA, HRT.h 445, (29.12.1333[1915]).

Şorbilaxê⁶⁰ (bi tirkî *Şorbulak*) ku li ser rêya Elaşgir û Bazîdê bûye, ji ber ku rewşa xwe ya rêgehî, dibe qonaxeke mihim a hêwirdanîna karwanên bazirganan. Şorbilax di salên 1800î de gundekî biçûk e ku bi ser Xamûrê ve ye. Piştî ku ev der şên dibe, di sala 1834an de dibe nahiye û di sala 1869an de dibe qeza (navçe). Ji vê dewrê de di belgeyên osmanî de navê wê wekî *Karakilise* derbas dibe ku piştî wextan wekî *Qerekilîs*⁶¹ dikeve nav zimanê kurdî jî. Ev nav ji ber dêreke li bajêr hatiye danîn ku ji aliyê ermeniyî ve li navenda bajêr hatibû damezirandin. Çawa ku li jorê jî hate diyarkirin piştî Şerê Osmanî-Rûs ê sala 1877-1878an gelek mihacihên qerepapax û tirk li *Qerekilîsê* tên bicihkirin. Taybet ji bo mihacirên ku tên li *Qerekilîsê* bi cih dibin taxek tê avakirin. Di belgeya sala 02/01/1310an de tê xwestin ku taxa ku mihaciran nêzîkî bîst mal lê avakirine, wekî *Sıdkiye* bê binavkirin.⁶² Ev nimûne destnîşan dike ku binavkirina taxan û gundan carcar bi awayekî rasterast ji aliyê dewleta osmanî ve hatiye danîn û bi dehan nimûneyên wihareng hene.

Piştî wextan, ji ber ku bi heman navî çend cih hebûne, navê *Karakiliseyê* tevlihevî çêdike. Ji bo tevlihevî zêde nebe, gund û qezayên bi vî navî tên zanîn wekî *Kars Karakilisesi*, *Pasinler Karakilisesi*, *Eleşkirt Karakilisesi* tên binavkirin (ji Alpaslan neqilkin Kaya û yd., 2017: 569). Bi taybetî, di dema harekatên leşkerî de, ji aliyê leşkeran ve ev nav tên tevlihevkin. Lewma li ser daxwaza Kazım Karabekir navê *Eleşkirt Karakilisesi*, di sala 1919an de ji ber ku li aliyê rojhilatê Çiyayê Kosedaxê dimîne wekî *Qerekose* (*Karaköse*) tê guhertin (Kaya û yd., 2017: 569). Bi vê yekê re peyva *kilise* (dêr) ku baweriya xiristiyanîyê sembolîze dike ji navê bajêr tê avêtin. Piştî heşt salan, di sala 1927an de, *Bayezid* statuya xwe ya wilayetê ji dest dide.

⁶⁰ Di nav gel de kesê ku êdî vî navî bi bîr tînin gelek kêmin. Di sala 2012an de, li ser rêya Elaşgirê kalekî ku min pê re xeber da, ji min navê bajêr ê kevn pirsî. Min jî navê *Qerekose* û *Qerekilîsê* bi bîra wî xist, lê wî qebûl nekir. Go berê berînga, mezinên me jê re digotin “Şorbilax”.

⁶¹ *Karakilise*, bi kurdî dibe *Qerekilîse*, *Qereklîs*, *Qerekilîs* û carcar *Qereks*. Ev hemû versiyon li bajêr tên dîtin.

⁶² BOA, DH.KMT. 1978.92 (02/01/1310) “Karakilise’de muhacir halkın yirmiye yakın hane inşasıyla yaptıkları mahalleye Sıdkiye isminin verilmesi”. Herwiha li ser heman binavkirinê, bin. BOA, ŞD 1512.5 (02.12.1309)

Piştî ku Bayezid statuya xwe winda dike, navenda wilayetê dibe Qerekilîs ku pê re jî piştî salekê navê bajêr dîsa dugihere û ji ber Çiyayê Agiriyê dibe *Ağrı*. Mîna navê Qerekoseyê, navê Agiriyê jî di encama rewşeke awarte de tê lêkirin. Bi taybetî serhildanên Agiriyê (1926-1930) dibe sebeb ku bajar ji nû ve bê binavkirin û navenda parêzgehê ji Bazîdê ber bi Qerekilîsê tê neqilkirin (bin. **Pêvek G**) Navê çiyê ji navê gundekî li qûntara çiyê tê yê bi navê *Ağori/Axurî* (Nişanyan, 2010: 172) ku li perê bakûr ê çiyê ye û di sala 1840î de ji ber hedimîna erdê hildiweşe. Ev nav di belgeyên osmanî de jî wekî Agorî derbas dibe.⁶³ Ev gund niha li aliyê Îdirê dimîne û bi navê xwe yê nû wekî *Yenidoğan* tê naskirin.

	1850	1891	1919	1935
Bi tirkî	Şorbulak	Karakilise	Karakose	Ağrı
Bi kurdî	Şorbulax/Şorbilax	Qereklîs/Qerekilîs(e)	Qerekose	Agirî

Tablo 5. Di heyamên cuda de navên bajarê Agiriyê bi kurdî û tirkî

Çawa ku tê dîtin bajarê Agiriyê ji dewra Osmanî heta niha çar caran rastî navguhertinê hatiye. Rast e ku navê ewil êdî di nav gel de nayê bikaranîn. Lêbelê navê duyem (Qerekilîse) di nav gel de gelek bi baş cîbicî dibe û dikeve nav kilamên dengbêjan. Pey re dema ku Qerekoseyê li bajêr dîkin, ev nav jî demeke kurt tê bikaranîn. Ne tenê navê Agiriyê, navê navçeyên wê jî hatine guhertin. Lê meriv dikare bibêje ku hin navên navçeyan forma xwe ya kevn bi hin guherînan ve parastine.

Navê Fermî	Navê Kurdî
Diyadin	Giyadîn
Doğubayazıt	Bazîd/Bayîzd
Tutak	Dutax ⁶⁴

⁶³ BOA, AE.SAMD.III. 157.15.363 (29.06.1126) “Şüregel sancağının Agori karyesi...”

⁶⁴ Berê navê herêma Dutaxê wekî Entab dihat binavkirin, ji ber nifûsa tarîxî ya êzîdiyan ji vê herêmê re gotine Êzdîxan.

Taşlıçay	Avkevîr
Hamur	Xamûr
Eleşkirt	Elaşgir (herêm) Zêtkâ (navend)

Tablo 6. Navên navçeyên Agiriyê

Li bajarê Agiriyê jî mîna gelek bajarên din ên li Tirkîyeyê, gelek navê gundan hatine guhertin. Tunçel (2000) hejmara navên gundan ên ku li Agiriyê hatine guhertin wekî 374 destnîşan dike. Di weşana bi navê *Köylerimiz* (1968) de, tê dîtin ku nav Agiriyê ji proseseke berfireh a navguhertinê re derbas bûye. Ji ber rewşa îdarî ya gundan ya guherbar, bidestxistina hejmara kamîl a navê gundan jî li gorî salên cuda diguhere. Di pêvekê de navên guhertî û navên kevn⁶⁵ –bi tevî forma wan a kurdî– hatine rêz kirin. Herwiha, navên ku hatine guhertin bi tevî hin şîroveyan etîmolojîk û agahiyên li ser xwecih û eşîrên gundan li ser malpera bi navê *Index Anatolicus: Türkiye Yerleşim Birimleri Envanteri* berdest in ku berê wekî kitap bi navê *Adını Unutan Ülke: Türkiye’de Adı Değiştirilen Yerler Sözlüğü* (2010) ji aliyê Sevan Nişanyan ve hatiye weşandin. Nişanyan (2010) di kitaba xwe ya navbirî de, bi temamî navê 371 navî dide ku hatine guhertin. Nişanyan bi xwe lîsteya navên berê ji çavkaniyên wekî *Son Teşkilatı Mülkiyeye Göre Adlarımız* (1928), *Meskûn Yerler Kılavuzu* (1946) û *Köylerimiz* (1968) wergirtiye û beramber nava hin cihetên etîmolojîk û dîrokî yên gundan bi kurtî lê zêde kiriye. Li gorî Nişanyan (2010), dabeşbûna navên guhertî yên gundan li gorî navçeyan bi vî rengî ne:

Navçeyên Agiriyê	Hejmara Navên Guhertî
Agirî (Navend)	69
Giyadîn	34
Bazîd	58
Elaşgir/Zêtkâ	47
Xamûr	33

⁶⁵ Navên kevn ên ku di weşanên fermî yên wekî *Köylerimiz* de derbas dibin, ji ber ku gelek caran bi rênivîsa tirkî ve tên amadekirin, bi başî nayên fêmkirin.

Panos	52
Avkevir	30
Dutax	48

Tablo 7. Hejmara navê guhertî li gorî navçeyan⁶⁶

Li gundên hemû navçeyên Agiriyê, rêjeya navguhertinê li gorî hejmar û mezinahiya navçeyê diguhere. Wêneyê giştî yê hemû navçeyan destnîşan dike ku tu istisna li pêşiya vê kiryarê tune. Ji bilî navên deverên meskûn, li Agiriyê navên deverên siruştî û mezrayan jî hatiye guhertin ku di listeyên jor de cih negirtine. Di *Yeni Tebîî Yer Adları* beşa Agiriyê de navê hin çiyayên naskirî û girên bilind hatine guhertin. Di nav van de, bo nimûne, *Kartavin Dağı* (Çiyayê Qertewînê) wekî Top Dağı û *Mozik Dağı* (Çiyayê Mozikê), wekî Arı Dağı, *Şemso Dağı* (Çiyayê Şemso) wekî Bozburun Dağı, *Rutu Dağı* (Çiyayê Rûto) wekî Buzkaya Dağı, *Dubori Dağı* (Çiyayê Dibûrê) wekî İmam Dağı, *Mirgemir Dağı* (Çiyayê Mêrgemîrê) wekî Karakoyun Dağı hatiye guhertin. Di mînaka *Arı Dağı* (Çiyayê Mozikê) de tê dîtin ku ji mînan hinek nav rasterast ji kurdî hatine wergerandin. Hin navên din de jî bi îşaretên îslamî hatine tercîhkirin, bo nimûne *Dubori Dağı* (Çiyayê Dibûrê) wekî İmam Dağı hatiye guhertin û navên ku di nav kurdan de gelek berbelav in ên wekî Çiyayê Qertewînê ketiye ber pêlên guherînê ku di nav vegêranên folklorîk de cihekî xwe yê taybet heye.

3.2. Nêrînek li ser rêbazên venavandinê yên li Agiriyê

Guhertina navê gundên Agiriyê, mîna bajarên din bi rengekî gelek bêpergal û bêserûber hatiye meşandin. Akin (2013) stratejiyên jinûve binavkirina gund bajarên kurdan li her çar welatên serekî (Iraq, Îran, Sûriye û Tirkîyeyê) di çarçoveya berhevokeke 298 navî pêkhatî de dinirxîne û sê rêyên serekî ji bo (ve)navandinê destnîşan dike. Li gorî wî yek ji wan stratejiyan adaptasyon e ku tê de Kerkûk dibe *Kirkuk*, an jî Diyarbekir dibe *Diyarbakır*. Stratejiya duyem wekî pratîkeke “kêmqeydkirî”⁶⁷ wergera toponîman e ku li her çar welatan jî xuya dibe. Ya dawî, bi

⁶⁶ Ev agahî ji Nişanyan (2010: 14-23) hatiye wergirtin. Dibe ku kêmasî tê de hebin.

⁶⁷ Bi rastî dema ku meriv gelek nimûneyan dinêre, ev pratîk wekî “kêmqeydkirî” xuya nake.

temamî afirandina toponîmên nû ye ku cihê yê kurdî dadigirin û ev di heman demê de stratejiya herî înkarker a nasnameya kurdî ye (bin. Akin, 2013: 286-290). Qismek ji van rê û rêkarên navandinê di cewher de ji aliyê lijneya berpirsiyar a navguhertinê ve wekî rêbaz hatine hilbijartin. Li ser stratejiyên lijneya navguhertinê, di destpêka Sempozyûma Cihênavên Tirkî (*Türk Yer Adları Sempozyumu*) de Gökçeer (1984: 4-5) hin biryarên bingeîn diyar dike ku Lijneya Navguhertinê li ber çavan digire. Ji wan biryaran çend heb bi vî rengî ne:

* Ew navên tî guherin ên ku ne bi tirkî ne, telafûz û binyada wan ne li gorî qaîdeyên zimanê tirkî ye an jî ji ber telafûza xwe ya nêzîk ve dibin sebebê tevliheviyê, wateyeke baş nadin û bereksê fêhma civakê ne, an jî hestên civakê rencîde dikin.

* Navên ku bi tirkî ne, lê li gorî devoka herêmî telafûz an jî binyada wê xerab bûye, li gorî bikaranîna wan a di zimanê nivîskî de tî guherandin.

* Navên cihan ên biyanî nabe ku bi bergindê wan ên tirkî ve bî guhertin. Lêbelê, ew navên kevn dikarin bî wergerandin yê ku wî cihî ji hêlên sirûştî û topografîk ve teswîr dikin.

* Wexta ku nav hatin guhertin, divê ew nav neyên lêkirin ên ku bi telafûza xwe ya nêzîk ve navê kevn tînin bîra meriv.

* Navên ku ji aliyê xwecihên herêmî ve nehatine lêkirin ên ku meriv texmîn dike ku bêbingeh in û ji ber ku dirêj in (gelek peyvan dihevin) nivîsandin û hilberîna xerîteyan de astengiyê derdixin, tîn kurtkirin û guhertin.

Herçiqas vê sempozyûmê hin xalên serekî yê navguhertinê rave kiribin jî, dema ku sempozyûm dihat lidarxistin, jixwe para pirtir a navan hatibûn guhertin û gelek kêr nav mabûn ku nehatibin guhertin. Îcar dema ku meriv bi renekî giştî li guhertina navê gundên Agiriyê dinêre, meriv bi rihetî dibîne ku hevgiriyek di navbera rêbazan de tune. Dîsa jî meriv dikare stratejiyên binavkirinê yê ku hatine tercîhkirin, ji nimûneyan derîne. Herçiqas dabeşkirin/tesnîfeke gişgir nebe jî di vê babetê de, xebata Erkinay Tamtamiş (2019) ya bi navê *Mardin'de Değiştirilen Yer Adları Üzerine Bir Tasnif Denemesi* li ser navên guherandî tesnîfekê diceribîne ku meriv dikare li ser navên guherandî yê li bajarine din jî bi guherînan ve bisepîne. Erkinay Tamtamiş, eynî wekî Akin (2013) stratejiya wergerandina navan digire dest

û wê di bin du binbeşan de dinirxîne û herwiha çend stratejî û rêyên din ên bi vî rengî jî pêşniyaz dike:

1. Cihênavên bi rêya wergerê hatine guherandin
 - a) Cihênavên bi wergera yekser/rasterast hatine guherandin
 - b) Cihênavên bi wergera qismî hatine wergerandin
2. Cihênavên ku di navbera navê wan ê kevn û nû de pêwendiyê wateyî heye
3. Cihênavên ku bi hin guherînên dengî yê li ser navê kevn encam dane
4. Cihênavên tesadîfî/bêsebeb
5. Cihênavên ku nehatine guherandin

Di navlêkirinan de yek ji wan rêya herî berbelav wergerandina navên bi zimanên din e. Ev rêbaz ne tenê di guhertina navê gundan de hatiye bikaranîn, herwiha li Tirkîyeyê di tesbîtkirina hin navên riwekan de jî gelek caran hatiye ceribandin. Akin diyar dike ku adaptasyona toponîman forma wan a nivîskî ji xwe re dike hedef, lêbelê werger asta watesaziyê digire nav xwe û bi îlûzyona parastina navê kurdî qisevanan dixapîne (2013: 289). Di guhertina navê gundan de, wergerandin, bi du cureyan pêk tê. Di ya ewil de, dema werger tê kirin, temamiya navê bi erebî, kurdî, ermenî an jî rûmî bi rengekî yekser tê neqîlkin. Di ya duyem de, bi taybetî di navên hevdudanî de parçeyê navê cih tê wergerandin, parçeyê din ji ber sedemên cihêreng an jê tê avêtin an jî bi rengekî cuda tê wergerandin.

Li vir bi nimûneyên ji toponîmên Agiriyê ve stratejiyên serekî yê danîna navên nû li ser navê gundan tê nîşandan. Helbet, li seranserê Tirkîyeyê heman stratejî nehatine sepandin, dibe ku li gorî guherîna zimanê armanc, hin stratejî jî pê re guherîbin. Di xalên li jêrê de, tesnîfeke tîkel a nû tê bikaranîn ku Erkinay Tamtamiş (2019) ji bo Mêrdînê tetbîq kirine û Akin (2013) di xebata xwe de li ser pratîkên navguhertinê yê çar dewletên cuda destnîşan kiriye. Lewra, di encamê de tesnîfeke tîkel û nisbeten nû derdikeve holê ku li ser hin nimûneyên li bajarê Agiriyê di pêş

dikeve. Di vê çarçoveyê de, ev senifandina stratejiyên navguhertinê hatine destnîşankirin û stratejiyek⁶⁸ jî lê hatiye zêdekirin:

Wergera yekser a cihenavan: Di vê kategoriyê de, ew nav cih digirin ku li Agiriyê bi rengekî yekser ji zimanê kurdî bo zimanê tirkî hatiye wergerandin. Navên bi vî rengî ne kêm in, lê di her tabloyê de nimûne bi şeş heban hatiye sînordarkirin an na nimûne gelek in. Hin toponîmên ku tên wergerandin hevdudanî ne. Wate her du beşên peyvê jî tên wergerandin.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Avtunne	Avtine	Susuz	Panos
Mollahudeyda	Mele Xudêda	Tanrıverdi	Avkevîr
Sağırtaş / Zağonk	Kevirê Ker	Sağırtaş	Agirî (navend)
Avamasiya	Avamasiya	Balıksu	Agirî (navend)
Gevrigejo /Gevrigezo	Kevirê Kejo	Sarıtaş	Agirî (navend)
?	Şikeft	Mağara	Avkevîr

Tablo 8. Nimûneyên wergera yekser a cihenavan

Wergera qismî ya cihenavan: Di hin navê gundan de, wergera yekser nehatiye tercîhkirin lê bi taybetî di wan navên du parçeyî de tercîha wergerê qismî ye. Wate, qismek ji toponîma hevdudanî tê wergerandin, qismê din jî wekî xwe dimîne. Wisa xuya dike ku ev pratîk jî bi qasî wergera rasterast berbelav e û di gelek nimûneyan de tê dîtin.

⁶⁸ Li vir stratejiya bi navê “Wergera bereks ya cihenavan” di çarçoveya vê xebatê de lê hate zêdekirin.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Gevirgevrik	Kevirgewrk	Dokuztaş	Giyadîn
Girekol	Girekol	Doğutepe	Agirî (navend)
Kırkan	Qîrka	Yanıkdere	Zêtkä
Pozmüezzin	Pozmezina	Uludal	Zêtkä
Girkop	Girgopa	Tanıktepe	Bazîd

Tablo 9. Nimûneyên wergera qismî ya cihenavan

Wergera bereks ya cihenavan: Stratejiyeke kêmqeydkirî ya guherandina navê cihan jî wisa diyar e ku bi rengekî dijber rûdaye. Ev dijberî, ne bi awayekî tam dijwtate ne lê di pêwenda têkiliyên hêzê de li hember hevdu ne an jî dijberiyê wateyî dihevin. Nimûneyên bi vî rengî kê m in. Bergindê navê kevn de cîbicîkirina navekê ku wateyêke dijber dide, bi xwe re gotara li pêş a desthilatê jî diyar dike.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Kurdali	Kurdalya	Türkeli	Zêtkä
Köleköy	Kole	Hürriyet	Zêtkä

Tablo 10. Nimûneyên wergera bereks a cihenavan

Wergera ku pêwendiyê wê ya wateyî bi navê kevn re heye: Di vê stratejiyêke binavkirinê de, di navbera navê kevn û nû de pêwendiyê wateyî heye. Helbet, di paşxaneyê de ne mimkin e ku meriv pê derxe bê ka ev stratejî keyfî ye an jî bi armanckirî pêk hatiye.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Tendûrek	Tendûrek	Yanıkçukur	Gîhadîn
Koçak	Kuçeka	Sağrıca ⁶⁹	Panos
Koto	Qoto	Ortayokuş	Agirî (navend)
Başkend/Başköy	Başkend	Başköy	Bazîd
Karpalu	Karpalo	Aydıntepe	Zêtkâ
Kanistiri	Kanîsitûrî	Balkaynak	Agirî (navend)

Tablo 11. Wergera ku pêwendiyêke wê ya wateyî bi navê kevn re heye

Adaptasyonên dengsazî û rênivîsî û keyfî: Di gelek nava de, ji peyva heyî formeke tirkî ya rêzimanî hatiye çekirin ku li standarda zimanê tirkî re jî li hev dike. Ev adaptasyon carcar li ser wan peyvan tê sepandin ku di kurdî, tirkî, erebî an jî farisî de bikaranîneke wan a hevpar heye.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Çalı	Çalê	Çalı	Bazîd
Ramazan	Remedan(a)	Ramazan	Zêtkâ
Kazi	Qazî	Kazlı	Agirî (navend)
Gulice	Gulîce	Güllüce	Panos
-	Goma Xatûnê	Hatunkomu	Xamûr

Tablo 12. Nimûneyên adaptasyonên dengsazî, rênivîsî û keyfî

Afirandina cihên navê nû: Di vê cureya guherîna navê cihan de, nav ne ji aliyê wateyê ve, ne jî ji aliyê rênivîsê ve dişibe cihên navê berê û bi tu rengî navê berê bi bîr

⁶⁹ Bi tirkî tê wateya “girik û berpal”.

naxe. Ev di heman wextê de stratejiya herî berbelav e ku li Tirkîyeyê hatiye tetbîqkirin û li Agirîyê jî ev stratejî serî dikêşe. Li gorî Akin (2013: 289-290) ev stratejî pratîkeke keyfî ye ku giringiya dengêya hêzan tîne ziman.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Gürvîran/Girberan	Girberan	Sarıçavuş	Bazîd
Heştö	Heyştö	Söbêtaş	Zêtkä
Şadiya	Şadya	Yığıntaş	Zêtkä
Çilkani	Çilkaniya	Güvence	Zêtkä
Aliksan	Hêlikсан	Çukuralan	Agirî
Kurinevrûz	Kornewroz	Yanelyol	Agirî

Tablo 13. Nimûneyên afirandina cihênawên nû

Cihênawên ku nehatine guherandin:⁷⁰ Hin navê cihan ên ku ji peyveke hevpar a kurdî û tirkî pêk tîne lê di tirkî de jî li kar in. Ew nav wekî xwe mane û nehatine guhertin. Dîsan jî ev navên ji heman kokê tîne ên ji aliyê wateyê ve jî nêzîkî hevdu ne, li ser rênivîs û telafûzê dikarin li gorî herdu zimanan ji hev cuda bin.

Navê Berê		Navê Nû	Navçe
Bi Rênivîsa Tirkî	Bi Rênivîsa Kurdî	Bi Rênivîsa Tirkî	
Gültepe	Gultepe	Gültepe	Bazîd / Dutax ⁷¹
Çiftlik	Çiftlik	Çiftlik	Bazîd
Gültepe	Gultepe	Gültepe	Xamûr

⁷⁰ Hin navê gundan nehatine guhertin lê dîsa jî ji ber cudahiyên di navbera zimanê kurdî û tirkî de ji aliyê dengsazî û telafûzê de gelek caran ferqêke eşkere heye di navbera

⁷¹ Heman nav li herdu navçeyan jî heye û herdu jî pêrgî guherîna navan nehatine.

Esmer	Esmer	Esmer	Dutax
Sincan	Sincan	Sincan	Dutax
Dedeli	Dedelî	Dedeli	Panos

Tablo 14. Nimûneyên cihên navên ku nehatine guherandin

Wekî dawî, meriv dikare gelek tesnîfên din jî destnîşan bike ku ne li ser awayê guhertina navan lê li ser mahiyet/wateya wan re têkildar in, lêbelê dikeve derveyî çarçoveya vê xebatê. Bi kurtî meriv dikare bibêje ku hin navên ku li gundên Agiriyê hatine lêkirin (guhertin) jî aliyê wateyê ve bi taybetmendiyên sirûstî re têkildar in: *Boztoprak, Otlubayır, Kumluğecit, Düzyayla, İkizgöl, İkiyamaç, Yassıkaya, Bayıraltı*. Hin nav zêdetir bi faûnayê re têkildar in ên wekî; *Kazlı, Sarıdana, Bozkurt, Karaca, Yılanlı*, hin jî bi florayê re yên wekî *Kabakköy, Balçışek, Otluca*. Helbet hin nav jî bi mefhûmên din re têkildar in ên razber an jî etnîk. Bi giştî meriv dikare bibêje ku navên ku hatine lêkirin cihêrengiyeke wateyî, naverokî û cureyî di hewînê û gelek rê û rêbazên cuda di venavandinê de hatine tercîhkirin.

3.3. (Hewla) danîna navên kurdî li park û kolanan

Ev du deheyên dawî, li hin bajarên kurdnişîn şaredarî di wê hewldanê de ne ku navên hin taxên nû bi kurdî binavînin an jî navên kurdî daynin dewsa hin navên kevn ê tax û kolanan. Pratîka paş ve vegerandina navan (restorasyon) an jî binavkirinên kurdî bi taybetî piştî salên 2000î dikeve rojevê, di demekê de ku DTP (*Partiya Civaka Demokratîk*) hin şaredariyan bi dest dixe. Hewldanên binavkirinên park, kolan û taxên bajêr, bi taybetî li Batman û Diyarbekirê jî aliyê şaredariyan ve pêngavên berçav tên avêtin. Ji ber ku li gorî Qanûna Şaredariyan hejmar 5393 û xala 18em guherîn û tesbîten li ser navên kolan û kuçeyan di bin însiyatîfa meclîsa şaredariyê de ye û li gorî xala 81em jî bo danîna navekî nû jî nivî zêdetir endamên meclîsa şaredariyê divê biryar bidin, ji bo guhertina navekî heyî jî du ji sê para sercem endamên meclîsê divê biryarê bidin û ev biryar jî aliyê parêzgarî û qeymaqam ve bê pesendkirin. Bi vî rengî, li gorî encama hîlbijartinên herêmi bîdestxistina sercem ji nivî zêdetir piştgiriya endamên meclîsê wekî xala bingeîn derdikeve pêşberî me (Günel, 2012: 177).

Desthilata nû ya siyasî angû DTP û partiyên peyrevên wan, ketin wê hewldanê ku bîr û raya xwe li ser mekan diyar bikin û bi guhertinên navan re îşaretên ziman îdeolojiya xwe berçav bikin. Lewra, her desthilatdarî bi rêya serrastkirin û (ve)hilberînên mekanî dixwaze tesîrê li jiyana, ziman û mekanê bike û rengê xwe di deqa bajêr de nîşan bide. Di sala 2000î de, dema ku Abdullah Akın dibe şaredarê Batmanê navê 200 heb kolanî diguherîne. Stratejiya (ve)navandinê ya şaredariyê ne tenê rasterast lidişderketina raboriyê bû ku gelek navên kurdî hatibûn jêbirin ji ser rûyê erdê, lê wê di heman demê de hewl dida ku hesasiyeteke kurdî ya çandî û siyasî bîne nav qada giştî ya jiyanê rojane (Jongerden, 2009: 43). Jixwe, dewletên modern qadên polîtîk ên neteweyî ava kirine ku tê de kurd ji temsiliyeteke pêpar bûn û nedihatî temsîl kirin (Vali, 2017: 62), lewma meriv dikare bibêje ku ev temsîliyeta herêmî ya kêr dihişt ku zimanê kurdî yê bi salan qedexekirî di qada giştî de dîtbar be û bê temsîl kirin.

Navên Qebûlkirî	Navên Redkirî	Navên serrastkirî
Amidiye Caddesi Barış Park Mem u Zin Park 8 Mart Kadın Park Ahmed Arif Park Özgür Park Ahmede Hane Caddesi Ahmet Arif Caddesi Ayşe Nur Zarakolu Caddesi Musa Anter Park Şemse Allak Park Ekim Park Gülistan	Jiyana Azad Park Zembilfroş Park Aşiti Park 33 Kurşun Park Çarçira Park Yek Gulan Zeynel Durmuş 1 Gulan Park Şilan Roşna Rojda Nefel Daraşin Beybun Berfin	Ciwan Park (wekî Civan Park hatiye qebûl kirin) Seyrangeh Park (wekî Seyrangah Park hatiye qebûl kirin)

Tablo 15. Navên erêkirî, redkirî û serrastkirî yên li Diyarbekirê⁷²

Günel (2012) di vekolîna xwe ya li ser guhertina navê kolanên ên Batmanê de lîsteyên navan ên pêşniyazkirî dide û destnîşan dike ku bi dehan navên kevn ên kolan û kuçeyan hatine guhertin. Herwiha, li Diyarbekirê jî bi heman rengî gelek navên

⁷² Jongerden (2009: 49).

kurdî hatine pêşniyazkirin û hin ji wan navan hatine pejirandin û hindek jî hatine redkirin.⁷³ Hinek navên ku hatine pêşniyazkirin, ne xwediyê taybetmendiyeke herêmî an jî kurdî ne yên wekî Mahatma Gandhi û Omer Muhtar. Ev navên navdarên antî-kolonyal ku bi seredorî li Hindistan û Lîbyayê, li hember desthilata Brîtanî û Îtalî şer kirine bi awayekî balkêş nehatine qebûlkirin ji teref parêzgariyê ve ji ber helwesta wan a antîkolonyal (Kuran, 2010: 140).

Li ser hin navên pêşniyazkirî bi giştî nelihevkirin û redkirin hebin jî pêngavên biçûk ji bo nivîsandina “deqa bajêr” hatiye avêtin (Jongerden, 2009: 51). Ev pêngavên li ser deqa bajêr, hindik be jî dîtbariya zimanê kurdî li bajêr zêde kiriye û di qada giştî de ew berçav kirine. Deqa bajêr a kevn ku temsîlên polîtîkayên raboriyê dikir û bi gelek serhatî, pratîkên cihêreng ên desthilatê ve neqîşandî ne, êdî rastî deqeke nû tê, bi vî karî, bajar dibe ew mekanê semiyotîk ku bi berdewamî tê nivîsandin û jêbirin ji aliyê danerên cuda ve. Di vê çarçoveyê de, deqa bajêr ji îdeolojî, nasname, dîrok, çand û ziman re dibe jêder û gelek tebeqeyên wateyê saz dike ji bo xwecihên ku wê dixwînin. Herwiha polîtîkayên desthilatê ku berê bi rijdî li hember “deqên dereke” derdiket, êdî li hember nivîsandina deqeke din li ser destxeta bajêr bi qismî be jî bêhnfirehî nîşan dide.

Jixwe, piştî salên 2000î, guvaşên li ser binavkirinên kurdî sist bûne û helwestên rayedarên siyasî navên kevn di nav gel de zêdetir asayî kirine. Bo nimûne, dema ku serokkomar Abdullah Gül, di sala 2009an de li Bedlîsê ji bo *Güroymakê* navê Norşînê bi kar anî, hewayeke erênî derheq vegerandina navên kevn de çêbû.⁷⁴ Herwiha serokwezîrê wê demê Recep Tayyip Erdoğan jî piştgiriya dide gotina serokwezîr û destnîşan dike ku Atatürk bi xwe jî navê Norşînê bi kar aniye.⁷⁵ Lêbelê

⁷³ Bo guhertina navên kolanan li herdu bajaran, bin. Günal (2012), Jongerden (2009) Kuran (2010).

⁷⁴ “Güroymak Norşin olmak istiyor,” *ntv*, (11.8.2009). Berdest e li vir:

<https://www.ntv.com.tr/turkiye/guroymak-norsin-olmak-istiyor,aWZCBW9UWkmOgOVvsf9ABw>

⁷⁵ “Erdoğan: Atatürk de Norşin diyor!” *ntv* (11.08.2009). “benim ülkemin insanı nerede neyi, kime söyleyeceğini çok iyi bilir. Bunu senden öğrenecek değil. (...)Cumhurbaşkanımızı, Bitlis'te Güroymak ilçesiyle alakalı 'Norşin' dedi diye eleştirdiler. Aç o zaman Atatürk'ün Nutuk kitabını o kitabın içinde Norşin sakinlerine nasıl hitap ettiğini gör. 'Norşin' diyor, 'Norşin halkı' diyor.” Berdest e li vir: <https://www.ntv.com.tr/turkiye/erdogan-ataturk-de-norsin-diyor,YRvTMaJO8UC-KfaacJWxpQ>

lêvegerandinên navan bi çend pêngavên biçûk ve bisînor ma. Dîsa jî ev helwest û gotinên erênî bi giştî tesîr li biryarên din jî kir. Herwiha bi tesîra hewayê erênî ya ku hest pê dihat kirin, li Diyarbekirê li hemû tabelayên gundan ji sala 2009an û vir de bi du zimanî ne: Tirkî û Kurdî.⁷⁶

Xêncî duzimaniya tabelayan, bi çêbûna hewayê erênî û demokratîk re navê hin gund û navçeyan hatin îadekirin. Yek ji wan jî navê Tîlloyê bû ku bi 18ê Gulana 1990an de wekî *Aydinlar* hatibûn tirkîkirin. Di heman wextê de, bi nav re statuya wê jî ji nehiyetiyê ber bi navçebûnê guherîbû. Di sala 2013an de projeyasayek tê amadekirin ku tê de daxwaza îadekirina navê Tîlloyê jî dibe. Li gorî sebebê vê projeyasaya nimre 2/1783, “ji ber ku navê vê navçeyê li seranserê dinyayê wekî Tîllo tê zanîn û navê *Aydinlarê* ne li herêmê ne jî li dinyayê nehatiye qebûlkirin. Û lewma jî ev problema nav roleke neyînî lîstiyê li ser pêşketin û danasîna navçeyê de” Piştî hin mizakere û şerhên mixalifetê guherîna daxwazkirî ya vê navçeyê encam da. Lê mixabin, ev pêngavên biçûk veneguhêrîn sererastkirineke qanûnî û mîna gelek mînakên dinyayê proseseke berfireh a restorasyonê dest pê nekir. Nişanyan (2010: xvii) destnîşan dike ku heta nika ji sedî zêdetir deverên meskûn ji prosesa qewî zehmet a burokratîk re derbas bûye û vegeriya li ser navê xwe yê berê.

Nîqaşên li ser navan bi gelemperî bi guherîna şaredariyan ve gurr bûne û her şaredariyê li gorî hizr û baweriya xwe hewl daye navan biguherîne an jî navên nû li gorî helwesta xwe ya siyasî danîne. Bi gelemperî dema meriv dinêre, tê dîtin ku hewldanên li ser binavkirinên bi kurdî li Agiriyê kêmtir çêbûne.

3.4. Dubendiyên navê cihan: dîmena zimên û berxwedana sembolîk

Navguhertinên li navenda bajarên, ji deverên gundewar zêdetir rastî guhertinan tên. Ev ji ber vê yekê ye ku bajar dînamîk in û zêdetir dibin mekanê têkiliyên hêzê. Herwiha ji ber ku bajar her diçin fireh dibin, tax, park, kolan, kuçe û rê û pirên nû her

⁷⁶ Ji kurdîbûnê qesit, ne bi nêrîneke etîmolojîk destnîşankirina koka peyvan e, lêbelê hemû ew nav in ku di nav civata kurd de tên bikaranîn çî bi tirkî û ermenî çî jî bi zimanekî din. A rast di seranserê vê xebatê de navê cihan ên “kurdî” li ser vê esasê tê bikaranîn. Ji ber ku kurdan ew nav ji berê de bi kar anîne û ew hebandine. Lewma dema ku navên kurdî tê gotin ji bo pratîkbûnê navên ji kokên din nayê behskirin.

tim li bajêr zêde dibin, ev yek jî pêdiviya navlêkirinê zêdetir dike. Xêncî navguhertinê bi xwe, navlêkirina tax, kolan û kuçeyên nû jî diyardeyeke xweserî bajaran e. Çawa ku deverên meskûn ên wekî gund û ji wan biçûktir, bi taybetmendiyên xwe ve deqên bîra gundewar a van deran be, wisa jî ji aliyê toponîmiya bajarî ve navê tax, bulwar û kolanên jî çavkaniyên zanyarî yê mihim in ku cografyaya bîra civakî derdixin mexderê (Baysan & Kara, 2014: 24). Helbet, gelek têkiliyên hêz/desthilatê li ser mekan rû didin, bi guherînan re serdestbûna dêsmenên îdeolojîk ên cuda rengê boçûn û hizrên xwe tev li nivîsandin û jêbirina “deqa bajêr” dikin, bi van kiryanan ve jî, navenda bajaran dibe babeta nirxandin û xwendinên curbicur, bi taybetî bi ser navguhertinan re. Light (2004: 153) di vê derbarê de îşaretê bi wê yekê dike ku navê kolanên -wekî bîranîna cemawerî yên din-rastî xwendin û şiroveyên cihêreng tê, lewma jî ew dibin navenda têkoşîn û berxwedanê li ser giringiya raboriya ku ew bi bîr dixin. Danîna navan li tax û kolanên, hem di navbera cemawerên cuda de dibin sebebê dubendiyan, hem jî dikarin bi rengekî wisa pêk bên ku neyeksaniya civakî di hêla temsîla zimanên de rû bide. Ev yek, gelek derfetan bimifa jî bi pêş dixê ji bo vekolerên ji qadên zimannasiya civakî, semiyolojî, dîmena zimanî û hwd. Vekolînên li ser nivîsandina deqa bajêr destnîşan dikin ku gelek hokarên cihêreng di paşxane û armanca binavkirina kolanên de hene û ev bûne babeta gelek vekolînan (Azaryahu, 2009: Alderman, 2008).

Eger meriv li pratîka li bajarê Agiriyê vegere, mîna gelek bajarên din ên li Tirkîyeyê, ji aliyê binavkirinan ve tê dîtin ku gelek çalak e, bi taybetî van deheyên dawî. Bi taybetî, piştî ku şaredariya bajêr di sala 2014an de kete destê BDPyê, piştî salan di bîlboardan de reklam, pîrozbahî û agahdariyên bi kurdî xuya bûn. Ev yek ji bo vî bajarî gelek nû bû. Helbet, bi guherîna rêveberiya bajêr re di vê derbarê de di demên cihê cihê de hin midaxele li deqa bajêr hatine kirin.

Dema ku di sala 2015an de rayedarên BDP (Partiya Aştî û Demokrasiyê) ên li Agiriyê ragihandin ku ew ê bînin navê çend taxan û kolanên biguherînin, helwesteke dij-hegemonîk a vegêraneke nû li bajêr pêş ket. Di vê çarçoveyê de, biryara meclîsa şaredariyê hate derxistin û di encamê de biryar ew bû ku navê du tax û kolanekî bê guhertin. A rast, ev hewldaneke gelek biçûk bû ku tenê armanc dikir ku sê navan

biguherîne. Bi vê mebestê, hate pêşniyazkirin ku navê Taxa Fevzi Çakmak wekî “İhsan Nuri Paşa”, navê Taxa Alparslan wekî Selahattin Eyyubi û navê Kolana Erzurumê jî wekî Yaşar Kemal bê guhertin.⁷⁷ Biryarên meclîsa şaredariyê ya li ser navên İhsan Nuri Paşa û Selahattin Eyyubi nehatin qebûlkirin ji aliyê parêzgariyê ve. Beramber vê, navê Yaşar Kemal hate qebûlkirin û heta nika jî ev nav di meriyetê de ye. Yaşar Kemal demeke kurt berî vê qerara binavkirina şaredariyê emrê Xwedê bi cih anîbû.

Nav	Cure	Navê Pêşniyazkirî	Encam
Favzi Çakmak	Tax	İhsan Nuri Paşa	Nehate Erêkirin
Erzurum	Kolan	Yaşar Kemal	Hate Erêkirin
Alparslan	Tax	Selahattin Eyyubi	Nehate Erêkirin

Tablo 16. Navên ku ji aliyê şaredariyê ve hatine pêşniyazkirin.

Di van pêşniyazan de, bi taybetî tê xwestin navê Taxa Fevzi Çakmak bi navê İhsan Nuri Paşa re bê guhertin. İhsan Nuri Paşa ku di dewra Osmanî de di artêşê de bi Fevzi Çakmak re tev kar kiriye, di navbera salên 1926-1930î de, wekî serekekî tevgera Xoybûnê, ji serhildana Agiriyê re pêşengî kiriye.⁷⁸ Di vê pêşniyazê de, du

⁷⁷ “Ağrı’da bazı mahalle ve cadde isimleri değiştirildi,” *Cnnnturk*, (02.03.2015) berdest e li vir: <https://www.cnnnturk.com/haber/turkiye/agrida-bazi-mahalle-ve-cadde-isimleri-degistirildi>

⁷⁸ Serhildana Agiriyê, rol û tesîreke xwe ya gelek mezin heye li ser navguhertînen li Agiriyê. Ji ber ku demeke kurt piştî serhildanê hem navê bajêr tê guhertin û hem jî statuya Bazîdê jî pê re dadikeve asta navçebûnê. Herwiha guherîna navenda parêzgehê ji Bazîdê ber bi Agiriyê dîsa bi rewşa siyasî ya wê demê re girêdayî ye. Rêxistina Xoybûnê ku di sala 1927an de hatibû damezirandin û heta 1946an karê xwe meşand, nûnertiya neteweperestiya kurdî (Bozarslan, 2008: 849) kir û di navbera salên 1927-1930an de serhildana Agiriyê bi rê xist. Serhildana Agiriyê di bin serpereştiya rêberê leşkerî İhsan Nuri Paşa ve tê meşandin. Di heman demê de, İhsan Nuri Paşa yek ji wan kesê ewil e ku serî li navguhertîneke dijber daye. Dema ku Komara Agiriyê li çend gundên li kîrê Girîdaxê (Çiyayê Agiriyê) tê ragihandin, İhsan Nuri Paşa gundekî nêzîkî bajêr, wekî payîtexta demkî ya serhildanê destnîşan dike û navê gund wekî *Kurdava* diguherîne. Navê gund ê berê *Türkmen* e (bi kurmancî,

sembolên leşkerî û bîrên dijber li hev diqelibîn û li ser temsiliyeta wan a mekanî û bîranînê berxwedaneke sembolîk rû dida. Bi taybetî, bi Îhsan Nurî Paşa re şerê serhildana Agiriyê bi bîr diket û semboleke azadîxwaz û berxwedêr a xwedî pozîsyoneke leşkerî derdiket pêş. Herwiha, hatiye daxwazkirin ku di dewsa Alparslan de Selahattin Eyyubi bê bicihkirin, lê ev yek jî nehatiye qebûlkirin herçend ku Selahaddîn ne aktorekî siyasî ye vê sedsalê ye jî. Pêşniyaza Kolana Erzurumê ber bi Yaşar Kemal hatiye qebûlkirin û îro jî ev nav li ser heman kolanê ye. Yaşar Kemal, wekî romannivîsekî serkeftî tevkarîyeke mezin li edebiyata zimanê tirkî kiriye û bi eslê xwe jî kurd e. Ew di heman demê de kesekî wisa ne ku herdu civakên etnîk jî lê xwedî derdikevin û jê hez dikin lewma wekî problem nehatiye dîtin ku navê wî hatiye qebûlkirin. Ji van hersê navên pêşniyazkirî tê fêmkirin ku di van nava de armanceke bîranînê (*commemorative*) hatiye daxwazkirin, ew ne peyvên cografîk û çandî ne lê zêdetir ên şexsiyetên dîrokî ne. Azaryahu (1996) û Rose-Redwood (2008) destnîşan dikin ku binavkirinên xwedî taybetmendiyeke bîranînê, raboriyê tînin dema nika û cihetên cihêreng yê dîrokê tînin dem û mekanê jiyana herrojî.⁷⁹ Dîsa li gorî Azaryahu “tesîreke serekî ya bibîrxistinê (*commemoration*) ew e ku dîroka bibîrxistî dibe tecrîbeyê bi awayekî çandî parvekirî (2009: 54).

Myers li ser rola neteweyên kêmine di babeta navandina cih de, bi awayekî berteng bi dasepandina dewlet û îdeolojiyên bijare û serdest re girê nade, ji ber ku bi raya wî navandina cih û sînorexêzî wekî stratejî tînin xebitandin hem ji aliyê komên xwedan hêza civakî ve û hem jî ji aliyê wan koman ve ku nispeten ji hêzê bêpar in (Myers, 2009: 96). Ev helwesta li dijî dasepandina îdeolojiya serdest li ser bîdestxistina nîrx û sermayeya sembolîk, li gelek bajarên kurdnişîn dikeve rengê berxwedanekê. Li ser vê yekê Alderman (2008) destnîşan dike ku berxwedan di navbera cemawerên serdest û cemawerên perawêzistî de rû dide. Di çarçoveya vê yekê de, Alderman (2008:196) du çarçoveyên çemkî bi pêş dixê, yek binavkirin wekî sermiyana sembolîk (*naming as symbolic capital*) û ya din binavkirin wekî

Tirkmena) û Îhsan Nurî di bîranîna xwe de dibêje ku wî bi xwe ew navê Turkmen guhertiye (Nuri, 1992: 38).

⁷⁹ Herrojî (*gündelik/everday*) di wateya tiştê ku her roj pêk tê, bin. Malmîsanij (2012: 124).

berxwedana sembolîk (*naming as symbolic resistance*). Ev herdu boçûn dikarin di çarçoveya pratîka li Agiriyê de bê analîzkirin. Li gorî boçûna “binavkirin wekî sermiyana sembolîk” binavkirin her tim ji aliyê cemawerên bijare û serdest ve nayê kontrolkirin, pardarên perawêzxistî (marjînal) jî dikarin dest bidin ser binavkirinê û wê bi dest bixin da ku xwedî deng û biryar bin li ser destnîşankirina nêrîna raboriyê ya ku li ser dîmena zimên neqîşandin (Alderman, 2008: 196). Li vir, wekî pardareke perawêzxistî aktorên kurd ên îdareyên herêmî, li ser dîmena zimanî dibin xwedî biryar û raboriyek tê pêşkêşkirin ku hatiye neqandin û temsîla hin xalên nasnameyî û cihanbîniyê dike.

Li Agiriyê binavkirinên toponîmîk, wan prosesên dîrokî û guherînên hizrî yên civakî nîşan didin ku bajar tê re derbas bûne. Ev, di heman demê de, şopa dubendî û biryarên nelihev ên têkiliyên desthilatên cuda, bîrên cuda û dubendiya li ser serdestbûna navên bibîranînê jî li pey xwe dihêle. Mîna hemû îşaretên şaristaniya bajarî, nav, sembol, peykerên li nav bajêr di vê çarçoveyê de “sermiyana sembolîk” a bajêr pêk tînin a ku li ser xwedîbûna li wê hewl tên dayîn. Li gor Alderman (2008: 196), “binavkirin wekî sermiyana sembolîk temayek e ku dide nasîn ka çawa navê cihan cudahî û statûyekê dixê nav wan erd û merivên ku pê re têkildar in”. Di vê çarçoveyê de “nav dikarin wekî amrazêke kontrolkirinê, nivîsandin û bergewdekirina hin îdeolojiyên çandî û polîtîk bên bikaranîn” (Alderman, 2008: 204) û navenda bajarê Agiriyê dibe şahidê gelek hewldanan ku dixwazin îdeoloji û sembolên dîrokî û çandî lê serdest bibin. Lewma, tecrîbe û raboriya ku navê Îhsan Nurî Paşa sembolîze dike û bi xwe re tîne, di temsîla raboriya azadîxwaz/serxwebûnê re pêwendîdar e.

Hêz û temsîla nav, a rast di wan dubendiyên li ser temsîliyeta navan a di nav bajêr de xuya dibin, lewra gelek aliyan ve guherîna wan dikeve bin kontrol û pesendkirinên fermî yên dewletê. Ji ber ku vegêranên dîrokî yên ku navên kurdî temsîl dikin bi rêya rêberiyên têkildar ve tên astengkirin. Ev prosesa pêşniyazkirin û pesendkirin/redkirinê ya ku li Agiriyê pêk hatiye, li gelek bajarên din ên wekî Batman û Diyarbekirê jî rû daye bi hincetên cihêreng (bin. Jongerden, 2009). Alderman (2008: 204) negotî, nav dikarin bên manîpûlekirin ji aliyê aktor û grûpên civakî yên hakim ve û ew dikarin rê li ber hin vegêranên dîrokî vekin da ku bên dîtin û bihîstinê, beramber vê, ew dikarin temsîlên din jî bidin bêdengkirinê. Wate,

binavkirina ku mafê wê di destê desthilatê de ye, li hember xwe jî cemawerekî derdixe ku dawakariyeke rewa dikin û li hember navandinên ku bîra wan temsîl nakin heta carcar wê biçûk dixin û “şîdeta sembolîk û vederkirinê” (Alderman, 2008: 208) didin sepandin. Lewma ye Myers binavkirinê ji amrazêke kontrolkirin û hêzê wêdetir, di şêweyêke berxwedanê de dinirxîne (Myers, 2009: 95). Cemawerên xwedan hêzeke nispeten kêr a civakî û siyasî an jî bi rengekî gişgir neteweyên kêrîne, bi gelek rê û rêkaran didine ber xwe ji bo ku li hember dasepana hêza serwer li ber xwe bidin û amrazên wê yên manîpulasyon û bînirxkirinê re serederî bikin. Di hin haletan de, cemawereke perawêzxistî bi nihênî an jî bêyî ku bide pêhesandin sistemeke reqîb ya ne-fermî ya navên cografîk bi kar tîne li hember sistema fermî ya navan (Yeoh, 1992). Û xêncî sistema ne-fermî û emelî ya navandinê, berxwedanên demdirêj ên cemaweran li hember navên ku zordarî û şîdetê bi bîr dixê li hin welatan encam daye ku xebatên Alderman (2008) ên di vê derbarê de nimûneyên baş in. Civaka Afro-Amerîkî piştî ku mafên xwe bi dest xwe ve anîn deng û dawakariyên xwe bilind kirin da ku navên kesên xwedan-bende (*slaveholder*) ji kolan û kuçeyan bîr rakirin û bi berdewama berxwedana xwe ve navê Martin Luther King Jr.⁸⁰ li gelek qad, kolan û cihên mihim ên bajêr kirin.

Binavkirinên kolanên di nav bajêr de, xwe dispêre wan paşxaneyan ku tê de berxwedanên politîk, hewldanên pêkanîna nasname û bîreke hevpar û meşrûkirina desthilatê cih digirin. Bi taybetî binavkirinên ku tiştan bi bîr dixin (li Agiriyê bo nimûne, Îhsan Nurî Paşa) tesîra hêza prosesa îdarî li ser prosedûrên semiyotîk nîşan didin, lewre bi rêya wan dîrok dibe rastiyeke berçav a semiyotîk (Alderman, 2009: 54) an jî bi destê desthilatê tê manîpulekirin û ew nav jî wekî sembol û formên temsîlê, tesîrê li ser fêr û feraseta cemawerê dike (Guyot & Seethal, 2007; Helander, 2014). Gelek rehendên politîk û wateyî yên navê cihan hene li navenda bajaran û bikarhênerên wan navan di heman wextê de wateyan jî hildiberînin. Çûnku dema em mekanê bajêr bi tevî hemû wateyên xwe yên semiyotîk wekî deqekî dibînin, ew deq ji aliyê cemaweran ve tenê awayekî nayê xwendin. Wate, ji aliyê xwecihên bajêr ve bi rêya xwendinê cuda gelek wateyên cihêreng derdikevin mexderê. Li vir, meriv

⁸⁰ Heta nika danîna navê Martin Luther King li kolanên bûye babeta gelek xebatan, bin. Alderman û Inwood (2013) û Alderman (2009).

dikare bala xwe bide têkiliyên civakî ku dihêlin wateyên cihêreng li ser mekan bên hilberandin. Ji ber ku wekî cih û warê dabînkirina xwendina deqa bajêr, “mekan [hem] di pratîka hêzê de roleke bingeşîn” (Foucault, 1984: 252) digêre, hem jî giring e ji ber ku “têkiliyên [civakî] li ser wê diqewimin” (Massey, 1984: 54-55).

Gambetti û Jongerden (2011: 382) amaje pê dikin ku têkoşîna li ser mekanê wekî serdest û dij-serdest du forman hildigire û hêz bi rêya kontrola li ser dîtbariya îşaretan (*sings*) –ku meriv dikare bibêje cihên avakirinê– tê avakirin. Ev bidestxistina dîtbariyê an jî qada îşaretan ku serdest pê reng û rûyê mekanê ber bi vegêrana xwe ve dikişîne û mekanê civakî dixê bin hikmê xwe di heman demê de nedîtbariya ên din jî kontrol dike. Lewma ev meseleya dîtbariyê –vegêrana kê û bi çi rengî wê bê temsîlkirin– dibe qada nîqaş û pozberî/dubendiyê ku wekî amrazê hêzê di destê îdeolojiya serdest da ku pê dikare bîrê hilweşîne an jî ava bike (bi taybetî bîra ku wê di xizmetguzariya armancê wî de be). Eger di vê behsê da em dîsa vegehin li ser gotina Gambetti û Jongerden ku dibêjin dîtbariya îşaretên hêzê an jî (tunebûna dîtbariya komên marjînalîzekirî an jî çanda wan) avakirina xeyala hêza civatî û raseriyê bi rengê şênber saxlem dike (2011: 382). Îcar, dema ku meriv li polîtîkayên Tirkiyeyê dinêre, bi qewlê (Haig, 2004) tê dîtin ku çandeke cihêreng a ku ne-tirkî ye bi konseptê netewewî-demokratîk nû-avabûyî re li hev nake, eger bi rêya bişafîna ew çandên kêmkirî ji holê ranebin, çareserîya alternatîf jêbirin, veşartina sembola berçav ê wê çandê ye ku wekî nedîtbarîkirinê (*invisibilisation*) tê binavkirin. Nedîtbarîkirina zimanê kurdî, bi salan xisareke mezin gihandiye dîmena zimanî ya kurdî û pê re jî fêhm û têgihiştina zimanî li hember kurdî. Lewma jî zimanê kurdî nebûye parçeyê mekanê bajêr (*urban space*) û pozisyona wê ya dîmena zimanî ku bi salan bi qedexebûn û biçûkdîtinê qels bûye û normalîze nebûye di nav bikaranînên giştî yên di jiyana rojane de.⁸¹

⁸¹ Nirx û bihayê cihên avakirinê li ser merivan pêdivî bi nirxandin û ravekirineke pir-alî heye. Öktem (2008: 65) dema ku fonksiyona guherîna nava Tirkiyeyê dinirxîne, dibêje ev guherînê bi darê zorê “wateya berî xwe *dirûxîna* û girêdanên dîrokî dinixumîne ... lê bi ser nakeve ku dewsa wan de hesta wateyê ya alternatîf bi cih bike”. Dema ku Fields vê fikra Öktem gengeşe dike, li dijî wê yekê derdikeve ku girêdanên dîrokî ku di her cihên avakirinê de jî ne berdest in “winda nabe heta ku (kesên) xwecih bi xwe ne amade bin, an dilxwaz bin ji bîr bikin her çi dîroka ku heye di toponîmê de”

têkiliyên hêzê yê civatî diyar dibin û cemawer pê tînan manîpulekirin, bi awayekî yekser çavkaniya xwe ji desthilat/hêza serdest wernagirin hêzê yê çandî û pêkve-hebûna prosesên zext û rizayê divê

Hevahengî li gel vê⁸² berxwedana civatî û takekesî ya bi rêya xebitandina navên kurdî rûda, piştî wextan bi sazî û gelek bi sistematîk nebe jî li hember derketinekê dengê xwe li raya giştî da bihîstîn. Ev nerazîbûn, bi amrazên medyayî yê wekî TV û rojnameyan de jî bi rengekî piştî salên 2000î derket holê. Rojnameyên kurdî û tirkî yê weşanên ku bi tevgerên siyasî yê kurdan ra girêdayî ne, dest pê kirin navên kurdî yê hemû gund û bajaran bi tîpên kurdî nivîsandin û di televîzyonan de jî form û telafûzên wan ên kurdî tercîhkirin. Meriv dikare vê diyardeyê di çarçoveya dij-gotarekê de binirxîne ku dixwaze nerazîbûna li hember venavandinê nîşan bide. Helwesta berxwedêr a bikaranîna toponîmên kurdî yê nedîtbarkirî û qedexekirî di wan rojname û televîzyonan de ku bi zimanê tirkî weşanê dikin, diyardeyeke hêjayê vekolînê ye. Digel ku li gelek deveran bi taybetî deverên ku ji aliyê rojavayîyan ve hatine kolonîzekirin,⁸³ gelek kes di jiyana xwe ya rojane de navên kevn ên kolonyal bi kar tînin (Bigon, 2008: 496).

(Field, 2013:22). Bi berdewamî, Field dibêje rewşên wekî jinavbirina bi darê zorê ya nifûsekê, dilxwaziya bo jibîrkirinê ku di demên cuda ên dîroka Tirkîyeyê cîriyane, dihele ku dîrokên (bi girêdayî toponîman) bîr jêbirin (2013: 22). Nirxandina Field a li ser vê babetê ji hin rastî û politîkayên zimanî bêpar e ku di pratîkê de derdikevin holê an jî kêma dema dibêje dîroka ku di toponîmê de heye wîndabûna nabe, eger gel bi xwe nexwaze û amade nebe. Nabe ku meriv xebateke toponîmîk a li Tirkîyeyê bîrê politîka û îdeolojîyên zimanî yê li kar binirxîne û tenê li ser tercîh û dilxwaziya jibîrkirina gel, wîndabûna dîroka toponîman rave bike. Ji ber ku di prosesên navandinê û wergirtina navên nû de gelek hokarên cihêreng li kar in (bin. Giraut û Houssay-Holzschuch, 2016). Dîsa di vê derbarê de, bi taybetî dema ku meriv bi tîgîha hegemonyayê ya Gramsci ve li têkiliyên hêzê yê civatî û manîpulekirinê dinêre, meriv dibîne ku li kêleka zextê prosesê rizayê jî heye.

⁸² Mîna gelek gelên din ên cîhanê kurdan jî, navên ku piştî damezirandina Komara Tirkîyeyê li ser wan hate ferz kirin û jêbirin, bi rihetî qebûl nekirin digel ku bi bîdengî mabîr jî demeke dirêj di pratîkê de piştî bi dehan salan jî navên xwemalî tînan mihefezekirin. Nerazîbûn û bikarneanîna navan ne helwesteke aîdê kurdan e, xêncî kurdan li nav bajarên din ên tirkînişîn an jî ew bajarên ku wextê de xwedî nifûseke kêmbûnê bûn, ev helwest tê dîtin (ji bo zêdetir agahiyan binêre Fields, 2013)

⁸³ Di sala 2005an de, dema ku navê paytextê Afrîkaya Başûr Pretoriya bi rengekî fermî hate guherandin wekî Tshwane ji bo ku hemû bermayiyên kolonyalan ji holê rabe, hin meriv derketin

Rewşa heyî ya bikaranîna toponîmên kurdî û berbelaviya wan a cemawerî gelek bi rengekî xurt bi polîtîkayên giştî yên zimanî re girêdayî ye ku li Tirkîyeyê li kar in. Bi taybetî, zelîna zimanî tesîreke gelek mezin heye li se vê yekê, lewma toponîm ku perçeyek ji repertuara ziman bi xwe ne, di nav civatî de bi ziman re pê emel dibe û bergewde dibe. Rewş û çarçoveyên civatî, ku tê de polîtîkayên hêz û desthilatê jî diyar dibin, bikaranîna ziman a rojane lê bi cih dibe. Eger zext û tadeya li ser bikaranîna zimanekî gelek bi tund û tijî be, wê hingê bi rengekî tebiî ew ziman ji nav çarçoveya xwe ya bikaranînê derdikeve û hebûna wê bi xwe dibe “polîtîk”. Rewşa kurdî ya li Tirkîyeyê ku ne tenê di bin berbend û astengiyên xebardana ziman bi xwe bûn, di heman demê de li ser têgihiştin û fêhma ziman bi xwe jî gelek rê û rêkarên (qaşo) zanistî hatin meşandin. “Bingehên mentiqî an jî (qelbe) zanistî yên vê înkarkirin û nediyarkeriyê texer bi qelemê wan nivîskaran dihatine belavkirin û ragihandin ku endam an jî berpirsên dezgehên dewletî bûn” (Öpengin, 2011: 91). Li gorî Akin, têgihiştin û temsîla kurdî piştî siyaseta qedexekirin û jêdestxistinê gihişt wê radeyê ku kurdî wekî “lehceyeke tirkîyê, ku têkiliya qisevanên wê dewreke mêjûyê de qut bûye ji cemaeta tirkîziman û bi vî rengî mane li herêmen şaxawî/çiyayî û lewma werara wê digel tirkîya resen di heman ciyê re neherikiye” (Vgz. Öpengin, 2011: 91). Wate, ji qedexe û înkarkirinekê wêdetir, tune kirin û şîdeteke gotarî li kar bû li hember şêwezarên kurdî. Lewma, rewş û daneyên ku ji vekolînên li ser toponîmiyê derdikevin di vê pêwendê de ji hevdu cuda dibin. Bo nimûne, Fields (2013) ku xebata xwe li ser toponîmiya Giresunê çekiriye ku piraniya nifûsa wê ji tirkan pêk tê û di zimanê xwe yê rojane de navên kevn bi rihetî bi kar tînin. Li Giresunê, êdî cemawereke li diyarî çav tune ye ku bi zimanê rûmî xeber bide di jiyana xwe ya rojane de. Lê heman rewş ji bo kurdan ne pêkan e, kurd di demekê de wan navên kurdî bi kar tînin, bi gelemperî bi şertê ku bi kurdî xeber bidin. Lewra pratîkên zimanî di vê diyardeyê de daxilî bikaranîn û têgihiştina zimanî ya toponîmîk dibin.⁸⁴ Ji ber hindê, meriv nikare bo nimûne fêhma li ser toponîmên li Agiriyê digel

nerazîbûna xwe nîşan dan ji bo vê venavandinê. Li gorî wan Tshwane xwediyê wateyeke xerab e –tê wateya meymûnê biçûk– û guherandina vî navî jî mesrefeke mezin e (Swanepoel 2009: 100).

⁸⁴ Kurd dema ku bi kurdî xeber bidin, bi gelemperî encax wê demê tercîha cihnavê bajêr bi kurdî dikin, lê heman rewş ji bo xwecihên tirkziman belkî di heman astê de ne pêkan be. Ew tenê di navbera

bajarekî wekî Giresûnê berawird bike û wan di pêwendê de binirxîne. Çunku, xwecihên li Agiriyê hem ji aliyê tecribeya şîdeta zimanî ya salan, hem jî ji aliyê bikaranîna aktîf a zimanê dayîkê ve ji hevdu cuda dibin. Çawa ku tê zanîn wekî dewra osmanî nifûseke li diyarî çav li vî bajarî najî û kesên ku li wir dijîn bi pirr

anî tirkîziman in û ji ber tercîhên xwe yê zimanî rastî tade û zehmetiyan nehatine.

3.5. Pratîkek kêmpêyda: navên duzimanî li rawestgehên taksiyan

Li Agiriyê, di demekê de ku şaredariyê hewl dida çend navên kolanan biguherîne, hewldaneke din jî li ser danîna navên kurdî li rawestgehan bû. Şaredarî piştî ku rawestgehên taksiyan modernîze dike, pêşniyaz dike ku navên kurdî jî li ser tabelayan hebin. Bi vî rengî, rawestgehên taksiyan ên li Agiriyê, di belgeyên fermî de dibin du-zimanî. Ev duzimanîbûna navê rawestgehên taksiyan ji sala 2015an û vir de li kar e. Di vê pratîka binavkirina taksiyan de meriv dikare bibêje ku rola serekî civata sîvîl û rêveberiya herêmî wergirtiye. Lewre di pêngava ku hatiye avêtin ne ji jor de hatiye tetbîqkirin, dilxwazî û tevlêbûna kirêdarê rawestgehan di vê pratîkê de mudaxil bûye. Di xebereyên li ser vê pratîkê de, Gerînendeya Xizmetên Veguhastinê Ezgi Barış, di vê derbarê de wiha xeber daye: “Me bi çêkirina van rawestgehan ve, alîkariyeke maddî da esnafên me yê taksîvan. (...) Hemû esnafên me ji vê xebatê gelek memnûn in. Digel vê yekê, mîna hemû xebatên me yê din, me di vê xizmeta xwe de jî navên kurdî û tirkî bi kar anîn. Em bi xebateke wihareng, armanc dîkin ku kurdî zêdetir bê bikaranîn.”⁸⁵ Wisa xuya dike ku şaredariya wê demê polîtîkayeke du-zimaniyê meşandiye û xwestine kurdî jî li beramber tirkî diyar û dîtbar be.

du navê cihan de tercîhekî dîkin, beramber vê, kurd bi tevî nav, di navbera du zimanan de jî tercîha xwe dîkin. Yek ji wan zimanê fermî yê dewletê ye ku bi navên guhertî pê vegêran, ya duyem zimanê wan ê dayîkê ye ku bi salan e rastî gelek şîdetên sembolîk hatiye û ji qada giştî hatiye vederkirin.

⁸⁵ Ağrı’da taksi duraklarının isimleri Türkçe ve Kürtçe yazıldı” Milliyet.com (14.10.2020) berdest e li vir:

<https://www.milliyet.com.tr/yerel-haberler/agri/agri-da-taksi-duraklarinin-isimleri-turkce-ve-kurtce-ya-zildi-11247754>

Giraut û Houssay-Holzschuch (2016: 8), dema ku prosesên binavkirinê şematîze dikin, sê aktorên serekî diyar dikin ku li ser binavkirinê xwedan biryar in: Hêza Dewletê, Sektora Taybet û Sektora Medenî. Di vê nimûneya rawestgehan de zêdetir a sêyem ango civata medenî rol girtiye. Sektora medenî bi gelek rê û rêkaran dikare daxilî prosesên binavkirinê bibe, ew dikare bi xwe bibe aktor, an jî bibe armanc ji bo aktorên din; dikare di vî karî de gavên pêşeng bavêje û bide destpêkirinê an jî dikare helwesteke bi bertek nîşan bide li hember heman prosesê (Giraut & Houssay-Holzschuch, 2016: 11). Wisa diyar e ku di nimûneya berbehs de, civata medenî, roleke pêşeng girtiye lê di heman demê de piştgiriyeke ekonomîk/teknolojîk jî ji şaredariyê wergirtiye.



Şikil 6. Tabelayên duzimanî yê rawestgehan: Berfîn û Welat

Pratîka duzimanîkirina tabelayên rawestgehên taksiyan û daliqandina hin billboardên bi kurdî li navenda bajêr, qada giştî ji zimanê kurdî re vekir ku nêzîkî sedsalekê bû ku ji bo zimanê kurdî girtî bû ango bi qewlê Haig (2004) hatibû nedîtbarkirin. Helbet, Dema ku “navên cografîk ên giştî li ser îşaretên rê yê trafîqê, avahiyan û nexşeyan û rêyên din berçav dibin, ew tevkarîyeke mezin li dorhêla zimên a dîtbar û ‘dîmena zimanî’ (*language landscape*) dikin (Du Plessis, 2011:

264). Ev pêşxistin û piştgirîdana hewlên berçavkirina zimanê di qadên giştî de, hin vegêranên nû jî bi xwe re li pêş dixe. Lêbelê, di nimûneya Agiriyê de, zimanê kurdî ji temsîliyeteke dîtbarî dûr e ku bikaribe bi tirkî re hevseng be.

Herçiqas, bajarên wekî Diyarbekir, Batman û Mêrdînê dîtbariyeke qismî hebe jî, dîmena zimanî ya li bajarên Serhedê ji ber sedemên cihêreng gelek qels maye. Dîtbarkirina zimanê kurdî di qadên giştî de li Agiriyê giring e, lê ji ber guherîna şaredariyan guherbariyeke mezin di polîtîkayên toponîmiyê de pêk tê. Dîsa jî, hewlên heyî tevkarîyê li normalîzasyona zimanê kurdî dikin. Di vê derbarê de, Du Plessis (2011) destnîşan dike ku dîtbariya ziman xwedî tesîreke bihêz a (ve)meşrûkirinê ye, bi vî rengî jî, ew tesîrê li ser helwestên merivan dikin. Berî her tiştî, êdî ew ziman û nîşaneyên wî tên li diyarî çavan, dibin perçeyek ji wê deqa bajêr ku her xwînerê wê bi rengê dixwîne û fêhm dike. Ji ber ku di nimûneya jor de, ew dîtbarî li ser navendeke danûstandin û têkiliyên merivî ye -rawestgeh- tesîra wê jî zêde dibe. Herwiha navên ku li rawestgehê di heman wextê de li ser taksiyan e û ev di nav mekanê bajêr de *dîmeneke zimanî ya gerok* derdixe meydana û dibe rêyeke asayîkirin û meşrûkirina zimanê kurdî li Agiriyê.

Kontrolkirina qada giştî û dîmena wê ya zimanî bi gelemperî li Tirkiyeyê bi piştgiriya amrazên bihêz ên dewletê pêk tê ku bi gelemperî bi carekî de li ser gel tê ferz kirin ku di encamê da rastî nerazîbûn, dijberî û berxwedanê tê. Lê wekî di nimûneya li jor de jî xuya bû, ev qad bi qismî be jî di bin îradeya aktorên sîvîl û îdareya herêmî de jî dikarin şikil bigirin. Di çarçoveya kolonyal a welatên rojavayî de, xwecihên Hawaii; Aotearoa, New Zealand; û Manankurra, Awistralya lê xebitîne ku navên xwe yên xwemalî li dijî dagîrîkirinê biparêzin û serhatî, hest û nasnameya xwe ya çandî mihefeze bikin (bin. Herman 1999; Kearns & Berg 2009; Kearney & Bradley 2009). Li Tirkiyeyê, helwesteke gelek bi hêz a ku li beramber venanadinê an jî “muhendisiya toponîmîk” pêk nehate ku Jongerden (2009: 33) wê wekî “paqijkirina gotarî ya derekeyan” pêname dike.

Herwiha mîna dewletên rojavayî, wekî nîşanên nerazîbûnan bi protestoyên girseyî dijberiyek nehate nîşandan (bin. Martin Luther King). Kêm be jî bi taybetî ji bo diyarkirin û normalîzekirina zimanê kurdî, hin hewldanên berçav bi taybetî piştî

salên 2000î zêdetir bûn. Meriv dikare bibêje ku li dinyayê li hember polîtîkayên fermî yên (ve)navandinê gelek caran nerazîbûn û berxwedan bi pêş ketiye ku di nav wan de Filistîn, (Cohen & Kliot, 1992) Îrlandaya Bakur (Nash, 1999), Afrîqaya Başûr (Swanepoel, 2009) û gelek deverên din hene. Lewra gelek cihan, cihenav wekî qadeke dubendiyên çandî, dîrokî û civatî dimîne di navbera berxwedana civatî ya ku ne razî ye navên nû bi kar bîne û dewletê ya ku dixwaze bi rêya van nava navnetewesaziyê û hişmendiya neteweyî qewî bike.

3.6. Guhê li guhdariyan: vegêran, çîrok û helwestên toponîmîk

Bi pêşketinên dawî yên qada toponîmiyê re, rola manipûlasyonên îdeolojîk û têkiliyên hêzê ya li ser nav û (ve)navandina erdê baştir eşkere bûn. Bêguman, ev berfirehbûn û xurtbûna bingegehên teorîk ji bo qadê giring e, bi vî karî, êdî têkiliyên hêzê yên li ser (ve)navandinê nehatin piştguhkirin. Lêbelê, bi qasî vê yekê behs û babeteke din a giring jî çêbûna helwest û gotarên li beramber nava(n)ê ye. Di vê xalê de, cext zêdetir li ser helwestên cemawerên li bajar/welatekî ye ku li ser navê cihan an jî prosesa venaandinê bi xwe derdikevin mexderê. Gelo li gorî xwînerên deqa bajêr (niştecihên li gund an jî bajarekî) çi diqewime dema ku navê cihekî diguhere? Civat li hember navên (da)sepandî helwest û reaksiyonên çawa nîşan didin? Gelo çi giringiya navekî heye ji bo niştecihên li Agiriyê (Qerekilîs)? Bersivên van pirsan gelek mihim in, lewra tesîra rasterast a venaandinê li ser civatê bi xwe ye û fikr û nêrînên wan ên derheq vê babetê de dikare deriyên nû li vekolînên qadê veke. Çunku, wekî bikarhênerên nava ên esil, fikra cemawerên li bajêr di derheq navên kurdî û navên guhertî de mihim e.

Bi taybetî, helwest û qenaetên derheq nava de, bi vê yekê re têkildar, têgihiştin û îdraqa li ser navguhertinê li bajarên cuda bûye babeta vekolînên sosyo-onomastîk. Wekî qadeke gelekî nû, xebatên sosyo-onomastîkê, her diçin lîteraturekê ava dikin. Ev boçûna nû, bi gelemperî wan helwest û qenaetên merivan dinirxînin ku li hember navê cihan çêdibin. Di vê hevtevnê de, ev xebat bi gelemperî wekî sosyo-onomastîk

(*socio-onomastics*) tèn binavkirin,⁸⁶ ango onomastîka ku ji aliyê sosyolînguîstîkê ve hatiye arastekirin (bin., bn. Ainiala, 2008; Kostanski & Puzey 2016; Ainiala⁸⁷ & Östman, 2017). Xebatên bi vî rengî gelek kêr bin jî, çend salên dawî geşekirineke li diyarî çav xuya dibe. Bi taybetî, kitêba bi hevparî hatiye amadekirin a bi navê *Socio-onomastics: The Pragmatics of Name* (2017) ku bi edîtorîya Terhi Ainiala û Jan-Ola Ostman derketiye di vê qadê de roleke giring digêre. Herwiha, xebata bi navê *Names and Naming: People, Places, Perceptions and Power* a Guy Puzey û Laura Konstanski (2016) helwest û îdraqa li ser nav û navê cihan bi rengekî xurt destnîşan dike. Li gelek bajarên cuda, helwestên kom û cemawerên ji nasnameyên cuda beramber navên cihan tèn pîvandî û nirxandî. Bo nimûne, Berezkina (2016) materyalên dîmena zimanî bi nêzîktêdayîna sosyo-onomastîkê ve nirxandiye û helwestên kom û grûbên ji çandên cuda yên li Osloyê vekolaye.

Herwiha, vê dûmahîkê di xebatên vê qadê de “îdeolojiyên zimên” jî nayên piştguhkirin ku di prosesa navandinê de derdikevin meydanê an jî li ser navan bi xwe çêdibin. Ev îdeolojî tesîrê li helwesta daner an jî bikarhênerên navan dike. Pipitone (2019) helwestên danerên navên li Parka Neteweyî ya Gracîerê (*Glacier National Park*) bi riwangeha îdeolojiyên ziman dinirxîne. Herwiha, ew destnîşan dike ku yekem car wê di çarçoveya ji aliyê Irvine û Gal (2000)⁸⁸ ve xêzkirî de “îdeolojiyên ziman”⁸⁹ xistiye xizmeta toponîmiya rexneyî. Wê, raportên endamên komîsyona navandinê di pêwenda îdeolojiyên ziman de vekolaye û helwestên li hember navên xwecihên Amerîkî nirxandiye. Xebata Pipitone, di heman wextê de tesîr li xebatên pey xwe jî kiriye, bo nimûne Kudriavtseva (2020) di sosyo-onomastîkê de navguhertinên li Ukraynayê di heman pêwendê de vekolaye. Lîteratura heyî vê yekê destnîşan dike ku

⁸⁶ Ainiala (2016) destnîşan dike ku xebatên bi vî rengî meriv dikare wekî folk onomastîk jî bîn binavkirin. Bin. Tehri Ainiala (2016) “Attitudes to Street Names in Helsinki.” In *Names and Naming: People, Places, Perceptions and Power*, (ed. Guy Puzey & Laura Kostanski), 106-119. Bristol, UK: Multilingual Matters.

⁸⁷ Terhi Ainiala, yek ji wan vekolînera pêşeng e di qada sosyo-onomastîka hevdem de.

⁸⁸ Herwiha ji bo zêdetir agahiyan û ji bo çavkaniya ku Pipitone ji bo xebata xwe wekî bingeha teorîk hîlbijartiye, bin: Irvine û Gal (2000: 35-84).

⁸⁹ Meriv dikare vê tîgiha sosyolînguîstîkê bi awayekî giştî wekî “qenaet û hestên derheq zimên de” pênas bike (Field & Kroskrity 2009: 4).

vekolerên vê qadê bi xebatên xwe yên di pêwendên cuda de, ber û bergehê sosyo-onomastîkê berfireh dikin.

Îcar, ev binbeş ku ji aliyê rê û rêkarên xwe ve xwe dispêre lîteratura berdest a li ser navê cihan çêbûye, ji bo bigihe armanca xwe ji metodojiyeke têkel sûd werdigire. Berî her tiştî, bêtî ku anketan çêbike,⁹⁰ ev beş bi rêya hevpeyvînên ber vekirî û nîv-sazkirî gewdeyê serekî yê daneyan tîne pê. Ji bo derxistina têgihiştin û helwestên li hember navan, metoda sosyo-onomastîk tê ceribandin ku pê meyl û fikrên bikarhêner li hember navan û navguhertinê derdikeve meydana. Wate, di vê xebatê de ne tenê nav lê fikrên bikarhêneran ên li ser (nav)guhertinê jî dibin babeta vekolînê. Xêncî vê yekê, vegêranên etnografîk ên ji jêr ve angû ji nav gel tê dizên bi qasî wan nirxandinên li ser polîtîkayên mekanî û navandinê mihim in.⁹¹ Çunku, wekî aktorên serekî yên vê prosesê, herî zêde bikarhêner ji (ve)navandinê tesîr digirin. Rêjeya bikaranîn an jî redkirina navê cihan dikare di nav helwestên wan de bîn dîtin. Ji ber hindê ye ji jêr ve temsîliyeta vegêranên takekesî yên xwecih/bikarhêneran, bi qasî wan polîtîkayan giring in ku ji jor ve tîr dasepandin. Bi van armancan, digel xebata sosyo-onomastîk a li ser navan, ev xebat rêbaza etnografîk jî bi kar tîne û guh dide vegêranên takekesî yên niştecih/hemwelatîyên li Agiriyê da ku dînamîkên herêmî û têgihiştinên li ser navên guhertî û bikaranîna wan a di jiyana rojane de diyar bibe.

Dij-vegêranên li ser navên nû yên di nav gel de tê hiskirin, neqilkirina çîrok û serhatîyên li ser wan, meriv li ser pratîkên venavandinê û têgihiştina erdê ya kurdan dide fikirîn. Ji ber ku bi qewlê Basso her çand, li ser karkirin û şîyanweriya zimên xwedî bîr û bawerîyan e, dizanin ew karkirin (fonksiyon) dikare çi qezenç bike an jî dizanin di kîjan pêwendên civatî de herî baş pê tê karkirin (1996: 99). Lewma tecrîbeya kurdan a li ser navguhertina bajar û gundên wan, fêhm û feraseta ku bi navan re an jî li ser navan derdikeve mexderê, dikare hin taybetmendiyên xweserî tecrîbeya kurdan nîşan bide.

⁹⁰ Gelek xebatên bi vî rengî anketan jî çêdikin li ser têgihiştin û helwestên li hember navan.

⁹¹ Kuran (2010) jî di xebata xwe ya li ser navan de, heman metodolojiya etnografîk bi kar tîne û rexne li Kerem Öktem digire ku ji jêr ve cih nedaye rewşa qebûlkirin û nîqaşên li ser polîtîkayên navan. Herweha Fields (2013) jî, beşeke xebata xwe ji bo etnografîyê veqetandiyê.

3.6.1. Vegêranên toponîmîk

Ev beşa vekolîna etnografîk ku fikr, hewêst û vegêranên agahîderan û gotarên serekî yên axaftinên wan datîne navendê, armanc dike ku ronkatiyê bixe ser tecrîbe, serhatî, çîrok û helwestên niştecihên li Agiriyê, sebarek bi nav û navguhertinê. Di vê beşê de, fikrên li ser prosesa navguhertinê an jî wateyên ku navê nû îşaretê pê dikin, li gorî gotarên serekî yên li diyarî çav tînin hilbijartin û nirxandin.

Gelek agahîderan di nav xeberdana wan de destnîşan dikirin ku “navên nû”⁹² li gundan nehatine û ev guhertin bêeleqe ne. Di vê çarçoveyê de “navên kevn” wekî parçeyekî zimanê kurdî dihate derbirin ku jî qedîm de çîrokên wan çêbûne û cografyayê dixemilînin. Cografyaya xumam û efsaneyî ya di nav vegêranên kurdan de derdiket pêş, gelek balê dikêşe. Di xebata qadê de derket holê ku gelek efsaneyên li ser navan û bi navan re têkildar, di vegêranên takekesî de derdikevin holê û gelek ji wan jî aliyê mezinan ve tînin neqilînkirin. Li gorî BM-2⁹³, vegêranên ku li ser mekan çêbûne bîr û bawerî, rabûn û rûniştin, dab û nerîtên kurdî nîşan didin:

Li gorî min pîvana ‘xwe’bûna miletekî bi ziman va têkildar e. Bi saya ziman em xwemaliya cografyaya xwe, çand û hunera xwe dikin. Bêguman, cihê ku em lê dijîn ji demên kevnar heya niha bi navên kurdî ve xemilîne û bûne xwedî çîrok.

Ez bixwe ji navçeya Gîhadînê me. Ev navçe girêdayî bajarê Qerekilîsê ye. Navê gundê min jî Kanîreş e. Çîroka gundê me bixwe jî heye ku dibêjin pêxember bi hespê xwe yê reş hatiye hinda gundê me û hêwiriye. Îcar şûna lingê hespê wî da kanîk zaye û hew mirçiqiye. Lewma navê gundê me Kanîreş e. Wek mînak, ez dikarim çîroka çend navên din jî bidim; dibûrê li hemberê gundê me ‘Dibûrê Elo’ ye. Di dewra xwe da kesekî bi navê Elî hezkirîya xwe bi bilûrê li ser wî Dibûrî nîşanê her kesî daye. Wekî din navê newaleke jora gundê me ‘newala Gulo’ ye ku dewra xwe da jineke bi navê Gulo di wî newalî da hikim kiriye û li ser tehtan bendê avan çêkiriye. Hê jî ew dûmahiya wan bendan heye (BM-2).

⁹² “Navên nû” di vê xebatê de, ji bo pratîkbûnê di dewsa navên fermî yên bi gelemperî bi tirkî de tê bikaranîn, an na, “nû”bûn an jî “kevnûn”a wan bi gelek aliyan ve dikare bê şirovekirin.

⁹³ Hevpeyvînên ku hatine kirin tenê ji bo vê beşê tînin bikaranîn. Di vê xebatê de agahiyên derheqê beşdarên hevpeyvînan de hatine karkirin û ewlehiya wan hatiye dabînkirin. Di vê çarçoveyê de, beşdarên mêr wekî BM-, beşdarên jin wekî BJ- hatine binavkirin.

Navê cihan, wekî nexş û xemla merivan in û bi wan re watedar in. Ew ne tenê temsîla çanda qedîm a kurdî nîşan dikin, herwiha ew pêkvejiyana bi gelên cînar re jî piştrast dikin. Lewma, navên bi zimanê ermenî hebûna wan a dîrokî nîşan dide, ew dîroka pirçandî û pirzimanî ya berê temsîl dikin. Bi windabûna navan ve xemlek ji çand û zimên kêmbûne. Li gorî BM-2, nav û çîrokên ku li ser wan hatine avakirin xwebûn û taybetmendiyên zimanê kurdî û kurdûnê ne û dema ku ew winda dibin xemlek ji ziman û erdê kurdan diçe. Lewma ew, vê rewşê dişibîne “gerdeneke bêmorî”. Herwiha, herçiqas di gelek cihan de jî aliyê komîsyona navguhertinê ve hatiye destnîşankirin ku navên xwedî qîmeteke dîrokî ne, divê neguherin jî, gelek navên gundên dîrokî ketine ber pêlên guherandinê:

Ez dikarim bi sedan nav bidim ku êdî bi çîrokên xwe ‘xwe’bûna me xurt dikin. Çawa ku gerden-morî hevdu tên, wisa jî navên erdan û em pev re xurt in. Em gerdan bin ew jî moriyên stûyên me ne. Lê helbet di cografyaya ku ez lê dijîm qewmên din jî hebûne ku ev nav û çîrok hebûna wan jî îsbat dike. Wek mînak navê gundekî cînarê gundê me ‘soran’ e ku meriv jî nav jî pê derdixe berê gundê ermenîyan bûye. Gundekî dinê jî li rex gundê me navê wê ‘Meya’ ye ku xwedî keleheke mezin e û weke ku dibêjin cihnişîna mirovên herî kevn e di dîrokê da. Ew nav jî hê jî qet neguheriye û kes wateya wê nizane. Lê ev nav bi tirkî kirine *Günbuldu*.

Taliya talî mirov dikare bibêje ev nav û çîrokên wan xîmên ‘xwe’bûna me ne. Çanda me û dewlemendiya zimanê me ne. Ger em van navan jî dest bidin, em ê bibin gerdeneke bê morî. (BM-2)

Dîsa beşdarekî din, BM-1, di pêwendê berfireh de behsa navê gundan kir û jî wir kete meseleya guherîna rêyên qedîm ên ku ji Elaşgirê ber bi Erziromê dirêj dibin.

Wê çaxa em hatin Zêtkî, pêşiyê em çûne gundekî navê wiya Kurdalya. Îca navê Kurdalya jî Kurd Elî tê. Dema em li wî gundî bûn, navê wiya danîne *Dikendere*. Kurdaliya pir menşûr bû. Dihar⁹⁴ heye ya, ji Diharê meztir bû. Gundekî pir giran bûye, sê-çar mehlê wê hebûye. Êê tabî nika gund piçûk e, pêşî rêya Diharê guherandin, berê li ser rêya Îpek Yolu ra diçû, paşê li ser Ebûzêr ra birin. Ew rêya ku ji Ebûzêr ra derbas dibe, diçe Erzirimê, berê jî wir ra nediçû, ew rêya guhirandin. Ew rêya dema ku guhirandin, ew *dîroka Qereklîsê tev kuştin*. Te dî, tenê nav na, rê

⁹⁴ Dihar, bajarok e ku bi girêdayî navçeya Elaşgirê ye.

diguherin. Ev rêya Îpek Yolu bû yanê, hezar salan emrê wê hebû. A wê derê de *dîroka me gişkî ji rê derxistin*. Yanê ew jeneresyona nû, *wan çîrokan, wan meseleyên wan rêyan tu tiştî nizanin*. Ew gundên li ser wan rêyan, ew çûn-hatinên wan, gişkî carekî de hate jibîrkin. Îcar, navê Kurdalya dawiyê de guhirandin xistin *Türkeli*.

BM-1yê destnîşan kir ku guherîna van rêyan ku emrê wan bi hezaran salî ye, zirar gihande çîrok û meseleyên li ser wan rêyan. Guherîna wê rêyê bi qewlê wî *dîrok ji rê derxist*. Li gelek deveran, ji ber ku otorêyên nû ava dibin ku di heman wextê de rêyên kese ne (kurterê), rêyên adetî yên kevn tîr terikandin. Bi guherîna li ser xwezayê bi rêya teknolojiyan bi mebesta komkirina sermayeyê, formeke mekanî ava dike ku Lefebvre wê wekî hikimkirî (*dominated*) bi nav dike. Çêkirina otorêyan li gorî wî, yek ji wan rê û rêkaran e ku pê mekan dikeve bin tehekûmê. Ji ber hindê ew dibêje “otorê (*motorway*) miameleyeke xerab li hember gundewar û welat dike, ew mîna kêreke kalanî⁹⁵ mekan qet/qut dike. Mekanê di bin tehekûmê de bi gelemperî girtî ye, hatiye sterîlkirin û valakirin” (Lefebvre, 2014: 182-183).

Meriv dikare bibêje cihê rê û dirbên kevn ku bi vê tehakûma teknolojik hatin guherîn qismek ji wan çîrok, serhatî û qewamên ku li ser wan rê û qonaxan bêpar man. Ew bi midaxeleyeke mekanî ji aliyê dîroka xwe ya lokal ve ji rêya xwe hatiye derxistin û ji têkilî û serhatiyên merivan hatiye valakirin. Bi taybetî, rêya berbehs ku di Bazîd, Agirî û Elaşgirê re derbas dibû, ji Elaşgirê şûnde rastî guherîneke mezin hatiye. Rêya berê ku ji gundê Diharê re derbas dibû û ji wir jî diçû Erzirom û gundên Qaxizman û Şarîqamişê rêyeke qedîm e. Di gelek kilamên kevn de, behsa rêze-gundên li ser wan rêyan tîr kirin û wisa diyar e ku çûnûhatinên civatê li ser wan rêyan li pey xwe bermayiyên tecrîbe û serhatiyên jî hêlaye.⁹⁶

Herwiha gundê BM-1ê ku navê wî yê kurdî Kurdalya bûye, pêşiyê wekî *Dikendere* pey re wekî *Türkeli* diguherînin. Gundê Kurdalya bi navê xwe ve îşaretê bi kurdbûnê dike. Qedexa û înkaran li ser ziman û hebûna kurdan, nedihîşt peyveke ku îşaretê nasnameyê etnîk a qedexekirî dike di nav ewraqên fermî de bimîne, bi vî

⁹⁵ Kêra mezin a ku karê birînê pê tê kirin.

⁹⁶ Bi taybetî, Evdalê Zeynikê dema ku diçe Xozanê bi seredorî behsa navê gundên li ser vê rêyê dike. Kesê ku pê nizanibe ew rê guheriye, dê mereq bike bê ka Evdal çima ji rêyeke din re diçe Erziromê.

rengî jî bikeve nav jiyana rojane ya civatî. Di vê derbarê de, Nişanyan (2011: 57-58) îşaretê bi wê yekê dike ku navguhertinên di salên 1930an de endîşeya siyasî û îdeolojîk a serdemê diyar dike. Gelek navên têkildarê termên dînî (şêx, tekke, zawiye, sofî, softa), xanedana osmanî (Mecidiye, Aziziye, Hamidiye, Reşadiye, Osmanli) û dewra Meşruiyetê (Feyzîhurriyet, Meşrutiyet, Talatiye) hatine guhertin. Lê dema ku tê salan 1960an endîşeya ku derdikeve pêş cuda ye. Ji ber ku êdî şûn û şopên ku mensûbiyeta etnîk û raboriya xeyrî-muslîm nîşan didin, ji ser erdê tîn rakirin (bo nimûneyan bin. Nişanyan, 2011: 58). Kurdalya jî dikeve ber pêla vê endîşeyê ji ber ku îşaretê bi mensûbiyeta etnîk a kurdî dike. Li gorî Nişanyan (2011: 58) nabe ku meriv van guhertinan wekî avakirina nasnameyeke hevpar bixwîne ku li ser kokên etnîk re ye, li beramber vê, ev hewldaneke wisa ye ku dixwaze çandê etnîk a heyî, bi tevî navê eşîret û silaleyan mîna dîrokeke farazî/xeyalî li cografyaya Anadolîyê bide nifûzkirin. Ji ber ku di vê nimûneyê de tirkbûn (*Türkeli*) di dewsa kurdbûnê (Kurdalya) de tê îqamekirin. Ev yek ne tenê qesta raboriya etnîk a kurdî dike, di heman demê de qesta wê nav û nîşanê dike ku kurdbûnê diyar û dîtbar dike. Bi vê yekê re jî, nîşaneyên kurdbûnê û zimanê kurdî ji ser rûyê dîmena zimên (*language landscape*) radibe û di dewsê de bi navê xwe ve peyva *Türkeli* tê cîbicîkirin ku temsîla îdeolojî û nasnameya dewleta yekpare dike.

Li Tirkiyeyê hewldana homojenîzasyonê û tune kirina pirrengî û pirzimanîyê ya ku di her qadê de xwe diyar dikir pêngaveke giring bû ji bo pêkanîna “cimaeta muxayel”. Ji ber hindê, li ser erdê bi hezaran nav û nîşaneyên zimanên cuda hatin paqijkirin. Bi taybetî di nav kurdan de binavkirina erdê gelek bi xurtî bi şûn û şopa eşîr, êl û malbatan ve girêdayî ye. Ev rastiya pergala civatî û merivatî ya kurdî li seranserê cografyaya kurdî belav bûye. Gelek navên bi vî rengî yên ku kurdbûnê tînin bîrê ku di mînakê Kurdaliya de jî berçav bû, rastî guherîn û texrîfatê hatin.

Wekî amrazêke desthilatê “binavkirin” li ser manîpulasyon û rêvebirina wêneyê cemawerî û intibayan kar dike ku ji bo avakirina civatî ya nasnameya cih giring e (Alderman, 2008: 201). Ji ber ku navê cih û nasname di pêwendêkeke mekanî û civatî de digihine hev û bi qewlê Alderman, “ew ne tenê dîrokê tevî cografyayê dike, di heman demê de ew cih û nasnameya cemawerê digihîne hev bi saya serê di

pêwenda hevbeş a bikaranîna navê cihan de” (2008: 196). Di hevpeyvînan de agahîderên li Agiriyê navguhertin, ne tenê wekî destwerdaneke li ser pergala navên kurdî didîtin, wan ev wekî texrîbatekê didîtin ku li ser dîrok û nasnameya kurdî çêbûye. Di vê derbarê de, di dewama xeberdana xwe ya li ser navan de JBM-1yê, xwest ku merama xwe bi rêya taybetmendiyên lînguîstîk ên zimanê kurdî ve rave bike:

Ger tu bixwazî gelekî xira bikî, tu yê *dîrokê biguherînî*. Mînakekê ji gramerê bidim te. Di îngilîzî de verb 1, verb 2, verb 3 dibêjin, wekî ku di kurdî de em dibêjin *bêj û got*. Dema derheqê zimanê borî de em xeber didin, em dibêjin “min got”. Nika di îngilîzî, *to say, to teach* hene dema borî de diguherin, bo nimûne; *teach* di dema borî de dibe *taught*. Lê fiil bi xwe dibe *teach*, di dema borî de bibe *taught* jî fiil bi xwe *teach*. Îcar mesele dizivire ser çî, di kurdî de tiştê borî bûye, çûye xilas bûye nayê guherandin. Di kurdî de tu nikarî dîrokê xira bikî, tu tenê dikarî li ser çîrokê ava bikî. Dîrok û çîrok yek nînin.

Di kurdî de tu zimanê berê nikarî xira bikî: “min got”. Lê “ez dibêjim”, “ez ê bêjim”, lewma tu aniha dikarî xira bikî û tu dikarî zimanê tê de jî xira bikî. Di îngilîzî de dema borî diguhere. Eger ku tu dîrokê biguherînî, *tu yê îro jî xira bikî, tu yê siberojê jî xira bikî*. A bi vî awayî asîmîlasyonê dest pê kiriye. A rast pêşî asîmîlasyonê îngilîzan kir. Li ser îrlandayê kir, zimanê îskoçan jî xira kirin, zimanê îrlandayê jî xira kirin. A îcar tirk bi guherînên navan ve dîroka kurdan xira dikin, dema tu dîroka kurdan xira dikî, tu dema wan a nika jî xira dikî siberoja wan jî xira dikî.

JBM-1 û hin beşdarên din bal dikişandin li ser guherîna mîrata dîrokî. Çawa di beşa teorîk de jî hate ravekirin ew dîrokê tev li cografyayê dikin (Alderman, 2008: 196), jî ber vê yekê destwerdaneke li ser mekan û navan rê li ber wê yekê xweş dike ku dîroka lokal jî pê re bê jibîrkirin a ku li ser navê gelek cihan hatiye neqîşandin. Navê cihan, kevintirîn parçeyê mîrata çandî ya merivahiyê dinimîne, ew bi hezaran salan bi devkî jî nifşekî bo yeke din tînin neqîlkin li cih û warê ku ew lê çêbûne (Helleland, 2012: 101), lewma ew xwedî hêleke dîrok û bîrê ne jî. Û bîr jî tenê raboriyê nahûne, ew li ser tecrîbeyên niha û siberojê jî karîger e (Yalım, 2002: 161). Çawa ku gelek xebatên li ser bîra hevpar jî destnîşan dikin, ew di destê rejîmên siyasî de dibe amrazek ku pê raborî tî bibîranîn deqene xizmeta armancên îro bike (Alderman,

2009; Dwyer, 2004; Pinchevski & Torgovnik, 2002), eynî wisa jî navguhertinê de di heman demê de armanca jibîrkinê jî kar dike. Îcar ji bo JBM-1ê ji bo merama xwe taybetmendiya zimanê kurdî ya rayeka dema borî nîşan da ku rastî guherînê nayê. Lewma nabe ku meriv destwerdanê li ser tiştê bike ku nirx û qîmeteke wê ya dîrokî heye. Herwiha hin agahîderan polîtîkayên Tirkiyeyê dişibandin wan polîtîkayên asîmîlasyonê yê Îngilistanê ku pê zirar gihiştiye zimanê îrî û skoçî.

Di heypeyvînan de gelek caran dema ku meseleya nav û navguhertinê dihat xebardan, beşdarî behsa hin cihan dikirin ku di nav gel de bi çîrok an jî efsaneyên xwe ve dihatin zanîn. Heta navê hin mintiqayên biçûk ji aliyê gel ve çend deh sal berê bi xwe hatine guhertin ji ber ku tiştê li wir qewimiye. Bi vî rengî tê dîtin ku navên eslî yê di nav civatê de bi tecrîbeyan re çêbûne û kes, eşîr, qewam, serhatî bi wan re hatine têkildarkirin û watedar bûne. Wate, nav tiştan bi bîr dixin. BM-3ê dema behsa wan navên li gund kir, wiha xeber da:

“(…) di navbera gundê me, gundê serfêza me Kanîsiyê de, “Deşta Kuştiya” heye. Li wir şer çêbûye, qewimiye. Di navbera me û wana da. Ez bêjim pencî sal berê ye. Li wir yek hatiye kuştin. Gundiyekî me hatiye kuştinê. Li ser wî ciyê ku şer kirine, li wir ra dibêjin “Deşta Kuştiya”. Yanê ew serpêhatiya wî ye. (...) Li wir çiyayekî bilind heye; “Kevirê Spî”. Qaşêke ji wî mintiqayê ra dibêjin “Kevirê Sipî”. Ama⁹⁷, hinek bi hurgulî behs dikin, dibêjin eva Deşta Kuştiya ye. Li ser vira şer derketiye. Ya din jî “Newala Gura” heye. Yanê, ez nizanim gelo yekî gur dît piştî wî navê wî danîne Newala Gur? Mesela hê jî dibêjin. Yaw neheqî negotîne “Newala Gura” da dibêjin dêlegurek heye. Hersal tê kifşê. Mehek berê jî me gîha diçîn. Gotin Şorikê gurek dîtine. Gundiya got “êê navê wî neheqî daneynine Newala Gura”. Wê derê Newala Gura ye. Yan din jî “Kaniya Muso” heye em diçin tê da dilîzin, topê dixin. Ew jî dibêjin yekî ji ‘eşîra me “delikî” bêrê di gundê me da bûye. Navê wî jî Musa bûye, wê derê ew kaniya çêkiriye. Îro, ew û neviyê xwe kes di gundê me da tineye barkirine, çûne. Ew camêrana sed sal berê li gund derketine ama navê wan hê jî maye. Ew Kaniya Muso çêkir.”

Gelek deverên binavkirî yê biçûk ên wekî newal, kanî, kevir û hwd ku di nav xwecihan de di jiyana rojane de tên qalkirin, ne tenê wekî niqteyên referansê kar dikin, ew di heman demê de taybetmendiya siruştî an jî tiştê li wir qewimî jî temsîl

⁹⁷ Lêbelê.

dikin û wê neqil dikin. Bo nimûne, berî gelek salan Musa kaniyek çêkiriye û bi malbatî ji gund koç kiriye lê îro Kaniya Muso hê jî xwediyê xwe bi bîr dixê. An jî qewameke dîrokî dîsa li ser erdê tê qeydkirin bi rêya navan: Deşta Kuştiya. Êdî ev nav xwedî fonksiyoneke wisa ye ku dîroka lokal a wê derê dihevine. Bi qewlê Basso (1996: 7) navê cihan “di xizmeta merivahiyê de sembolên qewamên dûr û derez in û alîkarên jêneger ên xeyalkirina wan in”. Herçiqasî, qewamê dûr û derez be jî, wekî semboleke xurt navê cih meseleyê tîne ziman û wan qewimînan dide xeyalkirin. Lewra, dîrok li ser erdê tê nivîsandin û vegêrandin bi rêya gereke zihnî/xeyalî ya li ser erdê (Cruikshank, 1990a, 1990b).

3.6.2 “Te nav rakir, tu wê çîrokê xira dikî”: çîrok, bîranîn û zanîn

Gelek navê cihan bi çîrokên bavûkalan/pêşyan re bi têkildarî tîne bikaranîn. Xebata sehayî de ev yek di gelek nimûneyan de derket pêş. Di gelek gundên Agiriyê û navçeyên wê de navên mîkrotoponîmîk xwedî çîrokên taybet in ku di derdora lokal de çîroka wan bi gelemperî tê zanîn û neqilkin. JBM-1ê behsa serhatiya kalikê xwe kir ku çawa navê kalikê wî wekî navê deverê hatiye zanîn û belav bûye:

Kevirê sel hebûye, yê ku lehî tîne, şimşat. Kevirê bêfêsal, yekî giloverî şimşat û bêfêsal. Îcar berê va, xortên berzewac ku tîne emrê, tîne quweta xwe li ser vî kevirî va nîşan didin. Îcar ew kevir li orta gund de bûye. Yanî, her kes tê xwe bi wî kevirî va diceribîne. Zimrete jî kalkê min bûye, yekî pir pelewana bûye, bi quwet bûye. Kevir ber bi tûmî ra wî kevirî hildide hembêza xwe, ber bi wî kaşî ra ber bi jor heta quweta wî heye, diçe. A dibê min vê derê ew kevir danî. A li vê şûn de, yê ku xwe diceribînin, bira ew jî rabe du-sê em bêjin heta çiqas ber bi jor biriye, bira kevir bi navî wî be. A li ser wiya, navê wî cîwarê datînin Kevirê Zimrete, navê wî yê berê. Îcar ew nav, li wî gundî derdikeve derdorê gund hetanî bajarê li wî cîwarî her kes ewk dike. Bavê min rokî çûbû, de gund-mundê wan ê berê ne. Go welle ez çûm, ez wan ciyana xweş geriyam, hettanî go ez çûm derketim Kevirê Zimrete. Yanî her nav bi çîrokek pê va ne. Eger tu çîroka nav, çima ew nav jî xwe de derketiye ku nizanibî, nav cî nagire. Îcar ku nav cî girt tu nikarî wî navî rakî. Îcar ku te nav rakir, tu wê çîrokê xira dikî.

Raboriya malbatî û têkildariya bavkalî ya bi nav re nasnameya erdê jî xurt dike. Bi rêya vê çîroka malbatî, hissiyata aidbûnê bi wî erdê re çêdibe ku lê serhatiyê

bavûkalan çêbûye. Ji xwe gelek xebatên etnografîk ên li ser navan destnîşan kiriye ku erd bi çîrokê re tê têkildarkirin.⁹⁸ Çîroka erdê jî bi navê wê derê ve tê bîrxistin, dema ku midaxeleyek li ser pergala navan a bi tijî çîrok û serhatî tê kirin, *çîroka wê xira dibe*. Lewma ji navên ku cih girtiye yê biemr, divê neyê rakirin.

Pareke berçav a ji navê cihan bi rêya serhatiyên takekesî dibin xwedî çîrokekê wekî di nimûneya Kevirê Zimrete de. Çunku Kevirê Zimrete êdî ew war e ku kalikê wî bûye sebebê navlêkirina wî û bavê wî pê çîroka malbatî tîne ziman. Lewma rola bibîrxistina navan ne bi rengê giştî hemû civat e, carcar tenê tecrîbe û serhatiya şexsî jî dikare bi xwe re çîrokekê bîne pê. Di xebatên xwe de, Cruikshank (1990a, 1990b) destnîşan dike ku navê cihan dikarin wekî kevîrê qorziyê kar bikin di nav vegêranên otobiyoğrafîk de ji ber ku xwedî cihekî navendî ne di çêbûna serhatiya takekesî de. Eynî bi vî rengî, gelek navê cihan ên kurdî hene ku bi serhatiyên takekesî ve çîrokeke wan çêbûye û bi vî rengî di nav vegêranên jiyana rojane de cih girtine. Jixwe gelek nimûneyên bi vî rengî ji agahîderan din jî anîn ziman.

Gelek agahîderan bi taybetî yê li Elaşgirê/Zêtkî behsa çîroka hin navan jî dikirin ku tê de peyamek dihat ragihandin. Yek ji wan jî li ser navê gundê Elyas bû ku di xebirdanên xwe de gelek kesan behsa wê kir. Helbet, ev mesele ji zû de ketiye ser zar û zimanan û di nav kurdên vê herêmê de belav bûye. BM-1ê jî mîna çend beşdarên din heman meseleya gund bihîstibû û li ser pîrsa navê gundan, wî wiha xebirdana xwe berdewam kir:

Navê gund Elyas bûye. Dîbê paşak wî ra derbas bûye, havîn bûye, gîhaçînîn bûye. Eskerê xwe ve ku derbas dibe, ji eskerê xwe ra dîbê lehzekî eviya biçînîn bidine kalê. Tînin didine kalê. Îcar paşa ji kalê sîual dike, dîbê hezar heb bixebite yek bixwe xweş e, yan tevahî bikin, tevahî bixwin xweş e. Ew jî dizivire dîbê, welle na. Hezar heb bixebite yek bixwe ji vê xweştir tu tişt tune. Welle dîbê, navê wê Elyas nîne Eşek Elyas e. Çima *universal ethic* naxebite? Li Ewropayê ber bi awayê *universal ethic* diçin. Hûn hewce nin, li ser *universal ethic* herin. Îcar ku wê çaxa *sinca gerdûnî* ku nexebitî, nav lê dîkin Eşek Elyas. Îcar gundî ji navê gundê xwe aciz dibin. Hinek qîrar didin, dîbên welle em ê mala xwe li vî gundî derxin. Dîbên em çi bikin, çi nekin... Rexa gund de, ji gund re rê

⁹⁸ Bin. Cruikshank (1990a, 1990b), Thornton (2008), Basso (1996), Kari & Fall (1987).

derbas dibe, dibên em ê herin taxa din ji xwe ra gundekî dinê ava bikin. Diçin wê derê xwe ra gundekî ava dikin. Yek, du sê mal ava dibe. Milet ji wir ra derbas dibe, dibê ew çi ye? Welle evna jî dibêjn, ji gundê Eşek Elyas aciz bûne hatine vê derê xwe re gundek danîne. Ê welle dibê evna Eşek bin, evna jî Xotik in. Navê wî gundî bû Xotik? Îcar ji Êşek Elyas revîn bûne Xotik, îcar rexa wiya de ji Xotik jî aciz bûn, şer û dewa wana jî hebû, wana jî çû gundekî din avakirin, a navê wî gundî jî danîn Newala Kera. A li wê derê de tam keristanek ava kirin. Li Kurdistanê hezaran navên ecêb hene.

Navên ku çîrokên wan ên ecêb hene û li ser van çîrokan jî hin peyamek û nirxên civatê xuya dibin. Gelek beşdaran dema behs dihate li ser navlêkirin û navguhertinên gundan, behsa çîroka gundê Elyas dikirin. Berî serdema modern a netewedewletan, bi regekî adetî, navê gundan ji aliyê civatê bi xwe ve dihate guherandin. Îrroj, êdî hikimê gel ê li ser navlêkirin û navguhertina cihan gelek kêmbûye an jî bi temamî ji holê rabûye. Li vir ser navê çîroka *Êşek Elyas*, peyameke civatî ya pêkvejiyan, hevkarî û parvekirinê tê ragihandin. Dema ku paşayê rêwî jê dipirse bê ka “*hezar heb bixebite yek bixwe xweş e, yan tevahî bikin, tevahî bixwin xweş e*”. Ew gundî lê dizivire dibêje: “*Welle na. Hezar heb bixebite yek bixwe ji vê xweştir tu tişt tune.*” Hişyarî û normên exlaqî yên civatê bi rêya nava ten veguhastin û bi çîrok û meseleyan ve li ser zar û zimanan belav dibin. Herwiha di navlêkirinên gel de deximandina wan gundiyan jî heye ku ji norm û nirxên civatê dûr ketine ji ber ku nanê xwe bi rêwiyan re parve nekirine. Pratîkeke gelek nêzikî vê vegêran û çîroka gundê Elyasê, di xebata li ser Apaçiyên Rojava ya Basso (1996) de xuya dibe. Di zimanê apaçiyên de, navê cihan wekî risteyên dirêj ava dibin. (Bo nimûne, “mêrikê-fêza-vir-û-wir-disekine” (*men-stand-above-here-and-there*) wekî navê cihekî wêne û serhatiya wir destnîşan dike. Serhatî û çîroka dîrokî ya ku li ser vî cihî qewimiye, bi taybetî li ser “wan kesan hûr dibe ku di encama kiryarên xwe de êşa bêbextiyekî dikişin ji ber ku tevgerên maqûl ên apaçiyên bin pê kirine” (Basso, 1996: 101). Ev serhatî, bi gelemperî bi wan tiştan re têkildar in ku “derheq qeyd û bendên pergali an nirxî de ne ku apaçî pêşbînî dikin ku pê jiyana hevdu durist bikin” (101).

Basso gelek nimûneyan dide ku di xebata xwe ya demdirêj a sehayî de, di pêwendeke dewlemend de bi dest dikevin. Bo nimûne, ew behsa wî cihî dike ku wekî

“mêrikê-fêza-vir-û-wir-disekine” hatiye binavkirin. Li gorî çîrokê, ew cih bi meseleyekê re girêdayî ye ku hatiye serê polîsê apaçî. Mêrikekî apaçî di demeke xerab a xela û nexweşîyan de diçe çêlekeke mêrikekî çermispî serjê dike û polîsekî apaçî diçe wî desteser dike. Cimaeta apaçî, qîrf û henekê xwe bi wî polîsî dikin ku dixwaze hemcinsê xwe desteser bike ji ber kiryareke ku ji aliyê apaçîyan ve tiştê gelek adetî û asayî tê dîtin. Polîs bi xwe, di çîrokê de bûyerê ji serekên xwe ra ranagihîne û wan agahdar nake, ji ber ku di hişê wî de jî ev yek wekî tiştê adetî xuya dike. Îcar, ev serhatiya vî polîsî yê ku apaçîyekî desteser dike ji ber ku wî çêleka kesê çermispî serjêkiriye. Ev tevgera wî “sûcdarkirineke xerab e li dijî wan kesên ku li hember endamên civata xwe piştî kesên biyanî dikin (...) û tevger û taybetmendiyên kesên çerm-spî nîşan didin” (55). Basso, vê çîroka balkêş di civîna rojbûnekê de dibihîse ku dapîrek ji ber tevgerê wê ya xerab -di şahiyekê de divê porê xwe vekirî bihêle, lê wê toqe pê ve kiriye- ji neviyê xwe yê hejdehsalî re dibêje. Neviya wê, toqeyê xwe porê xwe derdixe û davêje ji ber ku ew jî bi rengê tev li çîroka polîsî apaçî dibe. Piştî du salan dema ku Basso dîsa bi ser heman malbatê de diçe, cihê bi navê “mêrikê-fêza-vir-û-wir-disekine” nîşanî keçikê dide ku ne zêde ji kampa wan dûr e. Keçik dikene û dibêje “ez wî cihî dizanim. Çîroka wê her roj dide pey min” (57). Bi vî rengî, tenê navê wî cihî ku xwedî serhatî û çîrokekê ye, dikare peyama û nirxekî civatî nîşan bide û hişyariyan bide wan kesên ku derveyî normên civatî tevdigerin, eynî di nimûneyên gundê Êşek Elyas û çîroka polîsê apaçî de.

Guhertina navan wekî diyardeyekê ne tenê ji jor ve ango bi destê dewletê ve tê tecrîbekirin, lê herwiha gelek hemwelatî bi saya serê sazî û dezgehên fermî bi meseleyê haydar dibin:

Navê gundê min Ava Masiya ye. Gundê me girêdayê navenda Agiriyê ye. Ez navê gundê xwe yê tirkî cara ‘ewil di dibistana seretayî de hînbûm. Me li malê digot, “Em ji Ava Masiya ne”. Dema em çûn dibistanê mamoste ji me ra gotibû xwe bidin naskirin. Me gotibû Ava Masiya ewî jî qebûl nekiribû, gotibû ev navê wî yê kevn e tiştê wisa tine. Navê gundê we *Balıksu* ye. Hûn ê jê vir pê de bibêjin; *Biz Ağrı'nın Balıksu köyündeniz*. Yanê navê gundê me êdî *Balıksu* bû, Ava Masiya nebû! Ew navekî kevn bû. (...) Ez herim ku jî navê vê gundî Ava Masiya ye. Gelek kes wisa dibêjin yanê herkes wisa dibêje. Tenê ew civanên gunda baş nizanibin yê ku di bajêr

de mezin bûne, ew (ciwan) dema dibêje tu ji ku yî? Dibêjim Ava Masiya, dibê bi tirkî çî ye? Wê çaxê em dikarin bêjin *Balixsu*. *Ama*, ez bêjim bi sedî heştê pênc-nodê cîvakê neguheriye. Em tev jî dibêjin em ji Ava Masiya ne. Kal, pîr, zar. (BM-3)

BM3 û hin agahîderên din, di nav xebardan û serhatiyên xwe de gelek caran navê bi tirkî bi fermiyetê ve girêdayî dinirxandin an jî têkildar dikirin. Herwiha, navê nû yê bi tirkî bi xwe re guherîna helwesteke zimanî jî tîne. Jixwe di dema axaftina xwe de jî navê *Balixsuyê* li risteyeke bi kurdî nedianî û lewma bêtî ku gotina mamosteyê xwe bi kurdî bêje, wî rasterast bi risteya tirkî anî ziman. Di nav gundan û herêma gundewar de, xwecihên ku navê gundan ên kurdî bi kar naynin gelek kêr in, lê çiqas temen biçûk dibe û bajar dibin navenda nû ya jiyana civatî, ew qas jî navê tirkî dikevin dewsa yên kurdî. Û ev yek helbet bi guherîna ziman re heye ku her diçe di nav ciwanan de zêde dibe. Gundê Ava Masiya ku pêrgî wergera rasterast hatiye, bi tirkî wekî *Balixsu* hatiye wergerandin. Herçiqas, gelek navên guhertî bi navê berê ve eleqeyekê nîşan nede jî, hin navên wergerandî yên mîna *Balixsuyê* pêwendiyê wateyî bi navê xwe yê berê re datînin.

3.6.3. Helwest û ramanên li beramber navan

Gelek beşdarên, îşaret bi wê yekê dikirin ku navên ku hatine danîn bi gelemperî bêteleqe û keyfî ne. Herçiqas hin navên tirkî ku komîsyonê neçê û xerab nirxandine û ew guherandine jî, li hin deran navên nû jî zêde wateyêke pozîtîf nîşan nedaye. Bo nimûne, BM-3 bûyerek neqil kir ku ji mamosteyekî xwe bihistibû:

“Yanê min bûyerek ji mamosteyekî xwe bihistibû. Nizanim, çî qas rast e çî qas xelet e. Digo li Bazîde çawa çûne navê gundekî biguherînin yan jî em bêjin sala hezar nehsed sê yê filan de, em bêjin wan çaxa nav diguherandin. Navê gundan yan jî paşnav dihanîn ew dikirin. (Memûrên dewletê) çûne gundekî lê nihêrîne gayekî zer li hemberê gund diçêre. Jê re gotine *Sarioküz*. Yanê navê wê gundê danîne *Sarioküz*. Lê nizanim çî qas rast e çî qas jî zanistî ye ez wî nizanim ama serpehatiyêke wisa heye.” (BM-3)

A rast, meriv piştî lêgerînekê dikare bibîne bê ka meseleya vî gundî çî ye. Ev gund, li binetara Bazîda kevn û Qesra Behlûl Paşa cih digire bi navê xwe yê qedîm wekî Zengezûr tê naskirin. Piştî ku navê gund tê guhertin, navê *Sarîdana* li gund

datînin di sala 1960î de. Wate, navê gund ne *Sariöküz* be jî, bi wateyeke nêzîk *Sarıdana* ye ku gundî jî pê aciz in. Îcar, van salên dawî ji ber ku gund bû taxeke Bazîdê û navê wê dubare hate guhertin û bû *Sarıgül*. Pratîkên bi vî rengî yên keyfî û carna ne li cih, di nava kurdên li vî gundî de jî baş nayê dîtin.



Şikil 7. Gundê/Taxa Zengezûrê (bi Tirkî berê *Sarıdana*, paşê *Sarıgül*)⁹⁹

Bo nimûne, agahîderê bi navê BM3, tu têkiliyeke wateyî ya navê Kanîsiyê bi navê *Beşiktepeyê* re nabîne û vê di çarçoveyeke watedar de bi cih nake. Di hin nimûneyan de, helwesta ku li hember navê tirkî diyar dibe, helwesteke dijber e ji ber ku li gorî BM-3, ew, pêwediyeke wateyî an jî mekanî bi wî cihî re nîşan nadin. Peyvên weke “tênagîhîjim”, “li hev nadim rûniştandinê”, hem li hember bêwatedarî û bêteleqiya navê tirkî dike pozîsyoneke dijber xurt dike hem jî têkiliya navê nû bi navê berê re pirsîyar dike.

Bi min zêde tu eleqe bi wan re tine ye. Mesela em bêjin, navê gundê me hinek dişibe hev. *Balıksu*, xistine Ava Masiya, em bêjin hem masî heye hem jî av. Erê, rasterast wergerandine tirkî ama li serfêza me li gundekî heye “Kanî Sî” ye. Ez gelek caran difikirim û dibêjim gelo kaniya wî ber siya zinarekî derketiye loma? Ji xwe wisane jî. Kaniya gelî siyê li wir heye ji ber wî wisa dibêjin. Tirkiya wî

⁹⁹ Ev wêne di sala 2011an de hate kişandin. Zengezûr gundekî qedîm e û di gelek kilaman de navê wê derbas dibe.

“Beşiktepe” ye. Ez nizamim, van herda li hev nadim rûniştandinê, têngîhîjim. Yekî din jî li binyaka “Nisî Xelbegur” heye. Ez dibêjim belkî xirbegul be yan jî navekî din Xelbegur maye. Tîrkiya wî “Güneysu” ye. Ji xwe wir de avekî derbas dibe. Kîjan guney e, kîjan *kuzey* e ew jî nediya e, yanê çima danîne? Li ser wî “Qoto” heye. Qot di kurdî de wek “tepe” derbas dibe. Serê wî qotî. Gund jî li ser qotekî ye ji ber vê yekê jê re gotine Qoto. Navê gund tirkî danîne *Orta Yokuş*. Îca bibêjim *Orta Yoquş* be, *aşaxî* yan jî *yukarî yoquş* kîjan e? Kîjan *yoquşê* behs dike ev jî nediya e. Navê “Kûpqirana Eyup Paşa” heye ew jî dîrek wergerandine tirkî. (BM-3)

Bêleqetiya navên nû bi erdnîgarî re yek ji wan helwestên serekî bû ku gelek beşdaran bi dewamdarî dianî ziman. BM-3, li ser mentiq û eleqeya navên lêkirî wiha fikrên xwe anîn ziman:

Gundê ‘ecema ne. Qarapapax anîne (lê bi cih kirine). “Geçitveren” “Geçitalan” navê yekî di kurmancî de “Gelgel” e navê yekî jî “Golesor” e. Ew gundê Golesorê mesela Murad ji ber ra dikişê. Meriv yanê ez difikirim dibêjim dibe ku wê derê pelek yan jî kevîrek hebe bi sor be golek hebe û jê re gotibin “Golesor”. Çûnkî li gundê me deverê heye, jê re dibêjin Kevîrê Sor. Kevîrê wî jî sor in. Ama *Geçitveren* yanê bi tirkî bêjim *Neye geçit veriyor?* Mesela *Geçitalan* jî navekî wisa ye ku hatiye afirandin. Mesela li vir nêzîkî bajêr Navîk heye. Navê gundekî ye. Tîrkiya wî *Eliaçık* yanê tu ewk tine. Wisa. Navê gundekî din jî “Avdelîk” e. Ez dibêjim qey Avdelîk jî yanê baş nizanbim, têngîhîjim jî bi texmîna min ew cîhên ku tên avdanê. Zêdetir jî wan eraziyan re tê gotinê ku tene avdanê. Ama tîrkiya wî *Balçiçek Köyü*” ye. Yanê wergerandine, lê bi wê deverê re tiştêkî mantiqî newergerandine. Yanê tiştêkî xas, aidiyeta wê bi wê derê ra tine ye. Ji xwe re qafê xwe da navekî lêkirine, gotine navê me ev e. (BM-3)

Gelek caran, agahîder wateya navê kurmancî nizanibin jî, bi rêya etîmolojiya gelêrî (*folk etymology*) wateyekê jê re difesilînin. Lê navê ku pey re ji aliyê dewletê ve hatine danîn wê rêyê nade ku etîmolojiya gelêrî baş kar bike, lewre ji aliyê dîrokî ve bîngeha wan xurt nîne. BM3ê jî wateyekê nade navên tirkî yên wekî *Geçitalan* û *Geçitveren* û bi tirkî dibêje: “Neye geçit veriyor?”¹⁰⁰ Li gorî wî nav li gorî mantiqê nehatine wergerandin û “ji xwe re qafê xwe da navekî lêkirine”. Îfadeyên wekî “ji

¹⁰⁰ Bi kurdî, “Rê dide çi?” An jî “Bihurê ji çi re vedike?”

ber xwe avêtine”, “ji xwe re qafê xwe da navekî lêkirine” û “navek pê ve kirine” di gelek xeberdanan de diyar dibûn. Bilge Umar (1993: 2) di xebata xwe ya bi navê *Türkiye’deki Tarihsel Adlar* (Navên Dîrokî li Tirkîyeyê) de van navên nû li derveyî xebata xwe dihêle û dibêje ew nav li ser maseyan hatine lihevanîn¹⁰¹ (*masa başında uydurulmuş*) ango tu bingeheke wan tune. Gotareke bi vî rengî di gotinên BM-4 de jî tîr xuyanê û ew destnîşan dike ku li ser maseyê rûniştine “ber xwe da nav derxistine”. Ji gotinên wî meriv tê derdixe ku navên berê kêr-zêde tîr texmînkirinê (*predictable*) ku hin ji wan fonksiyon û taybetmendiya wan gundan nîşan didin:

Nîha ev navên tirkî, yek xwe re li ser maseyekê rûniştîye û ber xwe da nav derxistine. Tu nizanî ka ev nav çî eleqe? Lê navên rastî, navên ku xelkê lê kirine ne wusan in. Dema ku tu diçî cihekî, li gorî navê wir, tu taybetmendiya wir texmîn dikî. Mînak gundek heye li Qerekîsê, navê wî Karê ye. Ez qe neçûme wî gundî lê ez baş texmîn dikim ku li wir xwê derketiye yan dertê. Dîsa gundê Reboçî, rebo ango koma hespan. Meriv texmîn dike li wir zozanan hesp hebûne, belkî koma hespên beredayî. Dîsa gundek heye bi navê Pençerûk. Li wir pişîkeke dişibe pilingan hebûye, gel gotiye Pençerûk, dema li wir gund ava bûye, ew nava lê kirine. Hemû navên kurdî, çîrok û dîrokeke wan heye. Dema ku tu wan qedexe bikî, bidî bîrîkirinê, tu dîrokê jî dikujî. Ji ber wê ez dibêjim guhirandina navan tiştêkî biçûk nîne. Ev sûcekî mezin e li hemberî xelkê wê herême jî, li hemberî merivatiyê jî.

¹⁰¹ An jî meriv dikare wiha wergerîne: “Ji ber xwe avêtine.”



Şikil 8. Tabelaya duzimanî ya Mengeserê (*Yazılı*), 2021.

Wisa diyar e ku ji aliyê civatê ve navên kurdî û wateya wan carcar bi rihefî tên texmînkirin. Ew taybetmendiyên civakî, fîzîkî û çandî yê wê derê nîşan didin. Gundê Karê îşaretê bi xwê, gundê Reboçî îşaretê bi hespan dike û Pencerûk jî bi rengekî efsanewî cihê xwe girtiye. Li Agiriyê, ne tenê kurd lê di heman demê de qerepapax, terekeme û azerî jî hene. Wan jî navê kevn bi temamî terk nekirine û di danûstandinên xwe yên bi kurdan re zêdetir navê berê bi kar tînin, bi taybetî jî kesên salmezin.

Li gelek bajaran, bo nimûne Diyarbekir, Batman û beşeke Çewlîgê (Çolîg), lewheyên/tabelayên du-zimanî li kar in. Bi vê nimûneyê, li ser pirsax daxwaza lewhayên du-zimanî, BM-4ê ev rêbaz maqûl nîrxand û li ser helwesta qerepapaxên (papaxreş) li Agiriyê wiha xeber da:

Lewheyên duzimanî bi ya min dê gelekî baş bibe. Çimkî cihên din nizamim, lê li Qereklîsê gelek kes navên bi tirkî nizanin. Heya tirk, terekeme, qerepapax û azeriyên ku dewletê ji derve aniye û kiriye gundên Qereklîsê, ew jî zafî caran navên gundan bi tirkî nabêjin. Mesela li rojhilatê gundê me gundek heye, xelkê wir bi xwe tirk e, lê navê gund bi kurdî Golesor e. Navê wî gundî yê bi tirkî nabêjin. Niha ez fikirîm, ez hin jî navê wî gundî yê bi tirkî nizamim. Binêre, gundekî ber me de ye, dîsa nizamim. Dîsa li bakurê

gundê me, gundekî qerepapaxan heye, navê gund Mengeser e. Bi tirkî kirine *Yazılı*. Lê xelkê wî gundî li ser lewheya gund nivîsîne: "*Karapapak Köyü Mensegere Hoşgeldiniz*". Ne tenê kurd, tirkên ku anîne vira ew bi xwe jî navên dewletê nabêjin. Bi ya min li ser lewheyan navên gundan ên rastî hebin, xelkê zehmetiyê nakişîne êdî (BM-4).

Hin agahîderan bal dikişandin li ser dîrokîbûn û watedarbûna navên berê ku ji bav û kalan de mîras mane. Ev mîrasa ku ji bav û kalan maye, di heman demê de pêkvejiyana kurd û ermeniyên jî bi bîr dixê. Gelek beşdar eleqe û mantiqê binavkirina hin cihan re nabînin. Bo nimûne, BM-14 nikare wateyekê bide navê *Bardaklı* ku hatiye dewsa navekî kevnar:

Navê gundê me kurmançî berê da jixwe dîroka wê em nizanin çi çaxê, Taxilka ye. Yê xerîb, yê mesela ne ji gundê me bin, mesela yê aliyê dinê çaxê navê gundê xwe dibêjin, hinek tînin Taxilka dibêjin Taxlika. Taxilka wek tu dizanî tax; mehelle ye, mehelle ye re jî tê gotin. Lê navê gundê me orjînal Taxilka ye. Eva ji bav û kalên me de wisa tê zanîn. Gundê me kalkê min jî behs dike, berê da file û kurmanç tev jiyane. Pîgarê hev bûne, tev çûne zozanan. Zozanê wan jî eynî ne. Navbera wan pir xweş bûye. Piştî cumhuriyet yan jî beriya cumhuriyet bê avakirin, êdî ew şerê di navbera file û Osmanîyan de derketiye file nemane, çûne. Îro, navê gundê me danîne *Bardaklı*. *Bardaklı* û Taxilka yanî ji aliyê ma'aneyê va ti elaqe wan ji hev tune ye. Yanî meriv bêje gelo tu bêtî Bardak tu zanî ma'ena îskanê ye, îskan jî tu çi jî bêtî filan derê hildane meriv nikare wisa bêje (BM-14).

Helbet, hemû binavkirin bi heman rengî pêk nehatine. Hin ji wan dema ku hatine danîn, hin taybetmendiyên civatî û çavkaniyên siruştî nehatine piştguhkirin. Bo nimûne BM-14, di mînaka gundê *Suverenê* de destnîşan dike ku ew gundekî wisa ye ku gel tê ji wir av dibe:

Wekî dinê mesela nêzîkî gundê me yanî di navbera Îdir û Bazîdê de gundekî Îdirê heye, tirkî navê wiya danîne *Suveren*. Li wê derê ewek heye, ew mintîqa tiştê ecêb e. Gundên dêm e, bêav in. Li wê derê kanîka mezin heye û gundên derdorê hê berê da mesela Gewro heye gundekî. Navê wiya danîne *Şeyh Mirza* tirkî tiştê wisa lêkirine. Ew gundana mîlet niha ji wê derê av hildida, hê îro jî tîna ava xwe wir hildidin. *Suveren* danîne navê kurmançî jî Horgov e. *Suverenê* mirov fêhm dike ji wê kaniyê hildane, lê Horgov navekî kevnare ye û kurmanç wî navî bi kar tînin. Ji aliyê ewê ve, meriv Orgovê

ji aliyê etîmolojîk meriv li ser bifikire min tiştek jê dernexist, ez nizanim gelo çi ewayeke wê ya wisa heye. Yanî gundên derdorê me mesela Gewro. Gewro biharê hêşîn dibe giyayeka xweş heye. Pez mezê me, me biharê dibir wê derê, anka dibêjin qereqol mereqol ava kirine, gund vala bûye. Navê wî yê tirkî danîne Şeyh Mîrza. Kurmancî jî navê wî Gewro ye. Kurmanciya wê meriv fêr dike ji rengê xwe nê coxrafîk, erdnîgarî hildide. Çunkî piştî bihar biqede, erdê vira gewr dibe, şînahî keskeyî zer dibe û rengêkî gewr hildide û kevir jî, derdor jî pir kevir in jê re dibêjin Gewro. Navên wisa hene, yekê dinê mesela te behs kir ew heye, li zozana me derdorê me gund jî hene. Mesela gundekî ew heye navê wî Selbend e. Selbend gundekî nav keviran de ye. Kevirên mezin hene derdorê wê û navê wî jî danîne kurmancî Selbend e, lê navê wî bi tirkî çi ye ez nizanim. (BM-14)

Wisa diyar e ku navê gelek gundan ên nû ji aliyê xwecihên wê navçeyê ve jî nayên zanîn. Gelek kes tenê navên gundan cînar bi tirkî dizanibûn, navên gundên dûr tenê bi kurdî nas dikin. BM-10, di vê derbarê de anî ziman ku memurên dewletê ji ber navên nû carcar zehmetiyê dikişînin. Wî behsa serhatiya mamosteyekî kir ku bi saetan nava Dutaxê de li gundê *Sarıgöze* geriyaye lê pê dernexistiye:

Mezin navên teze nizanin. Hetanî ku zarê ku neçûbin mektebê ku nexwendibin, ewna belkî zarê gundên din re xwendine ya, ewna navê gundê teze zanin. Navê gundê yê ku *değiş* kirine. Wan nava dizanin, lê mezin navê gundê ewk berê zanin yê niha nizanin. *Öretmenek* (mamoste) hatibû gundê me Dutaxê. Sibehê di saet hefta de hatiye Dutaxê, gotiye îşte kurmancî nizane, gotiye “*Ben Sarıgöze köyüne gidecem.*”¹⁰² Sibê jî hefta de hetanî saet duwanzda ketiye nav Dutaxê, geriyaye. Gotiye: “*Ben Sarıgöze köyüne gidecem.*” Kesî gotiye “Wele em nizanin *Sarıgöze köyü* ku ye.” Tiştek wisa bûye. Hatiye en son hatiye cînarekî, gundekî cînarê gundê me ye, hatiye wî sual kiriye. Gotiye: “*Yaw Sarıgöze diye bir köy var. Burada hiç kimse bilmiyor.*” “*Vala, demiş. Bizim karşı köydür, yeni ismini söylersen kimse bilmez demiş.*”¹⁰³ Tu navê wî yê berê bêje yê herkes bizanibe. Lê hatiye eynî cihê ku sual kiriye sibê zû, gotiye: “*Ben Çelo köyüne*

¹⁰² Bi tirkî, “Ez herime gundê *Sarıgözeyê*”.

¹⁰³ “Yaw gundekî bi navê *Sarıgözeyê* heye. Li van deran kes nizane ku ye. (Yê din) gotiye gundê li hemberî me ye, wexta ku tu navê nû bibêjî kes pê dernaxe.”

gidecem.”¹⁰⁴ Gotiye: “*Biz Çeloyî biliyoruz*”.¹⁰⁵ Tişteke wisa zehf bela bûye, wî *oretmenî* digot yanî. Lê zaro yên niha ku diçin mektebê dixwînin tevî zaroyên gundên din, ewna navên teze zanin. Lê navên berê ku gotine em ê bidin bîrakinê, halbukî nehatiye bîrakinê. Yanî millet herkes vî navî dizane (BM-10).

Navên kurdî ji bo mekanê hê jî wekî noqteyê referansê kar dîkin û ji bo dîtina cih û warekî bi rengekî çalak tî xebitandin. Ev rastî, ne tenê ji bo niştecihên bajêr wiha ne, di heman demê de kesên biyanî yên ku wekî memûrên dewletê tî gund û navçeyan, di nav rewşê mecbûrî de serî li navên kurdî dîkin da ku karên xwe yên rojane berdewam bikin:

Rojekê mamosteyekî xerîb hatibû Agiriyê, bi tirkî got “gelo gundê *Eliçık* li ku derê ye?” Min got “min ev nava nebîhistiye, heger tu bikaribî navê wî gundî yê rastî hîn bibî, ezê ese bizanibim”. Bi tîlefônê ve li yekî geriya, vegeriya ser min got “Navîk”. Min got “belê, ez nas dikim, hevalê min jî ji wî gundî hene”. Bawer bikî, Navîk zêde dûrî gundê me nîne lê min *Eliçık* nizanibû. (BM-4)

Helwesta neyînî ya li hember navan tenê bi navên bi tirkî re sînardar nebû çend beşdaran diyar kirin ku navên wekî Çîyayê Agiriyê û heta Agirî jî navên çêkirî ne. Ev gotara dijber a li ser navên “kurdî”, ne tenê bi nimûneya peyva Agiriyê ve sînardar e, li hember hin navên din ên kurdîkirî jî heman helwest di nav gel de bi rihetî tê dîtin. Bo nimûne piştî bikaranîna bi salan a medyayê û derdorên siyasî yên kurdî, navê Agirî gelek berbelav bû, lê navenda bajêr jî aliyê gel ve wekî Qereklîs/Qerekilîse tê zanîn. Di vê derbarê de beşdarekî merama xwe wiha anî ziman:

Ez ji wê tiştê aciz im ku hin kesên ji me jî navên nû peyda dîkin û vê yekê hînê gel dîkin. Wek mînak ‘Çîyayê Agirî’ bi temamî wergera tirkî ye. Lê em kurd nabêjin ‘Gilîdax’! Çima Çîyayê Agirî? Meriv ji ‘Çîyayê Agirî’ na meriv ji Gilîdaxê dikare dîrok û çîrokekî derxîne. Ev mînak li tevayê Kurdistanê hene û divê xeletiyên bi vî rengî neyên kirin. (BM-2)

¹⁰⁴ “Ez ê herim gundê Çelo”.

¹⁰⁵ “Em gundê Çelo dizanin.”

Ez ji gundê Girekol im ku girêdayî navenda bajarê Agirîyê ye. Navê gund me wekî hemû gundên din hatiye guhertin û nika fermî wekî Doğutepe tê nas kirin (...) Dema piçûk bûm bi bavê xwe ra diçûm gelek gundan bona dewatan. Ku ji min dipirsîn ‘tu ji kîjan gundî yî?’, min carna navê tirkî *Doğutepe* digot. Îja gelek ji wan kesan carna bi hêrs digotin ‘Navê wê yê kurmançî bibêje’. Hin ji wan jî digotin navê wê yê berê bibêje.’ Heta çûyîna zanîngehê ya rastî ez pê nehisiyabûm, min fêhm nedikir ku sebeb çî be. Piştî ku ez bi xwe hisiyam, serê min da mesele zelal bû. Lê ji zaroktiyê heta xortaniya xwe her tim ez rastî vê meseleyê dihatim. Her gund xwedî du navan bû yek bi kurdî ya din jî tirkî. Xuya ye ku navê gundan jî ji tirkîkirinê para xwe girtibû, lê bona demeke kurt ta were qebûlîkirin ev nav nehatine guhertin. Ew jî baş dizanin ku demeke kurt da îmkana vê yekê tune, lê her nîş wê sal bi sal bin tesîra navê nû da bimîne û belkî sed belkî dused sal şûn da kesek êdî navê resen nizanibe. Ji xwe mebesta wan ê pêk were. Ev talûkeya herî mezin e. (BM-5)

3.6.4. “Xeber gi çûn, erd dimîne”: navên bi serhatiyan kodkirî

Rehendê bi dîrok û serboriyê re girêdayî yê navan balê dikişîne. Li diyarî çav e ku dîroka devkî û serboriyên malbatî û civatî bi navan re derdikevin meydanê. Di nêrîta devkî de, ku bi rêya van hevpeyvînan gelek nimûneyên wê derketin holê, dewsa ku babet û temayên giştî bînin ziman, wekî serhatî û vegêranên biçûk ên şexsî derdixin pêş ku di heman demê de dibin parçeyê dîroka devkî ya lokal. Leyla Neyzi, balê dikişîne li ser vê rehendê şexsî û rojane ya dîroka devkî û dibêje “dîroka devkî, dikare tevkarîyeke giring li nîrxandina wan qewimînan bike ku di dîrokê de (a nivîskî) bûne cihê nîqaşan û/an jî hatine piştguhkirin... Dêsmîna dîroka devkî ya ku bi subjektîf, rojane û bi vegêranê re girêdayî, dihele ku meriv fêhm bike ka çawa dîrok îroroj ji aliyê şexsan ve tê fêmkirin, şirovekirin û jiyîn.” (2013: 10) Vegêranên şexsî yê li ser navan, bi xwe re serhatî û meseleyên malbatî jî tînin mexderê. Bo nimûne, dema ku pîrsa navên çayîrên wan jê hate kirin, BJ-10, behsa çayîrekî kir ku bi navê Avziha tê nasîn li gundê Gapîra yê Elâşgîrê. Bêyî ku gotina wê bê birrîn, wê berê xeberdana xwe guhest û behsa serborîyeke xwe kir ku li wir qewimîbû. Wê wiha berdewam kir:

Avziha hebû, paleke aha aliyê rêya Çatê va ye. Yanê gişk çavkanî ne, şax in, ha navê wê jî Avziha ye. Ez bêjim eva şaxa jor da hatiye. (Pala li hember îşaret dike), ha

şaxa Nizarê ça jor da hatiye, vê şaxê de av heye, vê da heye. Resûlê kurê kalikê min Îsmâîl *wira* [Avziha] ew bir, Cewê. Diya min sond dixwar digot guliya Cewê mêtrokî zêdetir bûye, sond dixwar. Mêtrok got hindik bû. Got Resûl Cewê hez dike, Cewê dibêje Resûl ez te nastînim. Tu genc î, ez jî qîz im. Ez te nastînim. Resûl jî dibêje tu bimirî ez ê te bistînim. Ew jî dibêje welleh tu bimirî, qet îmkana ku bavê te were xwazgîniyê min, ez bêjim eva ez ê kurê te bistînim tune ye, ez te nastînim, *boşine* serê xwe neêşîne.¹⁰⁶

Tenê navê Avziha¹⁰⁷ serhatiya Cewê anî bîra wê ku diyar e gelek tesîr li ser wê bi xwe jî kiriye. Ev nav dibe wesîle ku gelek adetên berê, têkiliyên hezkiriyên û karên hevpar ên wekî çûna gêziyan giş pêkve bîr vegotin. Meriv gelek bi rihetî ferq dike ku ew nav bi xwe re çîroka xwe jî dibêje. Ji ber ku tu daxwaz û talebeke min a bi vî rengî tunebû. Julie Cruikshank bi xwe jî salixê rewşeke mîna vê dide li herêma Yukonê. Ew destnîşan dike ku li wir binavkirina cih xwedî bandoreke wisa ne ku qewamên çêbûne bi bîr dixê (1990b: 22). Bi taybetî dema ku me pîrsa navê çayîr û zozanan ji kesên biemrî dikir, wan di heman demê de, hin serborî, çîrok an jî efsaneyên derheqê wan deran de jî bi bîr dianîn.

Bi taybetî, bi navan re gelek serhatiyên rêyên kevn an jî şiverêyên di nava çiyayan de derdiketin meydana. Li ser pîrsa bê ka çi qîmeta navê erdekî heye, wê wiha bersiv da:

*En*¹⁰⁸ navê meqbûl, navê erdê ye. Tu îro xeberekî d(ib)êjî ku tu ciyê wî, warê wî nebêjî ka ewa xebera teyê here kî derê bisene? Ewê din gi inda dibin, diçin (ew) xeber. Erd dimîne. Tu carî erd cîkî da nabe. Hezar salê dinê jî bisene, tu eyne dîsa, tuyê werî bibêjî Qopiz. Lê ew xeberê te gotine, xeber gi çûn, erd dimîne. (BJ-10)¹⁰⁹

Navê cihan navên meqbûl û mayînde ne xeberdana (çîrok û serhatî) meriv diçe lê disekine: “xebera teyê here kî derê bisene?”. Herwiha xeberdana merivan gelek bi rihetî tê jîbîrkin û piştî wextan nayê bîra meriv lê nav ne wisa ne. Ew demeke dirêj

¹⁰⁶ Ji bo temamiya vê xeberdana BJ-10, binêre **Pêvek A**.

¹⁰⁷ Cih û devera şilek a ku tê de av dizê.

¹⁰⁸ Bi kurdî, “tewr” û “herî”.

¹⁰⁹ Li vir dixwazim destnîşan bikim ku BJ-10 diya min Nenêya Reşîd e. Ji ber ku hemû beşdar bi rêqem hatin kodkirin, me nexwest insicam xerab bibe û ew jî wiha hate binavkirin.

dikarin bimînin û ji bîr nebin.¹¹⁰ Gelek caran ew mîna erê cihekî da naçin her dimînin. Lewma “hezar salê dinê jî bisene, tu eyne dîsa, tuyê werî bibêjî Qopiz¹¹¹. Lê ew xeberê te gotine, xeber gi çûn, erd dimîne”. Li vir ji erdê qesit nav bi xwe ye. Wate xeber giş winda dibin lê navê erdê dimîne.

Têgihiştin û helwestên li hember navên “nû” yên ji jor ve hatine (da)sepandin bi gelek formên cuda derdikeve meydanê. Ev berxwedanên kom û cemawerê yên lokal ku hember navên (da)sepandî rûdide ji bo keşîfkirina dînamîkên civatî û çandî gelek giring in. Di vê çarçoveyê de xebata etnografîk û sosyo-onomastîk a ku li sehayê encam da, destnîşan dike gelek vegêranên cihêreng ên li ser wate û çîrokên navê cihan hene. Diyar e ku li Agiriyê bi giştî ew nayên “nû” hîn jî cihê xwe başbaş negirtine û di gelek astên cuda yên şexsî û hevpar de formên berxwedanê li hember bikar(ne)anîna wan hene. Navên nû, gelek aliyan de wekî navên qels û sterîl in ku wate û serhatiyên pêwedîdarê wan kêm in.

¹¹⁰ Li ser emrê dirêj ên navan bin. Rose-Redwood, Alderman, & Azaryahu (2010), Jett (1997: 481).

¹¹¹ Gundeke li Elaşgirê dimîne.

BEŞA ÇAREM

NEXŞEYÊN DEVKÎ YÊN NAVAN DI KILAMÊN DENGÊJAN DE

“Singê mi kitûka dengbêjan e

Zarê mi ji dengbêja ra kaxiz û defter û qelem e lo yeman”

Evdalê Zeynikê

Navê cihan, tenê li ser tabelayên bajaran rê nîşanî merivan nadin, ew di nav zanîna çandî ya devkî de jî gelek bi xurtî cihê xwe digirin û dikarin di navbera meriv û mekan de pabendî û aidîyetê çêbikin. Zanîna giştî ya çanda gelêrî û pergala toponîmîk a ku ew çand pê re pêwendîdar e, bi gelek form û wateyên cihêreng ve barkirî ye. Lewma destwerdana ji aliyê desthilatê ve li ser zanîna toponîmîk û zimanî ya civatê çêdibe, zirarê dide wan têkiliyan ku civat bi mekan, raborî û zanîna bavûkalan re saz dike. Dema ku pergala toponîmîk a kurdî tê xerabkirin ku bi salane gelek nexşeyên curbicur û pirtebeqeyî yên qewimînên çandî û dîrokî xêz dike, pê re jî xisar digihe zanîna gelêrî ya kurdî. Bi vî rengî, wate, çîrok û serhatiyên raboriyê jî para xwe ji destwerdana li ser navê cihan digirin. Di çarçoveya toponîmiyê de meriv bi hilsengandina vegêranên gelêrî dikare bergeh û berdiyeke giring dabîn bike ku pê têgihîştina civatê ya li ser navan baştir êşkere dibe. Herwiha, bi nêrîneke toponîmîk a rexneyî, nirxandina encamên tesîr û texrîbata navguhertinê yên li ser zanîn û veguhastina çanda devkî jî giring e, ji ber ku ew zanîn bi rêya navê cihan tê veguhastin.

Li dor çarçoveya li jor behskirî, em asta rûxîneriya guhertinên navan a li ser keresteyên çandî, zimanî û dîrokî dipîvin û ji destpêka navguhertinê heta niha tesîra wê di çarçoveya kilamên dengbêjan de dişopînin.¹¹² Jixwe, nav û wateya guhertina

¹¹² Di vê babetê de divê meriv bîne ziman ku çîrok û vegêranên din ên devkî li derveyî vê nirxandinê hatine girtin, ji ber ku kilam heta raboriyeke nêzik jî bi rengê tabîî tevkarî li hilberîna çandî dikir lêbelê çîrok ji ber taybetmendiya xwe, ji qedîm de bi guherînan ve digihîjin ber destê me. Ji bilî çîrokan heyranok, pêkenok, serhatî û destan jî li derveyî vê babetê ne. Kilamên ku di vê beşê de li ser

wan ji bo civatê bi rêya hevpeyvîn û çavdêriya li qadê hatibû nirxandin (binêre beşa 3an). Lêbelê ji bo ku nirx û fonksiyona wan ji bo nerîta devkî ya kurdî eşkere be, pêdivî bi vekolîneke li ser deqên kurdî yê kilaman çêbû. Ji ber ku di kilaman¹¹³ de komstêrkên navan, formên *topogenyê*, gelek qalibên vegotinê tên dîtin ku tesîrê li vegotin, peyam û çerxa dêsmanî ya çîroka kilamê dikan.

Di nav civata herêmî û hilberînên çandî yê wê civatê de qîmeta navên kurdî, hêz û temsîla wan a sembolîk, nêrîna xakî û aidiyeta bi welat re ya ku di wan de berçav dibe bi hin nimûneyên ji kilaman ve tên analîzkirin. Pabendî û têkiliya ku folklorê kurdî bi cografya û navên cografîk re çêkiriye, dikare bi nêrîneke mekanî, navnasî, civatî, etno-ekolojîk ve bê ron û eşkerekirin. Lewra heta ji bo civata kurdî nirx û qîmetê navan bi xwe diyar nebe, bi navguhertinê re tesîr û texrîbata ku li ser çand û bîra hevpar a kurdî çêdibe dê baş neyê fêmkirin. Dîsan meriv nikare bi hin normên rojavayî ve zanîna toponîmîk a kurdî û rewşa wê ya taybet binirxîne, ji ber ku toponîmên di kilamên kurdî de hin taybetmendiyan xweserî xwe nîşan didin. Ji bo tesîra navguhertinê ya li ser vê zanînê zêde be, divê meriv taybetmendiyan wê zanînê başerê destnîşan bike.

Deqên ku korpûsa vê beşê pêk tînin ji çanda devkî hatine wergirtin û xebat li ser formên wan ên nivîskî hatiye kirin. Bi gotîneke deqîqtir, ji bo vê beşê, çavkaniyan serekî kilamên du dengbêjan in ku hatine nivîsandin. Bi rengekî giştî, çî nivîskî û çî jî bi devkî, têgiha *deqê* di vê beşê de îşaretê bi berhema devkî dike (bin. Fine, 1984). Kilamên Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro yê ku ji aliyê Güneş û Şahin ve (2019a; 2019b) hatine bidefterkirin û bernivîsandin dibin deqa çavkanî ya vê xebatê, bi

xebat tînin kirin, ew kilam in ku ji kasêten wan dengbêjan hatine bernivîsandin û weşandin. Lewma, xebateke li ser dengê kilaman ên nenivîsandî, meriv ji nêrîneke kamil û giştî mehrûm dike û nivîsandina wan jî bi tena serê xwe karekî zehmet e.

¹¹³ Di vê xebatê de, hem sînardarkirineke herêmî hem jî yeke şêwezarî heye. Materyalên kilaman ji şêwezarê kurmancî hatiye hildan ku wekî herêm jî bi Serhedê re sînardar e, lewma vegêranên devkî yê li ser zazakî, soranî û hewramî nakevin çarçoveya vê babetê; ew bi dînamîk û taybetmendiyan xwe yê cuda ve divê bi rengekî berfireh bînin xebitandin. Kilam di pêwenda xwe ya çandî de dikarin hin xweseriyên nîşan bidin ku ji herêmekî heta herêmeke din guhertinên berçav tînin. Ji ber vê yekê jî meriv nikare, bi heman boçûnê hem stranên li Silêmaniyê, hem ên li Dêrsimê an jî li Serhedê binirxîne, mimkin e ku ew zêdetir di çarçoveyê berawirdî de li gel hevdu bînin analîzkirin.

taybetî jî ji bo analîza hejmarî ya navan. Herwiha, ji bo nimûnegirtin û nirxandina li ser navên cihan ji çavkaniyên din jî hatine istifadekirin, bi taybetî kitaba Gültekin (2013) ya bi navê *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. Di çarçoveya sînardarkirina babetê de vê vekolînê bi taybetî hin kilamên Agiriyê û derdora wê hîlbijartine, bi taybetî kilama Elî Xarza û kilamên têkildarî Zilanê ku bi serhildana Agiriyê re jî pêwêdîdar in. Bal û cexta serekî ya vê beşê lewma li ser deqa kilamên devkî bi xwe ye û gelek aliyên din ên civatî, çandî û muzîkal ên kilaman di vê çarçoveyê de li derveyî babeta serekî dimîne.

4.1. Navê cihan û zanîna xwecihan

Yek ji armancên vê beşê ji bo xwecihan destnîşankirin û keşîfkirina rehendên çandî û folklorî yên navên erdan e. Xebatên toponîmiyê yên ku xwe dispêrin paşxaneyêke antropolojîk û folklorîk ne tenê wezîfeyên navan lê dikolin, ew herwiha tesîra miteqabil a di navbera meriv û navan de jî didin ber xwe bi tevî girêdanên wateyî yên ku meriv bi navê cihan re çêkîrine. Navê cihan heta niha hem ji aliyê nirxê xwe yê etnografîk ve hatine vekolîn hem jî cihê wan ê di nav nerîta devkî de hatine nirxandin. Bo nimûne, W. F. Nicolaisen, tevkariyêke baş li ser xebatên navan û wateyên wan ên di nav vegêranên devkî û nivîskî de kiriye (bin. 1961, 1973, 1974). Herwiha, bi rengekî dîrokî xebatên etnografîk ku wekî parçeyêke çanda civatî bala xwe dide ser navan, vedigere heta destpêka sedsala 20an. Xebatên ewil ên di vê qadê de ji aliyê Franz Boas ve hatiye kirin ku wekî “bavê antropolojiya Amerîkayê” bi nav û deng bûye.¹¹⁴ Boas piştî ku li ser navê cihan ên xwecihên Amerîkayê xebatên xwe yên ewil (bin. 1934) dike kartêkeriyêke mezin çêdike li ser vekolerên peyrevên xwe ku qismek ji wan xwendekarên wî bûn.

Yek ji wan kesên herî giring ê hevçerx ku balê dikişîne li ser rehendê etnografîk û antropolojîk ê navan Keith Basso ye (Thornton, 1997: 209). Basso bi gelek xebatên xwe (1988; 1996) yên li ser têkiliya navên cihan û çanda xwecih vekolînên qadê meşandine û rehendê çandî yên navan di nav civatên xwecih ên Amerîkayê de nîşan daye. Dîsa jî pey Basso re eleqeyêke berçav di nav zimannasên antropolog de, bi

¹¹⁴ Ji bo rol û pêşengiya wî di xebatên li ser navan de, bin. Thornton (1997).

taybetî di nav xwendekarên wî de belav bûye. Bi taybetî cihetên sembolîk ên navê cihan, rola navan di veguhezandina çand û baweriyê de, fêrkirina rabûn-rûniştinên li gorî exlaqê û hin adetên gelêrî yên bi vî warî re têkildar hatine vekolîn. Keith Basso di kitaba xwe de ya bi navê *Wisdom Sits in Places* [Ferasetê li Erdê Hêwir Daniye] (1996), qedera sî salî di nav xwecihên amerîkî –apaçî– de li ser nexşekirina navê cihan dixebite û ji gelek cihetan ve di wê lêgerînê de ye bê ka navê cihan bi çi rengî li nav wî gelî de hatine saz kirin û binyada zimanê wan çendî bandora xwe heye li ser beşerkirina wan a ji erdê.

Berî ku nav bibin babeta xebatên etnografîk, ew ji aliyê etîmolojîk û dîrokî ve dihatin vekolandin û rehendên wan ên çandî û civatî bi têra xwe bala vekolerên qadê nedikişand. Piştî van xebatên navbirî yên pêşeng, ev qad bi beşdariya gelek xebat û vekolerên din, bi pêş ket û lîteratureke xurt ava kir. Li ser navê cihan ango toponîman û li ser têgihiştina merivan ji erdê bi rêya navan, gelek xebat li ser vê qadê zêde bûne di nav gelên cuda de.¹¹⁵ Xebatên bi vî rengî yên bi nêrîneke antropolojîk ve li ser toponîman hatine kirin, bikaranîn û qîmeta civatî û çandî ya navan di nav gelên xwecih ên dinyayê de nîşan didin. Ev xebat destnîşan dikin bê ka ji bo her gelekî bi çi rengî fêmbariya li ser navan diguhere û vegêranên devkî çawa têkilî û pabendiyê bi erdê re saz dikin. Lewma, pêdivî pê heye ku nav bi renekî pir-rehengî bê bicihkirin di nav xebatên vê qadê de.

Gelek xebatên ku vê qadê bi renekî eşkere nîşan didin ku kom û cemawerek diqewime¹¹⁶ ku wateyeke xweser ava bikin li ser mekan an jî bi wî navî re ku ew mekan pê tê nasîn. Di vê pêwendê de, Basso (1996: 76) radigihîne ku navê cihan di ferhenga hemû zimanên nasyar de, birîtiye ji milkên wateyî (*semantic domain*) ên cuda û taybetmendiyên fermî yên sîstema navê cihan bi tevî girêdanên mekanî û etîmolojiyên dema borî, ji kevn de bûye babeta lêgerînên antropolojîk. Lêbelê li gorî wî, çalakiya gişgir a cihnavandinê (*placenaming*) –bikaranînen navê cihan di nimûneyên berçav ên xeberdana rojane de– gelek bi kêrî bala zimannas û

¹¹⁵ Bo ninûme, bin. Basso 1988, 1996; Cruikshank 1990a, 1990b; Thornton 1997, 2008; Hunn 1996; Kari 1989; Kari & Fall 2003.

¹¹⁶ Li vir di wateya “dibe ku”, “ihtimal heye ku” de tê bikaranîn.

etnografan kişandiye. Ji ber ku ew qîmeta navan bilind dinirxîne. Li gorî Basso gelek fonksiyonên navan hene ku meriv dikare wiha rêz bike:

(1) Wêneyê hişî (*mental image*) yên pêgeheke cografîk a diyar çêdike; (2) pêş-tekstan bi bîr dixê, ên wekî çîrok û destanên dîrokî; (3) nirx û derbasdariya hikmên exlaqî yên nerîtî piştrast dike (b.n. feraseta bavûkalan); (4) dîqetêke nazik û zîz dikêşe li ser bergehên ku hem rûyên wan ên erênî û hem jî yên neyînî hene; (5) xema hestên xêrxwaz û alîkariya takekesî hildigire ser xwe (6) şîretên pratîk pêşkêş dike ji bo eleqedarbûna rewşên takekesî yên acizker (b.n. serî li feraseta bavûkalan bide); (7) fikrên xemgîn ku ji ber endîşeya zêde pêk tê, vediguhêze li ser yên meqbûltir bi rêya xweşbînî û hevîdariyê; (8) rihên birîndar pak dike (Basso, 1996: 100).

Navên cihan ku ji bo civatekê nispeten bi rengekî kêmtir giring bê dîtin jî, bi pêçevane, ji bo civateke din dikare bibe werçerxa bibîrxistina dîrok, efsane û vegêranên din ên devkî. Wate, nav ji bo her civatê wateyeke xwe ya xweserî xwe heye û taybetmendiyên resen dikare nîşan bide. Ji ber vê yekê ye ku xebatên li ser navê cihan, li ser çand, dîn, dîrok û folklorê gelekî dikarin bi xwe re teferûatên balkêş û kêmpayda bînin ber zanîna merivan. Lewma bi nêrîna antropologan navê cihan ne peyvên razber in ku dûr bin ji wateyên ku meriv bi xwe re têkildar dike, lêbelê dema ku ew di pêwendêke civatî û çandî de bînin bicihkirin, dê bi rihetî bê dîtin ku ew peyvên wisa ne ku bi tebeqeyên wateyê barkirî ne ku ji hêla wate û qîmetê ve bergindê wan di nav civatê de serincê radikêşe. Wekî yekeyeke zimanî navê cihan, tevkarîyekê dike li nav şeweya me ya watedarkirina dinyayê û herwiha ji bo çand û veguhastina çandê jî alîkariya bîra hevpar û dîroka devkî dike bi rêya pêşkêşkirina wêneyên hişî (*mental image*) ên wan qewimîn û serpêhatiyên ji bo gel bi qîmet. Heta ku di cihanbîniya merivan de ku wateya navan bi eşkereyî neyê destnîşankirin û têgihiştin bi rengekî giştî wateya wan a di nav civatê de jî bi temamî neyê fêmkirin. Jixwe bi xebatên etnografîk ve jî berçav dibe ku para pir a gelên xwecih ên li çarnîkarên dinyayê bi şeweyê û şirovekirinên gelek cuda ve nêzîkî navê cihan û erdê xwe dibin ku ew awayê nêrîna wan, cuda ye ji fêhm û têgihiştina navan a dinyaya rojavayî û Ewropa-navendî. Herçiqas hin qalibên fikrî yên dinyaya rojavayî li ser navê cihan, îro wekî pîvan û normên qebûlkirî bînin dîtin jî, gelên xwecih bi cihanbîniya xwe ve pencereyên nû yên wateyê li ser navan vedikin. Lewma jî ew qad

divê giringiyê bide wate û zanînên xwecih jî, ne ku xwe tenê bispêre wan fikran ku çavkaniyên wan ên sereke ji nêrîn û çarçovekirinên rojavayî pêk tî.

Gelek vekolînên ku bi gelên xwecih re hatine kirin asoya li ber têgihiştina wateyî ya navan fireh kir û cihê navan bi giştî di nav milkê zihnî de destnîşan kir. Basso dema ku vekolînan di nav xwecihên amerîkayê de dike, dikeve wê firqê ku toponîm di nav vî gelî de wate û rolên cuda hilgirtiye ku fêmkirina wan zehmet e û naşibe wateyên ku dinyaya rojavayî li navê cihan bar kiriye. Basso dema prosesa xebata xwe de navê avzêmekê çend caran bi xeletî bi lêv dike, ji ber vê yekê lêborîna xwe dixwaze û dibêje ji ber ku xeberdana wan tê qeydkirin, wê paşê li ser bixebite da ku rast telafûz bike. Lêbelê kesê xwecih ê ku jê re rêberiyê dike îşaretê bi giringiya bilêvkirina navan dike û ji hevalê xwe re bi zimanê xwe wiha qala Basso dike:

Tiştê ku ew dike ne rast e. Ne baş e. Tu dibêjî qey di nav lezûbezê de ye. Çima wiha dilezîne? Ev bêhurmetî ye. Bavkalên me ev nav çêkiriye. Ev nav eynî bi navê xwe yê niha çêkirine. Ji ber sebebekê çêkirine. *Ewil ew pê kelimîne, gelek ji zû de!* Ew kelimên bavkalên me diwekilîne. Ma vê yekê nizane. Jê re bêje ew kelimên bavkalên me diwekilîne (Basso, 1996: 10).¹¹⁷

Li vir ferqên serekî yên di navbera cihanbîniya rojavayîyan û xwecihan de gelekî bi zelalî diyar dibe. Rojavayî bi giştî bi fonksiyoneke pêgehî û referansê li navê cihan dinêrin, lêbelê gelê apaçî wekî kelim û xeberdanên bavkalên xwe dibînin ku nikare bê guhertin û bi xeletî bê bilêvkirin an na vê yekê wekî bêhurmetiya li hember kelimê dibînin, ji ber ku bi wî rengî nav lê hatiye kirin. Herwiha, xebatên Basso destnîşan kiriye ku cihên navên xwecihên amerîkî berawird li gel zimanên hînd-ewropî bi awayekî cuda hatine lêkirin di zimanê wan de û dêsmara ristesaziya zimanê wan derfetê dide ku ew bi rengekî cuda fêm û ferasetê ji erdê werbigirin. Nav, wekî sembolan dibin amraza ku em pê qewamên dûredest, di milkê hiş û xeyalkirinê de berdest bikin. Ew ne tenê nerîtên civatî dikare ava bike, lê herwiha ew bi derbasbûna demê re dibe parçeyeke dêsmara bîra şexsî û civatî. Di dinyaya apaçîyan de, li gorî Basso cih û navê cihan bi wateyê ve heta ber devan tijî ne, bitûniya dîroka merivan bi şîretbêjî û nutqdanê vedigêre û bergewde dike; bilêvkirina navê cihekî, vegotina

¹¹⁷ Nivîsa îtalîk aidî nivîskar e.

çîrokekê bîrê şiyar dike, hemû tiştên li wir qewimîne bi bîr dixê û di nav civatê de wê berdest dike (1996: 115).

Keith Basso (1996) destnîşan dike ku navên erdan ên apaçiyên rojavayî (*Western Apache*) di pêwendêke taybet a çandî de bicihkirî ye û navê cihan hesta aidîyet û nasnameya civatî dide çêkirin. Herwiha Stephen Jett (1997) derdixê holê ku têkilî û kartêkeriya ku hîndiyaniyên navahoyê (*Navajo*) bi dorhêla xwe re çêdikin ji aliyê navê cihan ve şikil digire. Kelley û Francis (2005: 99,104) di vekolîna xwe ya li ser nexşeyên devkî yê navahoyiyan de, destnîşan dikin ku çîrok û kilamên wan mîna nexşeyan kar dikin û di wan de agahiyên ji bo rêdîtîne tên kodkirin. Bi heman rengî, Cruikshank (1990b: 71) ji xebatên xwe yê qadê wê encamê derdixê ku ji bo kal û pîrên athabaskanê yê li herêma Yukonê, erd ji temayeke mudaxil zêdetir e; wisa diyar e ku mekanê bi kar tînin (di forma navê cihan û vegotinên ger û geştê de) ji bo derheq zeman de xeber bidin û bifikirin. Taybetmendiyên bi vî rengî dibin sembol û rê didin ku meriv derheq çandê de xeber bidin. Dîsa di nav xwecihên Dena'îna Athabaskan ên li Alaskayê de navê merivan nadin erdê, ji ber ku vê yekê wekî biçûkxistina bavûkalan dibînin û bi heman rengî navên nû ji aliyê şexsan ve nayên saz kirin (Kari, 1989: 142). Çawa ku li jorê jî hate destnîşankirin navê cihan di her çandekê de bi heman rengî kar nakin, carcar di nav hin çandên ne-rojavayî de, bi taybetî di nav wan gelan de ku nivîs dereng pêş ketiye form û wateyên taybet werdigirin.

Navên cihan nîşan dide ku civatek çawa şiyanweriya zimanê xwe bi kar tîne, çi şayanê bibîranîne dibîne û çi piştguh dike û bêqîmet dibîne, di çi çarçoveyê de têkiliya mekan û bîrê nîşan dide. Bi taybetî, di nav gelên ku xwendewarî lê kême û nivîs bi pêş neketiye, rol û fonksiyona ku vegêranên devkî hildigire ser xwe (Assman, 2018) bilindtir dibe. Ji bo gelên xwecih, navê cihan ku tevî nerîta devkî dibin wekî nexşeyên devkî pêwendîdariyê di navbera meriv û mekan de saz dike (Oliveira, 2009: 106). Di pêwenda zanîn, belavkirin û nasyarkirina navên erdan û cografyaya nêzîk de berbelavî û hebûna gelek navên cih, war û gundan di nav kilaman de mihim e. Hemû vegêran (*narrative*), çi kin çi jî dirêj (çîrokên jiyanê û serhatî) referansê didin navên cihan; ew roleke berçav dilîzin di birêxistina cih de ji ber ku ew ne tenê cih terîf dikin, di heman demê de, wê diafirînin ji bergeheke çandî

ve kakilekê jê re dabîn dîkin (Economou, 2014: 273). Çawa ku de Certeau tîne ziman; “wexta ku vegêrana cihekî tê jibîrkirin, wê demê cih bi xwe jî tê jibîrkirin” (Vghz. Economou, 2014: 273).

Eger em, ji perspektîfeke nav û navnasiyê ve li vegêranên kurdî binêrin, em dê bibînin ku ev qada xalî gelek zanînen balkêş di hewîne û rengvedanên wê di qadên din ên afirineriyê de jî hene. Meriv dikare bibêje ku ji edebiyatê¹¹⁸ heta vegêranên folklorîk ên kurdî ji wir heta nêrînen etnografîk ên ji nav kurdan nav û binavkirin hêjayê vekolînê ne. Di afirineriyên gelêrî de nav fonksîyoneke berçav hildaye ser xwe. Ev yek ji ber vê yekê ye; kurd hemû der û deverên wisa dinavînin ku bi taybetmendiyeke xwe ve berçav in yê wekî kevir, dar, çem, newal, gelî û hdw. Ev yek jî rê li ber wê yekê xweş dike ku kurd bi erdnîgariya xwe re pevgerîdaneke hestî çêbikin ji ber ku cihên navandî dibin navendên serborî û vegêranên takî, bi vî karî, ew tev li vegêranên rojane û yê derasayî yê wekî efsaneyan dibin.

Meriv dikare bibêje ku eleqe û bala akademîk zêde neçûye li ser bikaranîna nava di nav kilaman de û rol û fonksiyona ku ew radigirin li ser xwe. Dîsa jî pîrbûna nava di nav kilamên dengbêjan de bala Hamelinkê (2014) kişandiye, wê di xebata xwe de ya bi navê *The Sung Home: Narrative, morality, and the Kurdish Nation* di binbeşe biçûk de bi kurtî behsa nav û rola wan kiriye di nav kilaman de. Zêdebûna nava di nav kilamên dengbêjan de bala wê kişandiye, li gorî wê dengbêj bi rêya nava nexşeya herêmî ya kurdî xêz dike û di heman demê de ew navê di kilamê de wekî “noqteya referansê” kar dike. Helbet rola ku nav di nav kilaman de digêrin, hêjayê nêrîneke berfireh e û ji bo karekî bi vî rengî jî raçavkirina bi sedan kilaman lazim e. Bi vê armancê, di binbeşên bê de rola dengbêj di pêwenda hilberînen hunerî yê toponîmîk de tê nîrxandin. Bi awayekî giştî ne fermî bin jî, navên kurdî ew belgeyên saxlem in ku di nav kilaman de li civatê digerin û awayê têgihîştin û nêrîna kurdan û bavûkalên wan pêşkêş dîkin.

¹¹⁸ Di nav edebiyatê de jî bi taybetî di roman, helbest û çîrokan de gelek caran amaje bi nava û guhertina wan hatiye kirin. Welata û bajarên nebinavkirî û navên çîrokî yê di nav roman û çîrokên kurdî de şayanê vekolînan ne.

4.2. Dengbêj(î) û gera daimî û kilam

Dengbêjî bi terîf û şiroveya navê xwe ve cextê dibe li ser deng û bêj(î)yê. *Deng*, îşaretê bi wê deqa devkî ya hunerî dike ku bi *bêjê* ve dibe meqamê ku tê vegêrandin. Bi vî awayî, îcrakirina performansa dengbêj a vegêraneke hunerî li ser du tiştên esasî ava dibin: çîrok (*deng*) û performansa wê ya hunerî ya vegêranê (*bêj*). Dengbêj di çand û dîroka kurdî de xwedî cihekî taybet e. Bi taybetî ev du deheyên dawî dengbêjî dibe mijara gelek xebatên akademîk û berhevkarîyê ku tê de li ser jiyan û kilamên wan agahî tên dayîn (Kevirbirî, 2009a, 2009b, 2001; Yüksel, 2011, 2016, 2019a, 2019b; Schäfers, 2015, 2019; Hamelink, 2016; Hamelink & Barış, 2014; Scalbert-Yücel, 2009; Kardaş, 2017, 2019; Amy de la Bretèque, 2018). Ji ber hindê, li ser dengbêjî û vegêranên wan ên hunerî li vir hewce nake ku babet dirêj bibe. Ji ber ku xebata berdest tenê li ser navê cihan radiweste, pêdivî pê heye ku meriv li ser wan taybetmendiyên kesê dengbêj raweste yê ku dihêlin ew bibin xwedî zanîneke xurt a toponîmîk.

Gelek taybetmendiyên kesê/a dengbêj hene ku wî/wê ji kesên din cuda dikin. Berî her tiştî ew xwedî bîr û hafîzeyê xurt in ku dikarin bi sedan kilaman ji ber bikin an jî biafirînin. Ew bi tevî kilamê hurgilî û agahiyên li ser qewimîn an jî kesê berbehs ê di kilamê de jî dizanin. Dengbêj, bi hafîzeyê xwe ya xurt ve nêznasê civata xwe ye; ew kevneşopî, erf û adet, rabûn-rûniştin û erdnîgariya çandî ya lokal û giregir, eşîr û malbatên serekî yê civata xwe nas dike. Bi gelek şeweyan zanîn û tecrîbeyên wan çêdibin li ser civatê û qewimînên girîng ên civatî, hin ji wan di heman demê de dibin çîrokbêj û destanbêjên serkeftî jî û nîrx û babetên çandî roleke diparêzin û neqil dikin.

Dengbêj bi gerokbûna xwe ve mînanî mêşa hingiv ji gelek der û deveran qiset û çîrok, serhatî û qal û qewimînan hîn dibin. Ew, bi van gerên xwe ve ku bi gelemperî wekî parçeyê karê wan bi xwe bû, -lewra diçûn şahî, danîna kirîvatî û dawetan- li ser cografyaya xwe ya fîzîkî û çandî dibe xwedan agahî û zanînen kûr. Ji ber taybetmendiya karê xwe dengbêj tim di nav civatê de li dawet û şahîyan geriyane û

gund nemane ku ji bo dawet û şahiyar ziyaret nekiribin.¹¹⁹ Di xebata sehayî û hevpeyvînan de hate dîtin ku dengbêj ji dawetekê ji bo yeke din, ji gundekî bo gundekî din tim li ser rê û dirban e û erdnîgariya xwe ya lokal bi tevî çiya, newal, gund, zozanan ve baş hîn dibe û ne tenê navê wan dizane, di çarçoveya devera xwe ya lokal de serdana gundan dike û li gundan çend rojan kilaman dibêje.¹²⁰ Di van gerên xwe de, nîrx û normên civatî, kesayetên giring ên civatê nas dikin.

Gerokbûna dengbêjan ne tenê bi çûnhatina gundan re sînordar bû, gelek kesên dengbêj bi malbatî koçî gund û navçeyên cuda dikin heta dawîya emrê xwe ew her tim mala xwe bar dikin û diçin der û devereke nû. Gelek sebebên van koçên dengbêjan hene yê wekî ezimandina ji aliyê mezinekî ve, lihevnekirina bi gundiyan re, feqîrî û hwd. Helbet, ev koçberiya wan a bi rihetî tê kirin ji ber ku bi piranî dengbêj bi hunera xwe ve debara xwe dike û zêde bi karên çandiniyê re mijûl nabe. Ji ber vê yekê jî tiştekî tune ku kesê dengbêj bi gundê wî re zêde girê bide.¹²¹ Yek ji wan dengbêjên herî navdar, Dengbêj Reso jî mîna gelek dengbêjên din li tu gundî bi demeke zêde dirêj nehêwiriye:

Reso di 1951an de ji Gopala koç dike di rêzê de diçe Xêrgîs, Arincîk û Xoşgeldiyê û heta 1957an li van hersê gundên li ser navçeya Kopê dimîne. Di 1957an de dîsa vedigere Gopala û salekê lê dimîne. Paşê 1958an de li ser daxwazê mala xwe dibe gundê Koxakê ya li ser navçeya Kopê û heta 1963an li wir dimîne. Dîsa vedigere Gopala û sê salan lê dimîne. Di 1966an de mala xwe bar dike îcar diçe gundê Piyongê ya li ser navçeya Kopê, çar salan li wir dijî. 1970an de dîsa vedigere Gopala û heta 1972an li wir dimîne. 1972an de îcar koçî gundê Qeraxlî ya li ser navçeya

¹¹⁹ Taybetmendiya gerokbûna dengbêj ne ku bi tenê di nav dengbêjên li Serhedê de heye, gelek kesên li deverên kurdên elewî yê li Bazarcix û Depê diyar kirine ku berê dengbêjên ji Riha û Diyarbekirê bi ser piştên hespan deverên wan ziyaret kirine û li gundan ji wan re kilam gotine (Hamelink, 2014: 42).

¹²⁰ Bo nimûne, Dengbêj Kazoyê Garisya li gundên Deşta Elaşgirê ji bo dawet û şahiyar hatine vexwendin, meriv dikare bibêje ku gundek nemaye ku Kazoyê Garisya neçûbe lê nebibe mêvan û çend şevan ji wan re kilam negotibe. Heta ne tenê gundên Elaşgirê geriyaye, li gelek gundên Qereklîsê bi tevî navçeyên wan û gundên Kaxizmanê jî geriyaye ku wekî Newala Kaxizmanê tên zanîn.

¹²¹ Ev diyarde bi gelemperî ji bo wan dengbêjan rast e yê ku karê wan ên serekî dengbêjî ye û li dawet û şahiyar digerin. Lêbelê, hin dengbêj hene ku bi hunera xwe gelek pêş ketine û ber re jî karekî din kirine wekî melatî û xweyîkirina heywanan.

Kopê dike û çar salan li wir dijî. 1976an de ji ber sedemên aborî biryar dide biçê metropolên Tirkîyeyê. Reso bi tevî malbata xwe li bajaroka Golmarmarayê ya girêdayî navçeya Akhisar a Bajarê Manîsayê dimîne. (...) Piştê jî di sala 1980an de vedigerin Mûşê, gundê Pagê (Güneş & Şahin, 2019a: 29-30).

Heman ger û barkirina di nava gundên cuda de di gelek dengbêjên din de jî heye. Dengbêj Şakiro jî heta dawîya emrê xwe li gelek gundan digere û li wan deran bi salan dimîne (bin. Güneş & Şahin, 2019b: 33-40). Herwiha, Dengbêj Keremê Kor jî ji ber sedemên cihêreng li gund û deverên cuda dimîne û tim digere (M. Kılıç, Hevpeyvîna Rûbirû, 2yê Tebaxê, 2020). Ev barkirinên bi malbatî û gerên li gundan taybetmendiyan kesê dengbêj diyar dikin; ew bi van gerên xwe ve, bi hevnasînan xwe yên bi gelek kesan re, dibin guhdar û şahidê gelek qewimînan, guhê xwe didin serhatî, êş, evîn û şerê eşîran. Dengbêj, di ger û geştên xwe de bi rêya danûstandinên bi dengbêjên din re repertuara xwe dadigire û kilaman di nav civatê de digerinê.¹²² Zanîna wan a cografîk, bi taybetî zanîna wan a li ser navê gund, newal, zozan û golan bi gerê wan re di nav gel de jî belav didin. Navê şexs û cihên ku di kilamê de derbas dibin, nîşan didin ku vegêr û kesê ku qewam¹²³ bi xwe jiyaye çendî pabend in bi cografya û civata xwe re. Dengbêj ketine rêyên gundan ên gelek dûr da ku herin kilaman bibêjin û li ser wan rêyan de gelek serhatiyên wan çêbûne û hin ji wan kirine kilam.¹²⁴ Dema ku dengbêj diçû cihekî gelek caran bi peyatî hin caran bi erebeyên ga an jî bi hespan diçûn ji ber ku wesayît tunebû. Di vê rewşa zehmet de, rêwîti dirêj dibû û dengbêj gund bi gund, çem bi çem topografya û toponîmên welatê xwe bi xwe

¹²² Ew carcar dema ku salixê kilamekê hildidin, ji bo kilamekê diçûn gundên dûr û ji wî kesî kilamê berdigirin ê ku bi xwe ne dengbêj e lê mesele li ser wî qewimiye. Di hevpeyvînêkê de ku min bi destebirakê Kazo, Hecî Mihemedê Ferman (Çaçan) re çêkir, wî behsa çîroka kilama Porsorê kir û beşek ji kilamê got. Li gorî wî, dema ku kilam li ser Porsorê hatibû derxistin û li ser zarê dengbêjan belav bibû, keça bi navê Porsor hê sax bû û kesê ku kilam li ser hezkiriya xwe Porsorê derxistibû, Êsivê Huso bû û Dengbêj Kazoyê Garisya kilam ji ber wî hilda (H. M. Ferman, Hevpeyvîna rûbirû, 22ê Îlonê, 2020).

¹²³ Di vê beşê de ji bo peyva “bûyer”ê peyvên wekî “qewimîn”, “qal” û “qewam” hatine bikaranîn ku bi naveroka kilaman re li hev dikirin. Ev yek ji bo vê beşê bi zanebûn hate tercîhkirin.

¹²⁴ Gelek kilam di encama ger û geştên dengbêj bi xwe de derdikevin. Bi taybetî hin dengbêj dema ku diçûne cihekî serhatiyên xwe yên rê an jî dengbêjê ku pê re dikevin lecê dikin nav kilama xwe.

tecirbe dikir û hîn dibû bê ka çi gund hene li herêma wî ya nêzîk û dûr û navê wan çi ne. Herwiha, zanîna dengbêjan a rê û bihurên di nav çiyayan de, çûyîna wan a li gund û mezreyên gelek dûr ên çiyayî nîşan dide ku wan di nav danûstandinên civatî yên xurt de hunera xwe îcra kirine. Bi taybetî, cografyaya lokal a ku dengbêj pê re girêdayî ye ji aliyê zanîna erdê ya fîzîkî û çandî ve ji teref dengbêj bi xwe ve tê bidestxistin. Ev tecirbe û zanîn di afirîneriya kilam û mekanê kilamê de ji wan re dibe malzemeya vegêrana kilamê û dihêle ku ew qal û qewamê baştir nexşe bike û bisêwirîne.

Dengbêj bi zanîneke xurt a toponîmîk ve kilamên xwe diafirîne û ew di heman wextê de, dema performansê xwe de, zanîna xwe ya toponîmîk vediguhêze cimaeta hazir û guhdar jî. Bi vî rengî zanîna berfîreh ya li ser toponîmên dorhêla nêzîk û dûr li dîwan û dawetan di nav gel de belav dibe. Kilam jî di devê dengbêj de dibe wekî amrazê nasyarkirin û kişandina nexşeya xeyalî ya kurdî û helbet ew dibe amraza fêrkirina toponîman û bi giştî jî topografyaya kurdî.

Berhema hunerî ya dengbêjan ku “kilam” e, bi terz û uslûbeke nêzîkî axaftinê ya bi meqam tê vegêran ku bi gelemperî dirêjahiya wê li gorî cureya wê diguhere û pirranî bi demê re dibin anonîm jî, hindek ji wan diyar e ku ewil ji aliyê kê ve hatine gotin. Gelem kilam xwe dispêrin qewimînên rastîn, piraniya qewimînên ku di kilaman de tên behskirin, di sedsala 19an û 20an qewimîne û ew şikil didin fikrên derheq kurdûnê, nasname û aidûnê de” (Hamelink, 2014: 77). Di çarçoveya rêzkirina navan de tesîra cureyê li ser rêje û pêşkêşkirina *navbêjiyê* jî heye. Bi qewlê Allison, cure¹²⁵ an jî forma kilamê di nerîtê de tê pêşkêşkirin, hemû siberoja wê nêrîtê diyar dike. Çunka ew ne tenê wê dixê nav qalibekê, lêbelê ew di heman demê de dorhêleke performansê jî dabîn dike ku wekî dîrok ji bo dewamdariya wê giring e (Allison, 2001: 204).

¹²⁵ Cureya kilamê di heman wextê de çarçoveyê vegêranî ya şewazî ya kilamê jî diyar dike, digel gelek qalibên din ên ku şikil didine kilamê. Bi taybetî ji bo kilamên kurdî, cure li ser vegêran, deng, vegêr, bergeh û naveroka kilamê tesîr dike. Nav jî vegêrana kilaman xurt dike û bi cureyê re têkildar wekî yekeyê vegêranî ya çîroka kilamê tevdigere.

4.3. Rol û erka binyadî û wateyî ya navan di kilaman de

Navê cihan bi regekî çalak li tev vegêranên kilaman dibin. Ew şekl û şêweza binyadî ya kilamê de wekî kevirê qorziyê kar dikin û dibin bingeş û palpişt a ku carcar ber û meyla vegêranê diyar dike û wê li ser mekan bi cih dike. Lewma, ew ne tenê pêgeh û lokasyona şer û qewimînê dabîn dike, lê herwiha ew wan cih û waran nîşan dike ku têkilî û kartêkeriyên merivan lê gelek xurt bûne. Lê divê dorhêla fîzîkî jî neyê piştguhkirin a ku bi gelemperî piştî mekanê (navê mekanê) tê. Ango nav, bi xwe re mekanê temsîlkirî wekî dîmenekê dide xeyalkirin û kameraya vegêranê ji mekan ber bi karakterên li mekanê diguhêze ku di nav liv û tevgereke civatî de ne. Ev tevger û qewama civatî û çandî ku di kilamê de pêk tê, îşaretê bi bîreke civatî û hevpar dike. Îcar gelek fonksiyonên navan hene, hin ji wan ji aliye dêsmanî/binyadî ve kilamê birêkûpêk dike, hin ji wan ji aliye wateyê ve li ser rehendên wekî bîr, jiyan, çand û civatê kar dike. Lewma di vê çarçoveyê de, ev beş van herdu aliyên navan dide ber xwe û wan rave dike.

Nicolaisen di xebata xwe ya bi navê *Place-names in Traditional Ballads* (Navê Cihan di Baladên Nerîtî de) de nîşan dike ku ji aliye teşenasiya *balladê* ve, navê cihan dikarin wekî amrazê binyadî (*structural device*) kar bikin. Li gorî wî rola navê cihan wekî hêmanekê binyadî di nav balladan de eşkere ye. Herwiha ew destnîşan dike ku di *balladan* de carcar navê cihan kafiyeçêdîkin li dawiya malika risteyan de (Nicolaisen, 1973: 303-304). Eynî wekî *balladan* û heta ji wan gelek zêdetir, bi hêmanên xwe yên dêsmanî ve navê cihan wekî *balladan* di dawiya risteyên malikan de bi tevî peyvên din kafiyeçêdîkin. Di kilama “Xanzo me” de (Güneş & Şahin, 2019a: 210) ya Dengbêj Reso kafiye li ser navê cihan ava dibe û heta ji bo duristkirina kafiyeçêdîkin û lihevanîna wê peyvên tirkî jî dikevin nav kilamê:

(...)

Lo lawo Xanzo lawo ji **Norşînê** heyânî **Norşîncixê**

Dû dûxana devê tivinga Xanoyê Siloqî

Xwe berdaye çiyayê piştî **Mûşê**

Ji **Kêla Mamo** derketiye **Rasta Selamlîxê**

Derbekî li bedena Xanzoyê Siloqî dane

Eza korê herdu çavê min rijiyayê
 Xwûna gewez ji êvara da dilop bi dilop
 Jor da diniquete tê li ser ar wayê wayê...
 Hey lo lawo diniquete ez hêsîr im ser *yastixê*

Çawa ku di kilamê de tê dîtin navên pênc cihên di vê benda neh-riste de derbas dibe yên wekî *Norşîn*, *Norşîncix*, *Mûş*, *Kêla Mamo*, *Rasta Selamlîxê*. Di risteya ewil de *Norşîncix* bi qafiyeya *Rasta Selamlîxê* ve li hev tê û li dawiyê jî peyva ji tirkî ya *yastix*¹²⁶ kafiyea malikê tamam dike. Ev peyva bi tirkî ku bergindê wê belgî û berpala gelek zêde di nav kilaman de derbas dibe, diyar e ku ji bo xatirê lihevanîna kafiyeê hatiye hîlbijartin. Kilamên ku navê cihan tê de kafiye hatine çêkirin, zêde ne. Di kilameke din ya bi navê “Delêl” de (Güneş & Şahin, 2019b: 118) îcar kafiye li ser hin navên bajarên mezin tê çêkirin:

Feratî Bêlecûkê qam ber xwe bixista
 Derbas bûma **Hemis** û **Hekayê**, **Mûsil** û **Bexdayê**
Beyta Şerîf Beytullahê, **Stenbola** şewitî nîvê dunyayê
 Qasekî rûniştama li ber kanîka vê **Serayê**

Di kilaman de navê cihan gelek rolên din ên binyadî û hunerî digêre. Yek ji wan jî cotenav in û bi dubareya navê cih ve pêk tê. Bi vê yekê re hem cext bêhtir tê li ser nav bi xwe hem jî vegotîneke hunerî û amrazêke poetîk durist dibe ya ku xweşa guhdaran tîne. Ev awayê dubarekirina heman navî bi tevî peyva “xweş”, di nav kilamên dengbêj û şair Evdalê Zeynikê de jî tînin. Yek ji wan kilama ‘Wey Dil’ e (Güneş & Şahin, 2019a: 95) ku tê de dubarekirina “Dêrsim e Xweş Dêrsim e” derbas dibe. Evdalê Zeynikê dema ku ji Dersimê re derbas dibe da ku here Şerê Xozanê vê kilamê li ser Dersimê derdixe.¹²⁷ Di kilama “Wey Dil” de dubarekirina navê Dêrsimê bi vî rengî ye:

¹²⁶ Yastix bi kurmancî tê wateya balif, balgî.

¹²⁷ Ahmet Aras ku bi neviyê Evdalê Zeynikê, Emerê Zeynikê re xeber daye, neqil dike ku Evdal berî mirina xwe gotiye: “Du kilamên min yên emegdar henin, kilama Xozanê û ya Dêrsim. Piştî mirina min tu were kilamên min were jibîrkirin, lê ez dixwazim ku ev herdu kilamên min neyên jibîrkirin.

Mîro mîro mîro...

Mîrê min **Dêrsim** e xweş **Dêrsim** e

Avê çeman û kaniya îro bi ser mi da tê gurregur e

Gujeguj û guj e

Ez nemînim sê payê wê tê gimegim e gimegim e

Du zeriyan e her yekê gopalekî zîvîn di dest da

Qabqabekî zîvîn di ling da

Tu bala xwe bidê a mezin ne

Awirê çavê teresa piçûk

Mînanî topek ji topê Kurd Elo Memed Paşa

Xwe da dîharê **Kela Beyrûtê** li mi daye

Ser derecan û nimra

Ez kuştîme mîro mîro ax mîro mîro mîro... (Güneş & Şahin, 2019a: 95)

Nimûneyeke din jî wekî di kilama ‘Dîdem e xweş Dîdem e’ de derbas dibe ku babeta wê li ser leca herdu dengbêjên navdar Evdalê Zeynikê û Şêx Silê derketiye meydanê. Navê kilamê wekî “Evdalê û Şêx Silê” hatiye nivîsandin (bin. Güneş & Şahin, 2019b: 532-533). Di nimûneya din ya ji leca “Evdal û Şêx Silê” de îcar navê gundê Dîdemê derbas dibe bi heman qaîdeya ku li jorê behs hate ser:

Evdal digo Şêx Silê **Dîdem** e xweş **Dîdem** e

ê rebeno gelo mi te ra nego **Dîdem** e xweş **Dîdem** e

singê mi kitûka dengbêja zarê mi qelem e

ezê ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê

ezê vê sibengê av û rizqê Evdalê Zeynê rakim gelo

ji ber bextê lawê Tarxan ra

tu sêr bike vê sibengê malxirabo ji **topraxa Şahê Ecem** e

Bi taybetî navê cihan wekî qalibekê (*formulaic*) giring tê pêşiya kilamê. Li gorî cureyê kilaman ev qalib carcar rastî guherînan bê jî, bi gelemperî meriv dikare bibêje ku qaîdeyeke zexm a vegêrana devkî ya kurdî ye. Bi taybetî, di kilamên şer de, ev qaîde û qalibê kilamê kêr caran ji bo xatirê gotinên hunerî xerab dibe, lewra

Hemî hûn wan kilaman ji xwe dizanin, ezê niha wana kelîme-kelîme ji we ra bêjim, hûn jî li pey min ducar kin, wana rind ji ber kin!” (Aras, 2018: 159)

piraniya wan vê forma binyadî ya destpêka kilaman nîşan didin. Ew formên qalibî di nav vegêranên kilaman de, bi tevî dubarekirinên xwe yên estetîk taybetmendiyên xweser nîşan didin. Gelek balkêş e ku ev qalibên ku di nav kilaman de, bi gelemperî li destpêkê bi rengêkî bi perqal derbas dibin, ji aliyê forma xwe ya binyadî ve dişibin vegêranên wawîka (*coyote narratives*) ên gelê navahoyê. Navê cihan di nav vegêranên nerîtî yên gelê Navahoyê de, xwedî fonksiyoneke giring e û bi vî karî ji aliyê fonksiyona xwe ya ragirtî ve, vegêranên wawîka ên Navahoyê gelek dişibin kilamên kurdî. Di xebata xwe ya li ser amrazên poetîk ên di vegêranên devkî û nivîskî yên gelê Navahoyê de, Webster (2004; 2006) vegêranên wawîkan ên nêritî dinirxîne û destnîşan dike ku navê cihan di wan vegêranan de mîna “amrazeke çarçovekirinê” (*framing device*) kar dike.

Di vê pêwendê de, di nav kilamên kurdî de navê cihan kilamê dide destpêkirin û qewamê li ser mekanekî (nav) dide rûniştandin û lewma jî nav wekî “amraza çarçovekirinê” (Webster, 2006: 243) kar dike. Lîteratura kilamên kurdî (çi kasê çi jî kitab) ya ku di çarçoveya vê xebatê de hatiye raçavkirin, diyar dike ku piraniya caran dengbêj di destpêka risteyên ewil ên kilamê de navê cih didin. Li gorî vê nêrînê, di nav hemû kilamên şer de, rêjeya kilamên ku vê qalibê diparêzin gelek bilind e, dîsa bi heman rêjeyê ev qalib di nav kilamên şer ên Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro de jî bi rihetî dikarin bên dîtin.¹²⁸ Bi cihgirtina di destpêka risteyên ewil ên kilaman de, nav bi tena serê xwe nîne ew li gel çend gotin û teswîrên din, hin qalibên destpêkî yên kilamê an jî beyta kilamê durist dikin. Dengbêj carcar di destpêka gotina kilamê de navê wî mekanî tîne ziman ku qal û qewamek lê çêbûye. Heta di pêwenda çemkên zeman-mekan (*setting*) de û bi tevî wan navê mekan bi xwe ji bo nasyarî û rastgotiniyê lazim e. Herwiha, zemanê qewamê yê di nav rojê de (ne

¹²⁸ Bêguman, ev taybetmendiya kilamên kurdî tenê aidî kilamên van dengbêjan nîne, ew bi rengêkî gelemperî di nav hemû kilamên dengbêjan de dikare bê dîtin. Dîsa jî, li gorî herêmên cuda meriv nikare tiştekî qethî bibêje. Lewra hunera dengbêjiya li Serhedê hin ferqên xwe heye ji performansên dengbêj û stranbêjên bo nimûne ji herêma Botanê. Bo destnîşankirina ferqên performansên dengbêjan ên herêmên cuda, lêkolîneke berfireh lazim e.

yê salê)¹²⁹ û yê demsalan bi gotinên wekî “vê sibengê”, “mîla ber sefeqê”, “sibe bû”, “payîz e”, “sere sibê”, “îro”, “şev bû” diyar dibe. Gelek caran zeman û navê cihê qewamê bi tev di nav risteyekê de cih digirin. Bi rengê giştî, ji kilamên dengbêjan têderdixe ku hin qalibên guherbar ên destpêkirina kilaman hene û navê cihê qewamê jî di nav wan qaliban de roleke berçav digêrin. Meriv dikare hin ji wan qaliban bide ku bi tevî navê cihan pêk hatine:

	li/bi [navê cih] + ([navê cih]) (rengdêr) [lêker] ¹³⁰
	“...wî rebenê li Pira Batmanê li Çemê Xezaliyê diketim” (‘Ez reben im’, Güneş & Şahin, 2019a: 41)
	“bê gidiyê sibe ye li dîharê Xanzila şewitî bikevim bavêj e” (‘Bavê Seyîd Betal’, Güneş & Şahin, 2019b: 99)
	“Heyla dayê delîlê, li girê Nireşînê, li Pošta Dinê dinêrim...” (‘Girtiyê Kela Rewanê’, Gültekin, 2013: 188)
b)	(zeman) [bûyer] ¹³¹ (li me) [lêker] ¹³² (li) + (rengdêr) ¹³³ + [navê cih]
	“Lê-lê Hedê rebenê, sibe ye, şerekî giran li me çêbû, daweka li me qewimî li Şehîda Gazê, mi dî li Îranê li Gola Newêrê dayê rebenê bi hezeye” (‘Kor Husên Paşa’, Gültekin, 2013: 320)
	“lê lê Besrayê rebenê qalek çêbûye li kaviliya Kilîsekendê li kîrrê Tendûrekê” (‘Asyayê’, Güneş & Şahin, 2019a: 56)
	“Axawo, bihar e, şerek li me qewimiye li Gamêşvanê li Patnosê wê berî li avê” (‘Kor Husên Paşa’, Gültekin, 2013: 251)

¹²⁹ Dengbêj bi giştî meyldar nîne ku dîroka bûyerê bibêje, ew tenê zeman di çarçoveyê teng ya rojekê de bi cih dike. Helbet îstîsnayên vê yekê jî hene.

¹³⁰ Diketim, dinêrim, sêyr dikim, sêyr bike û hwd.

¹³¹ Qalek, şerek, dewak, dawetek û hwd.

¹³² Çêbû, qewimî, cîriya, çênebûya, neqewimiya...

¹³³ Wekî rengdêr peyvên wekî “şewitiya, wêrtasa, kaviliya û malikwêrana ” û hwd. tîk bikaranîn.

c)	(zeman) [bûyer] + (li me) [lêker] (li) + [navê cih] (xopan/şewitî)
	“...îro qalek çêbû li Zêrnaga şewitî, Kara Qîza li ber kaniyê” (‘Şerê Zêrnagê’, Güneş & Şahin, 2019a: 222)
	“şereka li me çêbû qaleka li me qewimî li Kutkanî ¹³⁴ şewitî bi çem û kanî (Güneş & Şahin, 2019b: 508)
	“sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra Geliyê Zîla, Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê...” (‘Geliyê Zîlan’, Güneş & Şahin, 2019a: 48)
d)	Ezê [lêker] şewitiya/kaviliya/wêrtaza... + [navê cih]
	“Ez çûme wêrtaza Parsînê di germê da” (Gültekin, 2013:337)
	“Ezê diçûme Textê Qereyaziyê bişewite bi dilê min re bi kevir e.”, (Gültekin, 2013: 281)
	“Lo lo mîro, malxirabo, sibe ye, bi kavila Îrana rengîn diketim” (Gültekin, 2013: 340)

Tablo 17. Hin qalibên navê cihan ku li destpêka kilaman cih digirin

Ji aliyê binyada vegêrana kilamê ve, carcar nav ji bo her bendeke kilamê qalibekî çarçove datîne bi tevî hin guherînên xwe. Ev yek di hin kilaman de bi rengêkî bipergal kar bike jî, di hin kilamên din de dikare xerab bibe an jî ji cihê xwe

¹³⁴ Di hin kilaman de paşgîrek (*suffix*) xuya dibe ku bi taybetî tê ser navê cihan. Paşgîra bi navê “-anî/-anê” ku di kurmançî de ji rengdêr û navdêran, navdêr çêdike, wateya razberiyê dide peyvê. Digel van wezîfê û fonksiyonên xwe, ev qertaf di kilamên dengbêjan de bi ser navê gund û bajaran ve dizeliqe. Ev qertafa navê cihan, bi taybetî tê li ser wan navan ku tîpa wan a dawî dengdar e (*consonant*). Qertafa “-anî” zêde berbelav nîne. Lê di hundirê kilaman de dikare ji bo xweşikkirin, lihevanîn an jî şîrînkirina nav bihê bikaranîn. Bo nimûne, kilama “Hay Lo Metê-Mihemedê Elî Begê” de navê gundê Meterê ya bi ser Dutaxa Agiriyê wekî “Meteranî” tê wesifandinê û bi vî rengî navê gund ji peyva “metê” tê vavêrkirin ya ku gelek dişibe Meterê. “Metê rebenê Meteranî wêran bişewite wa li zinêr e” (Güneş & Şahin, 2019a: 192-193) Di nimûneyeke din de navê gundê Heftrengê wekî Heftrenganî ditewe: “Kuro êfimo Heftrenganî şewitî bişewite (Güneş & Şahin, 2019b: 421).

bileqe. Di van nimûneyan de, destpêka her bendekî bi temamî eynî nîne, tenê hin rengdêrên ku wesfandinê dîkin li risteyê zêde dibin. Bo nimûne, di kilama bi navê “Axao” de (Güneş & Şahin, 2019a: 74-75) ya Dengbêj Reso navê gundê Cemalvêrdiyê ji bo her beytê wekî destpêk beşeke kilamê saz dike û di kilamê de bi dubarekirina navê gund û cihê qewamê li destpêka bendê de cih digire:

Benda Yekem > Axao axao axao...

lo lo maqûlo sibe ye li rasta **Cemalvêrdiyê** diketim îro *bi bavêj e*
hela li helehelê xweşmêra sêrbike
qîrçîniya çapiliyan û mawzera bi bextê we da me
(...)

Benda Duyem > Ey axao axao axao axao...

lo lo maqûlo li rasta **Cemalvêrdiyê** diketim eza nemayê *bi darî tere*
Seyîdxan bi sê denga bang dîkir Sidîqê Hecî Mistefa
tu bidî xatirê Xwedê û pêxembere
(...)

Benda Sêyem > Axao axao axao...

lo lo maqûlo sibe ye li rasta **Cemalvêrdiyê** diketim îro *bi çem û kanî*
Sidîqê Hecî Mistefa bang dîkir Mûsa Beg apo
Mala te mîrat biyo rabe helehelê xweşmêra sêr bike
(...)

Di navbera bendên kilamê de piştî dengkirina “axao” di hemû hevokên destpêkê yên li her bendekî de ku bi wate û fonksiyonên nêzîk hildigirin ser xwe, hatina navê gundê Cemalvêrdiyê nîşan dide ku nav wekî formeke qalibî dewamdarî û herka kilamê destnîşan dike. Dîsa dubareyên navan û hin gotinên din ên qalibî, derfetê didin guhdar da ku careke din li xetên serekî yên kilamê vegere, bi gotina Ong (2002: 39) di metna devkî de dubare ji bo hişê meriv li vegêrana pêşkêşkirî vegere û wê bi bîr bîne mihim e. Di her sê bendan de jî hevoka “lo lo maqûlo sibe ye li rasta Cemalvêrdiyê diketim” sabit e, lê terîf û nitirandina taybetmendiyên gund diguhere. Bo nimûne, di benda ewil de Cemalvêrdî cihekî “bi bavêj e”, di ya duyem de “bi darî

ter e” û ya dawî de jî “bi çem û kanî” ye. Ev awayê şayesandina gund piştî ku navê wî derbas dibe di gelek kilaman de xuya dike û li gorî xwe formeke qalibî heye. Meriv dikare destnîşan bike ku awa û şewaza serbest a dengbêjiyê bi lihevanînên bi vî rengî ve dikevin nav pergaleke vegotinê û ev pargal wisa diyar e ku bi taybetî di kilamên Evdalê Zeynikê de xurt in. Evdalê Zeynikê ne tenê bi terz û meqama xwe ve, lê di heman demê de bi dehan qalibên kilaman ve ji dengbêjên pey xwe re hewzeke hazir wekî mîras hêlaye.¹³⁵ Ev gotinên qalibî yê Evdalê Zeynikê, ji bo dengbêjan bûne hîm û bingeha vegotina xweş û poetîk. Eger meriv li kilama navbirî ya Reso binêre, dê bê dîtin ku qaliba destpêka her bendeke kilamê ji Evdal hatiye deynkirin. Bo nimûne, di leca di navbera Evdal û Gulê de, destpêka her bendeke kilamê bi van risteyan ve hatiye çêkirin:

“Lê Gulê hatim Xamûrê lo ha li til e”

“Heyla Gulê ez hatim Xamûrê, lê ha li hember e”

“Gulê ez hatim Xamûrê, xanyê keşîş bi qube ye”

“Gulê ez hatim Xamûrê bîna bê tê”

“Lê Gulê ez hatim Xamûrê li ber ba ye”

“Gulê ez hatim Xamûrê wê li mil e”

“Gulê ez hatim Xamûrê ha li fêrika” (bin. Aras, 2018: 43-48).

Di hin kilaman de navê cihan dikevin nav bendên cuda yê kilamê û dîsgotinê (neqeret) çêdikin. Di van cure kilaman de ew cihê ku navê wê tê gotin bi gelemperî ew der e ku şer û qalek lê qewimiye. Bo nimûne, di kilama Evdalê Zeynikê de ya bi navê Xozanê ku Dengbêj Reso (2019a: 240) dibêje dîsgotina li ser Xozanê avabûyî wiha derbas dibe:

Xwezila îro şewitiya **Xozanê** gidîno bişewitiya li ba fêrika lo lo lawo ca rabe
îro mi dî qîz û bûkê Kurêyşa tê da winda kirine berxê, kofiyê tev cênûga

¹³⁵ Helbet Evdal bi xwe jî ev mîras ji dengbêjên beriya xwe hildabû. Lê gelek dengbêjên berî wî nayên zanîn.

Eyşan Xanimê digo Surmelî Memed Paşa mala te mîrat be
mi ji te ra nego berê van xorta mede **Xozanê**
bi ro hedûriya mi tune bi destê germê û germistanê
şevê nahevibim ca ji destê qêrînê çeqelan û van wawîka

dilêm yar yar dilê mi yar yar
ax dilêm yar yar wey **Xozanê**

Xwedê xirab bike belkî şewitiya **Xozanê** îro gelo li me yan da
mi dî li selefê siwarê Surmelî Memed Paşa, simêlreşa
li binê kurk û eba palik bada
Eyşo Xanimê digo Surmelî Memed Paşa
belkî mala min û te xirab bibe bi ser malan da
mi ji te ra nego berê me nede **Xozanê**
tu hetanî melê nîvro sêr bike sêsed siwarê te li ser piştê hespa rih û can da

Navên cihan gelek caran li dû hevdu rêz dibin. Ev qalibên navan ên ku li pey hevdu rêz dibin ku li vir wekî “komstêrkên navan” hatine binavkirin ji bo bedewkirin û xurtkirina gera xeyalî ya kilamê tîen vegêran, herwiha ew ji bo xemilandinê jî tê bi kar anîn bi taybetî dema ku dengbêj bixwaze bêhnê vedê û dewama kilama xwe bibêje ev rêzên li pey hevdu yê qalibî derfetê didin dengbêj ku ew li ser dewamdariya kilamê bifikire. Ev komên navan, carcar bi du-sê navan pêk tîen carcar jî hejmara wan xwe digihîne bi dehan navan. Di kilamên şer de, navê li dû hevdu tîen bi gelemperî ji bo zelalkirina cihê qewimînê û mîntiqaya şer a bi detay û dormaleya wê tê raxistin da ku di serê guhdar de nexşeya zihnî (*mental map*) a wê deverê xweş bi cih bibe. Herwiha, di kilamên şer de carcar navên ku li dû hevdu rêz dibin ew cih û war in ku qehremanê çîrokê tê re derbas dibe an jî dixwaze hewara xwe bigihîne hin kesên li wan deran. Di kilama li jêr a bi navê Geliyê Zîlan de (Güneş & Şahin, 2019a: 48-49), Dengbêj Reso cih û gundên ku qir lê qewimiye bi detay dide û navan li dû hevdu rêz dike ku hin ji wan dibe ku mîkrotoponîm bin:

Dayê dayê dayê...

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra **Geliyê Zîla**
Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê

wey la reben im lawo îro nizamim sebeb kî bû, kê bi kê kir

Gelek kilamên şer ên din de jî bi heman rengî rêzkirina navên cihan ên têkildarî qada şer tîn dîtin. Bi taybetî qewimînên girîng de, eger dengbêj bi xwe jî wê herêmê be carcar dikare nexşeyeke gelek bi hûrgilî di serê guhdar de xêz bike. Lê dema ku kilam ji nav herêma xwe derdikeve, gelek navên bi detay ên kilamê ji aliyê dengbêjên ji herêmên cuda ve nayên gotin û kilam rastî guherînên toponîmîk tê. Ev yek bi rengekî tabîî li ser esasên veguheştina zanyariyên devkî çê dibe û bi têkilî û têkildarkirina di navbera dengbêj û cimaeta wî de rû dide. Yek ji wan kilaman ku nav li dû hevdu rêz dibin kilama Filîtê Quto ye. Ev kilama ku qala şerê di navbera serekê eşîra reşkotan Filîtê Quto û serekê eşîra etmankiya Mamê Emê dike, ji aliyê gelek dengbêjan ve tê gotin û li gelek herêman belav bûye. Di şer de Filît dawa tîfinga Mamê Emê -bazinbelek- dike ku biçûkxistineke mezin e. Di encama nîqaşa di navbera wan de Mamê Emê tîne Filît dîkuje. Herwiha, di şer de bi temamî pêncî du kes ji eşîra etmankî tê kuştin.¹³⁶ Di gelek versiyonên kilamê de navê cihan bi rengekî rêkûpêk tîne rêzkirin û “kilam me cih bi cih digêrîne di gereke xeyalî de” (Hamelink, 2014: 123-124)

Hey lor hey lo lo hey lo lo...

Filîto lawo karwanî berxê mi karwanî

Karwanî êvarê bar kir sibê bi royê ra qe dananî

Kevanê Kêrê, li Kaniya Qîrê, Pira Batmanê li Delavê Paşo¹³⁷

Pêşî vegeriya ser paşiyê danî

Gelo lawo çuqa xortek nezan e, bi çi aqilî siwar bûye hatî pêşiya vî karwanî

Te serê paçê çidarê berda ser erwanî

Te nego serkarwanî Eliyê Etmanekê ye, Elî mamê Gindê ye

Gava tu cara îjar ji ber destê egîtan û xweşmêra xilas bibî

Lo lo lawo bira Şemê dayîka te bibê mi çokê xwe da erdê berxê

Teze li dunyayê ji xwe ra lawek anî (2019a: 204)

¹³⁶ Ji bo nirxandineke li ser kilama Filîtê Quto bin. Hamelink (2014: 123-124), Kevirbirî (2009a: 60-74)

¹³⁷ Navê wê “Delanê Paşo” ye lê di kilama Reso de bûye “Delavê Paşo”. Bin. Kevirbirî (2009: 74).

Navê hin deran bi belavbûna kilamê re hinekî guherîbe jî, bi giştî rêya karwana etmanekî, cihê ku şer tê de qewimiye nav bi nav tê raxistin. Dema ku guhdarên (berê) ji herêma Xerzan kilamê guhdar dikin, dikarin bi saya serê nav û detayên di kilamê de bikevin gereke xeyalî (Hamelink, 2014: 134) ya ku tê de hemû qal û qewam li ser mekanekî tê dîtbarîkirin û pêşkêşkirin. Di nav kilamên şer de, cihê ku navê wê tê dayîn, bi gelemperî ew cih e ku şer lê rûdaye.

Ji bo kilamên dil, navên ku li dû hevdu rêz dibin, navê zozan û waran e ku bi gelemperî hezkirî ji bo derbaskirina demeke xweş dixwazin herin lê bigerin û bimînin. Ji bo şibandina bedewiya hezkiriyê xwe wan navan rêz dike. Ango meqsed û rola ku ew li xwe digirin li gorî cureya kilamê dikare biguhere. Di kilamên dil de zêdetir bihar, zozan, war û çiya derbas dibin (Hamelink, 2014: 134). Di nav kilamên Dengbêj Şakiro de bi dehan “komstêrkên navan” hene ku di nav gelek kilaman de dubare dibin an jî ji bo hin kilaman bi hin komên navan ên nû çêdikin. Bo nimûne, di kilama Şakiro ya bi navê “Delala Gimgimê-Subha Hacî” (2019b: 230-231) de navê gelek zozan û warên xweş wiha li dû hevdu rêz dibin:

lê lê lê...

ax de lê lê delaliyê sibe ye

bejna te zirav e ji tayê rihanê, ji topa rimê

hêşîn dike li **Çûlyê** li **Maçûlyê**, li **Axûryê**,

li **Sînê**, bi **Sînegê**, **Qazgol** û **Bîngol** û **Şûşar** û **Tekmanê**

welatê me **Serhedê** bexê tu sêr bike gelo li **Varto** li **Gimgimê**,

xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê

ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna Subha Hacî

Komstêrkên navan ên ku li vir li dû hevdu rêz bûne, bi heman awayî an jî bi hin guherînan û lêzêdebûna navên nû di gelek kilamên din de jî xuya dibin. Bo nimûne heman “komstêrka navan” a ku li jor derbas bûye di gelek kilamên din ên Şakiro de derbas dibe. Yek ji wan kilaman “Can Hey Can” e ku di demên cuda de ji aliyê Dengbêj Şakiro ve hatiye gotin (bin. 2019b: 218-221). Di herdu versiyonan de hejmara navan tê guhertin û tê dîtin ku nav di kilamê de bi meqseda xurtkirina vegotinê tê bikaranîn û ji aliyê dengbêj ve di kilamê de nebe jî dikare lê bê zêdekirin

da ku kilam pê xweş be. Li jêr ferdên ewil ên kilama “Can Hey Can-1” û “Can Hey Can-2” tê dîtin ku herdu jî ji aliyê Dengbêj Şakiro ve hatine gotin:

Can Hey Can-1

De lê lê bedewê sibe ye vê sibengê tu sêr bike
ezê dakevim rastek ji rasta **Parsînê**
tu sêr bike vê sibengê li rasta van bêdera
minê bizinekî kûvî ji kêfê ra rakirîye
minê berê bizinê daketî vê sibengê
li zozanê di **Çûlyê** li **Maçûlyê**, li **Axuryê**, li **Sînê** bi **Sînegê**,
Qazgolê û **Bîngolê** û **Şûşar** û **Tekmanê** welatê me **Serhedê**
gidîno li ser **Evdurehman Qazî**
na wele berê xwe dabû ser **cotê Qizlera**

Can Hey Can-2

wî de lêlê delaliyê minê xezaleke rakirî gêra biniya mala da bêdera
hela bala xwe bidê berê xezala mi ketiye **Parsîna Jêrîn Parsîna Jorîn**
na wele vê sibengê tu dêhna xwe bidê ser **cotê Qizlera**

Di gelek kilaman de navên ku li dû hevdu rêz dibin, navên heman mintiqayê ne û navên gundan ji bo lihevanîna kafiyyê li pey hevdu tê rêzkirin û ev nav ji bo guhdarên herêma behskirî eleqeyekê ji bo kilamê hasil dike. Herwiha, ev rêzkirina navan, herwiha zanyariyên çem û rêyên çeman û gundan jî di nexşeyeke xeyalî de xêz dike ya ku di heman demê de guhdaran jî bi xwe re digerin. Lihevanîna van navan bêtir zanyarî û malûmatên cografîk û herêmî ne pêkan e. Bo nimûne, di kilama bi navê “Dosto” de (2019b: 405-407) rêya Çemê Şeryan¹³⁸ û gihiştin/herikîna wê ya ber bi Mûradê re hatiye pêşkêşkirin û di nav re jî gelek qonax û gundên li ser rê yên li vê mintiqeyê li dû hevdu hatine gotin:

Sibe ye minê diharê **Xano**, di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**
Minê li diharê **Xano** di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**
Li ava **Xano**, di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**
Tê li orta **Boçikmasûriyê**, **Zado**, di **Mado**

¹³⁸ Çemeke ji Elaşgirê re derbas dibe û tev Çemê Muradê dibe.

Bi Şeryanê ra daw dibîne, Mûradê ra li hev dikeve¹³⁹

Etnomuzîkolog û etnograf Steven Feld ê ku li ser etnografyaya akustîk, hestiyariya muzîkal û çandî dixebite û di nav gelê Kaluli yê Bosaviyê de destnîşan dike ku çawa cih bi saya navan bi rengê helbestî tî bibîrxistin û çawa hest di hundirê wî gelî de cih digire: “Strandina li ser çend rêze-cihên binavkirî, guhdar derdixe gerekê ya ku bi tevî sûlavan diherike di nav erdên herêmî de. Rêya herka van kilamên helbestî bi hesasiyet û rewşa xwe ya fîzîkî ve bi herka hestî ya dengê strandinê re tê girêdan” (Feld, 1996: 91). Ev herka hestî û dengî, an jî bi zanîna bi rêya dengê û bi tevî dengê ji aliyê Feld ve bi çemka “akustemolojî”¹⁴⁰ tê ravekirin. Ev navên ku guhdaran li ser dorhêla teng a herêmî bi qewlê Feld derdixe “gerekê”, di gelek kilamên kurmançî de bi tevî rengvedana siruştî ya çem, robar û zozanan dewam dike. Di strana navbirî de, ji bilî navê gundan rê û çivanekên ku robarên herêmî yê wekî Mûrad û Şeryanê tê re derbas dibin bi aheng tî qalkirin.

Di nav kilamên dengbêjan de, li gel navê gund, zozan, kanî, çem, gelî û waran gelek navên din jî hene ku îşaretê bi cografyaya çandî û civatî ya kurdî dikin. Ew der di kilaman de wekî ocax, şexs û ziyaret derbas dibin. Ev cihên ziyaretê ku bi giştî bi şexsekî mezin re têkildar in, ji bo kurdan dibin cihê bindarûk û seyrane ku li wir di heman demê de dua tî kirin, tiştên xwarinê tî belavkirin. Cihên ziyaretan ên bi vî rengî, dirustkirina nîrx û rabûn-rûniştina kurdî de xwedî qîmetê mezin bûn/in û danûstandinên çandî û civatî li wan deran zêde dibin. Ew dibin navendên çandî yê giring di jiyana civatî de û herwiha wekî nîşaneyên nîrxê wan cihan di hin wextên diyar de ew der tî ziyaretkirin, qurban li wan deran tî serjêkirin û bi awayekî xurt tê bawerkirin ku daxwaz û dua tî qebûlkirin (Kardaş, 2018: 274). Ev cihên pîrozwer ku ji aliyê kom û cemawerên cihêreng ve ji bo gelek meqsed û mirazan tî ziyaretkirin, dibin navendên giring di bîra civatî de û lewma jî di vegêranên gelêrî de jî meriv dikare rastî gelek cihên bi vî rengî were.

¹³⁹ Hemû gundên vî parçeya kilamê de derbas dibin gundên Agiriyê ne.

¹⁴⁰ Akustemolojî, çemkeke ku ji du peyva pêk tê: “akustîk” û “epîstemolojî”. Bi pênaseya Feld (1996) “akustemolojî” “rêyeke bideng ya zanîn û hebûna li dinyayê ye.” (*a sonic way of knowing and being in the World*).

Di gelek kilaman de, cihên bi vî rengî an li ser sond tê xwarin, an jî kesek hezkiriyê xwe dibe ber bextê wan şêx û ziyaretên li wan deran. Carcar jî di kilamê de hemû cihên pîroz li dû hevdu tên rêzkirin û navendên giring ên dînî û civatî li ser nexşeya xeyalî û mekanên dînî tên xêzkirin. Bawerî û nirxên civatî ku bi wan meknan re gelek bi xurtî vebestî ye di kilamê de cihê xwe digire. Bo nimûne, di kilama bi navê “Dosto” (Güneş & Şahin, 2019b: 405) ya ku ji aliyê Dengbêj Şakiro ve tê gotin, nav wiha rêz dibe:

Go le Dosto rebeno sibeye vê sibengê eger tuyê têtî were
 Gava tu nayê bi sonda tamam ji te ra ca sond bixwim
 Ezê ji te ra bi **Horyan Baba** kim
 Bi **Gurgur Baba** kim
 Bi **Uryan Baba** kim
 Bi **Gozel Baba** kim
Dede Mexsûd, Dede Mirad kim
 Ocaxa erdê **Bilîsê** kim
 Mala Hecî Heyderî **Kêrsê** kim
 Şêx Ehmedê **Amasiyê** kim
 Bi Seydayê **Taxê** kim
 Şêx Eliyê **Paliyê** kim
 Şêx Şabedînê erdê **Diyarbakirê** kim
 Ocaxa erdê **Xirte** kim
 Şêxê **Çoxreşiyê** kim
 Mala Seydayê **Nêhriyê** kim
 Şêxê **Tiloyî** kim
 Şêx Eşûrê Erebî ewla seyîd e dostê Xwedê kim
 Şêx Badînê erdê **Dignûgê** kim
 Şêx Evdila şêxê **Milazgirê** kim
 Bi ocaxa **Şêrwêranê, Gogoxlanê, Qizqapanê**
 Şexsan û zaretê serê **Kosedaxê, Gilîdaxê, etegê Sîpanê** kim
 Bi Încila Îsa kim, bi Tewrada Mûsa kim
 Bi Zebûra Dawid, bi Qurbana ser çokê Mihemed Mistefa kim
 Eger tuyê têtî were, gava tu nayê
 Herçî sondê min sond xwarine

Berxê temamî xenîmî can û bedenê te û dê û bavê te bi lo lo.

Di kilamê de navê şêx û mekanê wî tê nîşandan û herwiha gelek ziyaretên li qûntarên çiyayan jî tên behskirin û li ser tê sondxwarin. Çiyayên Kosedax, Gilîdax û Sîpanê jî ku di gelek kilaman de derbas dibin vê carê bi ziyaret û şehîdên xwe li ser wan sond tê xwarin. Tenê di beşa li jor a kilamê de navê 25 heb ziyaretan hatiye rêzskirin, ew ziyaret piraniya wan li Serhedê bin jî di nav de yên ji herêmên din jî hene, mîna “Şêx Eliyê Paliyê”, “Şêx Şabedînê erdê Diyarbekirê”. Îcar dengbêj gelek navendên dînî yên di cografyaya çandî ya kurdî de xwedî nîrx û qîmeteke mezin in, nav bi nav rêz dike û sînorekî xêz dike ku di nav de, ew der û dergah dibin kevîrên takêşê. Ev nexşe, ji civatê re mîna rêbera şexs û ziyaretên mihim ên kurdan kar dike ku di bîra hevpar a kurdî de cih girtine, serhatî û bîranînên gelek kesên li ser wan deran çêbûne. Ji aliyê vê taybetmendiya xwe ve jî kilamên kurdî hinekî dişibin kilamên gelê navahoyê. Van Valkenburgh di xebatên xwe yên li ser gelê Navahoyê de çavdêrî dike ku rîtuêl, kilam û diayên wan mîna ferhengokeke navan a devkî (*oral gazetteer*) navên naskirî û cihên pîroz dihevin. Di çanda wan de, her vegêraneke efsaneyî lê dixebite sînorexêziyê bike (Thornton, 1997: 220). Di kilama jor de jî, sînorexêziyê ku wergiriya wê berfîreh e û nexşeya xêzkirî de navên navendên dînî, mîna quçên kevîran (*landmark*) tê de xuya dibin.

Di kilamên kurdî de, fonksiyona navan gelek in, carcar nav bi yekcarî tên rêzskirin, bêtî ku bêt teswîrkirin an jî şirovekirin. Lêbelê carcar bajarê ku navê wê tê hildan, bi taybetmendiya xwe ya çandî, civatî, aborî an jî siruştî ve tê teswîrkirin. Ew bajar bi çi tiştê xwe ve navdar be, bi çi taybetmendiya xwe ve li pêş be di kilamê de salixê wê tê dayîn. Bo nimûne, kilama bi navê “Sê Zerî” (Güneş & Şahin, 2019b: 253) ya bi meqamê Dengbêj Şakiro bi vî rengî ye:

Digo de lo lo lawiko sibe ye dilê mi ji dilanî wa ye

ciyê me Bexda yi

Entaba Helebê¹⁴¹ ciyê weliya yi

kaviliya **Mûşê** ciyê feqiya yi

Korta **Bîtlîsê** ciyê şêxan û mela yi

¹⁴¹ Entaba Helebê ji bo *Gaziantepê* tê bikaranîn da ku bi Entaba (Dutax) li Agiriyê re tev li hev nebe.

welatê **Elaşgir**¹⁴²ê ciyê rênçberan û çifçiya yi
 kûraniya **Entab**¹⁴³ê ciyê axa û axalera yi
 nav **Hesena**¹⁴⁴ ciyê siwaran û rimbaza yi
 kaviliya **Milazgir**ê kûraniya aşa yi
 nav **Heyderan**¹⁴⁵ ciyê qîzan û bûka yi
Eledax mexelê hogeçan û miya yi meskenê yêşilbaşa yi
Kosedax mîrê çiya yi
Gilîdax mexelê pezkuyiya yi
Sîpandax¹⁴⁶ ciyê şehîdan û xaziya yi
 belekê berfê heliya li etegê **Bilêcanê** mayi
Enqere şewitî textê di paşa yi
Sûra Diyarbekirê sertacî sûra yi
Siwêrekê li me anî koka feqîr û fiqara yi
Erziroma rengîn ciyê zozana yayle yi

Kesê ku neçûbe û ew der qet nedîtibe, dizane ku ew der bi çi hêla xwe ve xurt e û çi xweşikî an jî taybetmendiya xwe ve li pêş e. Di vê kilamê de, rewşa sosyo-kulturî ya navçeyên serekî yên Serhedê tên xuyanê. Li gorî vê kilamê, Mûş cihê feqîyan, Bîtlîs cihê şêx û melayan, Elaşgir cihê rênçber û *çiftçiyan* e. Ev agahiyên bikêr ên cografyaya kurdî di dewrekê de bi dest diketin ku çûn-hatina di navbera bajaran de bi peyatî bû. Dema ku çûn-hatinên merivan bi peyatî be, meriv baştir rabûn-rûniştina merivên ji bajarên cuda dinase û hay ji cotkarî, terşdarî û rewşa perwerdehiya xelkê wê deverê dibe. Ev yek jî têgihiştin û fêmeke xurt ya dorhêla herêmî û zanyariyên toponîmîk bi xwe re tîne. Nimûneyên bi vî rengî yên rêzkirina bajaran û taybetmendiyan wan di helbestên devkî yên belûçan de jî tê dîtin (bin. Badalkhan, 1992)

¹⁴² Navçeya Agiriyê ye.

¹⁴³ Navçeya Agiriyê ye ku niha zêdetir wekî Dutax tê nasîn.

¹⁴⁴ Ji navê eşîrê qesta ku ew der e ku ew eşîr lê dimîne. Eşîra hesenan eşîreke mezin e ku bi taybetî navçeyên wekî Panos, Kop, Milazgir û Erdîşê dimînin.

¹⁴⁵ Ji heyderan qesit ew herêm e ku ew eşîr lê dihêwire.

¹⁴⁶ Eledax, Gilîdax, Sîpandax (Sîpanê Xelatê), Kosedax giş li parêzgeha Agiriyê dimînin.

4.4. Rêjeya toponîmên kilaman û şopa têkiliyên çandî û civatî

Di hin kilamên kurdî de hejmara nav û îşaretên fîzîkî ew qas zêde ne gelek zehmet e ku meriv bêyî navê cihan çîroka kilamê fêm bike. Ji ber ku tenê di nav kilamekê de carcar bi dehan şan û nîşanên erdê xuya dibin. Ji ber vê yekê, divê meriv wêneyekî gişgir ê navê cihan di nav kilamên dengbêjan de derxe meydana. Bi vê meqsedê, hemû navê cihan ên di nav kilamên Dengbêj Şakiro û Dengbêj Reso de hatin destnîşankirin û hejmara wan hate derxistin. Di encamê de hate dîtin ku hejmara navan di kilaman de gelek zêde ne. Di nav 110 kilamên Dengbêj Reso de -destan û çîrokên gelêrî ne tê de- bi temamî 735 caran navê gund, herêm, bajar, newal, gelî, kanî, mexel, çiya, war, zozan û ziyaretan derbas dibe. Di nav 266 kilamên Dengbêj Şakiro de¹⁴⁷ hejmara navê cihan -bi tevî dubarekirinan- xwe digihîne qedera 1683 navî ku navên di destanên Şakiro de derbas dibin ne tê de. Di **(Tablo 18)** de hejmara temamê kilamên Dengbêj Şakiro û Dengbêj Reso xuya dike. Çawa ku ji tabloyê jî diyar dibe di hemû cureyên kilaman de nav zêde bin jî tê dîtin ku di nav kilamên dil (evîn) de nisbet bi kilamên şer kêmtir navê cihan xuya dibin. Çawa ku hate gotin destanên Dengbêj Şakiro û Dengbêj Reso jî gelek navan di hewînîna lê ew “destan” di nav statîstîkan de cih nagirin ku li jêrê hatine pêşkêşkirin.¹⁴⁸

¹⁴⁷ Li vir mebest ew kilamên Şakiro ne ku hatine deşîfrekirin û bernivîsandin, bêguman dibe ku bi dehan kilamên wî yên din jî hebin ku qet nehatibin tomarkirin an jî qeydên wan hatibin windakirin. Ji bilî vê, destnîşankirina navê cihan ên di kilaman de jî ne hêsan e, navê mexel, kanî û deverên din carcar eger meriv ne beled be zehmet e ku meriv pê derxe. Di jimartina van navan de jî dibe ku hin şaşiyên me bi xwe jî çêbibin, ev tiştekî normal e.

¹⁴⁸ Di nav hejmarên navan de kilamên Şakiro û Reso tê de nînin ên ku wekî “Destan” (2019a, 269-316; 2019b: 559-611) hatine kategorîzekirin. Li gorî Güneş û Şahin destanên ku Şakiro gotine ev in: “Dewrêşê Evdî”, “Keja Mîrê Palo û Salihê Kurê Mîrê Berêz”, “Memê Musê”. Dengbêj Reso jî “Mem û Zîn” û “Cebelîkê Lawê Mîrê Hekarî û Binevşa Narîn” gotiye ku kitabê de wekî destan hatine kategorîkirin. Herçiqas ev kategorî xeletiyên bihewîne jî, di vê xebatê de ew “destan” derveyî nîrxandina navan hatine girtin. Ya baş ew e ku meriv van vegêranên navbirî wekî Çîrokên Gelêrî (bi tirkî, *Halk Hikâyesi*) bi nav bike. Ji bo nîqaşê bi vî rengî bin. Chyet (1991). Ji bilî vê yekê, hejmarên kilamên herdu dengbêjan gelek zêde ne, dibe ku herdu vekoleran hin kasêtên wan bi dest nexistibin.

Senifandina Tematîk a Kilamên Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro					
Dengbêj Cure	Kilamên Serhildanê	Kilamên li ser Şer û Pevçûnên Navxweyî	Kilamên Evîniyê	Kilamên li ser Xwezayê, Ramanê, Jiyanê	SERCEM
Dengbêj Şakiro	36 kilam	27 kilam	184 kilam	19 kilam	266 kilam
	336 cihenav	303 cihenav	900 cihenav	144 cihenav	1683 cihenav
Dengbêj Reso	20 kilam	21 kilam	50 kilam	19 kilam	110 kilam
	203 cihenav	215 cihenav	169 cihenav	148 cihenav	735 cihenav

Tablo 18. Hejmara navê cihan li gorî senifandina tematîk a kilaman

Dema ku li gorî du kategoriyên serekî kilam ji hev tîn veqetandin wekî “kilamên şer” û “kilamên dil”, tî dîtin ku ferqeke berçav çêdibe li gorî hejmara navên ku di herdu kategoriyan de derbas dibin. “Kilamên şer” û “kilamên dil” helbet ne tenê ji aliyê navê cihan ve wekî du kategoriyên ji hev cuda derdikevin pêş, ew ji aliyê naverok û gotarên xwe ve jî gelek caran ji hevdu vediqetin. Adaptasyona kilamên dilan ji bo rewş û hezkiriyên cuda rihet e û di prosesên adaptasyonên nû de navên di kilamê de bi demê re jê dikevin. Herwiha ji ber ku cihê qal û şeran jî tî de xuya nakin, kilamên dilan ji aliyê navan ve dibin xwedî gelek şaxan. Mekanê kilamên dilan jî ne mekanê şer û qewimînê ye lê belkî ew zêdetir dibe paşxaneyêke dîtbarî ya nitirandineke poetîk. Ji ber van yekan, pêdivî pê çêbû ku meriv bîne li gorî herdu kategoriyan jî hejmara navan binirxîne û wan li gel ferqên serekî destnîşan bike. Çawa ku di tabloya jêr de jî berçav e, di nav kategoriya “kilamên şer” yê herdu dengbêjan de, tenê kilamek jî tune ku navê cihan tî de derbas nebûbe. Ev diyarde ji bo vavêrkirina herdu cureyên kilaman xaleke giring e. (**Tablo 19**).

	Senifandina Tematîk a Kilaman li Gorî Du Kategoriyên Serekî	
	Kilamên Şer ¹⁴⁹	Kilamên dil
Dengbêj Şakiro	63 kilam	203 kilam
	639 cihnav	1044 cihnav
Kilamên Bê Cihnav ên Şakiro	(...) ¹⁵⁰	15 kilam
Dengbêj Reso	41 kilam	69 kilam
	418 cihnav	317 cihnav
Kilamên Bê Cihnav ên Reso	(...)	50 kilam

Tablo 19. Senifandina tematîk a kilaman li gorî du kategoriyên serekî

Li gorî (**Tablo 19**), di nav 63 kilamên şer ên Şakiro de 639 navê cihan derbas dibe, di 203 kilamên dil de jî ev hejmar xwe digihîne 1044 navan. Bi heman rengî, ji nav 41 kilamên şer ên Dengbêj Reso de, hejmara navan 418 e, lê di nav 69 kilamên dil de, 317 navê cihan derbas dibe.

Hamelink (2014: 132-136) jî di teza xwe ya doktorayê de nirxandineke hejmarî ya navê cihan dike li ser kilamên di kitaba bi navê *Antolojiya Dengbêjan* (2011) de. Ew tîne 84 kilamên ewil ên vê antolojiyê bi hûrgilî li ber çavan re derbas dike û destnîşan dike ku bi sercem 180 navê cihan di kilaman de derbas dibin û wekî herêm navenda van kilaman wekî başûrê rojhilatê Anadolîyê, Diyarbekir, Muş û Serhed

¹⁴⁹ Di kitabên Güneş û Şahin (2019a; 2019b) de tesnîfek jî li ser kilamên dengbêjan çêkirine. Wan, kilamên dengbêjan li gorî naveroka wan dabeşî pênc beşan kirine: “kilamên serhildanê”, “kilamên evîniyê”, “kilamên li ser şer û pevçûnên navxweyî-eşîrî”, “kilamên li ser xweza, raman û jiyanê”, “destan”. Li vir “kilamên şer” ew kilam in ku kategoriyên “kilamên serhildanê” û “kilamên li ser şer û pevçûnên navxweyî” ên di xebatên Güneş û Şahin (2019a; 2019b) vedigire nav xwe. Wate ev senifandin di bin du kategoriyên kilaman ên serekî de hatine parvekirin..

¹⁵⁰ Kilamên ku navê cihan tê de derbas nebûne.

diyar dike (Hamelink, 2014: 135-136). Li gorî wê, 36 caran kilam behsa derveyî herêma kurdî ya li Tirkîyeyê dikin ku jê 17 caran navê ku tê behskirin li Sûriyeyê ye. Tenê 8 caran cihê ku tê behskirin li derveyî herêma kurdî ya li Tirkîyeyê ye, ev jî destnîşan dike ku ji bo kurdan cihên li Sûriyeyê ji Tirkîyeyê zêdetir dibe xala referansê (Hamelink, 2014: 136).

Dema meriv kitaba *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso* (2019a), û *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro* (2019b) dinêre ji aliyê navan ve hin ferqên balkêş derdikeve meydanê. Berê beringa, divê meriv bibêje ku *Antolojiya Dengbêjan* (2011) ku ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê ve hatiye amadekirin, bi giştî li dengbêjên dorhêla berfireh a Diyarbekirê digire nava xwe û kêm be jî dengbêjên navdar ên Serhedê jî tê de cih digirin. Hejmara dengbêjên ku di kitabê de bi tevî kilameke xwe hatine nasandinê 175 e lê nirxandina hejmarî ya Hamelinkê hemûyan nedaye ber xwe. Ji ber ku beşdariya gelek dengbêjên ji herêmên cuda tê de heye û nav û nîşanên erdê yên ku di temamê vê xebatê de cih girtine malûmatên giring in. Lêbelê, çawa ku ji navê wan jî tê fêmkirin, kitaba li ser Dengbêj Şakiro (2019b) û ya Dengbêj Reso (2019a) tenê kilamê wan bi xwe dihewîne. Wate, kilamên dengbêjên din di kitabê de cih nagire. Taybetmendiyeke Dengbêj Şakiro ya berçav ew e ku wî hejmareke gelek zêde kilam ji dengbêjên din ên li Serhedê hildaye û kilamên wî dikare temsîla dorhêla berfireh a herêma Serhedê bike. Di vê çarçoveyê de, herçiqas kilam giş ji devê du dengbêjan tenê derketibin jî ji ber ku ew kilam ji kana xêr û xizne ya folklorê kurdî hatine wergirtin, xwedî temsiliyeteke nispeten gişgir in.¹⁵¹ Ji aliyê rêjeya navê cihan ve dema meriv li *Antolojiya Dengbêjan* (2011) dinêre, tê dîtin ku di 84 kilamên ewil de tenê 180 navê cihan derbas dibin, beramber vê, tenê 41 kilamên Dengbêj Reso yên li ser şer û qewaman de bi tevî dubareyan 418 navê cihan derbas dibin. Di temamê kilamên Dengbêj Şakiro de hejmara navan xwe digihîne **1683**î. Ji ser van amaran, meriv dikare bibêje ku meriv çiqas nêzîkê herêma Serhedê dibe, ew çend navên di kilaman de zêde dibin. A rast gelek sebebên vê yekê hene.

¹⁵¹ Ne ku hemû kilam aidî wan in, wan piraniya kilaman ji repertûara dengbêjên herêma Serhedê wergirtine û Reso di babeta kilamderxistinê de bi ser Dengbêj Şakiro re ye. Kilamên wan herdu dengbêjan çavkaniya xwe ji dengbêjên navdar ên mîna Evdalê Zeynikê, Mistoyê Heyran (Mistefayê Xelê Heyran) û Mistefayê Çiftborî û hwd digire.

Çawa ku li jorê jî hate destnîşankirin, herêma Serhedê kana hunera dengbêjiyê ye. Ji ber ku zêdetir ev herêm di vî warî de bûye navend, kilamên ku ji aliyê dengbêjên vê herêmê ve hatine derxistin, zêdetir bi herêma xwe ya lokal re girêdayî ye.

Dema ku kilamên ji Serhedê ber bi herêmên din diçin, an jî bi berovajî, dema ku ji herêmeke din ber bi Serhedê tên ji ber ku nasî û beledbûna navê cihên di kilamê de kêmtir dibe, nav an wîndî dibin an jî hejmara wan kêmtir dibe. Lêbelê, çavkaniya gelek kilaman Serhed e an jî cihê qewamê li wir derbas dibe. Wexta ku kilameke Serhedê bi devê dengbêjên herêmên din ve tên gotin, hin detayên navan wîndî dibin. Helbet, dema ku nasiya cihên navên rêzkerî yên di kilaman de ji teref cîmaeta hazir ve tune be, wê demê têkildarî û bîranîna mekanî kêmtir dibe ya ku guhdar di serê xwe de disêwirîne. Lewma carcar, hin kilamên ku li deverêke din belav dibin ji aliyê navan ve qels dibin an jî rastî herifandinê tên.

Li ser vê babetê Hamelink (2014: 134) destnîşan dike ku navenda kilaman herêma lokal a nêzîk e, kilamên derheq cihên dûr zêdetir xeyalî û kêmtir in ji aliyê hûngiliyan ve. Herwiha ew tîne ziman ku eger dengbêj ji wê herêmê be ku kilam lê hatiye gotin, zûtir xeletiyên nav û nîşanên erdê yên di kilamê de ferq dike (2014: 134). Navên di kilaman de eger ji herêmên dûr û cuda bin rastî guherînan tên. Bo nimûne, ev yek di kilama Filîtê Quto de tê dîtin ku xwedî gelek şax û guhertoyan e. Lê bi giştî, ji aliyê deng (voice), alîgirî û nêrîna exlaqî ya kilamê ve guhertoyên Serhedê ji guhertoyên herêma Xerzanê cuda dibin (bin. Kevirbirî, 2009a). Ji ber ku cihê ku şer lê qewimiye dikeve devera Xerzanê, navên li wan deran ji aliyê dengbêjên vê herêmê ve baştir tên zanîn. Ji herêma Xerzanê, Dengbêj Karapetê Xaço dema kilama Filîtê Quto dibêje, navê cihê şer wekî “Delana Paşo” bi lêv dike (Kevirbirî, 2009a: 94-95). Lêbelê dema ku Dengbêj Reso vê kilamê dibêje navê heman cihê wekî “Delavê Paşo” tîne ziman (2019a: 204-209). Ji ber ku nasiya navên li herêma Xerzanê li ba dengbêjên Serhedê baş nîne, dengbêjên Serhedê vî navî dişibînin peyva “delav”¹⁵² ku di kilama Geliyê Zilanê de wekî “Delavê Hêrîşoyê” (2019a: 204-209) derbas dibe. Çawa ku ji vê nimûneyê jî diyar dibe dema ku

¹⁵² Peyva “delav”ê tê wateya cihê ku ava çem tê de nizm dibe an jî “devera ku di derbiharan de av tê de der dibe” (Önen, 2020: 174).

çavkaniya kilama dengbêj dût dikeve, hin navên di kilaman de ji aliyê dengbêjê herêma nû ve baş nayên zanîn û xelet tên bilêvkin.

Çawa ji rêjeya bilind a navê cihan jî diyar dibe, kilamên dengbêjan gelek nexşeyan xêz dikin. Kilamên dil de, nexşeya cih û meskenên xweş ên wekî çiya, zozan, war(koz), kaniyan tê xêzkin û ev nexşe bi gelemperî bi navê çiya û zozanên lokal û naskirî ve tê dagirtin. Carcar jî bo şibandinê carcar jî ji bo derbaskirina demeke xweş bi hezkiriya xwe re, vegêrê di kilamê de nexşeyeke xweşik a çiya, zozan û warên bi xweşikbûna xwe ve bi nav û deng xêz dike, bi vî rengî, heke meriv bi gotina Feld bibêje “cimaeta hazir û guhdar derdixe gerekê” (1996: 91). Bêguman, rêzkirina navên çiya, zozan û waran, nexşeya civatî û çandî nîşan dide ku rastiya civata kurdî ya sedsalên borî bû. Meriv dikare jê derxe bê ka kurd bi çi rengî jiyana xwe ya gundewarî (çolterî) û koçberiya demsalî derbas kirine û têkiliyên di navbera hezkiriyên de, di nav vê civatê de bi çi rengî bûne. Kilamên şer, bi gelemperî nexşeyên qewam-navendî xêz dikin, bi gotineke deqîqtir, ew li dor mekanê rûdanê û dorhêla wê ya têkildar nexşeyekê radixin ber çavan. Bi vî rengî, erdnîgariya kurdî bi gelek şan û nîşanan ve tê xemilandin ku îşaretê bi qal, şer û qewamên giring dike. Bi teqîba li ser navên di nav kilaman de cih û deverên qewamên herî giring ên sedsala dawî ya kurdan tê destnîşankirin; Serhildana Agiriyê, Qira Geliyê Zîlan, Dardakirina Şêx Seîd, Şêx Fexrî Bukarkî, Serhildana Seyîdan û Beraziyan û hwd. Şik tê de nîne ku qewamên sosyo-polîtîk ên ku li cemawerê bandor kirine, bi saya serê kilaman di bîra civatî de hatine mihefezekirin. Zanyariyên çandî, têkiliyên hêzê yên di navbera eşîran de, pêwendiya civatî ya bi erdê re, rehendên civatî, dîrokî û polîtîk ên qewamê giş mîna pergaleke zanyariyan li ser erdnîganiya merivî ya kurdî tên îşaretkirin.


Îşaretên li ser erdnîgariya kurdî yên li dor qal û şerên raboriyê, beşên wê bîrê vediguhezînin dema îro, guhdar û xwecihên wê dormaleyê han didin û wan dixin nav meraqê da ku vê qewama dîrokî hîn bibin û bi bîr bînin ên ku êdî bûne parçeyek ji raboriya jibîrkirî. Bi qewlê Lewicka (2008: 214) ku li ser bîrxistên bajarî (*urban reminders*) dibêje -meriv dikare navan jî tev bike- li deverên bermayiyên xwecihên cihekî dikare bi awayekî yekser tesîrê li bîranînên wî cihî bike, bi rêya veguhastina zanyariyên dîrokî an jî bi rengekî neyekser dikare meraqê li wan peyda bike û wan teşwîq bike da ku raboriya wî cihî keşf bikin. Lewma meriv dikare bibêje ku navên

deverên gundewar ku navendên danûstandinên civatî bûn ji bo kurdan dikarin qewama raboriyê bi bîr bixin û guhdaran bixin meraqê da ku raboriya xwe keşif bikin. Ji vê yekê ew encam derdikeve ku nexşeyên cihêreng ên navan bi sedan kilaman de tîr xêzkirin, di heman demê de îşaretên bîrxistinê dihevinin ên ku hem dikarin mereqdariyê çêkin hem jî dikarin berê guhdar bidin qewamên dîrokî yên di raboriya civata wî/wê de pêk hatine. Ev bîra li ser qewama raboriyê hesta dewamdarî û aidîyetê bi wan kesan re çêdike ku raboriya xwe ya civatî hîn dibin.

Navê cihan ên ku di nav kilaman de gelek zêde xuya dibin, bi rol û tesîra xwe ya civatî ya lokal zêde ne, ew navendên girîng in û danûstandinên civatî yên ku li wan deran çêdibin tesîra xwe heye li ser jiyana rojane ya wê dewrê. Helbet ev yek bi zêdebûna dengbêjan ya li herêmekî re jî girêdayî ye, bo nimûne wekî ku tê zanîn mintiqaya di navbera Agirî, Mûş, Bazîd, Erzirom, Qers, Îdir û qismen Çewlîg û dorhêla wan ya berfireh de dengbêjî, nisbet bi cihên din zêdetir li rewacê ye û hejmara dengbêjan li van mintiqayan gelek in. Jixwe ji ber vê yekê ye ku Serhed wekî “navenda bingeşîn ya dengbêjan” tê dîtin (Özağaçhanlı, 2013: 789). Ne ku dengbêj û stranbêjên herêmên din kêmtir in, li vir cext zêdetir li ser kilamên dirêj ên bi awaz û meqam in ku bi gelemperî bê enstruman tîr îcrakirin. Ji ber vê yekê, dema ku dengbêj li derekê zêde bin, herêma dengbêj bi xwe û dorhêla berfireh ya wê herêmî jî nisbet bi herêmên din zêdetir dikeve nav kilaman. Rast e, Serhed bi her awayî li navenda kilaman de bi cih digire. Lêbelê têkiliyên tîcarî, civatî û çûna waran û dagerîna aranan jî nexşeyên taybet xêz dikin di nav cografyaya kurdî de û ev danûstandin, nexşeya lokal a Serhedê berfireh dikin. Bi taybetî rêya karwanan a ku ji Erziromê heta Îranê dirêj dibe û gund û navendên li ser vê rêyê gelek caran di kilaman de xuya dikin. Herwiha rêya tîcaretê ya ku ji Serhedê heta Diyarbekir, Heleb û Şamê diçe şopa xwe bi rêya navan di kilaman de dihele.¹⁵³

¹⁵³ Bo nimûne, di kilama Filîtê Quto ku di heman demê de kilameke li ser karwanan e, rêya ku Mamê Elê Etmanekî ji bihûra Bedlîsê re derbas dibe tê ku herêma Reşkotîyan re derbas dibe da ku here Diyarbekirê û li wir danûstandinên xwe biqedîne. Û li ser vê rêyê, şerê di navbera Filît û Mamê Elê de derdikeve ku li jor bi nimûneyan navên di kilamê de rêzkirî hatibûn pêşkêşkirin. Çawa ku xuya ye, têkilî û danustandinên dîrokî yên di navbera herêmên cuda ên kurdan de, jiyana civatî û têkiliyên tîcarî jî bi rêya şopa navên li ser nexşeyên xêzkirî dikare bê teqîbkirin.

Çûnûhatin û lebata demsalî ya kurdên koçer û nîvkoçer (*seminomads*) bi tevî keriyên pêz di navbera hêwirgehên germiyan û zozanan de çêdibe û bi vê yekê re danûstandinên çandî û civatî li ser van rêyan pêk tên û zozanên bilind û quntarên çiyayan jî dibin cih û warên hêwirdanînê. Ev jiyana ku bi koçberî û şivaniyê re teşe digire di sedsalên borî de yek ji taybetmendiya herî serekî ya hin eşîrên kurdan bû. Thevenin (2011) xebata xwe ya li ser çûnûhatinên kurdî û pratîkên şivanî di nav kurdan de destnîşan dike ku gelek rêyên cuda di navbera çêregehên (*pasture*) zivistanî û havînê de hene ku kurdên koçer bi dewamdarî li ser wan di liv û tevgerê de ne. Ew, herwiha gelek nexşeyên tevgerên demsalî yên eşîretên cuda yên koçer û nîvkoçer derdixe holê û wêneyekî jiyana pastoral a kurdî dikêşe. Çiya û zozanên ku di kilaman de wekî navendên jiyana pastoral tên dîtin di xebata Thevenin de (2011: 4) wekî çêregehên havînê tên nîşandan ku di heman demê de (nîv)koçer bi tevî heywanên xwe lê hêwir datînin.



Şikil 9. Liv û tevgerên demsalî li Anadolîya başûr-rojhilat¹⁵⁴

¹⁵⁴ Thevenin (2011: 4).

Di xebata xwe de ya li ser eşîrên koçber ên pastoral de Yener Koç diyar dike ku du cure koçberiyên eşîrên kurdan xuya dikin. Yek ji wan li ser mesafeyeke dirêj diqewime ku li ser xeta başûr-bakûr şikil digire. Ev yek bi taybetî ji aliyê eşîrên wekî mîlî, alikan, bekiran, reşkotan û mîran ve hatiye bikaranîn û ev nexşeya koçberiyê ji berê de heye ku carcar mesafeya koçê xwe digihîne du hezar km (Ji herêma Mêrdîn, Diyarbekir û Cizreyê heta Muş, Erzirom, Bedlîs, Çewlîg û hwd.). Cureya koçberiyê ya duyem ku niha jî qismen ji aliyê hin eşîran ve dewam dike di navbera mesafeyên ne zêde dûr de pêk dihat. Wê demê bi gelemperî koçberan zivistanên xwe li Xoy, Maku, Rewan, Erdîş, Adilcewaz, Milazgir û Muşê derbas dikirin (2020: 47-61).¹⁵⁵

Di nexşeya li jor ya tevgerên demsalî ya koçeran de hêwirgehên havînê û bilindî û çiyayên serekî yên li wan deran xuya dibin. Di nav kilamên dengbêjan de bi rêya navan ev nexşeya pastoral ya tevgerên kurdên koçber/rewend bi rihetî dikare bê teqîbkirinê. Bi taybetî Çiyayê Şerefdînê, Çiyayê Paletokê (Palandoken), Eledax, Gilîdax, Keşîş, Qerejdax di nav kilaman de gelek zêde xuya dibin, ev yek nîşan dide ku ev bilindî havînan bûne havîngehên (nîv)koçerên kurd. Bi giştî meriv dikare bibêje ku bi rêya kilamên kurdî gelek nexşeyên cuda cuda tên xêzkirin û ev nexşeyên toponîmîk jiyanî pastoral ya kurdî, rêyên karwanan ên di navbera bajaran de, qewamên giring ên li ser van rêyan îşaret dike, nahêle ku ew bi tevî raboriya xwe bîn jibîrkirin. Dewamdariya bîrê ya ku bi vî karî pêk tê re li ber merivan xweş dike ku jiyanî berê ya bavûkalên xwe hîn bin û bi erdê xwe re bîn girêdan. Lewma vebestîna bi erdê re (*place attachment*) û nasnameya erdî (*place identity*) bi encama têkiliyên sercem ên çandî, civatî û siyasî çêdibe.

Çawa ku Lewicka tîne ziman dema ku kesek bi cihekî re tete girêdan, zêdetir eleqeya xwe tîne ziman di derheqê raboriya wî cihî de û derheq kokên xwe de ji gelek kesan zêdetir eleqeyê nîşan dide (Lewicka, 2008: 210). Jixwe, “navê cihan tîna bîra me bê ka em kî ne, ji ku hatine” û ew çavkaniya zanyariyan e derheq dîroka cihekî de. Ew di heman demê de “parçeyeke navxweyî ya nerîta çandî û zimanî ya neteweyekî pêk tîne” (Tent & Slatyer, 2009: 5). Nerîta çandî û zimanî ya kurdan ku

¹⁵⁵ Ji bo nirxandineke gelek baş a eşîrên Zîlan, Celalî, Heyderan û koçberiyên wan ên pastoral û li ser sinorên Împeratoriye Osmanî, Farisî û Rûsyayê, bin. Koç (2020).

di kakilê navê cihan de tê hewandin di nav kilaman de dibin wekî amrazeke ku pê guhdaran bi erd û raboriyê re girê dide, xeyala welatê wan di serê wan de zindî dike. Bi qewlê Hamelink “behsa bi dewamdarî ya navê cihan û îşaretên fîzîkî li ser erdê di dema performansa xwe de, dengbêj nexşeyên herêma kurdî xêz dike. Ev nexşexêzî dibe ku ji bo guhdarên berê wekî noqteyên referansê kar kiribe, lewra kilam dikare alîkariya meriv bike da ku meriv ji wêneyê giştî yê dorhêla xwe ya jiyanê agahdar be” (2014: 132-133).

4.5. “Topogeny”: bi seredorî vegêrandina navê cihan

Di hin kilamên kurdî de, ji mekanê destpêkê yê kilamê heta cihê armanckirî yê dawiyê (çi rêwîti an jî şopa kesê firarî) navê cih û waran bi rengekî seredorî di nav vegêranê de cih digire û li ser qewam, tevgerên civatî yên li ser mekan girêdanên hestî û bîranînê saz dike.

James J. Fox di kitaba xwe ya bi navê *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality* (2006) de diyar dike ku bi taybetî di nav wan gelên xwecih ên ku bi zimanên avustronezî (*austronesian*) diaxivin navê cihan wekî parçeyekî navxweyî yê secereyê (*geneology*) tên vegotin ku di nav wan stranên ayînî de meriv an jî tiştek (bo nimûne, birinc û garis), li ser erdê derdikevin rêwitiyekê li gorî rêzeke secereyî. Ew ji bo ravekirina pêwendiya di navbera erdê û dîrokê de bi rêya seredorî rêzkirina navê cihan, nûpeyva bi navê “*topogeny*” (2006: 8) saz dike, li gorî wî vegêranên wihareng zanîna civatî rêz dîkin û wan vediguhêzînin. Di pêkhatina van *topogenyan* de, rêwitiyên şexsî jî dikarin bibin xwedî rol. Li gorî Fox (2006: 8) çemka *topogeny*ê “vegotin/xwendina ji ber ya navê wan cihan e ku bi seredorî rêzbûne”. Herwiha ew dibêje ku “*topogeny* dikeve gelek şekl û formên cihêreng di nav nifûsa avustronezyayê de. Ew dikarin rêwitiya bavûkalekî, koça grûpekî, an jî veguheştina tiştekî vebêjin” (2006: 8) Ew hevterîbiyekî (paralelî) di navbera secere û *topogeny* de dibîne, ji ber ku herdu jî bi *seredorî navan rêz dîkin*. Bi xebatên etnografîk ve gelek fonksiyon û rehendên cihêreng ên *topogeny*ê bi gelemperî di nava wan gelan de hatine dîtin ku bi zimanên avustronezyayî (*austronesian*) diaxivin û li ser gelek welat û giravên cuda cuda niştecih in (Tulius, 2012; Thomas, 2009; Wessing, 2001). Tulius (2012: 28) diyar

dike ku di tevgerên koçeriyê yê bavûkalên gelê Mentawai bi rêya secere û topogeniyê bi bîr dikevin.

James Weiner formeke cuda ya topogeniyê tesbît dike di nav stranên helbestî yê foïyan (*Pagua New Guinea*) de. Ev stran ji bo bîranîna kesê mirî behsê tîne li ser gelek rêze-cihên ku ew kes wextekî lê nêçîrvanî kiriye û bi rengê gotarî ji nû ve jiyana wî kesî saz dike di pêwendê mekanî û demî de (vgz. Fox, 2006: 14). Helbet, ev babeta *topogeniyê*, ji serhatî û rêwîtiyê takekesî bigire heta koçberiya malbatî û eşîrî, ji wir heta tevgerên bavûkalan û ên rûhanî derheq gelek çalakîyên civatî de têkiliya di navbera meriv û erdê de jî diyar dîkin.

Di nav kilamên kurdî de, ev têgiha ku Fox pêş xistiye bi çend cureyan ve tê dîtin û ev yek bi tena serê xwe ji bo lîteratura *topogeniyê* tiştekî nû û giring e. Vegêranên di dilqê secere û *topogeniyê* de zêdetir di nav gelên xwecih ên avustronezyayî tîne dîtin û ev diyardeya ku di nav kilamên dengbêjan de jî berdest e hin formên nû ên *topogeniyê* jî bi pêş dixin. Di hin kilamên rêwîtiyê yê Evdalê Zeynikê de, bi taybetî kilamên li ser rêwîtiya wî ya Xozanê de û di hin kilamên firarî û qaçaxiyê de formên gelek berçav ên *topogeniyê* tîne dîtin. Di vir de, ji bo nimûneya *topogeniyê* şaxeke kilama navdar Elî Xarza hate hilbijartin ku ji aliyê Gültekin ve (2013: 215-226) hatiye qeydkirin ji devê Dengbêj Kerem. Kilama Elî Xarza an jî Eliyê Xarziya, li ser qewimîneke gelek trajîk hatiye çêkirin û ji aliyê dengbêjê bi taybetî li Agiriyê ve hatiye gotin. Ev qewimîna vê kilamê di heman demê de bûye babeta hin nivîsarên bi kurdî jî (bin. Aras, 2013; Kahraman, 2013; Varlı, 2021).

Meriv dikare vê qewimînê gelek bi kurtî neql bike. Du karakterê serekî yê vê kilamê hene ku şaxên kilaman li gorî wan wekî Xalo (Hemze) û Xarziya (Elî) ji hev cihê bûne. Elî Xarziya ji ber hin meseleyên ku berê pêk hatine, direve û diçe aliyê Îranê, li Makûyê bi cih dibe. Dewleta Osmanî bi casûsê xwe li pey wî dikeve û wî digire û tîne hepsa Bazîdê. Xalê wî Hemze bi vê yekê di hise û rêyeke xelasiya wî digere. Elî Xarziya gelek îşkence jî dibîne û piştî wextan, dewlet dixwaze wî ji Bazîdê hilde bibe li Erziromê ceza bike. Hemze Beg ji bo xelaskirina Elî ji destê eskeran ji hevalê xwe Îbo Beg alîkarî dixwaze. Li tanga Deveboyniya li ser rêya Erziromê pêşî lê digirin, serekê eskeran Sarîbînbaşî dikujin û direvin. Di rêya pişt

Diharê re tê derbasî gundê Çatkosedaxê (li Elaşgirê ye) dibe û li wir tê kuştin. Xalê wî, Hemze wî hildide, tîne nêzîkî gundê Çerkez¹⁵⁶ dispêre axê (ji bo hûrgiliyên qewamê bin. Aras, 2013: 39-42). Aras destnîşan dike ku ev qewam bi texmînî di navbera salên 1888-1890an de pêk hatiye (2013: 40).

Ev meseleya li seranserê Agirî, Qers û Makûyê û gund û deverên derdorê deng vedide û gelek dengbêjên navdar li ser xal û xarziya kilaman derdixin.¹⁵⁷ Ahmet Aras diyar dike ku wî ji devê dengbêjê navdar Hecî Sêvdînê Remedana ev kilam tomar kiriye ku şaxeke dirêj e (2013: 40). Ev kilama taybet, gelek taybetmendiya balkêş nîşan dide. Bi taybetî, têgiha *topogenyê* ya Fox (2006) ji bo ravekirina bi seredorî rêzkirina navan a di nav vegêranê de gelek li vê kilamê tê.¹⁵⁸ Lê di kilaman de bi *topogeny* re taybetmendiya secereyê xuya nakin. Ji ber ku ruknê kilamê li ser rêwîtiyeke di navbera Makû-Bazîd-Erziromê de ava bûye, li gorî şaxê kilamê cihê destpêkirina navê gundan diguhere. Di “Elî Xarza” ya Dengbêj Kerem de (bin. Gültekin, 2013) bi tevî dubarekirinan **160** heb navê cihan derbas dibe ku bi gelemperî bi seredorî tên rêzkirin. Wate, rêzbûna van navan ne bi keyfî (*arbitrary*) ne lê ew li gorî rêwitiya karakterê kilamê li ser mekan tên neqîşandin. Li gorî Fox (2006: 8) vegêranên bi vî rengî zanîna civatî vediguhêze û bîrê li ser mekan bergewde dike. Di rêwitiya di kilamê de, parçeyek wiha tê vegotin:

...

Ewê şevê îstereheta xwe dibîne

¹⁵⁶ Gundekî Elaşgirê ye.

¹⁵⁷ Hin dengbêjên ku şaxên vê kilamê dibêjin ev in: Dengbêj Hecî Sêvdînê Remedana (Sêvdînê Hamê), Dengbêj Mihemedê Çêrmeliyê, Dengbêj Eliyê Mirad, Dengbêj Keremê Kor, Dengbêj Mistefayê Cangoranê û gelek dengbêj û stranbêjên din ên jî ev kilam gotine. Kilama Kawîs Axa ya bi navê “Çemê Çetelê/Xalo” gelek bi nav û deng bûye. Birayê Dengbêj Mihemedê Çêrmeliyê diyar kir ku birayê wî ev kilam gelek xweş digot û şaxeke kin ya vê kilamê wî bi xwe jî dizanibû (M. Yıldız, hevpeyîna rûbirû, 29ê Îlonê, 2020) Şaxeke vê kilamê ji aliyê Ehmedê Hepo ve ji zarê Eliyê Ezîzê Rûto li Komara Azerbaycanê hatiye bernivîsandin (2021: 25-39). Herwiha Heciyê Cindî şaxeke heman kilamê ji zarê Keleşê Xelîl li Ermenistanê bernivîsandiye (2016: 183-197) û Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl jî (1978: 268-278) şaxeke vê kilamê tomar kirine.

¹⁵⁸ Helbet ne tenê ev kilam, bi dehan kilamên din ên kurdî heye ku tê de *topogeny* tê dîtin. Ji ber ku ev kilam vê taybetmendiya baş nîşan dide li vir ew hate hîlbijartin.

Sibê ra du seet sibe dimîne
 Radibe teng û bera dişidîne
 Eynî di **Lêşko** ra, di **Gundê Pîrê** ra
Tîra Jorîn ra, **Mîrzexan** ra, di **Ava Mesiya** ra
 Dajo dicedîne
 Gelo di **Nado** ra, tanga **Sînegê** ra
 Dajo gelo tanga **Çamûlê** ra
 Di **Nawîk**¹⁵⁹ ra gelo tanga **Aşqelê** ra
 Di **Îza** ra, di **Cimika** ra, **Kasorê** ra
Qeyabegê ra, binya **Xaçilê** ra
 Di **kela Elaşgirê** ra, gelo **Şadya**
Remedana, di **Gapira** ra
 Çû derkete orta **Parsînê**, gundek heye li **Çatê** dimîne
 Lo, lo, lo, lo (Gültekin, 2013: 218).

Çawa di perçeya jorê ya kilamê de tê dîtin, kilamê de rêzkirina navan ji gundê Lêşko¹⁶⁰ dest pê dike heta gundê Çat(kosedax)ê tê. Li ser vê rêyê navê wan hemû gundan bi rêzeke seredorî (*ordered sequence*) tên vegotin. Ji ber ku ev kilameke gelek dirêj e ne mimkin e ku meriv hemû navan li ser nexşeyekê bi cih bike. Lêbelê eger meriv beşa jor a kilamê bi rengekî seredorî nexşe bike wê bê dîtin ku ew gundên ku hatine rêzkirin bi gelemperî tevlihev nabin û bi rêzê navê wan derbas dibe (bin. Şikil 10).

¹⁵⁹ Navê gund Nawîk e ne ku Nawîk. Dibe ku bernivîsandinê de xeletiyek çêbibe.

¹⁶⁰ Lêşko gundê Avkevîrê ye.



Şikil 10. Vegêrana topojenîk a ji gundê Navîkê heta Çatê

Dema ku li gorî rêzê navê gundan tên xêzkirin rêya ku karakterên kilamê tê re derbas dibin baştir xuya dike. Ferdên jor ên kilama Elî Xarza ku hema hema tenê ji navan pêk tê ji gundê Navîk dest pê dike ji wir bi seredorî gundên wekî Aşqele, Îz(iy)a, Cimika, Kasor, Qeyabeg, Xaçîl, kela Elaşgîrê, Şadya, Remedana, Gapira û Çatê teqîb dike. Ev kilama bi navan dagirtî gelek berbelav dibe û ji aliyê bi dehan dengbêjan ve tê gotin û heta nav kurdên Ermenistan (Cindî, 2016: 183-197), Azerbaycanê (Hepo, 2021: 25-39) û gelek deverên din jî şaxên vê kilamê tînin. Nimûneyên bi vî rengî yên ku taybetmendiya *topogenyê* nîşan didin û bi navan çîrokan saz dikin kêmbin jî hene.

Bo nimûne Rosaldo (1986) diyar dike ku ji bo gelê ilongotê (bugkalot) yê li Fîlîpînê, navên cihan ên rêzkirî bi tena serê xwe wekî çîrok tînin hesabandin. Li gorî gelê navbirî guhdariya wan navê cihan ên rêzkirî ku kesek lê geriyaye bi qasî vegêraneke bikitekit çîrokek e (û nabe ku ji nav çîrokekê bên derxistin) (Rosaldo, 1986: 106). Di nav gelek gelên avustronezî de navê cihan bi tevî secereya bavûkalan tê veguhastin û çîrokên rêwitiyên malbatî di nav her kom û cemawerên eqreba de tînin û ev di nav malbatê de ji nîşekî bo yeke din tînin parastin (bin. Tulus, 2012) Li gorî Tulus secereyên merivên eqreba yê ku pêkhateyên giring ên çîrokên malbatî dihewînin û agahiyên li ser tevgerên koçberiyê û navên bavûkalan dikarin eqrebatîya wan û ya cînarên wan piştrast bikin ku niha ji hevdu cihê bûne û li devereke din dimînin (Tulus, 2012: 191). Lêbelê dîrokbêjiya devkî ya malbatî ku di nav kurdan de

jî hin taybetmendiyên *topogenic* û secereyî dihewîne, mîna hin gelên avustronezî bi sînorên berteng ên secereyên malbatî re ne girêdayî ye. Belkî berevajî wê, çîrokên ku ji bo civatê balkêş bin û zêdetir derdikevin pêş belav dibin û dikarin sînorên xwe yên lokal bi rihetî derbas kin. Wekî çîroka rizgarkirina Elî ji destê dewletê û rewa wan a bi wêrekî herçiqas wekî çîroka xal û xwarziyekî di nav sînorên malbatî de be jî, cihetên wê yên wekî li dijî derketina desthilatê û qaçaxî û firarîbûna wan dihêle ku çîroka wan ji sînorên dewletan jî derbas bibe.

Bi vegêrana ku li dor rêzkirina wan hemû navan tê avakirin, bîra vê rêwitiya wan bi pêzanînen mekan-zemanî pêşkêş dike û serhatiya lehengên kilamê ku hewl didin Elî Xarziya rizgar bikin bi navên rêzkirî ve îşaret dike. Çûn-hatina di nav kilamê de tim bi navê gundan ve tê vegêran, ew di van cure kilaman de ber û paşîya kilamê diyar dikin. Piştî ku Elî Xarziya tê kuştin, rêwitiya Hemze dewam dike heta ber bi gundê Xecxatûnê ku li hinda sînorê Çaldiranê ye. Di vegotina mirina wî ya trajîk de, dengbêj amrazên vegêraneke helbestî û retorîk bi kar tîne û mirina wî wiha pêşkêş dike:

“Gelî cimaetê, sibe bû, li geliyê **Çatê** tav diziriqî

Serê xarziyê li ser çoka xalê dixeriqî

Eliyê Xarza go, xalo, dilê min kîne-kîne

Wexta tu hatî bihar e, eva payîzd e,

dar lê dixê dar çiloyê xwe diweşîne” (Gültekin, 2013: 225).

4.6. Nav wekî avakerên mekanê bîrê: “Geliyê Zîlan”

Di nav kurmancên Serhedê de, dengbêj qal û şerên mezin ên ku tê de kuştin û rewşeke dilşewat hebe bi detay hîn dibe -eger nizanibe û ne şahid be- ji kesekî şahid an jî ji zêmara jinekê werdigire û dike kilam. Dengbêj di wê ferqê de ye û dizane ku qal û şerê ku li ser vegêranê tê avakirin wê ji mezinan derbasî biçûkan be û neyê jibîrkin. Heta carcar dengbêj vê diyardeya “veguhastina çandî ya di navbera nîşan de” dixê nav kilama xwe û di kilamê de yek ji armancên kilambêjiya xwe destnîşan

dike. Ew dixwaze bîreke civatî ava bike û li hember xisara jibîrkirinê bi kilam û kelama xwe ve li ber xwe bide û qal û qewimînê nede jibîrkirin.

Di nav kurdan de ji ber ku nivîs kêr bû, gelek qal, şer û qewam nedihatin tomarkirin. Dengbêj li hember talûkeya jibîrbûnê li ber xwe dida bi sedan salan, lewra dengbêj warê sewt û qefesa xwe wekî kitab didît ya ku tê de serboriya gelêrî hatibû nivîsandin û ev kitab ji dengbêjên din re dikaribû bibûya kaxiz, qelem û defter da ku ji ber bigirin û nedin jibîrkirin. Li vir, çanda devkî bi rola çanda nivîskî radibe û bi şêwaz û stîla ku çanda nivîskî pê kar dike, dibe navê neqilkirina devkî ya dengbêjan. Ev nîşan dide ku dengbêj çendî bi bîra xwe guman in. Bo nimûne, kilama Evdalê Zeynîkê bi devê Dengbêj Reso (2019a: 258-259) wiha tê neqilkirin:

Ez Evdalê Zeynê Bavê Mihê me

Singê mi **kitûka dengbêjan** e

Zarê mi ji dengbêja ra **kaxiz û defter û qelem** e lo yeman”

Sing û bîra dengbêj dibe ew kitaba ku hemû qal û qewamên giring tê de tên tomarkirin û ji bo dengbêjên din tên neqilkirin. Qewamên mezin lewma li ser zar û zimanê dengbêjan (ve)digerin û heyênî dinya xweş ava be dengbêj wê dîkin “kilam û meqam”. Li vir zanîn û sermayeya çandî û dîrokî ya gel ji bo nîfşên bê tên neqilkirin. Vansina ku li ser dînamîkên veguhastina “nerîta devkî” (*oral tradition*) ji nîfşekî bo nîfşeke din xebat kiriye, diyar dike ku nerîta devkî dikare hevterîb li gel çavkaniyên nivîskî kar bike û dîroka çandên nexwenda/bêsewad bide neqilkirin (1985). Kilamên dengbêjan ku parçeyekî wan ê giring ji qewamên dîrokî pêk tê, rola veguhastina nerîta devkî ya çanda kurdî hildigirin ser xwe û wan derbasî nîfşên nû dîkin. Ango, sermaye û zanîna çandî ya bi salan di bîra gel de bi rêya nerîta devkî ya kurdî winda nabe û tê neqilkirin. Dema meriv di çarçoveya pênasîya rola veguhastina nerîta devkî ya Vansina de (1985) li kilaman dinêre, meriv dibîne ku tespîten Vansina rasterast ji aliyê dengbêj ve di nav kilamê de tê vegêran. Dengbêj wekî veguhêzerê nerîta devkî, bixwe ferqa rola vegêrana xwe ya hunerî de ye. Bo nimûne, di kilama “Dêran-Kejik” (2019a: 214) de taybetmendî û rola kilam û meqamên dengbêjan bi terza Dengbêj Reso wiha tê ziman:

heyânî dinya xweş ava be dengbêjê bikin meqam û kilam
li hevdu vegerînin

Rast e, dengbêj gelek qewamên dîrokî dîkin “kilam û meqam”, bi saya afirineriya wan pirên çandî di navbera nîfşên berê û yên nû de tên avakirin. Ew, demên ku dikevin navbera nîfşan, bi veguhastina çandî digihin hevdu. Di vê derbarê de, Yüksel, bi xebata xwe ve hevgiriya vegêranên devkî bi qeydên nivîskî dipeyitîne û destnîşan dike ku di veguhastina dîroka kurdî de helbesta devkî (*oral poetry*) roleke giring werdigire (2016: 663) ji ber ku kilamên dengbêjan, ji aliyê mezinan ve ji bo biçûkan tên neqilîkirin ango pireke çandî û dîrokî ava dîkin di navbera nîfşên cuda de.¹⁶¹

Çawa ku li jorê hate diyarkirin, şer û qewamên giring ên ku bîra civakê de cih digirin, zêdetir dibin mesele û babeta kilamanên dengbêjan. Yek ji wan qewama herî giring ya nêzdîroka kurdên li serhedê bêguman Serhildana Agiriyê û bi serhildanê re têkildar Qira Zîlanê ye. Geliyê Zîla(n), geliyekî kur û bi dar e ku ji Çiyayên Eledaxê heta Erdîşê ji çemên biçûk û ji gelek gundan pêk tên. Dever bi zozanên xwe yên xweş û bi çavkanî û çemên xwe ve tê naskirin.¹⁶²

Ber bi dawiya Serhildana Agiriyê, şer heta vê herêmê jî belav dibe û li gelek gundên Zîlanê di encama operasyonên leşkerî de tên şewitandin, gundî tên kuştin û gelek gund êdî nema dimînin. Ev qewama giring a dîroka nêzîk, gelek bala dengbêjan kişandiye. Kilamên li ser Geliyê Zîlanê, di nav vegêranên devkî yên kurdên Serhedê de xwe digihîne dereceyeke bilind, bi dehan dengbêjan ev qir kirine “kilam û meqam” û li hevdu vegerandine. Li Serhedê hejmara dengbêjên ku li ser

¹⁶¹ Bo nimûne, di kilama Filîtê Quto de, di versiyona Dengbêj Huseynê Muşî de,¹⁶¹ dema ku behsa kuştina Filîtê Quto tê kirin, li ser mirina wî wiha tê gotin: “Lo lo lawo ca derbekî bavê(je) Filîtê Quto êtîmê Şemê, siwarê pêşiyê ewê ser bi şemla / *Heta dinya ava be, bira mezinê wir rabin piçûkên wir ra gelo çêkin mesele bexêê*”. Ji bo deşîfrasyona vê kilamê bi hin biçûk, bin. Güneş û Şahin (2021: 273). Mezinan rabûye ji biçûkan re şerê di navbera Filîtê Quto û Emê Etmanekî de, kiriye mesele û meseleya dîrokî bi rêya kilam û meqamên dengbêj, ji nîfşên berê heta nîfşên nû hatiye neqilîkirin.

¹⁶² Bo merhaleyên serekî yên Qira Zîlanê û vegêranên şexsî yên derheq vê qirê de, bin. Ulugana (2012) û ji bo serhildana Agiriyê bin. Alakom (2011).

Geliyê Zîlanê kilam negotibe kê in. Ev rastî, di heman demê de ji bo bîra civatî giringiya qewamê û wehşeta li wir pêkhatî nîşan dide. Tiştên ku li Geliyê Zîlan diqewimin bi dehşeta xwe ve di nav kilamên dengbêjan de bi hostatî û bi meqamê etîk û exlaqeke çê tê vegêrandin. Di hin kilamên li ser Geliyê Zîlan de, çîroka di nav kilamê li dor şexsan tê avakirin, beramber wê, di hinan de jî wêneyên panoramîk ên meydana kuştîyan (“qesabxane”) tên pêşkêşkirin bi tevî, jin, zarok û ciwanên ku pêrgî vê karesatê bûne.

Piştî Zîlanê civat gelek trawmatîze dibe, hin malbatên ji Geliyê Zîlan cîguhastî dibin û diçine gund û bajarên cuda ên li Serhedê bi cih dibin, gelek malbat li hember tirs û xofa ku dîtine bêdengî tercîh kirine. Ev bêdengî, ji trawma û karesata wan dîtî re nabe aramî û derman, bi ser de jî ew bêdengiya tercîhkirî wan dike “qurbaniyê bîreke deforme”. Li ser vê bêdengiya qurbaniyan Dori Laub wiha dibêje;

Tu kes di bêdengiyê de aramiyê nabîne, wexta ku ev bêdengî tercîha wan bi xwe be jî rewş naguhere. Di ser de jî, mexdûrê ku çîroka xwe venabêje dibe qurbaniyê bîreke deforme, ango, bîreke bi darê zorê “xerabiyeke derveyî” lê hatiye kirin a ku bi xeyalê re dibe sebebê têkoşîneke bêkevî. “Venegotin” ji dewamdariya zordariyê re xizmetê dike. Di bibîranîna bêdeng de bûyer her ku diçe deforme dibe û bi berbelavî jiyana rojane ya mêxdûr diherimîne û dagir dike. Çîrok çiqasî bêdeng dimîne, ewqas têgihiştina mêxdûr a derbarê wê de deforme dibe, ev yeka tê radeyeke wisa ku mexdûr derbarê rastîbûna bûyerên pêkhatî de dikeve şik û şibhê (Laub, 1995: 64).

Li dijî vê (ve)negotin û bêdengiyê, dengbêj dibe “deng” gel û qêrîna wan bêdengan dide bihîstin ku di trawmayeke daîmî de ne. Herwiha, dengbêj bi wêrekiyeke mezin li ser Zîlanê bêdengiyê dişkîne ango ew civatê li ser serboriya wê ya biêş ji bêdengiyê xilas dike ya ku ji berdewamiya zordariyê re xizmetê dike û nahêle ew kesên mexdûr bibin dûçarî têgihiştîneke deforme. Lewma, ji bilî tomarkirina dîroka dûr û nêzîk ya gel û veguhastina bîrê ji bo nifşekî nû, kilam dikare li ser qewam û “qir”ên raboriyê deng û dijberiya xwe ya exlaqî diyar bike. Li aliyekî, helbet tu metn, vegêran an jî kilam nikare serboriya trawmatîk a mexdûran bi xweşîkî vegêre ji ber ku mexdûr bêpeyv dimînin. Dori Laub ku bi xwe ji Holokostê xilas bûye di zaroktiya xwe de, li ser trawmayê dibêje “bi têra xwe peyv an jî peyvên

rast nînin serborî tu carî bi temamî di hizr, bîr û xeberdanê de nayê qefaltin” (1995: 63). Wate, tu gotin, peyv û çîrok tune ku derdê dilê kesê mexdûr re bibe derman û di asta zimanî de jê re ifadeyeke tetmînkar peyda bike. Li vir, rola kilamên dengbêjan helbet bi temamî dermankirina êş û azara mexdûran nîne lê ji ber ku bi rengê ew şahidiya li ser qal û qira li Geliyê Zîlanê tînin ziman, bi rêya kêmkirina bêdengiya li ser qewamê û wêrekiya bi xeberdan û veguhastina şahidiyê ve ew “tedawiyeke” kelamî/peyvî çêdikin di nav civatê de. Dori Laub dema behsa şahidî û serboriya xwe ya trawmatîk dike, di derekê de dibêje ku detayên zelal (bi tevî navê cih û merivan) ên ku tên bîra wî ew qas rast derdiketin ku diya wî ji ber vê yekê şaş û metelmayî dima (Laub, 1995: 61). Wî bi rengê ecêb, digel temenê xwe yê biçûk navê cih û merivan bi bîr aniye. Ev yek dikare nîşan bide ku kesê mexdûr an jî bi gotineke rast şahid di derheq serboriya xwe ya trawmatîk de dikare çendî tiştine bi detay ên wekî navê cihan û merivan bi bîr bîne. Dema meriv ji vê bergeh û berdiyê li kilamên dengbêjan dinêre ku gelekên wan xwe dispêrin çîrokên şahidên qewimînê, gelek navên bi detay ên çem, delav û kaniyan xuya dikin. Ev, bi taybetî rastbûna bîra şahidê qewamê û rastbûna neqilkirina wê/wî destnîşan dike.

Dengbêjan gelek kilam li ser Geliyê Zîlan derxistine,¹⁶³ di vê beşê de tenê kilamek ji wan tê nirxandin, ji bo nirxandineke kûrdirêj û bi berawird xebateke taybet divê ku ew jî dikeve derveyî çarçoveya berdest a vê xebatê. Ji ber hindê, kilama ku li vir dê nirxandineke li dor vegêrana wê çêbe, kilama Dengbêj Reso ya bi navê “Geliyê Zîlan”¹⁶⁴ e (2019a: 48-49). Kilam bi navê cih û meskenê qirê ve dest bi vegotina xwe dike û hê di serê kilamê de cihên ku qal û qetlîam lê cîriyaye nav bi nav tên bibîranîn. Ev navên cihan, ji ber ku sehaya qirê berfireh e, li gorî kilaman dikarin biguherin û navên din jî lê zêde bin. Lewra Geliyê Zîlan ji dehan gundan pêk

¹⁶³ Bi dehan kilamên li ser Geliyê Zîlanê dikarin di nav hewza rêzekilamên li ser Serhildana Agiriyê de bîn hesibandin û nirxandin.

¹⁶⁴ Ev kilam û hin guhertoyên vê kilamê ku carcar ji bergeheke lap cuda hatine vegêran ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin: Dengbêj Şakiro, Dengbêj Kazoyê Garisya, Dengbêj Mistefayê Cangoran, Dengbêj Ehmedê Hêlikan, Dengbêj Nûroyê Meter, Dengbêj Mihemedê Canşah û hwd. Ji bilî wan, Gültekin (2013) jî hin kilamên li ser Zîlanê bi defter kirine; “Ferman e” (317-318), “Geliyê Zîlan” (330-331), “Keremê Elî” (334-335).

tê. Li ser Geliyê Zîlan, gelek kilamên ku hatine gotin navên cihan gelek bi detay rêz dikin, kilama Dengbêj Reso ya bi navê “Geliyê Zîlan” jî mîna gelek kilamên din, navên gund û deverên qirê bidetay tîne ziman. Di temamê kilamê de, -ku tenê ji sê bendan pêk tê- bi tevî dubareyan 25 heb caran navê cihan derbas dibe. Zafbûna navê cihan û derbasbûna wan a bidetay, bi mezinbûna karesatê re vebestî ye. Lewra qewam çiqas mezin û tesîra xwe çiqas berfireh be, binavkirinên di çîroka (kilam) qewamê de jî ew qas bi detay û zêde dibin. Ev yek di gelek kilaman de bi rihetî tê ferqkirin. Di kilama Dengbêj Reso de, piştî ku navên cihan tên dayîn, sebeb û failê qirê wekî “Doquzincî Alay” û Dewrêş Beg¹⁶⁵ tên destnîşankirin. Ji bilî navê cihê qewamê, gelek navên merivan jî di kilamê de xuya dibin ku bi piranî ew kes in ku bi rengê bûne qurbanîyê vê karesatê an jî pêkhatina wê de rola wan hebûye. Di kilamê de, berdî û bergehê dengbêj ber bi Geliyê Zîlanê e, li wir, zîqa vegotina wî ya gur zêdetir li ser navan dicive û cext tê li ser navên cihên biçûktir ên wekî “Warê Salih Begê”, “Kaniya Dîdarê”, “Delavê Hêrîşoyê”:

Dayê dayê dayê...

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra **Geliyê Zîla**

Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê

wey la reben im lawo îro nizanim sebeb kî bû, kê bi kê kir

kula Xwedê bi kul be têkeve mala doquzincî alayê

fîrqa waliyê **Bazîdê** Dewrêş Beg pê ra

Mihemedê Hesê Hecî Elî li kaviliya **Sarisuyê** kuştin

Şêx Tahir dayê rûniştin di heqê **Geliyê Zîla** da fesadî kir

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**

kuştina tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer

Dewrêş Begê ûrt û ocaxê xwe li dunyayê qelandî lawo

¹⁶⁵ Kilam di heman demê de dibe amraza exlaq û wicdanî ya ku nerindî, bêbextî û tevgerên kirêt û kesên xwedî kiryarên xerab “tehdît” dike yên ku derveyî normên civatî tevdigerin û aramiya civatî xerab dikin. Darizandina daîmî û hetahetayî ya di nav wicdana gel de, kiryara xerab ya wî kesî (an jî desthilatê) nade jibîrkinê, berovajî wê, di dîwanxaneyan de wê tim bi bîr dixê û di nav gel de belav dike. Di vê derbarê de Çelik (2015) destnîşan dike ku vegêrana kilamê dikare carcar “deximandinên berdewam” çêbike. Di vê kilamê de jî dexmek (*stigmat*) li ser kiryara xerab a “Derwêş Beg” û “Doquzincî Alay” çêdibe ku desthilatê dinimînin.

derbek li taxoxlanê mala Şero daye Efê delalî
ji bona xelekek zêr e eza hêsîr im tiliya Ûsiv Begê delal di ber da jê kir.

Bi rêzkirina navê cihan ên biçûk ên wekî war, zozan, kanî û delav, cihê ku qirê lê rûdaye bi zelalî tê vegêran û bi bîr xistin. Bi vî rengî dengbêj, bi navê cihan ve mekanê bîrê ava dike li cih û noqteya qewamê bi detay xêz dike û qewama bi êş bi wî mekan û navî re girê dide û vediguhêzîne. Li ser veguhastina bîrê, Bilal di xebata xwe ya li ser lorî û stranên ermeniyên de cextê dibe ser bîranînên rojane yê jinan ermeniyên ku zanîneke dîrokî hildiberînin. Li gorî wê, lorî û stran di astên cihêreng de navçitiya bîrê dikin, vegêr (jin) bi serhatiya wê re vedibestînin, nîşên nav malbatê digihînine hevdu an jî hesta aidîyetê bi dîrokeke hevpar re çêdikin ji ber ku şîyanweriya wan a veguhastina bîrê heye (Bilal, 2018: 16). Helbet ev bîr hem ji bo ermeniyên hem jî ji bo kurdan ji ber serboriyên sed sala borî dirûvê vegêranên biêş û trawmatîk werdigire.

Erdê lokal yê ku bi navê cih û şexsan ve hatiye neqîşandin, girêdaneke hestî bi wan kesên xwecih re çêdike ên ku li wan der û deveran nas dikin û pê re jî bavûkalên xwe bi rêya çend navên berçav û temsîlî bi bîr tînin. Lewma meriv dikare bibêje ku toponîmên di kilamê de dibin bîrxer/bîrxistên peyvîkî (*verbal reminder*) yê mekanê ku qewam lê rûdaye. Li vir êdî nav mîna qûç û îşaretên mekanî kar dikin ên ku di asta bîr û hafîzeyê de meriv û mekanan di nav jiyana civatî de digihîne hevdu. James E. Weiner jî di nav gelên xwecih ên Papua New Guineayê de rastî diyardeyeke bi vî rengî tê. Li gorî wî navê cihan wekî bîrand (*nîmonîk*) kar dikin ji bo qewamên dîrokî yê merivan ku tînin cih û waran tekane û giring dikin (Vgz. Helleland, 2012: 110).

Connerton navê cihan û erka wan wekî bîranînê (*memorial*)¹⁶⁶ dinirxîne. Li gorî wî, navê cihan ne tenê şan û nîşana erdê destnîşan dikin, ne jî ew tenê mîna nîşanderan tên bikaranîn da ku pozîsyonên di danûstandinên civatî de mizakere bikin (2009: 10). Di çarçoveya bîra gel a gelêrî de bi taybetî qewimîn û karesatên gelek mezin ku li ser kilam hatine derxistin, bi navên xwe ve dibin bîrxistên karasetê bi xwe. Tenê navê derekê jî, çawa ku di nav gelê apaçhiyan de pêk tê, dikare

¹⁶⁶ Meriv dikare wekî mekanê bîranînê jî wergerîne.

vegêraneke naskirî di nav xwe de bihewîne (Basso, 1996). Ev yek, di nav gelek gelên xwecih de tê dîtin, bo nimûne di gelên Papua New Gineayê de navê cihan gelek tiştên sembolîk dikarin bi bîra meriv bixin (Fox, 2006; Feld, 1996). Û ev bibîrxistin bergiriya bîra cemawerê xurt dike ya ku her tim dûçarê jibîrkinê ye û her cara ku kilam li dîwanxaneyekê tê gotin, bîr teze dibe û karesat heta demeke din jî hebûn û dewamdariya xwe di nav bîra civatî de diparêze.

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye ser eşîra **Geliyê Zîla**

Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê

reben ez im lawo qewimiye li orta herdu rêyan e

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**

kula Xwedê bi kul be têkeve mala doquzuncî alayê

fîrqa waliyê **Bazîdê** Dewrêş Begê pê ra

Mihemedê Hupê Hecî Elî li kaviliya **Sarisûyê**

Şêx Tahir dane pêşiyê ji êvar da ez hêsîr im lawo

devê topan û tometîkan û mawîzerya li hêsîrê **Geliyê Zîla** girêdane

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**, kuştina tazoxlanê Mala Şêro

heyfa mi nayê li wê heyfê zarê di serê sungûya da şûrê di qirika jina da


heyfa mi nayê li wê heyfê, heyfa min tê li wê

Derwêş Begê ûrt û ocaxê xwe ji dinyayê qelandiye

hezar û pîncsed nifûsê **Geliyê Zîla** tov kiriye ji êvar da

biriye li orta **Kindûk** û **Milkê** di nav da kirin qesabxane

Dengbêj, bi temamiya kilamê bi navan dineqîşîne. Di kilamê de tê dîtin ku berê çekên giran dane li “êşîr”ên Geliyê Zîlanê û kuştinên bi komî pêk hatiye: “devê topan û tometîkan û mawîzerya li hêsîrê Geliyê Zîla girêdane”. Herwiha vegêrana kilamê dîmenên gelek biêş û dilşewat vedigêre ku hesteke gur bi tevî dîtbariyeke zindî tê berpêşkirin ji meydana ku qir lê pêk hatiye: “zarê di serê sungûya da şûrê di qirika jina da” tîne ber sehneyê. Dengbêj pey re qal û qewameke ji zarê ser singûyan mezintir salix dide û bi gotina qalibî ya dengbêjiyê “heyfa min nayê li wê heyfê” bi kar tîne û libo libo heyfa xwe bi wan tîne. Heyfa xwe herî dawî bi wê heyfê tîne ku çawa kuştina komî pêk hatiye li navbera gundên **Kindûk** û **Milkê** de.



Şikil 11. Nexşeya Gelîyê Zîlan û mintiqaya ku gundên Kindûk û Milkê

Dengbêj navê mintiqeyeke bisînorkirî û gelek diyar dide û herêmeke gelek berteng xêz dike ku meriv dikare wê derê wekî cihê qira bi komî destnîşan bike. Li gorî wî, ya herî xerab ew bû ku bi hezarî zêdetir meriv di navbera **Kindûk û Milkê**¹⁶⁷ de hatine kuştin û ew der kirin “qesabxane”:

hezar û pêncsed nifûsê **Gelîyê Zîla** tov kiriye ji êvar da
biriye li orta **Kindûk û Milkê** di nav da kirin qesabxane

¹⁶⁷ Bi tirkî *Kündük û Mülk*. Herdu gund piştî Zîlanê hatine şewitandin û niştecihên gund hatine kuştin. Navên herdu gundan nehatine guhertin ji ber ku gund bi temamî hatiye tunekirin. Lewma di nîşankirina li ser nexşeyê ya wan herdu gundan jî zehmet bû, ji ber ku gelek kes êdî cihê wan gundan jî nizanin, lê tenê navê wan dizanin.

Bi rastî jî, di vekolînên li ser dîroka devkî ya Zîlanê de ji vegotinên kesên şahidê qirê nîşan didin ku yek ji wan qetlîama herî bi wehşet li orta herdu gundan de pêk hatiye (Ulugana, 2012:125-132). Ulugana di xebata xwe ya sehayî ya bi navê *Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı (1926-1931)* de cihekî taybet dide qetlîama li van herdu gundan û destnîşan dike di tîrmeha 1930ande ji 25 gundên geliyê Zîlan li **Milkê** tê civandin û li wir tîr kuştin (2012: 125). Herwiha ew destnîşan dike ku li **Kindûk** û Newala Bebo endamên eşîrên hecîdêrî û îskî tîr kuştin (bin. 2012: 145-147) Çawa ku ji vê kilamê tê fêmkirin, dengbêj kilama xwe bi temamî li ser rastiyan ava dike ku meriv dikare bi delîlên dîrokî û bi rêya şahidiyan wê piştrast bike. Dengbêj gelek bi hostatî, wan “êşîran” bi bîr tîne û şîna wan dike û herwiha ew bi serboriya wan re gelek biwefa û rastgo ye.

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo ez nemînin ji kê ra
 nizanim bigirîm ji halê kîjan eşîrê ra
 ez nemînim ji hêsîrê **Geliyê Zîla** ra
 le hela felek mala te mîrat biye kê ji te ra digo
 Hacê Huco Fêrîdê her sê xweyînga sax bihêl di binê cendeka da
 bira bimîne ji derdê dinyayê ra lawo
 ezê îro ji xelkê **Geliyê Zîla** ra bêjim hêsîrê, hêsîrê, hêsîrê
 lawo bi şevê royê ez hêsîrê tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer
 gula xorta û Efê delalî ez bixwe me felek hey wêl wêl

Di berdewamiya kilamê de vegêrê kilamê êdî nizane halê kîjan eşîrê re bigirî û şîna kê û kê bike. Gelo “li ber sêsid qîz û bûkê Geliyê Zîla” bikeve ku “kirin makîna şandin nav duwala” an li ber bi sedan kesên bêtawan bikeve ku hatin kuştin. Şîngirtin gelek zehmet e di vê rewşê de, lêbelê saxmayîna ji karesateke bi vî rengî tiştê herî xerab e. Gelo kê ji felekê re gotibû, Hacê Huco Fêrîdê û her sê xweyînga sax bihêl di bin cendeka da.¹⁶⁸ Ji Zîlanê saxmayîn jî ne xelasî ye, ew êdî ji derdê dinyayê re dimîne û dikeve şîneke dewamdar. Jixwe piştî qira li Zîlanê pêk tê ew gundên li wir, bi temamî ji bo ziyaretê tîr qedexekirin bo demeke dirêj û dewlet dest dide ser erdê wan deran. Ango, îmkân tune bûye ku xizm û eqrebayên qurbanîyan û xwecihên wê

¹⁶⁸ Li gorî gelek şahidiyên ji Zîlanê, di dema kuştinên bi komî de, tenê ew kes ji Zîlanê difilitin yê ku di bin cendekan de dimînin. Ji bo serboriyên bi vî rengî bin. Ulugana (2010: 141).

deverê, herin li ser merzelê -eger hebe- miriyên xwe. Lêbelê, kilamên dengbêjan ku mîna şîneke li ser miriyan e, mekanê bîrê ava kirine ku ewên guhdar bi rêya wan di xeyalê xwe de herin raboriyê, serdana xwîşk, bira, dê û bavê xwe bikin û wan bînin bîra xwe her cara ku kilamên li ser Zîlanê guhdarî dîkin. Bi awayekî, vegêrana kilaman, raboriyê tînin dema nika û li ser mekanekê dide avakirin, ew mekanê ku bi gelemperî ji cimaeta hazir ra ne cihekî dûr û derez e, ew nasyar e û bîranîna bavûkalên wan zindî dike. Lewra “bîra hevpar di mekan û wexteke diyar de teşe digire; lewma, ew têkiliya di navbera do û îroya mekanekî diyar de rave dike” (Wang, 2016: 2).

Bîra ku bi rêya kilaman li ser Geliyê Zîlanê ava bûye, ne bîreke takekesî ye ku tenê aidî dengbêj(an) be, ew xwe dispêre “çarçoveya civatî ya bîrê” (Halbwacsh, 2016). Li gorî Halbwacsh (ve)guherîn û pêkhatina bîra hevpar şert û mercên civatî re girêdayî ye, pêkhatin û parastina bîra takekesî re çarçoveya civatî lazim e (Assman, 2018: 44). Di nav vê çarçoveya civatî de diyar dibe bê ka çi dê were bibîrxistin an çi dê were jibîrkin. Lewma, eger vegêraneke gelek xurt li ser Zîlanê hebe, ev helwest û bîra hevpar a gel re vebestî ye, nabe ku meriv vê yekê li derveyî rehendê civatî bi cih bike. Li ser giringîdana civatî ya bi vê meseleyê aidîyet û nasnameyek jî tê hilberîn û “em bîr(anîn)ên her serdemeke jiyana xwe mihefeze dîkin û ew bi dewamdarî tînin (ve)hilberandin; bi rêya wan, wekî têkiliyeke berdewam, hesta nasnameya me tê dabînkirin (Halbwacsh, 1992: 47). Gelek bîranînên me bi navê mekan ve girêdayî tînin hafa hişê me û ji xwe nav jî roleke eslî dilîzin di avakirina bîr û nasnameyê de û ew me daxilî dinyaya dîrok û aidîyetê dîkin (bin. Çelik, 2017).

Bîra gel a serdema Zîlanê, di nav performansên dengbêjan de ji xwe re mekanekî difesilîne, nexşeya wê xêz dike û wê bi navê wê ve diyar û sabit dike. Ji ber ku “tu bîreke hevpar tune ku di nav çarçoveyeke mekanî de pêk nehatibe” (Halbwacsh, 2017: 153) û li gorî Halbwacsh bîr pêdivî bi seqamgirî û berdewamiya dorhêla xwe ya maddî heye û mekan rehendê dewamdariyê li bîrê zêde dike. Têkiliya bîrê ya bi mekan re jî destnîşan dike ku mekan pêkhateyeke çendî serekî ye ji bo bîra hevpar. Mekan dibe ew cih û war ku êdî bîra civatî lê diedile û hêwir datîne, bi vî rengî, mekan bi xwe êdî figurên bîr(anîn)ê mihefeze dike li hember jibîrbûnê. Çunku

“figurên bibîranînê, dixwazin di mekanekî diyar de bîn bergewdekirin” (Assman, 2018: 46).

Lewma meriv dikare bibêje ku bîr(anîn) li ser qira li Zîlanê, li ser wî geliyî hatiye bergewdekirin û di imkanên xwe yê peyvî ve navên wan, wekî bîrxistinên bihesibîne ku Nora bi çemka “mekanên bîrê” (*lieux de mémoire*) ve rave dike. Di navê cihan de, hemû serborî û qira li Zîlanê tê destnîşankirin û mihefezekirin, bi vî rengî, nav bi rêya vegêranên devkî dibin amrazêke sembolîk a ku mekanê bîrê ava dîkin; ger û geştê wan a daîmî di nav cemawerê de hesta seqamgîrî û dewamdariya di navbera raborî û siberojê de li ser bîra mekanî xurt dike. Bi vegêran û teşwîqa kesê dengbêj, bîr alîkariya hevdu dîkin û di nav civatê de belav dibin. Cografyanasê humanîst, Yi-Fu Tuan (1991) rola ziman a di avakirina mekan de bilind dinirxîne û ew destnîşan dike ku dîmen bi tena serê xwe nikare hemû hêza mekan nîşan bide, hemû derbirînên peyvî bi tevî ziman, peyv, xeberdan, çîrok, kilam û hwd. di prosesa (pêşgorî) avabûna mekan de rola xwe digêrin. Li gorî wî, çîrokbêjî -her kilam xwedî çîrokekê ye- objeyan ji derve bo hebûna rastîn vediguhêze. Zanîna derheq mekan de zanîneke rasterê ye û “peyv rehendekî demkî ji mekan re dabîn dîkin ku wêneyê dîtbar bi tena serê xwe nikare pêşkêş bike” (Tuan, 1991: 691). Kilam û çîrokan ku dengbêj neqil dîkin, wate û têgihiştina li hemberê mekanê qestkirî de diguherîne, li hin derên giring mekananên xwedî bîr saz dike.

Mûzexane, abîde, goristan, peyker, qad, kolan û hwd. giş dikarin bibin mekanê bîrê (bin. Till, 2003: 297). Mekanê ku şerekî yekalî lê qewimiye, bi hezaran kes lê hatiye kuştin û bûye “qesabxane” li vir bi wezîfeya goristanekê radibe ya ku kêlên wê xuya nakin, beramber vê, temsîla wan a vegêranî bi rêya navan jê re dibin “kêl”. Çawa ku kêl îşaretê bi kesê mirî dide, di qada berfireh ya ji bo jin û zaran bûye “qesabxane” bi navan ve tê îşaretkirin. Ji ber ku navê cihan dikarin gelek bîrxistinên zihnî û hestî binin bîra meriv -bîrxistinên dem û mekan, ên dîrok û qewaman, ên meriv û çalakiyên civatî, ên takekesî û merhaleyên di jiyana kesekî de. (Basso, 1996: 76) Bi rêya îşaret û referansên navê cihan yê wekî “Geliyê Zîla”, “Warê Salih Begê”, “Zozanê Sûtê”, “Kaniya Dîdarê”, “Delavê Hêrîşoyê”, “Kindûk”, “Milk” û hwd. bi carekê de gelek cih dikevin ber hizr û xeyala guhdar û civatê. Ev bibîranîna civatî ku ji nav folklorê kurdî tê der, helbet bîreke alternatîf e di heman wextê de û

mîna mekanên bîrê ên wekî mûzexane, peykerên bibîranînê ên li bajaran li ser gewdeyekî maddî bilind nabe û bi rêya merasîmên fermî şîna kesên li wir mirine, bi cemawerî nayê bibîrxistin, beramber wê, bîranîna “hêsîrên Geliyê Zîlan” bi rengê hevterîb di nav bîra civatî de dikeve tedawileke guherbar û dewamdar.

Kilam dikare li ser qewam û qirên raboriyê dengê xwe yê dijber bilind bike. Ev deng û vegêrana devkî, li pozîsyonekê werdigire û li beramber gotara dewletê ya fermî radibe ya ku dixwaze vê qirê bi gelek aliyan ve rewşa nîşan bide. Ev rastî di gotara serdest a wê dewrê de tê pêşxistin ku tê de kurd wekî ne-meriv tîna nîşandan û berterefkirina wan di dema Serhildana Agiriyê û Qirê Zîlanê de tê meşrûkirin. Têkildarî vê babetê, Özbilge di çend rojnameyên tirkî yên wê dewrê de perspektîfa dewletê ya derheq serhildan û qirê Zîlanê de nîşan dide. Özbilge destnîşan dike ku gotarên li ser vê qewamê hatine avakirin li ser xetê vederker û dîker avakirin ku tê de kesên li Zîlanê hatine/tîna qirêkirin wekî ne-meriv û heywan tîna resimandin û pêşkêşkirin (2020: 118-141). Di wê dewrê de micadeleya dewletê ya li hember kulî û kurdan di asta gotarî de dişibin hevdu, bi vî rengî, tê xwestin ku aliyên insanî yên qewimînê, êş û azara kuştî û birîndaran li ber çavan winda bibe û dengê wan kesan nayê bihîstin ku rasterast ew karesat tecrîbe kirine an jî bûne şahidê wê. Li vir, li hember vê bîdengkirin û bîmerivkirina gotara fermî ya dewletê dengbêj ku bi rengê rola rojnameyan jî digirin ser xwe, bîra vê raboriyê bi rêyeke din vediguhêze ku tê de kesên mexdûr bi deng û gotina xwe dibin aktorên serekî yên vegêranê û mekanê ku ew lê hatine qetilkirin bi nav û nîşana xwe ve dibe mekanê bîrê yê ku her cara navê wê bê hildan tê bibîranîn. Lewma, dengbêj bi vegêrana xwe ve li hember helwest û gotara ne-merivkirinê ya dewletê derdikeve û ev vegêrana hunerî çavkaniya xwe rasterast ji fikr û têgihiştina xelkê bi xwe hildide.

Bîranîna ku Geliyê Zîlanê bi tevî gundên xwe li ser “goristan” a kuştîyên li wir pêk tînin, bi guherîna navên wê herêmê ve ji nav bikaranîna rojane ya gel hêdî hêdî radibe û qismen be jî ji aliyê nîfşên nû ve navên guhertî tîna elimandin. Ev destnîşan dike ku navguhertin dikare çendî zêde xisarê bigihîne rê û rêkarên ku em qewamên raboriyê bi bîr tînin, ew dikare rêgiriyê jê re bike û bîra li ser “qir”ê di nav tedawila rojane de rabike û bi tevî wê jî hemû serhatî û çîrokên wê derê yên ku di kilamên dengbêjan de krîstalize bûne bi awayekî bide jibîrkirinê. Dema meriv ji vê hêlê ve lê

dinêre, tê dîtin ku dengbêjan di nav kilamê xwe de kurdiya bi sedan navên cihan bi tevî îşaret û referansên wan parastine û ew li hember venavandinan neterikandine. Çiqas ew navên li Geliyê Zîlan bên bibîrxistin, ew qas dê qal û qewama li wir rûdaye bê mihefezekirin û neqilkirin. Navê gund û deverên biçûk ên li Zîlanê çawa “mekanê bîrê” ava kiribin, bi guherîna navên gundên li wî geliyê jî ew qas xisarê digihîne wî mekanê ku bûye warê bîr û bîranîna kesên mirî. Di vê wateyê de, “mekanên bîrê” ji ber wateyên xwe yên pir-tebeqeyî pêrgî têkiliyên hêzê jî tê, ji ber ku ev mekan têkiliyên civatî û têkiliyên hêzê jî pêk tîne (Till, 2003: 291).

4.7. Navguhertin û rola dengbêj a berxwedêr

Di nav kilaman de, bi dehan nexşeyên devkî tên xêzkirin, her kilamek bi rêya navan dibe xwedî nexşeyeke taybet a ku bi serhatî û dîrokê ve hatiye dagirtin. Navên li ser van nexşeyên devkî, herçiqas li ser nexşeyên fermî nehatibin tomarkirin û rayedarên fermî yên dewletê pûte bi wan nedabin jî ji bo zimanê kurdî û kurdan nîrx û qîmeteke wan a mezin heye. Bêguman, dema ku navê cihan tên nivîsîn û li ser nexşeyên fermî tên îşaretkirin bi rêya nivîsê, ew êdî “di nav gotara fermî de tên nexşekirin” (Kearns & Berg, 2002: 287). Bi rêya gotarên fermî, nexşeyên ku tên çêkirin/xêzkirin, herçiqas mîna “teswîreke bêalî ya erdnîgariyê” xuya bikin jî, di cewher de, ew bi rengekî zêde bijêrî (*selectively*) erdê teswîr dikin (Johnson, 2007: 85). Ev hîlbijartinên alîgir ên li ser nexşeyan li milekî gotara desthilatê nîşan didin, li milekî din jî zanîna civatî ya kesên dereke dide veşartin. Li Tirkîyeyê navên kurdî di statuyeke fermî de nînin ku bikeve nav gotara fermî (*official discourse*) a dewletê. Bêyî ku bikevin bin siwan û rewabûna fermîbûnê, navên kurdî bi rêya vegêran û afirandinên kurdî yên devkî berbelav dibin û bi taybetî di kilaman de “hukmê şêr” dikin. Bi vî rengî, bi navan ve bi sedan *nexşeyên alternatîf* ên kurdî tên îşaretkirin û kodkirin ku li ser nexşeyên fermî xuya nakin. Lewra ew rastî destwerdanê tên û bi temamî nav û nîşana wan tê tunekirin. Ev nexşeyên alternatîf ên ku di nav zanîna civatî de tên parastin di heman demê de bîra hevpar a alternatîf jî kod dike bi tevî dîrok û çanda kurdî ya ku bi amrazên desthilatê ve tên manîpûlekirin.

Wekî kesekî di hewla dewamdar a di xêzkirina nexşeyên kurdî de, dengbêj, nav û nîşanên di kilaman de -nexşeyên devkî- li civatan digerîne û wan di bîra civatî de jî

xêz dike û dibe sebeb ku ew daîm zindî bimînin. Bi salan, dengbêjan di demekê de hunera xwe îcra dikirin ku li Tirkîyeyê rewşeke dîrokî û siyasî ya wisa hebû ku kurdî û perwerdehiya nivîskî kêr bû û dihat tepeserkirin (Yüksel, 2019b: 326). Di heman demê de, ji destpêka damezrandina Komara Tirkîyeyê ve, navên gundan hatibûn guhertin, bi dehan salan kurdî bi xwe û îcrakirinên bi kurdî hatibûn qedexekirin. Lewma, performansa dengbêj bi xwe dibû talûkeyek ji bo wî/wê û herwiha performansa wê dilqê berxwedanekê jî digirt. Helbet di dewrekê de ku bédengî li ser civata kurdî hukim dikir, bi dehan dengbêjan ji ber îcrakirina hunera xwe zehmetî kişandin û guhdarên dengbêjan jî ji ber kasêten li malên xwe tade dîtin. Bo nimûne, Dengbêj Reso ji ber kilamên xwe yên “siyasî” di wextên derbeyên leşkerî û rêveberiyên awarte de rastî gelek zehmetiyan tê, carcar tê desteserkerin, carcar jî ji bo ku neyê girtin bi mehan wekî qaçax li çolê dimîne (Ulugana, 2016: 43). Di vê derbarê de, Hamelink jî behsa wan zor û zehmetiyan dike ku çalakvanên çandî yên kurdî û gelek îcrakerên hunera dengbêjiyê bi xwe dîtine û herwiha ew cih dide hin serpêhatiyên wan û koça wan a ji welêt ber bi xeribiyê (bin. Hamelink, 2014). Dîsan, dengbêj û şairê mezin Mistefayê Xelê Heyran¹⁶⁹ jî ji ber ku kilamên siyasî derdixe hin derdorên siyasî ji wê rewşê aciz dibin (bin. Aras, 2007: 237).

Heta çend deh sal berê jî guhdar û hezkiriyên dengbêjan an jî bi giştî muzîka kurdî rastî gelek zehmetiyan dihatin. Li Agiriyê gelek kesên ku min pirsra meseleya “kasêtveşartin”ê ji wan kir, behsa zehmetî û talûkeya kasêten dengbêjan kirin (H.B. Delikaya, Hevpeyîna rûbirû, 3ê Cotmehê, 2020). Bi helwesteke li dijî vê tepeserkirin û tadekirinê, sîrkulasyoneke gelek berfireh a kilamên dengbêjiyê û pê re jî kasetên wan li Serhedê hebû, nisbet bi herêmen din ên kurdan, muzîka polîtîk a kurdî (bin. Saritaş, 2010) bi demeke dirêj hukimraniyeke bi qasê kilamên dengbêjan bi dest nexist. Ne ku meriv bêje ew muzîk li Serhedê nekete nav malan, lêbelê ji ber çanda dengbêjiyê ya xurt heta salên piştî 2000î jî kasêten dengbêjan li navenda bajar û navçeyan baş dihat firotin û dengê dengbêjan li gelek bajarên Serhedê bilind dibû. Îcar, dema ku meriv ji destpêka Komara Tirkîyeyê heta salên 1980an dide ber xwe,

¹⁶⁹ Mistefayê Xelê Heyran di heman demê de hostayê Dengbêj Reso, Dengbêj Hecî Sêvdînê Remedana, Dengbêj Mihemedê Canşah û gelek dengbêjên din yê navdar e. Ew hem dengbêj hem jî şair e. Peyva “şair” ji bo wan dengbêjan tê gotin ku bi xwe gelek kilaman derdixin.

bi maweyeke dirêj a bêdengî û kêmasiya muzîkê bi payeke mezin bi xêra dengbêjan dihate dagirtin.

Piştî van xalên serekî yên li ser erka giring a dengbêjiyê ya di parastina çand û zimanê kurdî de, meriv dikare helwesta dengbêjan binêre ya ku bi rêya performansa wan a daimî derdikeve holê. Çawa ku jorê jî hate ziman, dengbêj bi rêya performansa xwe gotarekê tînin ziman ku ji terefê gotara fermî ya dewletê ve tê/hatiye înkarkirin. Li vir înkara li ser zimanê kurdî, wekî perçeyekê zimanê kurdî, cihên navên kurdî jî rastî gelek qedexekirinan hatine. Helbet meseleya ziman, navê cihan û desthilatdariyê zaf bi hevdu re têkildar e (Herman, 2009: 124). Ji ber ku ziman nîşankerê nasnameya hevpar e û prosesên binavkirinê wekî pratîkên paqijkirina çandî tînin dîtin ên ku tê de cihên teze binavkirî û nexşekirî tê tesîskirin, pê re jî, çanda xwecihî tê paşguhkirin (Brealey, 1995). Lêbelê, herçiqas bi awayekî fermî hema hema navê temamiya cihên kurdnişîn hatibin binavkirin û li ser gelek nexşeyên fîzîkî û siyasî hatibin neqîşandin jî, di ferheng û repertuara dengbêj de navên kurdî her zindî mane. Tenê di repertûara Dengbêj Şakiro de ji hezar pêncsedî zêdetir nav hene ku nêzîkî temamiya wan, navên berê yên bi kurdî, ermenî û tirkî ne. Li hember navên guherandî, kasetên dengbêjan wekî “nexşeyên qedexekirî” diketin nav tedawilê û bîr û bîranînê civatê yên li ser navên kurdî (ên guhertî) teze dikirin; ew nav ji jîbîrbûnê diparastin. Bi gotina Yüksel (2019: 342) “navên ku bi rêya nerîta devkî dikevin tedawilê û tînin veguhastinê yên bi kurdî û ermenî, li hember dabeşkirina îdarî û îdeolojîk a ku jor ve tê sepandin, tesewira karteografîk nîşan dide ya ku bi awayekî civatî li rewacê ye.”

Navên ku “bîra vegêranî” (*narrative memory*) ya dengbêj de tînin sitirîn bi tevî serhatiyên ku li dor wan hatiye avakirin, di asta guhdar û cemawer de tevkeriyê li tesewira raboriyê û bîra mekanî dike. “Bîra vegêranî lê dixebite şûn û şopa yên dereke- bi taybetî mexdûrên dîrokê- biparêze, yên ku eger neyên bi bîr anîn wê di bêdaletiya (tu)nebûnê (*non-existence*) de bi bin kevin” (Kearney, 2002: 80). Bi vê berpirsiyariya xwe ve, navên kurdî ku ji teref desthilatê ve bo jîbîrbûnê hatine mehkûmkirin û bîra mekanî ya ku ew nav temsîliyeta dikin tê veguhastin, navên yên derekekirî bi tevî vegêranên li dor dîroka herêmî tînin ber rohnîyê. Bi vî teherî, di neqeba cemawer û navên cihan de têkiliyek tê avakirin. Bi saya serê bîra vegêranî ya

dengbêjan, raborî û bîra mekanî ya di vegêranên gelêrî de, bi berdewamî zindî dimîne û dihêle ku navê cihan bi form û binyada xwe ya resen/tabîî ve bîn mihefezekirin.

Navên kurdî ku derheq raboriyê de pêwendiyên civatî û nasnameyê xurt dikin û xwedan wê hêzê ne ku bîranînên bav û kalan bînin bîra cemawerê, di performansên dengbêjan de dilqekî xurt ê amrazî werdigirin ku pê li hember navên nû ên empozekirî, şûn û şopa çandî ya civata kurdî bi şêweyekî berxwedana hunerî tê parastin. Di xala ku pê bîra civatî û dîroka herêmî tê veguhastin, navên di kilamên dengbêjan de, bereksê navên tirkî, ji ber aliyên xwe yên hestî û pêwendîdariyê, bi wate û bîrxistinên cihêreng pêşkêş dike. Li vir mesele ne munasibnebûna navên tirkî ye ji bo çand û zimanê kurdî, ne jî zehmetiya telafûza wan e ji bo behra bêtir a kesên biemr ên kurd. Ji ber ku navên tirkî yên empozekirî bi rêya gotarên fermî ji bo qada giştî tên veguhastin, wate û bîranînên ku ew bi bîr dixin gelek cuda ye ji wan wate û bîranînan ku bi sedan salan di prosesa demê re hatine kemilîn û di nav rabûn û rûniştina (*life style*) kurdan de bûne xwedî nirx. Li vir meriv dişê bibêje ku mekanên bîrê yên bi rêya navan tên neqilkirin û otorîte/hêza wateyî ya ku ew pê tiştan tînin bîra cemawerê di navên kurdî de zêdetir in.

Bi taybetî, di sedsala borî de, piştî guherînên navan, bi sedan kilamên dengbêjan bi dewamdarî hatin afirandin û dengbêjan bi rengekî giştî navên tirkî tev li kilaman nekirin û bi biryardarî bi navên kurdî berdewam kirin ku di nav civatê de jî bi sedan sal bûn li kar bûn. Helbet vê yekê jî ew hesta nerazîbûnê ya li dijî navên tirkî bi rengekî ne rasterê xurt kiriye. Lewma, dengbêjan tenê nexşeyên bi navên qedexekirî ve dagirtî nebirin hafa hişê merivan, wan di heman demê de liyaqata temsîlkirinê ya mekanên bîrê û raboriya cemawerê jî bi dest ve anîn. Nexşeyên devkî îşaretê bi kurdan û zimanê wan dikin. Ev nexşe, destnîşan dikin ku sedsala raborî di nav civata kurdî de pirrengiya çandî û çanda pêkvejiyanê hebûye. Berevajî nexşeyên kontrolkirî û nivîsandî, nexşeyên devkî îşaretê bi nav û nîşanên zimanê ermenî jî dike ku êdî îro bi tevî kurdan najîn. Herwiha navên fermî di destê dewletê de ji bo qebûlkirina cihanbînî û nasnameya pêşbînîkirî dibûn amrazeke bikêrhatî; lewre dewletê li ser hesabê “sermiyana sembolîk” (Bourdieu, 1990; Alderman, 2008) pere xerc dikir, bi sedan nexşeyên cuda cuda derdixist, talelayên bi navên tirkî ve dagirtî amade dikir.

Dema ku meriv hêzeke ewqas berfireh û bipergal dide ber nexşeyên devkî û hêza bîra hevpar a ku bi van nexşeyan re tîr veguhastin, tê dîtin ku ji gelek aliyan ve ne-hevsengiyeye mezin a tîrkiliyên hêzê heye. Nirxên çandî û civatî yên ku navên “kevn” temsîl dikin, di çarçoveya projeya tîrkîkirina navan de diherifin û dibe sebeb ku cemawer bi aliyê çandî û siyasî ve bi temsîla fermî ya navên tîrkî re li hev neke û pê re pev biçe.

4.8. Welatê ku di kilaman de tê sêwirandin: “welatê me Serhed e”

Gelo war û welatê ku di nav kilamên dengbêjan de bi rêya nexşeyên cihêreng tê xêzkirin ku der e û bi çi navî tê xuyanê? Ev pirs, xwediyê bersiveke gelek rihet nîne ji ber ku di nava sedan nexşeyên şer, çandî, dilî û dînî de gelek tesewirên cihê cihê yên cografîk tîr pêşkêşkirin. Nabe ku bi fikr û ramanên îroyîn ve û bi gotareke neteweperest û anakronîk ve xêz û xeyala kartografîk ya di kilaman de bê nirxandin. Herçiqas zehmet e ku meriv nirx û cihê wan bi rihetî destnîşan bike jî, bi giştî hin xal derdikevin pêş ku di nav pergala xweser ya afirîneriya folklorîk de li ber çavan dikevin. Bi sedan kilamên ku tê de navê cih û waran derbas dibin, di nav xwe de nexşeyên biçûk ên herêmî xêz dikin û taybetmendiyên van nexşeyan dikare li gorî cureya kilamê biguhere. Çawa ku berê jî hatibû destnîşankirin di nav kilamên şer de, cihê qal û qewamê bi detay tê xêzkirin lê di nav kilamên dil de navê war, zozan û çiyayan derbas dibe ku derbaskirina demê lê xweş e. Di nava herdu kitabên de yên li ser *Dengbêj Reso* (2019a) *Dengbêj Şakiro* (2019b) bi temamî ji du hezarî zêdetir nav hene ku behra bêtir navên li herêma Serhedê ne. Di temamiya kilamên van herdu dengbêjan de yek ji wan navê ku herî zêde derbas dibe “Serhed” e. Ji ber vê yekê navê Serhedê wekî singekî li navenda nexşeya kilaman de kutayî xuya dike û hemû navên din li dor wê rêzkirî û belavkirî ne. Hingê, pêdivî pê heye ku peyva Serhedê bi xwe bê îzahkirin û çarçoveya wê ya cografîk bê nîşandan.

Dema ku peyva “welat” di nav kilaman de derbas dibe, ew bi herî zêde bi peyva “Serhed”ê re girêdayî tê gotin: *Welatê Serhedê*. Ev gotin gelek zêde di kilaman de cih digire û welatek li dor herêma Serhedê tê sêwirandin. Lewma meriv dikare bibêje ku nexşeya mezin a ku di kilaman de tê xêzkirin herî zêde li dor navê Serhedê tê xêzkirin. Lêbelê sînore vê herêmê ji ku dest pê dike û hera ku dewam dike gelo? Li

gorî Alakom, Serhed ew herêma berfireh e ku li ser wê sînorên Rûsyayê, Îranê û Dewleta Osmanî digihîjin hevdu. Kurdên vê deverê wekî kurdên Serhedê tên zanîn û ev herêm bajarên wekî Qers, Agirî, Wan û Mûşê hildide nav xwe (2009: 19). Aras sînorên Serhedê berfirehtir nîşan dide û amaje bi wê yekê dike ku beşeke Sêrt û Batmanê jî li ser Serhedê tê hesibandin û ji aliyê çandî ve Colemêrg ne Serhed e, ne jî welatê jêr e, ew parçeyekî hêla Behdînan e (2007: 231). Ev herêma berfireh a ku li ser wergiriya wê lihevkirineke giştî tune ye, bi sed salan bûye herêmeke pêkvejiyana gelek pêkhatayên wekî kurd, tirk, ermenî û gelek baweriyên cuda ên wekî misilmanî, xiristiyanî û ezdîtî û hwd. Ji ber pêgeha xwe ya jeopolîtîk, ji berê de bûye navenda şer û pevçûnên di navbera dewletên cînar de. Lewma gelek caran li Serhedê bi qefîle û komên mezin meriv koçber bûne ber bi hundirê Anadolîyê û deverên din ên kurdnişîn.

Di nav kilaman de herêmên din ên kurdnişîn, bi eşkereyî ji aliyê binavkirinê ve wekî kategoriyeke cuda xuya dibe û li derveyî herêma Serhedê dimîne. Gelek kilaman de herêma kurdnişîn ya berriyê wekî “welatê jêrê” derbas dibe. Herwiha, ne tenê di kilaman de, li Serhedê jî xelk herêma Mêrdîn, Riha, Diyarbekirê û dorhêla wê ya berfireh wekî “welatî jêrîn” bi nav dike û ji welatê xwe Serhedê cuda dike (Aras, 2010: 26).¹⁷⁰ Welatê Serhedê, gelek caran di kilaman de wekî “welatê me Serhedê” û “welatê me Serhed e”¹⁷¹ tê dîtin û aidîyet û xwedîlêderketinek jî pê re derdikeve.

¹⁷⁰ Heta carcar, dengbêj bi kurmanciya beriyê jî bi welatê jêrê re têkildar dike û wê wekî “berjêrî” bi nav dike û welatê xwe jî wekî Serhed destnîşan dike. Bo nimûne, di kilama “Ferzende û Xalis Beg”ê (Güneş & Şahin, 2019b:43) de wiha derbas dibe:

emê ji xwe ra bi kurmancî bibêjin dayê gelo bi *berjêrî* bibêjin yadê
tu dêhna xwe bidê vê sibengê bihara welatê me Serhedê hatiye
Xwedê xira bike esker li qolınca Kekê Elfesya vê sibengê siwar bûye

¹⁷¹ Di nav kilaman de peyva “welat” behra bêtir ji bo duwal (dewlet) û herêmên mezin tê bikaranîn lê hin caran jî ji bo bajaran jî tê bikaranîn. Herwiha peyvên wekî “duwal” jî bo dewletan û welatên xerîb, peyva “dîhar” di bergindê der, dever de tê bikaranîn û hin caran tê pêşiya navê gund û navçeyan wekî “dîharê Xanzilê”, “dîharê Panosê” û hwd.

“Welatê jêrîn” di gelek kilaman de tê dîtin. Ev welat, ne welatê xeribiyê an jî sirgûnê ye.¹⁷² Ew parçeyê ji cografyaya kurdan, herçiqas ferq û cudahiyên xwe yên nerît, rabûn-rûniştin, jiyana civatî û aborî hebin jî. Di kilama li ser mihaciriyê de ya bi navê Heyla Lê Gulê de herêma Sêweregê wekî “welatê jêrîn” tê binavkirin. Ev welat bi temamî ne xerîbî be jî, ji welatê Serhedê cudatir e û gelek ferqên xwe yên cografîk û civatî heye. Rast e, nexşeyên ku tên pêşkêşkirin ên di kilaman de xwediyê hin taybetmendiyên lokalbûnê ne lê cografyaya kurdî ji aliyê parvekirin/dabeşbûnê ve di nexşeyên hişî yên kilaman de şêklê kartografiyê mezintir jî dikare pêşkêş dike; “welatê Serhedê”, “welatê jêrê”.¹⁷³

Tesewira ku ji vegêranên devkî yên wekî kilaman de derdive meydanê ew e ku (kilamên) kurdên li Serhedê kategoriyeke cuda diafirîne di nava erdnîgariya kurdî de û xwe ji welatê jêrê qismen cuda dike. Digel ku zaravayê kurmancên Serhedê û bi giştî baweriya wan a dînî bi kurmancên li “welatê jêrê” re eynî ye jî, di têgihiştina li ser welat a di nav kilaman de, aidiyeteke xurt a bi Serhedê re xuya dike. Bi giştî, meriv dikare bibêje ku herêma Serhedê bi hewzeyê çandî û civatî re aidiyetek ava kiriye. Mefhûma welat ya vê hewzeya herêmî ya vegêranên devkî ji aliyê naveroka xwe ya kartografîk û toponîmîk ve bi xwe re hin hevparî û hevgiriyan jî derdixe holê. Herçiqas li vir em nimûneyên takî ji dengên subjektîf yên kilamên dengbêjan pêşkêş bikin jî hewzeya berfireh a ku ev kilam jê dizên hin taybetmendiyên hevpar nîşan didin. Folklorasê Swêdî Ulf Palmanfelt diyar dike ku çawa nerîta çîrokbêjiya hevpar û repertuarên subjektîf têkildarî hevdu ne û tesîrê li hevdu dikin. Lewma têkiliya di navbera çîrokbêjiya hevpar û ya şexsî de divê wekî li dû daîreyekê (hewz) bê dîtin ku jê hin element tên deynkirin, lihevanîn û ji nû ve tev dibin (Vgz. Cocq, 2008: 22) Dîsa lec û avêtina ber hevdu ya dengbêjan di çarçoveyê vegêrana hevpar de ye û di heman demê de ev lec dibin wesîleya danûstandinên gelek qalibên vegêranî yên dengbêjiyê. Di encama gelek danûstandin û tesîrkirina hevdu de

¹⁷² Digel van kategoriye navbirî, kategoriyeke din jî heye ku welatê jorîn ji bo welatên xerîb wek bajarên mezin yên mîna Stenbol, Îzmîr û Enqerê tê bikaranîn (Alakom, 2006: 38).

¹⁷³ “Welatê jorîn” li Riha, Diyarbekir û wê derdorê ji bo Serhedê tê bikaranîn, lê heman peyv li hin deverên Serhedê di bergindê welatê xerîbîyê de tê emilandin. Li vir hevgiriyeke têgihiştina ji welat di nav van herdu herêmên ji hev cuda de xuya nake.

dengbêj ji hev kilam û çîrokan hildidin û bi vî rengî carna “hewzên kilaman” çêdibin li derdora herêma ku ew danûstandin tê de zêde çêdibin. Herwisa pêkan e ku hin nexşeyên hevpar û sêwirandina kartografîk jî di nav wan hewzên kilaman de bîn dîtin ku meriv dikare Serhedê jî wisa bifikire. Di vê kilama jêrîn Dengbêj Şakiro de (2019b: 128) têgihîştina “welat” dibînin:

Lê lê muhubê hela tu sêr bike gelo
vê sibengê welatê me Serhed e

Di kilameke din ya bi navê “Ez gunê me” (2019b: 150) navê çend çiya û zozanan tîrên rîzkirin û tê destnîşankirin ku berfa welatê xelkê giş heliyayê lê berfa welatê Serhedê cî da maye:

taxima sing û berê mi fena belekiya berfa **Çiyayê Bîngolê**
spî bike gelo li serê çilan û çiyayê
bêbexto gilî gazin û loma ji mi neke
bihara welatê me hatî berfa welatê xelkê tev heliyayê
taxima sing û berê mi fenanî belekya berfa li **Çûlyê**, li **Maçûlyê**
li **Axûryê**, li **Sînê** bi **Sînegê**, **Qazgol** û **Bîngol**, **Şûşar** û **Tekman**
li **welatê me Serhedê** li etegê **Bîngolê** cî da mayê

Di kilamê de, taybetmendiya cografyaya çiyayî ya Serhedê diyar dibe û avûhewayaya wê ya sar balê dikêşe. Xuya ye ku çêbûna têgihîştina welatê Serhedê de, xweza û avûhewayaya li wir tesîra xwe heye. Di kilameke din a karwanîyê de, karwanek ji gundê Boçikmasûriyê,¹⁷⁴ diçe welatê jêrê li nêzîkî gundê Gola Gulê¹⁷⁵ re derbas dibe. Li wir şivan û gavanên gund hawarî û gaziye dibin ser êla Metîniya ya li Gola Gulê û ji wan re dibêjin dijminê we derbas dibe. Di qewimînê de, gelek kes ji ber fêmkirineke bi xeletî ji nav xelkê Boçikmasûriyê tîrên kuştin. Îcar di kilamê de karwanî salixên xwe û welatê xwe wiha didin:

de lo lo libo lo

¹⁷⁴ Gundekê li nêzîkî Qereklîsê dimîne.

¹⁷⁵ "Gola Gulê" (bi tirkî *Arısu*) gundekî girêdayî navçeya Şemrexa girêdayî Mêrdînê ye. Gundî ji eşîra Metînan e.

lo lo birano îro bi bextê we da me ez rebenê Xwedê
 li dîharê **Gola Gulê** diketim dilê mi rebena Xwedê gidîno bi bax û rez e
 şivan û gavanê **Gola Gulê** xêrê wayê nebîne gazî dane êla Metîniya keko
 rabe sêr bike li siwar û peyayê Metîniya
 girtine bi ortê gawir modoliya
 kişyan bi ser me karwanê xerîb da hatin bi xar û lez e
 Besê bi sê denga bang fikir gelî Metîniya lawo neyê gazî derew e
 em karwan in, xerîb in hey mala we mîrat bûyo wey lo
 li meydanê kuştine Elî û Mihemed, Hesen û Husên birayê mi rebenê
 êla bavê mi êlekî giran e meqelînin
 nehêlin li hêviya lawê apê minê Çerkez e
 gidîno ne em karwan e
 lo gelî Metîniya lawo wele em ne gawir in em busulman in
 îro hewar di rêya Xwedê da
 em ne xelkê **welatê Serhedê** xelkê **Boçikmasûriyê**
 em xelkê welatê **Qereçoliyan** in lawo
 ax libo lo libo lo (2019a: 220-221).

Di kilamê de karwaniyên ji Qerekilîsê salixên xwe û welatê xwe didin da ku
 bidin zanîn ku ew ne dijmin in. Lewma di kilamê de, ew destnîşan dikin ku ew jî
 mîna wan “misilman” in. Misilmanî mîna hevpariyeke mezin ji bo destnîşankirina
 biratî û nasiya di nav kurdan de tê ziman. Paşê karwanî dibêjin ku ew xelkê welatê
 Serhedê ne û ji eşîra Qereçoliyan in. Ev kilam di heman demê de hêmayên giring ên
 jiyana rojane ya sedsal berê jî diyar dike: “dîn” û “eşîrbûn”. Ne tenê li vir, bi
 gelemperî eşîrbûn bi wateya esilbûn û kurdbûnê tê emilandin. “Welatê Serhedê” jî di
 kilamê de ji bo kurdên “welatê jêrîn”, ne welatekî xerîb û cuda ye. Cexta li ser welatê
 Serhedê ji ber vê fikrê derdikeve meydanê. Rast e ku di asteke bilind ya wergiriya
 kartografîk de Serhed ji bo serhediyên wekî hewzeyeye taybet tê dîtin lê ev nikare
 rêgiriya ji biratiya bi kurmancên “welatê jêrîn” re bike. Bi têkiliyên civatî, bi zimanê
 hevpar û dîroka hevpar kurdên Serhedê jî di wê ferqê de ne ku herçiqas kurdên
 welatê jêrê ji wan dûr in jî ew jî “misilman” in û bi “eşîr” in.¹⁷⁶ Herçiqas welatê

¹⁷⁶ Hin kilam ji sînorê nexşeya xwe xeyalî ya lokal derbas dikin. Di kilama “Dosto” (bin. Pêvek B)
 de, ewil navên herêmeke dorteng rêz dibin û pey re nexşe bi cih û warên ziyaret û navendên dînî ve

Serhedê mîna kartografiyeke mezin ya taybetmendiyên xweser nîşan bide jî, ev yek cudatîyê naxe nav têkiliyên civatî yên kurdên herdu deveran.

Hêleke din a navên di kilaman de jî cih û warê sirgûnê an jî firariyê ne ku bi gelemperî herêmên li ser sînor in. Gelek kilaman de navê Binxetê derbas dibe.¹⁷⁷ Ev xet, wekî sînorekî sunî yekparebûna xaka kurdan xirab dike ya ku bi gelek têkiliyên xizmatî, civatî û dîrokî ve bi sedsalan bû ji hev cihê nebibû. Ev xeta ku kurdên heman eşîr, malbat û bajarî ji hev qetandine, lewma ji mehkûm û firariyên dewletê re dibe xetê rizgariyê ya ku destê dewleta Tirkîyeyê nagihîjê. Lewma, ev der sînorekî nû ye. Digel nûbûna xwe ji ber ku gelek kilam li ser qaçax û firariyan e, wekî parçeyekî serhatî û rêya wan, ev der gelek caran dikeve nav kilaman:

Toxtorê **Erziromê** lingê Bavê Mamê xwar girêda
heyfa mi nayê li afata **çiyayê Mûşê** tofana di **Avareş** da
raporta Bavê Mamê mi girtin di saet yekê şevê da
şandin **Qerekosê**¹⁷⁸ di firqê da
kes tune ciwabekî bide **Binê Xetê**
ji berxê mala Êsivê Seydo ji bavê Sulhedîn ra
Evdilhemîd şêrê bigulî mala te mîrat biyo
xwe bigihîne pêşiyê di wextê da
çiqas xerab be lawê apê te ji te ra pişmêrê rojê di oxilmê giran
le Bavê Mamê dîsa di pişt te da
li meydanê mînanî gamêşekî boxê hêş bibe di herbê da

Binê Xetê, çawa ku ji nimûneya jor jî diyar dibe, carcar dibe ew cih ku daxwaza gazî û hewariyê jê tê, carcar jî dibe cihê xelasiya ji destê dewletê. Herwiha ev cih

berfîreh dibe. Di kilamê de behsa navendên dînî yên ziyaretan tê kirin ku li bajarên wekî “Bilîs”, “Sêrt”, “Xarpêt”, “Diyarbakir”, “Erzirom”, “Hekarî”, “Muş”, “Qerekilîs” dimînin. Li vir tesîra bawerîya îslamê jî derdikeve meydanê ku ji bo kurdan gelek mihim e. Dema behsa navendên dînî dibe nexşeya herêma kurdan fireh dibe û welatê jêrê û welatê jorê digire nav xwe. Wisa diyar e ku çêkirina nasname û aidiyeta kurdan de rola dîn gelek xurt e.

¹⁷⁷ Navê binxetê carcar wekî “Xeta Frensîz”, “binya Xetê”, “binê Xetê” derbas dibe

¹⁷⁸ Navekî Agiriyê ye. Dewlet navê Qereklîsê wekî Qerekose diguherîne. Temenê wê zêde dirêj nebe jî ev nav heta radeyekê hatiye qebûlkirin û carcar di hin kilamên li ser şer û pevçûnên dewra ewil ê Komara Tirkîyeyê de xuya dike.

îşaretê bi dewra piştî Komara Tirkîyeyê dike ku li wir Sûriye û Tirkîye dibin sînordar. Di xebata xwe ya etnografîk ya li ser vê sînorê de Ramazan Aras (2020: 129) destnîşan dike ku li gorî vegêranên ermenîyan, piştî sala 1915an hêla Sûriyeyê ji bo gelek kesên ermenî dibe cih û warê starê. Herwiha li gorî wî kurdên mixalîf ên polîtîk ku rewşenbîr, mela û şêx bûne, reviyane aliyê Sûriyeyê di dewra rejîma tek-partiyê de, di navbera salên 1923 û 1950yan de (Aras, 2020: 129). Firarî, di destpêka Komara Tirkîyeyê de roleke giring gêrane di demekê de ku serhildanên kurdan çêdibûn û di encamê de gelek merivan qesta reva ji Tirkîyeyê dikir (Hamelink, 2014: 139). Bi taybetî di kilamên serhildanê yên li ser Seyîdan û Berazan de ku seranserê Serhedê li ser gel tesîreke gelek mezin çêkirine, rola ku binxet radigire gelek giring e. Xêncî kilamên li ser seyîdan û berazan, gelek kilamên serhildanê yên din jî hene ku tê de qehremanê serekî bi saya serê vê xetê ji destê Tirkîyeyê difilite. Hejmara kilamên li ser firariyan ne hindik in. Kilameke din ya bi navê “Bavê Fexo” ya Dengbêj Şakiro de (2019b: 135) navê bajarên kurdan ên li binxetê jî tê rêzîkirin û tesewira yekpare ya xaka kurdan ji aliyê têkiliyên civatî û dîrokî ve tê ber çavan:

Mi dî tîpê siwarî eşîrê vê sibengê ji **Binê Xetê** derketin
 Li **Xeta Frensiz**, **Amûda şewitî**, **newala Qamîşlokê**, **Hemîd golê biniya Xetê**,
 Li **Bolinda** Hecî Mihemed
 Minê vê sibengê Bavê Fexo Torînê Mala Yeho Kekê Ezo Siwarî Gêjo
 Nava hezar û pênsid siwarê ax Reşkotî da reben ez im
 Li ecibandî la li mi delîlê

Di kilama jorê de, sînorê di navbera Tirkîye û Sûriyeyê de wekî *Xeta Frensiz* û *Binê Xetê* derbas dibe. Pey re navên wan bajarên tîrêzîkirin ku niştecihên wan kurd in ên wekî Amûd, Qamîşlok, Hemîd golê. Gelek kilamên din de, navê bajarên kurdnişîn ên li binê Xetê bi rêya firarî û qaçaxan dikevin nav kilaman. Têkiliyên civatî yên di kilaman de nîşan dide ku xeta ku bi rêya sînorên netewedewlatên nû hatiye kişandin, tîkiliyên civata kurdî ya wê dewrê ji hevdu qut nekiriye. Gelek caran navê Xetê derbas dibe di dewsa navê Sûriyeyê de. Herçiqas netewedewletan (Tirkîye-Sûriye) xetek kişandibin di navbera xaka kurdan de û êdî du dewletên ji hevdu cihê ava bibin jî, *binxet* di tîgihîştina kurdên *jora xetê* de ne cihekî dûr an jî

dewleteke cuda ye ku êdî bi navê Sûriyeyê tê zanîn. Awayê ku sînorên dewletan di nav kilaman de berçav dibin, nîşan dibe bê ka kurd çawa cografyaya polîtîk a wan dewletên ku ew lê dijîn biyanî/xerîb têdigihîjin û wan wekî par û parçeyeke rastiya civata kurdî nabînin (Hamelink, 2014: 137).

Nexşeyên ku ji derbirîn û serboriyên gel(êrî) tê dizên carcar li ser hevdu siwar dibin, carcar ji hev dûr dikevin. Zîqbûn an jî gurbûna navên cihan di hin nexşeyan de bi taybetî li hin nuqteyan zêde dibin, bi taybetî ew nuqteyên ku têkiliyên civatî û dîrokî lê xurt in û wekî navend û bihurên jiyana rojane ne ji bo kurdan. Hemû nexşeyên navan, bi heman erk û taybetmendiye nagerin, hin ji wan ji ber ku di encama dubendiyên bi pergalên mezin ên polîtîk re derdikevin holê, şûn û şopa rê û reva firarî û qaçaxan dişopîne ku bi gelemperî -eger pêk bê- ber bi sînoran diçe. Ev nexşe, berfirehtir dibin û rastî asteng û rêgiriya sînorên netewedewletên nû dibin: Îran, Sûriye, Tîrkiye. Herwiha, piştî ku firar û qaçax tîn desteserkirin, wekî cihê sirgûnê gelek hepisxane û “taşxane”yên ji welat dûr, di nav kilaman de dibin referansên pergala polîtîk û hêza radest a dewletê. Yüksel destnîşan dike ku “Anadolî”, wekî cihekî cografîk ku zêde tê qalkirin, dibe ew cihê ku kesek lê tê sirgûnkirin (2011: 105). Ji bilî vê, navê Kurdistanê nisbet bi navên cih û bajarên din kêr derbas dibe. Lewre ew zêdetir îşaretê bi welatê xwe yê Serhedê didin ne ku bi Kurdistanê. Di xebata xwe de, Hamelink (2014: 132-133) destnîşan dike ku di performansên xwe de dengbêj nexşeyeke herêma kurdî xêz dikin û ev nexşe xwedî taybetmendiyeke lokal e û referansê nade wan dewlet û sîstemên polîtîk ku ew pê re girêdayî ne:

Bi rêya, bi berdewamî behskirina navê cihan û îşaretên fîzîkî li dîmenekê di dema performansê de, dengbêj nexşeya herêma kurdî xêz dike. Ev nexşekirin, dibe ku ji bo guhdarên berê wekî noqtaya referansê kar kiribe, wekî ku kilam dikare kesekî bi wêneyê mezintir yê dorhêla wî/wê ya jiyane bide warqilîn. Ev de heman demê de nîşan dide ku dorhêla herêmî di nav rastiya xwe de tê hesîn, bêtî ku referansên rasterast bide dewlet û sîstemên polîtîk ên mezintir ku pê re girêdayî ye.

Bêtî ku meriv kuliya teke mezin a vegêranên folklorîk vebikole, zehmet e ku meriv tîgîhiştin û sêwirandina Kurdistanê û li ser çawaniya wê nirxanînên pêbawer bike. Lewra çawa ku di nimûneyên kilaman ên ji herdu antolojiyan de jî hate

fêmkirin, herêma Serhedê bi rêya çûn-hatinên karwanî, koçberiya bi tevî pêz a demsalî û hwd. têkiliyên xweş bi kurdên dorhêla xwe re çêkiribin jî, di sêwirandina fêhma “welat” de li dor Serhedê hewzeke parastî ava dikin. Herçend ev hewze ji kurdên cînar re ne girtî be jî, bi temamî ji aliyê fêhma welat ve heman formê jî nagire ku bi wan re yek be û bişibe wan. Meriv vê yekê dikare di nav xwenasandineke ne hişk a li ser hin nîşanên nasnameyî yên terîtoryal de binirxîne. Ji ber ku ji aliyê bingehê ve eger meriv ferqên devokî bide aliyekî, nasnameya etno-dînî ya kurmancên li Serhedê û kurmancên li “Welatê Jêrîn” (Riha, Diyarbekir, Mêrdîn û hwd.) ji hev cuda nabe. Ev yek, rê li ber civata li Serhedê xweş dike ku xwe ji têgihîştineke derekekirina dorhêla xwe nisbeten xelas bike.¹⁷⁹ Têgeha Kurdistanê, qesta jê û wergiriya wê di nav vegotinên gelêrî de zelal nebe jî, bi taybetî di destanan de derbas dibe. Bo nimûne, di varyanteke destana Dimdimê de ya ku ji aliyê Albert Socin ve li Botanê di sala 1890an de hatiye berhevkirin, gotareke neteweyî xuya dike û vegêr têgiha Kurdistanê jî bi kar tîne (Vgz. Atlı, 2020: 197):

Bela bû mabînî welatê **Kurdistanê**
 Zêra bidin ji ber haqane
 Da bo me çêkin du sûlixane
 Pala bo me bînin ji welatê ra û naqa
 Zêra bidin ji ber heqa

Ev yek nîşan dide ku vegotinên gelêrî yên kurdî bi taybetî jî destanên kurdî ku rihekî zêdetir neteweyî dihewînin, ne durrî peyva “Kurdistan”ê ne. Di nimûneyeke din ya li devera Serhedê jî, ev peyv dîsa di versînoneke Kela Dimdimê de wiha derbas dibe:

Tacê te ser serê te be,

¹⁷⁹ “Welatê cêrî” (Welatê Jêrê) wekî kategoriyeke di kilamên bi kirmancî yên Dersimê de jî xuya dike. Herwiha meriv dikare têgihîştineke nispeten lokal a “welat” di nav kilamên kirmancan de jî bibîne. Bo nimûne, li gorî Atlı (2020: 89) “Tesewira [Sey Qajî] ya welat bi tevahî bi herêma Dêrsimê û sînorên wê yên derveyî wekî Erzîngan, Meletî û Xarpêtê bi sînor e. (...) em têdigihîjin ku ew qismî be jî Erzîngan, Meletî û Xarpêtê jî di nava vê *hawzaya çandî-dînî* de dibîne.” Ev têgihîştina welat a ku ji aliyê baweriyê ve şikil digire, bi heman rengî dişibe wê welatê ku di nav kilamên kurmançî de bi navê Serhedê ve derdikeve pêş.

Gû nav mesebê te be,
Kuştina mêra wê hebe,
Kurdistan bê nav nabe (Celîl, 2011: 144)

Çawa ku ji nimûneyên ji destanan jî tê dîtin, bikaranîna peyva Kurdistanê di nav vegêranên gelêrî yên kurdî de heye, herçiqas di kilaman de ev hejmar kêr be jî. Eger em vegerin behsa navê Kurdistanê di nav kilaman de, em dikarin bibêjin ku nisbet bi sedan navên din ev nav di nav kilamên Dengbêj Şakiro de gelek kêr e. Di nav nêzîkî 1500 navî de, navê Kurdistanê tenê li çend deran derbas dibe. Bo nimûne, di kilama bi navê “Keremê Kolaxasî” de (101-102) peyva Kurdistanê wiha derbas dibe:

Lo axao axao ...
Sibe ye ezê li dîharê textê **Qereyaziyê, Qizqaniyê**
Diketim dilê min û te ra
Vê sibengê tu dêhna xwe bidê hewara me Xwedê
Îro ji êvara Xwedê da herkesî ji kêfê ra agir dadanî
Hela bala xwe bidê vê sibengê siwar û peyayê Zirika siwar bûne
Mala axê maleke bi tenê ne
Tu dêhna xwe bidê Keremê Kolaxasî, Evdal
Li derê **Birca Belek** senîne
Herkesî di tanga xwe da hicûm danî
Ez çî bikim felek xayîn e vê sibengê malxirabo
Berxê mala Kolaxasî Evdalê Mistê ra nadomîne
Tu dêhna xwe bidê **Hukûmeta Turkiyayê**
Temamî vê sibengê li qolincê siwar bûye
Hukûmeta Turkiyayê tevî eşîra **Kurdistanê**
Ez çî bikim felek xayîn e vê sibengê malxirabo
Keremê Kolaxasî, Evdalê bira
Berê xwe dane Mala Silêmanê Ehmed ba Ferzende
Got tu were vê sibengê îro şûnda nava **Turkiyayê** îdara me nabe
Emê ji xwe ra vê sibengê berê xwe bidin şewitiya vê **Îranê**
(2019b: 101-102)

Ev kilama jorê ku behsa serhildana Keremê Kolaxasî tê kirin ku tê de helwesteke li dijî Hikûmeta Tirkîyeyê xuya dibe. Keremê Kolaxasî ku yek ji endamê Tevgera

Azadî ye, piştî ku serhildan têk diçe berê xwe dide Îranê da ku bi tevî hevrêyên xwe, li ser sînor şerek bi leşkerên Îranê re derdikeve û di encamê de ew li wir tê kuştin. Di kilamê de peyva Kurdistanê bi tevî Hikûmeta Tirkiyeyê tê xuyanê, lê ev ne di nav gotareke dijber de ye, beramber vê, ew zêdetir îşaretê bi wan eşîrên li Kurdistanê dike ku li qolincê Keremê Kolaxasî siwar bûne û alîkarî bi hêzên dewletê re kirine. Ji bilî vê kilama şer ya serhildanê di çend kilamên din de jî ev peyv derbas dibe û diqewime ku peyva Kurdistanê paşê ji aliyê Dengbêj Şakiro ve lê hatibe zêdekirin:

lawko gidî mi ji te ra nego terka mi delalê dikirî
 diçû welatê me Serhedê li qîzê ji qîzê Kurdistanê
 fena bergîrek bergîrê palan rizî (2019b: 334)

Ezê rabim destê kubara şêrîn bigrim
 Qasekî vê sibengê di dêrisê gunda da birevînim
 Bavê ber bextê axa û axalê Kurdistanê
 Eger biye ji xwe ra biye, gava ku nebiye
 Ezê ji xwe ra bavê ber bextê keşîş ji dêra Fila
 (219b: 372)

Çawa ku ji nimûneyên jor jî diyar e, peyva Kurdistanê¹⁸⁰ di herdu nimûneyan de jî bi formeke nêzikî hev de hatine bikaranîn. Herwiha ev kilam di heman wextê de ji aliyê Dengbêj Reso ve jî hatiye gotin ku tê de meriv peyva Kurdistanê nabîne. Çawa ku tê zanîn Dengbêj Şakiro şagirt û peyrevê Dengbêj Reso ye. Lê guhertoya heman kilamê de ya ku Reso dibêje bê peyva Kurdistanê ye (2019a: 119). Dibe ku rewşa siyasî ya salên 70-80an, ku nifşeke nispeten polîtîk derdiket sahneyê, li ser dengbêjan tesîr kiribe. Bi giştî, di nav vegêranên gelêrî de welatê ku hukmê wê zêde ye “welatê Serhedê” ye, ne ku Kurdistan bi xwe. Çawa ku Hamelink jî di xebata xwe de destnîşan dike navenda dîmena xeyalî ya kilaman li dor serpêhatiya sosyopolîtîk ya

¹⁸⁰ Tesewira cografîk a di kilaman girêdana xurt a di navbera kurdan û erdê wan de nîşan dide. Dibe ku ev peyv kêr derbas bibe, lê kurd bi erd û welatê re baş girêdayî ne. “Her civat xwedî nêrîna xwe ya cografîk e û ev yek ji bergeha xwe ve, bo fêmkirina dinyayê bingeîn e” dibêje O’Shea û wiha pê de diçe: “Kurd hem bi cihê xwe yê jidayîkbûnê rastîn ve hem jî gelemperî bi têgeha Kurdistanê re bi rengekî qayîm vebestî ne” (2004: 132-133).

kurdî ava bûye, navendên Împeratoriya Osmanî û Tirkîyeyê di kilaman de wekî cihên mihim xuya nakin û herwiha ev erdnîgariya kurdî wekî hebûneke sosyo-polîtîk şeklê Kurdistaneke mezintir jî nagirin ku wê bi vî rengî bi rastiya guhdaran re jî li hev neyê (Hamelink, 2014: 132-133).

Bi giştî li vê beşê me dil kir ku em bînin giringiya navên kurdî û rola wan di nav zanîna civakî de diyar bikin. Çawa ku tê zanîn, dengbêj û vegêranên wan li ser nerîta hevpar a kurdî û li ser civakê bi xwe tesîr dikin, beramber vê, ew di bin tesîra gelek qewimînên civakî û siyasî de dimînin. Ev rewşa hevkartêkeriyê di gelek cihetan de rê dide ku meriv li ser vegêranên dengbêjan re fikr û nerînên hevpar ên civakê jî bi dest bixe ku derheq erd, nav û navandinê de derdikevin holê. Ji vê berdiyê eger meriv lê binêre helwesta civatê ya li ser navan (bin. Beşa 3an) û pozîsyona dengbêjan a ku bi afrînerî ber xwe dide ku bîra li dor navan ava bûyî veguhêze hevterîb xuya dikin. Bi taybetî gelek qewamên giring ên ku tesîr li civatê kirine di nav vegêranên dengbêjan de cih digirin ên ku pirî caran bi tercîhên dînamîk û hişmend ve tînin afirandin. Lewra dema ku dengbêj hez dike bîrekê neql bike, ew xwedî tercîheke hişmend e û helwesta xwe bi zanebûn nîşan dide

Kilam û rêzkirina navê di hundirê kilaman de, bi taybetî kilamên şer de, nexşeyên lokal ên Serhedê ji bo her kilamekê ji nû ve tê xêzkirin, bi ser hevdu, bi vî rengî gelek nexşeyên cuda cuda ên qewamên ji dewrên cuda li ser hevdu siwar dibin. Herwiha di danûstandinên di navbera guhdar û dengbêj de, zanîn û nasîna etno-cografîk a kurdî jî pê re hem belav dibe hem jî dewamdariya xwe ya dîrokî diparêze. Lewma kilam digel gelek hêlên xwe yê mayîn, embara navê cih û şexsan in û ev embar ji qewam û serhatiyên civatî-çandî dadiwerive. Di vê hevtevnê de, meriv dikare destnîşan bike ku navguhertin texrîbateke pir-rehendî pêk tîne û zirarê dide zanîna civatê ya ku bi rêya navê cihan tê kodkirin.

ENCAM

Qet ji bîra min naçe, wextê ku ez zarok bûm li gund gelek caran em diçûn tanga dara sêvê ya bi navê Dara Kona. Dara Kona yek ji wan dara bû navek lê hatibû kirin. Gundiyan dema behs dikirin, herkesî dizanibû ku kîjan dar e. Îcar, li çayîra ku ew dar lê bû gelek darên sêv û hurmiyên biyanî hebûn ku bênav bûn, navêk li wan nehatibû kirin. Dara kona, dareke gendel bû, yanî bi carekê de bilind nedibû mîna konan (xîvet) nimiz bû.

Rojekê me anî, bi aqilê zarokane gelek şeytanokên (guhşeytan) li derdora vê darê kom kirin û li biniya wê danîn da ku hilkişin serê darê. Çend roj şûn de dema em dîsa hatin, me dît ku bi dehan şeytanok hilkişiyane darê û heta ser pelgên wê jî çûne. Me jî biryar da ku navê darê ji wê şûn de ne “Dara Kona” be, lê “Dara Şeytanoka” be. Jixwe zarokên gund jî kêr bûn û ev yek di nav zarokan de zû belav bû, hinekan ji bo darê digot Dara Şeytanoka. Nizanim, bi hest û aqilê zarokane, min peyva şeytanokê ecêb didît, mîna peyveke fantastîk. Min wetrê eger meriv taybetmendiyeke nû bide wê darê, meriv dikare navekî nû jî bide wê. Ev kira me ya zarokane, di cewher de, kiryareke navlêkirin û navguhertinê bû. Pir neçû ku ez jê poşman bûm, me biryar da ku dara li jêra Dara Kona, bi vî navî bê zanîn û pey re em zêde pê de neketin. Lê piştî ku gelek sal bi ser de derbas bûn, ez bûm şahid ku hin xortan ew navê nû hê ji bîr nekirine. Bi vî rengî, hê di zaroktiyê de mereqa min li ser navê dar û çayîrên gundê me hebûn. Tim ez li pey wateya wan diketim. Vê mereqdariya min a di zaroktiyê de, dev ji min berneda.

Babeta vê xebatê, çavkaniya xwe ji serhatiya min a berbehs hildide ku li ser “navê cihan” û “navguhertin”ê bû. Helbet, guhertina navê Dara Kona bi niyeteke ne-xerab û masûmane ya zaroktiyê bû. Gelo guherîna navê hemû gund, bajar, çiya û zozanên me kiryarake ew çend masûmane bû? Çima nav giring in û navguhertin çi armanc dike? Bi giştî eger em werin pirsê li destpêka vê xebatê de: “Çi heye di navekî de?” Bi kurt û kurmancî, bi bersiva pirsên bi vî rengî ev xebat bi xwe re derxist meydanê. Lewma, lêhûrbûna serekî ya vê xebatê jî mîna babeta epîgrafa jor li ser “nav” û “navguhertin”ê de ye. Navê cihan, bi emrên xwe yê dirêj, bi encama fêr û zanîna sosyo-kulturî bi gelek wateyan ve têr û tijî ne. Ji ber fonksiyon û wezîfeyên ku hildigirin di jiyana civakî de, ne tenê wekî referansên mekanî kar dikin, ew di heman demê de çîrok, efsane û vegêranên curbicur li ser erdê dineqîşînin û di

bikaranînên xwe de jî gelek melûmatên têkildarî qewamên dîrokî û civakî bi bîr dixin. Navê cihan ji berê de bi rengekî adetî dihatin danîn û dîsa guherîna wan jî li gorî pêşhatên civakî û tevgerên merivan encam didan. Lêbelê, di serdema netewedewletan de, guherîna navan ji vê adeta xwe derket û di bin serrastkirin û hilberînên mekanî yên dewletên nû de, bi wateyên xwe yên sembolîk û xurt ketin ber armancên polîtîkayên homojenîzasyonê yên zimanî û toponîmîk. Seranserê dinyayê li dewletên cuda cuda pratîkên bi vî rengî rû dan. Bi taybetî toponîmiya kurdî li hemû welatên kurdnişîn rastî destwerdanê hat. Wate, ji bo civata kurdî dewlet guherîbin jî, helwesta dewletan ya li hember toponîmên kurdî li gel hin cudahiyan, bi giştî neguheriye. Ne tenê li Tirkiyeyê, di heman demê de li Îran, Iraq, Sûriye û heta Ermenistanê gelek navên cihan hatin guhertin ku pareke wan a girîng bi zimanê kurdî bû.

Hîn di destpêkê de, Tirkiye dibe pêbestê polîtîkayên navguhertinê. Di pêwenda xwe ya hişk û demdirêj a netewesaziyê de ku bi serrastkirinên li ser mekan û qada giştî re, Tirkiyeyê bi deh hezaran navên ji bilî tirkî (carcar ên tirkî bi xwe jî) bi qanûn û bingeheên yasayî ve guherand û di dewsa wan de navên xwerû tirkî bi cih kir ku raboriya pirzimanî, piretnîsîteyî û pirdînî ya Dewleta Osmanî nedianî bîr. Navguhertina li Tirkiyeyê ku dîroka wê vedigere heta stratejiyên navandinê yên *İttihat ve Terrakiyê*, wekî helwestên binyadî yên dewleta nû-avabûyî her tim li kar bûn û bi Komisyona Pisporan a navguhertinê (*Ad Değiştirme İhtisas Komisyonu*) û hin serrastkirinên yasayî ve şiklekî fermî wergirtin. Bi tesîra neteweperestiyê encamên ku li ser guherîna navan re bi dest ketin, rewşa pirçandî ya dîmena zimên ji kurdî, ermenî, rumî û gurcî û hwd hatin paqijkirin, pê re jî xisareke berçav giha nav û nîşanên cografyaya kurdî û pêkvejiyanê.

Ji ber hindê, meriv dikare bibêje ku prosesa netewesaziyê û neteweperestiyê ku gelek caran rûxîner e, kartêkeriyê li ser navê cihan jî çêdike mîna piraniya pêkhateyên din ên pirçandî. Çunku, ev proses wekî projeyeke neteweperest birêkûpêk hate meşandin, çi tiştên ji çand û zimanên cuda ku ji berê mabûn pêrgî destwerdanê hatin, yek ji wan qadên ku destwerdaneke berçav çêbû qada “sembolîk” bû ku tê de para pirtir a navê cihan ên ne-tirkî ji şûn û şopa çandî, zimanî û dîrokî hatin şûştin.

Navê cihan û venavandin gelek bi zexmî bi polîtîkayên netewesazî û nasnamesaziyê re jî têkildar in. Ew di destê gelek desthilatên siyasî de dibe amrazeke xurtkirin û vebestina cemaweran bi erdê re, bi taybetî bi rêya navguhertinê, giringiya wan a neteweyî û etnîk baştir diyar dibe. Ev guhertin armancên polîtîk û nasnameyî tînin kirin, bi wan xwenasandin û destnîşankirina nasnameyê tê handan. Ji ber ku navê cihan hem di asta takî hem jî di asta cemawerî de roleke berçav digêre, tevkarîyê li hest û îdraqa aidîyetê ya cemawerê dike. Dema ku navdanîn an jî jêbirina navan rûdide, pê re destwerdan jî çêdibe li ser îdraqa me ya li ser nasnameya cih. Bi vî rengî jî pevgirêdana di navbera polîtîkayên nasnamesaziyê û destwerdanên toponîmîk de jî eşkere dibe. Ev destwerdan carcar di nav koma zorîne de bi rêya watesazkirinê pêbendîya bi xakê re xurt dikin, an jî bi pêçevane, ji bo gelên ku xwedî dezavantaj ên ku ji îdeolojiya hakim hatine derekekirin, wêrankariyeke pir-rehend digire ku tê de ev berdest in; dîroka nû ya ku bi destê netewe-dewletê de hatiye sêwirandin, bîra hevpar ku bîrên gelên kêmnê jêrdest û bînîrx dike, nasnameya neteweyî ku nasnameyên din bi retorîkên neteweyî ve qels dike. Şik tê de nîne ku prêzeyên ku Tirkiyeyê bi rê ve çûn, biserûberkirineke mekanî û sepandina toponîmiyeke nû bû û ev yek jî bi tesîra neteweperestî derketine holê.

Vê xebatê tecrûbeyî ya navguhertinê û sepandina wê ya li bajarê Agiriyê wekî nimûne nîrxand û destnîşan kir ku hem li li ser mekanê bajêr, hem jî li ser deverên wê yê gundewar gelek navên cihan hatine kodkirin ku temsiliyeta hişmendî û nasnameya neteweyî ya tirkî dikin. Li ser esas û rêzikên navguhertinê, di dewrên cuda de hin agahî hatibin dayîn jî bi giştî meriv dikare bibêje ku lihevkarîneke birêkûpêk di nav endam û nûnerên lijnaya navguhertinê de çênebûye. Dîsa jî di navguhertinê de hin pîvanên serekî bi giştî hatine şopandin. Bi taybetî peyvên ku mensubiyeta qewmî nîşan didin û yê ku bawerîya xirîstiyaniyê bi bîr dixin an jî yê bi rengekî wate û îmajêke “ne-baş” didin gund, bi tirkî bin jî hatine guhertin. Para pirtir navên kurmancî, zazakî, ermenî, rûmî û erebî hatine guhertin. Li ser vê paşxaneyê, şêwaz û temsîlên ku di prosesa venavandina li Tirkiyeyê de rû dane, bi awayekî berçav nîşan didin ku toponîmên ku bi rengekî ji tirkî re nebûye mal û milk, di prosesa venavandinê de nehatine dîtin, bi temamî ji pergale hatine (ve)derkirin. Ev proses, herçiqas bi rengekî giştî hemû navên ermenî, gurgî, lazî, erebî, zazakî û

kurmancî kiriye jî, bi taybetî tê dîtîn ku bajarên kurdnişîn bi rengêkî zêde ketine ber pêlên navguhertinê. Dîsan bajarê Agiriyê jî bi heman rengî rastî hemû wan destwerdanên toponîmîk bûye ku li seranserê Tirkiyeyê di astên cuda de pêk hatiye.

Di çarçoveya vê xebatê de hate dîtîn ku li Agiriyê binavkirinên toponîmîk, wan prosesên dîrokî û guherînên hizrî yên civakî nîşan didin ku bajar tê re derbas bûne. Ev, di heman demê de, şopa dubendî û biryarên nelihev ên têkiliyên desthilatên cuda, bîrên cuda û dubendiya li ser serdestbûna navên bibîranînê jî li pey xwe dihêle. Di vê çarçoveyê de li Agiriyê navê cihan “wekî amrazê kontrolkirinê, nivîsandin û bergewdekirina hin îdeolojiyên çandî û polîtîk” (Alderman, 2008: 204) hatine bikaranîn. Lewma, li navenda bajarê Agiriyê dibe şahidê hewldanên ku dixwazin îdeolojî û sembolên dîrokî û çandî yên xwe lê dîtbar bikin. Binavkirinên kolanên li navenda bajarê Agiriyê, xwe dispêre wan paşxaneyan ku tê de berxwedanên polîtîk, hewldanên pêkanîna nasname û bîreke hevpar û meşrûkirina desthilatê cih digirin. Bi taybetî binavkirinên ku tiştan bi bîr dixin (li Agiriyê bo nimûne, Îhsan Nurî Paşa) tesîra hêza prosesa îdarî li ser prosedûrên semiyotîk nîşan didin, lewre bi rêya wan dîrok dibe rastiyeke berçav a semiyotîk (Alderman, 2009: 54) an jî bi destê desthilatê tê manîpulekirin û ew nav jî wekî sembol û formên temsîlê, tesîrê li ser fêhm û feraseta cemawerê dike (Guyot & Seethal, 2007; Helander, 2014). Bo nimûne, tecrîbe û raboriya ku navê Îhsan Nurî Paşa sembolîze dike û bi xwe re tîne ku di temsîla raboriya azadîxwaz/serxwebûnê re pêwendîdar e, ji aliyê desthilata herêmî ve nayê qebûlkirin û ev nav nabe navê tax an jî kolanekê. Gelek rehendên polîtîk û wateyî yên navê cihan hene li navenda bajêr û bikarhênerên wan navan di heman wextê de wateyan jî hildiberînin. Çunku dema em mekanê bajêr bi tevî hemû wateyên xwe yên semiyotîk wekî deqekî dibînin, ew deq ji aliyê cemawerê ve bi tenê awayekî nayê xwendin; gelek wateyên guherbar derdikevin mexderê di çarçoveya xwendinên cuda yên xwecihên bajêr ve. Bi giştî meriv dikare bibêje ku navenda bajarê Agiriyê, dubendiyên ku li ser navan rûdane û hewldanên din ên binavkirinê, nîşan dide ku formên hin berxwedaneke sembolîk li wir derketine holê.

Binavkirinên li Agiriyê rû dane, tenê ne li ser deqa bajêr in, para pirtir ji wan li ser deverên avadan ên wekî gund û mezreyan pêk hatiye. Di encama vê xebatê de

derket holê ku gelek stratejî li ser binavkirina navê gundan xuya dibin. Ev stratejiyên cihêreng rê û rêkara venavandinê diyar dikin ku meriv dikare wiha rêz bike: “wergera yekser a cihenavan”, “wergera qismî ya cihenavan”, “wergera bereks ya cihenavan,” “wergera ku pêwendiyê wê ya wateyî bi navê kevn re heye”, “adaptasyonên dengsazî û rênivîsî û keyfî”, “afirandina cihenavên nû”, “cihenavên ku nehatine guherandin”.

Ji jêr ve, temsîliyeta vegêranên takekesî yê nîstecih/bikarhêneran, bi qasî wan polîtîkayan giring in ku ji jor ve tên dasepandin. Lewma vê xebatê xwest ku fikr û helwestên xwecihên li Agiriyê yê li hember navan vekole. Di vê lêgerîna etnografîk de hate dîtin ku gelek qewam, çîrok, serhatî bi rêya navan li ser mekan hatine neqîşandin. Navê cihan temsîla raboriya malbatî û têkildariya bavkalî dikin ku li ser navan re girêdana bi erdê re xurt dike. Bi rêya nerîta devkî û zanîna civakî ya li dor navan, hisiyata aidbûnê bi wî erdê re çêdibe. Gelek agahîderan bal kişandin li ser erdên bi çîrokan re hatine têkildarkirin. Li gelek gundên Agiriyê û navçeyên wê de navên cihan xwedî çîrokên taybet in ku dorbera herêmî de çîroka wan tên zanîn û neqilkirin. Herwiha, di nav nîfşên berê de gelek kes navên gundên derdora xwe yê bi tirkî nizanin an jî gelek kêr nizanin. Lê di nav ciwanan de, zanîna herdu navan pêde pêde zêde dibe û ev zanîn di heman demê de bi zanîna zimanê kurdî re jî rasterast girêdayî ye. Helwestên li ser bikarneanîn an jî redkirina navê cihan di nava gotarên sereke yê agahîderan de hate dîtin.

Ji bilî polîtîkayên dewletê û helwestên li hember navê cihan, rehendekî giring ên navê kurdî jî di nav zanîna devkî ya kurdî de derkete mexderê. Navê cihan û rola wan ya giring di nav nerîta devkî ya kurdî de û bi navguhertinê re xisara ku digihe vê zanîna xurt hêjayî vekolînê bû. Çawa ku tê zanîn bi deng û kilamên xwe ve dengbêjan, bi sedan salan tevkariyeke mezin li çanda kurdî kirine û guhê xwe dane ber hemû qewamên ku bo civata wan girîng in û bîra raboriyê veguhastine dema me ya îroyîn. Ji ber ku dengbêj ji dawetekê ji bo yeke din, ji gundekî bo gundekî din tim li ser rê û dirban e û erdnîgarî û toponîmên welatê xwe bi tevî çiya, newal, gund, zozanan ve baş hîn dibe. Ew ne tenê zanîneke toponîmîk a xurt bi dest dike, di heman demê de vê zanîna xwe tevli vegêranên xwe dike û wan (ve)digerîne.

Vê vekolînê destnîşan kir ku navê cihan wekî perçeyekî navxweyî yê çanda devkî ya kurdan, bi gelek fonksiyonên sosyo-kulturî ve radibin. Ew wekî amrazên veguhastina zanîna cografîk ya çanda devkî kar dikin ku pê re jî gelek peyam, qewamên dîrokî, bawerî û nirx li wan hatine barkirin. Bi taybetî, di nav afirandinên dengbêjan de, bi dehan nexşeyên devkî li bîra civakî tên xêzkirin, bi vî karî, her kilamek bi rêya navê cihan ên ku tên neqîlkin, dibe xwedî nexşeyeke taybet a biçûk. Ev navên li ser van nexşeyên devkî, herçiqas li ser nexşeyên fermî nehatibin tomarkirin û rayedarên fermî yên dewletê giringî nedabin wan jî, li diyarê çav e ku nirx û qîmeteke wan a mezin heye ji bo nerîta devkî ya kurdî. Di vê xebatê de hate dîtin ku di nav kilamên kurdî de, mefhûma *topogenyê* ku Fox (2006) pêş xistiye bi çend cureyan ve tê dîtin. Vegêranên di dilqê secere û *topogenyê* de zêdetir di nav gelên xwecih ên avustronezyayî de tên dîtin û ev diyardeya ku di nav kilamên dengbêjan de jî berdest e hin formên nû yên *topogenyê* jî bi pêş dixin. Bi taybetî kilama Elî Xarza (nêzî 160 navî dihevine) ku taybetmendiyan gelek xurt ên *topogenyê* nîşan dide. Di kilamê de navê cih û waran bi rengekî seredorî di nav vegêranê de cih digire û li ser qewam, tevgerên civatî yên li ser mekan girêdanên hestî û bîranînê saz dike. Ev yek destnîşan dike ku nerîta devkî ya kurdî de, nav dikarin bibin xwedî wateyan gelek giring û bibin parçeyê herê serekî yê vegêrana kilamekê.

Di encama vekolîneke berfireh a li ser kilamên Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro de, statîstîkên balkêş hatin dîtin: Di nav 110 kilamên Dengbêj Reso de -destan û çîrokên gelêrî ne tê de- bi temamî 735 caran navê gund, herêm, bajar, newal, gelî, kanî, mexel, çiya, war, zozan û ziyaretan derbas dibe. Di nav 266 kilamên Dengbêj Şakiro de hejmara navê cihan -bi tevî dubarekirinan- xwe digihîne qedera 1683 navî ku navên di destanên Şakiro de derbas dibin ne tê de. Herwiha di nav hemû kilamên li ser şer ên Şakiro û Reso de, navê cihan teqez derbas dibin. Ji ber ku tu kilameke şer nehate tespîtkirin ku navê cihekî tê de tune be. Ev yek diyardeyeke giring a kilamên kurdî ye û destnîşan dike ku navê cihan dikare bibe parçeyekî jêneger ên kilamên kurdî.

Rast e, li Tirkiyeyê, rewşa navên kurdî ne xwedî statuyeke fermî ye ku nav bi rengê bikeve nav gotara fermî a dewletê. Bêyî ku bikevin bin siwan û rewabûna fermîbûnê, navên kurdî bi rêya vegêran û afirandinên kurdî yên devkî berbelav dibin û bi taybetî li ser kilaman “hukmê şêr” dikin. Bi vî rengî, bi navan ve bi sedan “nexşeyên devkî” yên alternatîf li ser erdê tên îşaretkirin ku li ser nexşeyên fermî an rastî xisarê tên an jî bi temamî nav û nîşanên wan xuya nakin. Zanîna giştî ya çanda gelêrî û pergala toponîmîk, gelek form û wateyên cihêreng ve barkirî ye. Dengbêj bi kilamên xwe ve ku gelek nav tê de derbas dibin, helwesteke berxwedêr jî bi dest dixe li hember navên ku bi darê zorê hatine (da)sepandin. Dengbêj tînin navê kevn li civakê digerin û nahêlin ku ew jî nav bîra civakî derkevin. Bi taybetî di kilamên li ser şer û qalên giring bi rêya navê cihan *mekanên bîrê* tên avakirin. Di vê xebatê de hate dîtin ku dengbêj bi taybetî di kilamên li ser “êsr”ên Zîlanê de gundên ku piştî qirê bi temamî jî ser nexşeyan rabûne bi navan ve îşaret dikin û li dor wan cih û derên ku bûne “qesabxane” mekanên bîrê ava dikin. Ev mekanên bîrê di nava kilaman de bi nav û nîşanên xwe ve tên diyarkirin û ji bo siberojê tên veguhastin. Lewma, dema ku destwerdanek li pergala cihên navên kurdî çêdibe yên ku bi salane gelek nexşeyên curbicur û pir-tebeqeyî yên qewamên çandî û dîrokî çêdikin, di heman demê de destwerdanek li ser zanîna gelêrî ya kurdî jî çêdibe. Ev destnîşan dike ku navguhertin dikare çendî zêde xisarê bigihîne rê û rêkarên ku em qewamên raboriyê bi bîr tînin, ew dikare rêgiriye jê re bike û bîra li ser “qir”ê di nav tedawila rojane de rabike û bi tevî wê jî hemû serhatî û çîrokên wê derê yên ku di kilamên dengbêjan de krîstalîze bûne bi awayekî bide jibîrkirinê.

ÇAVKANÎ

- Ahıska, M. (2006) 'Occidentalism and Registers of Truth: The Politics of Archives in Turkey', *New Perspectives on Turkey*, 34, pp. 9–30.
- Ainiala, T. (2008) 'Socio-onomastics', in Östman, J., Verschueren, J. (eds.) *Handbook of Pragmatics*. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins, pp. 1–18.
- Ainiala, T. (2016) 'Attitudes to Street Names in Helsinki', in Puzey, G., Kostanski L. (eds) *Names and Naming: People, Places, Perceptions and Power*, Bristol, UK: Multilingual Matters, pp. 106–119.
- Ainiala, T. and Östman, J. (2017) *Socio-onomastics: The pragmatics of names*. Amsterdam: John Benjamins Publishing Company.
- Akgül, M. (2017) *Ethnic Homogenization in Turkey: The Case of Toponymic Practices in Istanbul*, Unpublished Master's Thesis, İstanbul Bilgi University.
- Akin, S. (2013) 'Jinû ve Binavkirina Erdê Kurdan: Analîzeke Kemberî di Zimanên Erebi, Farisî û Tirkî de', tê de *Vekolînên Zimannasiya Kurdî*. Stenbol: Avesta, rr. 281–292.
- Akin, S. (2013) 'Kurd û Kurdistan di Vegotina Zanistî ya Tirk de', tê de *Vekolînên Zimannasiya Kurdî*. (Öpengin, E., wer.) Stenbol: Avesta, rr. 233–253.
- Aktar, A. (2010) 'Conversion of a 'country' into a 'fatherland': the case of Turkification examined, 1923–1934', in Aktar A., Kızılyürek N. and Özkırımlı, U. (eds) *Nationalism in the Troubled Triangle*. Basingstoke: Palgrave, pp. 21–35.
- Akyol, H. (2011) *Antolojiya Dengbêjan*. Stenbol: Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê.
- Alagöz, C. A. (1984) 'Türkiye Yer Adları Üzerine Bazı Düşünceler', *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri*, Ankara: Başbakanlık, rr. 11–23.
- Alakom, R. (2011) *Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta.

- Alderman, D. (2003) 'Street names and the scaling of memory: the politics of commemorating Martin Luther King, Jr within the African American community', *Area*, 35(2), pp. 163–173.
- Alderman, D. H. (2000) 'New Memorial Landscapes in the American South: An Introduction', *The Professional Geographer*, 52(4), pp. 658–660.
- Alderman, D. H. (2008) 'Place naming and the Interpretation of Cultural Landscapes', In Graham, B., Howard, P., (eds) *The Ashgate Research Companion to Heritage and Identity*, Aldershot: Ashgate, pp. 195–213.
- Alderman, D. H. (2009) 'Street Names as Memorial Arenas: The Reputational Politics of Commemorating Martin Luther King Jr. Georgia County', In Berg L.D. and Vuolteenaho J. (eds) *Critical Toponymies. The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, pp. 179–197.
- Alderman, D. H. (2015) 'Naming Streets, Doing Justice? Politics of Remembering, Forgetting, and Finding Surrogates for African American Slavery Heritage' in Choo, S. (eds), *Geographical Names as Cultural Heritage*. Seoul, Korea: Kyung Hee University Press, pp. 193–228.
- Allison, C. (2001) *The Yezidi Oral Tradition in Iraqi Kurdistan*. Richmond: Curson Press.
- Ambert, A.M., Adler, P. A. and Detzner, D. F. (1995) 'Understanding and Evaluating Qualitative Research', *Journal of Marriage and Family*, 57(4), pp. 879–893.
- Amy de la Bretèque, E. (2018) 'Awazên (Dengên) Keserê: Axaftinên Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de', (Sinan Gültekin, wer.), *Wêje û Rexne*, 9-10, rr. 57–78.
- Anderson, B. (2020) *Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*. (İskender Savaşır, çev.), İstanbul: Metis.
- Anderson, J. M. (2007) *The Grammar of Names*. New York: Oxford University Press.

- Antonsich, M. (2010) 'Search for belonging: An analytical framework', *Geography Compass*, 4(6), pp. 644–659.
- Arai, M. (2008) *Jön Türk Dönemi Türk Milliyetçiliği*. (Tansel Demirel, çev.), İstanbul: İletişim Yayınları.
- Aras, A. (2010) Kılama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê", *Bîr*, 7, 228–244.
- Aras, A. (2013) 'Du Nivîsên Nûbiharê', *Nûbihar*, 123(20), rr. 39–42.
- Aras, A. (2018) *Şairê Kurda yê Efsanewî: Evdalê Zeynikê*. Stenbol: Nûbihar.
- Aras, R. (2020) *The wall: The making and unmaking of the Turkish-Syrian border*. Cham: Palgrave Macmillan.
- Araújo, M. P. N., and dos Santos, M. S. (2009) 'History, Memory and Forgetting' (Sheena Caldwell, Trans.), *RCCS Annual Review*, 1, DOI: <https://doi.org/10.4000/rccsar.157>
- Arslan, S. (2015) *Language Policy in Turkey and Its Effect on Kurdish Language*. Unpublished Master's Thesis, Western Michigan University.
- Aslan, S. (2009) 'Incoherent State: The Controversy over Kurdish Naming in Turkey', *European Journal of Turkish Studies*, 10, DOI: <https://doi.org/10.4000/ejts.4142>
- Assman, J. (2018) *Kültürel Bellek*, (Ayşe Tekin, çev.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Atı, H. (2020) *Di Vegotinên Gelêrî De Guherînên Di Navbera Civakên Etno-Dînî De (Nimûneya Kurdên Elewî û Kurdên Êzîdî)*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê.
- Aydingün, A. and Aydingün, İ. (2004) 'The Role of Language in the Formation of Turkish National Identity and Turkishness', *Nationalism and Ethnic Politics*, 10, pp. 415–332.
- Aykun, İ. (1995). *Erzurum Konferansı ve Osmanlı-İran Hudut Anlaşması*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Atatürk Üniversitesi.

- Aytürk, İ. (2004) 'Turkish linguists against the West: The origins of linguistic nationalism in Atatürk's Turkey', *Middle Eastern Studies*, 40, pp. 1–25.
- Aytürk, İ. (2009). 'H. F. Kvergić and the sun-language theory', *Zeitschrift Der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft*, 159(1), pp. 23–44.
- Azaryahu, M. (1996) 'The Power of Commemorative Street Names', *Environment and Planning D: Society and Space*, 14(3), pp. 311–30.
- Azaryahu, M. (1997) 'German reunification and the politics of street names: The case of East Berlin', *Political Geography*, 16(6), pp. 479–493.
- Azaryahu, M. (2009) 'Naming the Past: The Significance of Commemorative Street Names', in Berg L. D. and Vuolteenaho, J. (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, pp. 53–70
- Azaryahu, M. (2011) 'The critical turn and beyond: The case of commemorative street naming', *ACME: An International Journal of Critical Geographies* 10(1), pp. 28–33.
- Badalkhan, S. (1992) 'A glance at Balochi oral poetry', *Newsletter of Balochistan Studies*, 8, pp. 3–45.
- Basso, K. (1988) "Speaking with Names": Language and Landscape among the Western Apache. *Cultural Anthropology*, 3(2), pp. 99–130.
- Basso, K. (1996) *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache*. Albuquerque: University of New Mexico Press.
- Battiste, M. and Henderson, J. Y. (2000) *Protecting Indigenous Knowledge and Heritage: A Global Challenge*. Saskatoon: Purich Publishing Ltd.
- Bayar, Y. (2011) 'The Trajectory of Nation-building through Language Policies: The Case of Turkey during the Early Republic (1920–38)', *Nations and Nationalism*, 17(1), pp. 108–228.
- Baysan, S., ve Kara, A. (2014) 'Aydın'da Mahalle, Bulvar, Cadde ve Sokak Adları: Şehirsal Toponimik Özellikler', *Coğrafi Bilimler Dergisi*, 12 (1), pp. 23–48.

- Berezkina, M. (2016) 'Linguistic landscapes and inhabitants' attitudes to place-names in multicultural Oslo', in Puzey, G. and Kostanski, L. (eds) *Names and naming: people, places, perceptions and power*. Bristol: Multilingual Matters, pp. 120–136.
- Berg, L. D. and Kearns, R. A. (2009) 'Naming as norming: "Race", gender and the identity politics of naming places in Aotearoa/New Zealand', in L. D. Berg and J. Vuolteenaho (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, pp. 19–51.
- Bilal, M. (2018) 'Lullabies and the memory of pain: Armenian Women's remembrance of the past in Turkey', *Dialectical Anthropology*, 1–22., DOI: <https://doi.org/10.1007/s10624-018-9515-8>
- Boas, F. (1934) *Geographical names of the Kwakiutl Indians*. New York: Columbia University Press.
- Botî, K. S. (2006) *Ferhenga Kamêran, Kurdî-Kurdî*. Duhok: Spîrêz.
- Bourdieu, P. (1990) *The Logic of Practice*, Stanford, California: Stanford University Press.
- Brealey K. G. (1995) 'Mapping them 'out': Euro-Canadian cartography and the appropriation of the Nuxalk and Ts'ilhqot'in First Nations' territories, 1793-1916, *Canadian Geographer*, (39), pp. 140–156.
- Caruth, C. (1995) *Trauma: Explorations in memory*. Baltimore/London: Johns Hopkins University Press.
- Celîl, O. û Celîl, C. (1978) *Zargotina Kurdan I*. Moskva: Neşîrxana Naûka, rr. 268–278
- Celîl, Ordîxanê (2011) *Kürt Kahramanlık Destanı: Dimdim*, (İbrahim Kale, çev.), İstanbul: Avesta.
- Chmiliar, L. (2010) 'Multiple-case designs', in Mills, A. J., Eurepas G. and Wiebe, E. (Eds.) *Encyclopedia of case study research*. USA: SAGE Publications, pp. 582–583.

- Chyet, M. L. (1991) *And a Thornbush Sprang Up between Them: Studies on 'Mem u Zin', a Kurdish Romance*, Unpublished Ph.D. Dissertation, University of California at Berkeley.
- Cindî, H. (2016 [1957]) *Folkloru Kurmanciyê*. Amed: Weşanên Lîs.
- Clark, I. and Kostanski, L. (2012) 'Reintroducing Indigenous place names – lessons from Gariwerd, Victoria, Australia, or, How to address toponymic dispossession in ways that celebrate cultural diversity and inclusiveness', *Proceedings of the 22nd International Congress of Onomastic Sciences*, Section 5 Geographical Names, Edizioni, Pisa, pp. 517–532.
- Coates, R. (2006) 'Introduction', *Onoma*, (41), pp. 7–13.
- Cocq, C. (2008) *Revoicing Sámi narratives: North Sámi storytelling at the turn of the 20 th century*. Umeå University: Sami Studies.
- Cohen, S. and Kliot, N. (1992) 'Place-names in Israel's Ideological Struggle over the Administered Territories', *Annals of the Association of American Geographers*, (82), pp. 653–680.
- Connerton, P. (2009) *How Modernity Forgets*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Connerton, P. (2019) *Toplular Nasıl Anımsar?* (Alâeddin Şenel, çev.) İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Coşkun, V., Derince, M. Ş. û Uçarlar, N. (2010) *Kula Ziman, Kêşeya Bikarneanîna Zimanê Zikmakî di Perwerdeyê de û Serhatiyên Xwendekarên Kurd li Tirkiyeyê*, (Elîxan Loran & Ergin Öpengin, wer.), Amed: DÎSA.
- Creswell, J. W. (2007) *Qualitative inquiry and research design: Choosing among five approaches*. California: Sage Publications.
- Cruikshank, J. (1990a) 'Getting the Words Right: Perspectives on Naming and Places in Athapaskan Oral History', *Arctic Anthropology*, 27(1), pp. 52–65.

- Cruikshank, J. (1990b) *Life lived like a story: Life stories of three Yukon native elders*. Vancouver: University of British Columbia Press.
- Çağaptay, S. (2006) *Türkiye’de İslâm, Laiklik ve Milliyetçilik: Türk Kimdir?* İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Çakır, B. (2014) *Crafting symbolic geographies in modern Turkey: Kurdish assimilation and the politics of (re)naming*, International Institute of Social Sciences, Working Paper No: 580.
- Çelik, A. (2015) ‘Eşîra Xiyan, bîra kolektîf û trawma: Êşeke patetîk li dor kilama Reben im’, *Wêje û Rexne*, 4, rr. 180–202.
- Çelik, A. (2018) ‘Cumhuriyet Döneminde Yer İsimlerinin Türkçeleştirilmesi Meselesi’ içinde Doğanay, R., Çelik, A. ve Özçelik, F. (ed) *Rıfat Özdemir’e Armağan*. İstanbul: Hiperyayın, pp. 445–228.
- Çelik, C. (2017) ‘Toplumsal Hafızanın İnşasında İsimler’, *Sosyoloji Divanı*, 10, ss. 63–75.
- Çiçek, C. (2013) *Zimanek Çima Tê Qedexekirin? Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkîyeyê, ji Înkare ber bi Nasîne*, Stenbol: Peywend.
- Dahiliye Vekâleti (1933) *Köylerimiz*. Hazırlayan: Mahalli İdareler Umum Müdürlüğü, İstanbul: Dahiliye Vekâleti Yayını.
- Davey, L. (1991) The application of case study evaluations. *Practical Assessment, Research & Evaluation*, 2(9), Art. 9.
- de Certeau, M. (1984) *The Practice of Everyday Life*. (Steven Rendall, Trans.) Berkeley: University of California Press.
- Delikaya, Ö. (2015) ‘Nexşeya Zimanî ya Erdnîgarê û Nirxandineke Mîkrotoponomîk li ser Gundê Qopiza Jorîn’, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(1), rr. 96–110.

- Delikaya, Ö. (2019) ‘Cihwar(nav) û Hesta Aîdbûnê di Kilamên Dengbêjan de’, *Uluslararası Dengbejlik Kültürü ve Dengbejler Sempozyumu*, Şırnak, rr. 427–441.
- Denzin, N. K. and Lincoln, Y. S. (2011) *The Sage handbook of qualitative research*. Thousand Oaks, CA: Sage.
- Diego Gordon, M. (2019) *Behind Renaming: State, Minorities and Toponym Changes in Almaty and North Kazakhstan Oblasts since 1991*, Unpublished Master’s Thesis, University of Glasgow.
- Du Plessis, T. (2011) ‘Language policy, language visibility and the standardisation of geographical names in South Africa – the quest for coherency’, *Language Matters*, (42), pp. 264–281.
- Duncan, J. and Duncan, N. (1988) ‘(Re) reading the landscape’, *Environment and Planning D: Society and Space*, 6(2), pp. 117–126.
- Dündar, F. (2000) *Türkiye Nüfus Sayımlarında Azınlıklar*. İstanbul: Çiviyazıları.
- Dündar, F. (2002) *İttihat ve Terakki’nin Müslümanları İskan Politikası (1913-1918)*. İstanbul: İletişim.
- Dündar, F. (2013) *Modern Türkiye’nin Şifresi: İttihat ve Terakki’nin Etnisite Mühendisliği (1913- 1918)*. İstanbul: İletişim.
- Düzgün, D. (2020) *The death of the author in the streetscape of Ankara: A Barthesian intervention into critical toponymy*, Unpublished Master’s Thesis, Middle East Technical University.
- Dwyer, O. J. (2004). ‘Symbolic accretion and commemoration’ *Social and Cultural Geography*, 5(3), pp. 419–435.
- Economou, A. (2014) ‘The Narrative of Place, the Place of Narrative: Toponymic Narratives and the Making of Place-names in Continental Greece’, *Narratives Across Space and Time: Transmissions and Adaptations. Proceedings of the 15th Congress of the International Society for Folk Narrative Research*,

Academy of Athens, Publications of the Hellenic Folklore Research Centre - 31, Athens)

Egîdê, F. (2020) ‘Mîkrotoponîma gundê Fêrgayê (Silopya - Şernex)’, *Folklorame*, (6), rr. 93–111.

Emiroğlu, M. (1984). ‘Bolu Yöresi Yer Adları’, *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri*, Ankara: Başbakanlık.

Ender, R. (2016) *İsmiyle Yaşamak*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Eren, H. (1965) ‘Yer Adlarımızın Dili’ *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı Belleten*, s. 154–165.

Erkınay Tamtamiş, H.K. (2019) ‘Mardin’de değiştirilen yer adları üzerine bir tasnif denemesi’, *TYB Akademi*, 25, ss. 65–84.

Feld, S. and Basso, K. (eds) (1996) *Senses of Place*. Santa Fe, NM: School of American Research Press.

Feld, S., (1996) ‘Waterfalls of Song: An Acoustemology of Place Resounding in Bosavi, Papua New Guinea’, in S. Feld and K. Basso (eds) *Senses of Place*. Santa Fe, NM: School of American Research Press, pp. 91–135.

Fields, D. (2013) *State Imposed Place Name Change in Turkey and Responce of Giresun Residents*, Unpublished Master’s Thesis, Sabancı University.

Fine, E. C. (1984) *The folklore text: from performance to print*. Bloomington: Indiana University Press.

Foucault, M. (1980) *Power/Knowledge: Selected Interviews and Other Writings, 1972–1977*. Gordon, C. (ed), New York: Pantheon Books.

Foucault, M. (1984) ‘Space, knowledge and power’. in Rabinow, P. (ed), *The Foucault reader*. London: Penguin, pp. 239–256.

Foucault, M. (2013) *Büyük Kapatılma*. (Ferda Keskin ve Işık Ergüden, çev.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

- Fox, J. J. (2006) 'Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names', in Fox, J. (ed.) *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*, Canberra: Pacific Linguistics, Research School of Pacific and Asian Studies, Australian National University, pp. 89–100.
- Gambetti, Z. and Jongerden, J. (2011) 'The Social (Re)production of the Kurdish Issue: Multiple and Contradicting Trajectories', *Journal of Balkan and Near Eastern Studies*, 13(4), pp. 375–388.
- Gee, J. P. (2005) *An Introduction to Discourse Analysis: Theory and Method*. London: Routledge.
- Ghulyan, H. (2020) 'Conceiving homogenous state-space for the nation: the nationalist discourse on autochthony and the politics of place-naming in Armenia', *Central Asian Survey*, DOI: 10.1080/02634937.2020.1843405
- Giraut, F., & Houssay-Holzschuch, M. (2016) 'Place naming as dispositif: Toward a theoretical framework', *Geopolitics*, 21(1), pp. 1–21.
- Gökçeer, F. (1984) 'Açılış Konuşması' in *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri*, Ankara: Başbakanlık, ss. 1–5.
- Guyot, S. and Seethal, C. (2007). 'Identity of place, places of identities: Change of place names in post-apartheid South Africa', *South African Geographical Journal*, 89 (1), pp. 55–63.
- Gülensoy, T. (1983) *Kürmanci ve Zaza Türkçeleri Üzerine Bir Araştırma, İnceleme –Sözlük*, Ankara: TKAE.
- Gültekin, M. (2013) *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, Stenbol: Avesta.
- Günel, V. (2012) 'Batman'da cadde adlandırmaları: Toplumsal bellek oluşturma ve şehirselleşme mekânı hâkim olma çabaları', *Marmara Coğrafya Dergisi*, 25, ss. 171–197.

- Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2019a) *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2019b) *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2021) *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno*. İstanbul: Nûbihar.
- Ğefür, A. (2009) *Kuzey Kürdistan'ın Köyleri: İdari ve İdari Olmayan İsimleri*. Erbil: Weşanên Akademiya Kurdî.
- H. Nihal ve A. Naci (1928) 'Anadolu'da Türklere Aid Yer İsimleri', *Türkiyat Mecmuası*, 2, ss. 243–259.
- Haig, G. (2004) 'The invisibilisation of Kurdish: the other side of language planning in Turkey' in Concerman S. and Haig, G. (eds), *Die Kurden: Studein zu ihrer Sprache, Geschichte und Kultur*. EB-Verlag: Schenefeld, pp. 121–150.
- Hajdú, M. (2002) 'The History of Onomastics', *Onomastica Uralica*, (2), pp. 7–45.
- Halbwachs, M. (1992) *On Collective Memory*. (Lewis A. Coser, çev.), Chicago/London: University of Chicago.
- Halbwachs, M. (2017) *Kolektif Hafıza*. (Banu Barış, çev.) Ankara: Heretik.
- Hamed-Troyansky, V. (2018) *Imperial Refuge: Resettlement of Muslims from Russia in the Ottoman Empire, 1860-1914*, Unpublished PhD Thesis, Stanford University.
- Hamelink, W. (2016) *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation*. Leiden: Brill.
- Hamelink, W. û Barış, H. (2014). 'Dengbêj di Sinoran de: Sinor û Dewlet Bi Nêrîna Kîlambêjên Kurd', (Şehmuz Kurt and Ziyaddin Yıldırımçakar, wer.), *Wêje û Rexne*, 3, rr. 173–200
- Harley, J. B. (2001) *The New Nature of Maps: Essays in the History of Cartography*. Baltimore: Johns Hopkins University Press.

- Harris, C. (1991) 'Power, Modernity, and Historical Geography', *Annals of the Association of American Geographers*, 81, pp. 671–83.
- Hassanpour, A. (2020) 'The politics of A-political Linguistics: Linguist and Linguicide' in Hassanpour, A. *Essays on Kurds: Historiography, Orality, and Nationalism*. New York: Peter Lang.
- Hassanpour, A.. (1992) *Nationalism and language in Kurdistan, 1918–1985*. San Francisco: Mellen Research University Press.
- Hauser, G. A. (1986) *Introduction to Rhetorical Theory*. Cambridge: Harper & Row.
- Helander, K. R. (2014) 'Sami placenames, power relations and representation' in Clark, I. D., Hercus, L. and Kostanski, L. *Indigenous and minority placenames*. Canberra: Australian National University Press, pp. 325–349.
- Helleland, B. (2012) Place names and identities. in B. Helleland, Ore, C.E. and S. Wikstrøm (eds) *Names and identities*. Oslo: University of Oslo, 4(2), pp. 95–116.
- Hepo, A. (2021) *Karîbarên Gelê Kurd*. Ankara: Peywend.
- Herman, RDK. (2009) 'The Aloha State: Place Names and the Anti-Conquest of Hawai'i', in Berg L. D. and Vuolteenaho, J. (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, pp. 101–136.
- Hilterman, T. and Koopman A. (2003) '“A High Degree of Wayward Folly...” - an Analysis of Public Response to a Proposal to Rename Streets in Central Pietermaritzburg', *Nomina Africana*, 17(2), pp. 1–36.
- Hobsbawm, E. (1983) "Introduction: Inventing Traditions" in Hobsbawm, E. and Ranger, T. (eds) *The Invention of Tradition*. Cambridge: Cambridge University Press, pp. 1–14
- Hobsbawm, E. J. & Kertzer, D. J. (1992) *Anthropology Today* 8, (1), pp. 3–8
- Hoelscher, S. & Alderman, D. H. (2004) 'Memory and Place: Geographies of a Critical Relationship', *Social and Cultural Geography*, 5(3), pp. 347–355.

- Horsman, S. (2006) 'The politics of toponyms in the Pamir mountains', *Area*, 38(3), pp. 279–291.
- Hough, C. (2012) 'Linguistic levels: onomastics' in Bergs, A. and Brinton, L.J. (eds) *English Historical Linguistics: An International Handbook*. Series: Handbooks of Linguistics and Communication Science, 1 (34.1). Berlin: De Gruyter Mouton, pp. 212–223.
- Hough, C. (2016) 'Introduction', in Hough C. (ed.), *The Oxford Handbook of Names and Naming*. Oxford: Oxford University Press, pp. 1–13.
- Irvine, J. T., and Gal, S. (2000) 'Language ideology and linguistic differentiation', in P. V. Kroskrity, (ed) *Regimes of language: Ideologies, politics, and identities*. Santa Fe: School of American Research Press, pp. 35–84.
- Jett, S. C. (1997) 'Place-Naming, Environment, and Perception among the Canyon de Chelly Navajo of Arizona', *Professional Geographer*, 49(4), pp. 481–493.
- Johnson, M.. 2007. *Ideas of landscape*. Malden: Blackwell Publishing.
- Jongerden, J. (2009) 'Crafting Space, Making People: The Spatial Design of Nation in Modern Turkey', *European Journal of Turkish Studies*, 10, pp. 2–20. <http://ejts.revues.org/4014>
- Jordan, P. (2009) 'Place names as ingredients of space-related identity', *Wiener Schriften zur Geographie und Kartographie* (18), pp. 33–39.
- Kahraman, C. (2013) 'Rêzenivîsek li ser hinek stranên Nêzdîroka Me-14: (Tew Dinyayê) Li ser Kîlame 'Eliyê Xwarziya û Têlî Hemze an jî Çemê Çetelê, *Kelha Amed*, (19), pp. 25–30.
- Kalkan Parlak, G. (2014) *Gaziantep İli Yer Adları Üzerine Bir İnceleme*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Fırat Üniversitesi.
- Kara, B. (2012) 'Kentler Açısından Mekânın Toplumsallığı ve Yer İsimlerinin Siyasal Yapıya Göre Değişimi: Niğde Örneği', *Zeitschrift für die Welt der Türken, Journal of World of Turks*, 4 (1), pp. 149–163.

- Kardaş, C. (2017) *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi: Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme*, Ankara: Eğiten Kitap.
- Kardaş, C. (2018) 'Toprakta Aranılan Şifa: Muş Türbeleri', *Bingöl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 8 (16), ss. 273–284.
- Kardaş, C. (2019) 'Dengbêjlikte Tür ve Şekil Tasnifleri Üzerine Bir Değerlendirme', *Uluslararası Dengbejlik Kültürü ve Dengbejler Sempozyumu*. Şırnak, ss. 39–51.
- Kardaş, C. (2019) 'The Legacy of Sounds in Turkey: Âşıks and Dengbêjs' in Özdemir, U., Hamelink, W. And Greve, M. (eds) *Singer-Poet Traditions in Eastern Anatolia*. Baden-Baden: Ergon Verlag, pp. 37–51.
- Kari, J. (1989) 'Some Principles of Alaskan Athabaskan Toponymic Knowledge' In K. M. R. and Hoenigswald, H. M., (eds) *General and Amerindian Ethnolinguistics Remembrance of Stanley Newman*. New York: Mouton de Gruyter, pp. 129–149.
- Kari, J. and J. A. Fall, (eds) (2003) *Shem Pete's Alaska: The Territory of the Upper Cook Inlet Dena'ina*. Fairbanks, AK: Alaska Native Language Center, University of Alaska.
- Katz, Y. (1995) 'Identity, Nationalism, and Placenames: Zionist Efforts to Preserve the Original Local Hebrew Names in Official Publications of the Mandate Government of Palestine', *Names*, 43(2), pp.103–118.
- Kaya, E. (2008) '1877-1878 Harplerinde Ağrı Bölgesinde Göç Hareketleri', *Erzincan Eğitim Fakültesi Dergisi*, 10(1), ss. 203–210.
- Kaya, F., Karataş, Y. ve Özgül, İ. (2014) 'Erzurum Vilayeti Bayezid, Diyadin, Karakilise, Tutak ve Eleşkirt Kasabalarının 1913 yılı Sıhhi ve İctimai Coğrafyası', *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 29 (7), pp. 562–572.
- Kelley, K., and Francis, H. (2005) 'Traditional Navajo maps and wayfaring' *American Indian Culture and Research Journal*, 29 (2), pp. 85–111.
- Kevirbirî, S. (2009a) *Filîte Quto*. Stenbol: Do.

- Kevirbirî, S. (2009b) *Sedsala Qêrînekê: Karapetê Xaço*. Stenbol: Do.
- Koç, Y. (2020) *Nomadic Pastoral Tribes at the Intersection of the Ottoman, Persian and Russian Empires (1820s-1890s)*, Unpublished PhD Thesis, Boğaziçi University.
- Koraltürk, M. (2003) 'Milliyetçi Bir Refleks: Yer Adlarının Türkleştirilmesi', *Toplumsal Tarih*, 117 (19), pp. 98–99.
- Kostanski, L. (2009) *What's in a Name? Place and Toponymic Attachment, Identity and Dependence. A case study of the Grampians (Gariwerd) National Park name restoration process*, Unpublished PhD Thesis, University of Ballarat.
- Kostanski, L. and Puzey, G. (2016) 'Trends in Onomastics: An introduction', in: Puzey, G & Kostanski, L. (eds) *Names and Naming*. Bristol, UK: Multilingual Matters, pp. xi–xxiv.
- Köylerimiz, 1 Mart 1968 Gününe Kadar* (1968) TC. İçişleri Bakanlığı İller İdaresi Genel Müdürlüğü, Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Kuran, İ. (2010) *The Practice of Renaming Places in Turkey: An Anthropological Perspective on Spatio-Temporal Politics*, Unpublished Master's Thesis, Boğaziçi University.
- Lakoff, R. T. (2001) 'Nine Ways of Looking at Apologies: The Necessity for Interdisciplinary Theory and Method in Discourse Analysis', in Schrifin D., Tannen D. and Hamilton, H. E., (eds) *The Handbook of Discourse Analysis*. Massachusetts: Blackwell.
- Lefebvre, H. (2019) *Mekanın Üretimi*. (Işık Ergüden, wer.), İstanbul: Sel.
- Lewicka, M. (2008) 'Place attachment, place identity, and place memory: Restoring the forgottencity past', *Journal of Environmental Psychology*, 28 (3), pp. 209–231.
- Lewis, G. (1999) *The Turkish Language Reform, A Catastrophic Success*. Oxford: Oxford University Press.

- Lewis, P. G. (1982) 'The politics of Iranian place-names', *The Geographical Review*, 72, pp. 99–102.
- Liakos, A. (2008) 'Hellenism and the Making of Modern Greece: Time, Language, Space' in K. Zacharia (ed) *Hellenisms: culture, identity, and ethnicity from antiquity to modernity*. Burlington, VT: Ashgate Publishing, pp. 201–236.
- Light, D. (2004) 'Street names in Bucharest 1990-1997: exploring the modern historical geographies of post-socialist change', *Journal of Historical Geography*, 30(1), pp. 154–72.
- MacDonald, S. (2017) "*Dh'fheumadh iad àit' a Dheanamh*" (*They Would Have to Make a Place*): *Land and Belonging in Gaelic Nova Scotia*. Unpublished Ph.D. Thesis, Memorial University.
- Mack, N., Woodsong, C., Macqueen, K. M., Guest, G. and Namey, E. (2005) *Qualitative research methods: A data collector's field guide*. North Carolina: Family Health International.
- Malmîsanij, M., (2012) *Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî*. İstanbul: Rûpel.
- Manzo, L. (2005) 'For better or worse: exploring multiple dimensions of place meaning', *Journal of Environmental Psychology*, (25), pp. 67–86.
- Massey, D. (1984) *Spatial Divisions of Labour: Social Structures and the Geography of Production*. London: Macmillan.
- Minorsky, V. (1957) 'Mongol Place-names in Mukri Kurdistan' *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, 19(1), pp. 58–81.
- Myers, G. A. (2009) 'Naming and Placing the Other: Power and the Urban Landscape in Zanzibar', in L. D. Berg and J. Vuolteenaho (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*, Aldershot: Ashgate, pp. 85–100.
- Neyzi, L. (2013). "*Ben Kimim?*" *Türkiye'de Sözlü Tarih, Kimlik ve Öznellik*. (Hande Özkan, çev.), İstanbul: İletişim.

- Nicolaisen, W. F. H. (1961) 'Field-work in place-name research', *Studia Hibernica*, 1, pp. 74–88.
- Nicolaisen, W. F. H. (1973) 'Place-names in traditional ballads', *Folklore*, 84, pp. 299–312.
- Nicolaisen, W. F. H. (1974) 'Names as Verbal Icons', *Names*, 22(3), pp. 104–110.
- Nişanyan, S. (2010) *Adını Unutan Ülke: Türkiye'de Adı Değiştirilen Yerler Sözlüğü*. İstanbul: Everest Yayınları.
- Nişanyan, S. (2011) *Hayali Coğrafyalar: Cumhuriyet Döneminde Türkiye'de Değiştirilen Yeradları*. İstanbul: Tesev Yayınları.
- O'Shea, M. (2004) *Trapped between the Map and Reality. Geography and Perceptions of Kurdistan*. New York and London: Routledge.
- Oliveira, K. (2009) 'Wahi a Kāhiko: Place Names as Vehicles of Ancestral Memory' *AlterNative: An International Journal of Indigenous Peoples*, 5(2), pp. 100–115.
- Ong, W. J. (2002) *Orality and Literacy*. London and New York: Routledge.
- Öçal, S. (2021) 'Navên Jîngeh û Teşeyên Erdnîgarî li Herêma Dêrikê (Lêkolîneka Onomastîk)', *Folklor û Ziman*, 2 (1), rr. 29–60.
- Öçal, S. (2016) *Awayê Lêkirina Navan li Herêma Dêrikê (Vekolîneka Onomastîk-Sosyolojîk)*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardin Artukluyê.
- Öktem, K. (2003) 'Creating the Turk's Homeland: Modernization, Nationalism and Geography in Southeast Turkey in the late 19th and 20th Centuries' *Paper for the Socrates Kokkalis Graduate Workshop*, The City: Urban Culture, Architecture and Society.
- Öktem, K. (2004) 'Incorporating the time and space of ethnic "other": nationalism and space in Southeast Turkey in the nineteenth and twentieth centuries', *Nations and nationalism*, 10(4), pp. 559–578.

- Öktem, K. (2008) 'The Nation's Imprint: Demographic Engineering and the Change of Toponymes in Republican Turkey' *European Journal of Turkish Studies* 7. DOI: <https://doi.org/10.4000/ejts.2243>
- Öktem, K. (2020) 'Erasing Palimpsest City' in Yacobi, H. and Nasasra, M. (eds) *Routledge Handbook on Middle East Cities*. London: Routledge, pp. 295–318.
- Ölçer, E. (2014) *Sokak Şehir Hafıza, Kuyulu'dan Biçki Yurdu'na Osman Nuri Ergin ile Sokak Adları*. İstanbul: Zeytinburnu Belediyesi Yayınları.
- Önen, A. (2020) *Erdnîgariya Kurdistanê-I: Agirî*, İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları.
- Öpengin, E. (2011) *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*. Stenbol: Avesta.
- Özağaçhanlı, Z. (2013) 'Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikâye Anlatıcılığı: Dengbêjlik Geleneği', *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*. Bingöl, ss. 788–807.
- Özberk, N. (2018) 'Mekânsal Semiyotik ve Politik Semantik Açısından Kentsel Metnin Dönüşümü: Nevşehir'de Kamusal Mekân İsimlendirmeleri Örneği', *İdealkent*, 9(24), ss. 662–700.
- Özbilge, N. (2020) *Çekirgeler, Kürtler ve Devlet: Erken Cumhuriyet Dönemine Yeniden Bakmak*. İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Özkan, M. ve A. C. Yoloğlu (2005) 'Bir bellek projesi olarak sokak isimlendirmesi: Ankara örneği', *Planlama*, (34), ss. 54–62.
- Özkırımlı, U. (1999) *Milliyetçilik Kuramları Eleştirel Bir Bakış*. Sarmal Yayınevi: İstanbul.
- Palonen, E. (2008) 'The City Text in Post-Communist Budapest: Street Names, Memorials, and the Politics of Commemoration', *GeoJournal*, 73(3), pp. 219–230.

- Patton, M. Q. (2002) *Qualitative research and evaluation methods*. California: Sage Publication.
- Penrose, J., (2002) 'Nations, States and Homelands: Territory and Territoriality in Nationalist Thought', *Nations and Nationalism*, 8 (3), pp. 277–297.
- Pilancı, H. (1996) *Anadoluda'ki Türkçe Yer Adları*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Erciyes Üniversitesi.
- Pile, S. & Keith, M. (1997) *Geographies of Resistance*. London: Routledge.
- Pipitone, K. E. (2019) *Mapping Ideologies: Place Names in Glacier National Park* Unpublished Master's Thesis, The University of Montana.
- Proshansky, H. M. (1978) 'The City and Self-identity', *Environment and Behavior*, 10, pp. 147–169.
- Relph, E. (1976) *Place and Placelessness*. London: Pion.
- Rofe, M.W. and Szill, G. (2009) 'Name Games 1: Place Names as Rhetorical Devices', *Landscape Research*, 34(3), pp. 361–370.
- Rosaldo, R. (1986) 'Ilongot Hunting as Story and Experience', in Turner, V. W. and Bruner, E. M. (eds) *The Anthropology of Experience*. Urbana and Chicago: University of Illinois Press, pp. 97–138.
- Rose-Redwood, R. & Alderman, D. (2011) 'Critical interventions in political toponymy', *ACME: An International E-Journal for Critical Geographies*, 10(1), p. 1–6.
- Rose-Redwood, R. S. (2008) "'Sixth Avenue is now a Memory': Regimes of Spatial Inscription of the Performative Limits of the Official City-text', *Political Geography*, 27(8), pp. 875–894.
- Rose-Redwood, R. S. (2011) 'Rethinking the agenda of political toponymy', *ACME: An International E-journal for Critical Geographies*, 10(1), pp. 34–41.

- Rose-Redwood, R. S. (2018) 'From Number to Name: Symbolic Capital, Places of Memory, and the Politics of Street Renaming in New York City', *Social and Cultural Geography*, 9(4), pp. 432–452.
- Rose-Redwood, R., Alderman, D. and Azaryahu, M. (2010) 'Geographies of toponymic inscription: New directions in critical place-name studies', *Progress in Human Geography*, 34(4), pp. 453–470.
- Rose-Redwood, R., Alderman, D. and Azaryahu, M. (2018) 'The Urban Streetscape as Political Cosmos' in Rose-Redwood, R., Alderman, D. and Azaryahu, M. (eds) *The Political Life of Urban Streetscapes: Naming, Politics, and Place*: New York: Routledge, pp. 1–24.
- Sancar, M. (2016) *Geçmişle Hesaplaşma: Unutma Kültüründen Hatırlama Kültürüne*. İstanbul: İletişim.
- Saparov A. (2003) 'The alteration of place names and construction of national identity in Soviet Armenia', *Cahiers du Monde Russe*, 44(1), pp. 179–198.
- Saparov A. (2017) 'Contested spaces: the use of place-names and symbolic landscape in the politics of identity and legitimacy in Azerbaijan', *Central Asian Survey*, 36(4), pp. 534–554.
- Sarıtaş, S. (2010) *Articulation of Kurdish Identity Through Politicized Music of Koms*, Unpublished Master's Thesis, Middle East Technical University.
- Scalbert-Yücel, C. (2009) 'The Invention of a Tradition: Diyarbakır's Dengbêj Project', *European Journal of Turkish Studies* (10), DOI : 10.4000/ejts.4055
- Schäfers, M. (2015) 'Being sick of politics: the production of dengbêjî as Kurdish cultural heritage in contemporary Turkey', *European Journal of Turkish Studies*, (20) DOI: 10.4000/ejts.5200
- Schäfers, M. (2019) 'Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey', *Comparative Studies in Society and History*, 61(2), pp. 447–473.

- Schudson, M. (1997) Dynamics of Distortion in Collective Memory, in Schaacter, D.L. (ed) *Memory Distortion: How Minds, Brains, and Societies Reconstruct The Past*. London: Harvard University Press, pp. 346–364.
- Scott, J. C., Tehranian, J., and Mathias, J. (2002) ‘The Production of Legal Identities Proper to States: The Case of the Permanent Family Surname’, *Comparative Studies in Society and History*, 44(1), pp. 4–44.
- Skutnabb-Kangas, T. & Bucak S. (1995) ‘Killing of a mother tongue: how the Kurds are deprived of linguistic human rights’, in Skutnabb-Kangas, T. and Robert Phillipson (eds) *Linguistic human rights: overcoming linguistic discrimination*, Berlin & New York: Mouton de Gruyter, pp. 347–370.
- Skutnabb-Kangas, T. (2006) ‘Language Policy and Linguistic Human Rights’, Ricento, T. (ed) *An Introduction to Language Policy: Theory and Method* Oxford: Blackwell Publishing, pp. 273–291.
- Smith, A. D. (1994) *Milli Kimlik*, (Bahadır Sina Şener, çev.), İstanbul: İletişim Yayınları.
- Soja, E. W. (1989) *Postmodern Geographies: The Reassertion of Space in Critical Social Theory*. London: Verso Press.
- Son Teşkilât-ı Mülkiyede Köylerimizin Adları* (1928) İstanbul: T.C. Dâhîliye Vekâleti.
- Swanepoel, N. (2009) ‘Capital Letters: Material Dissent and Place Name Change in the ‘New’ South Africa, 2005–2006’, *Anthropology Southern Africa*, 32(3 & 4), pp. 95–105.
- Szurek, E. (2020) “Yan, Of, Ef, Vic, Ic, Is, Dis, Pulos...”: The Surname Reform, the “Non-Muslims and the Politics of Uncertainty in Post-genocidal Turkey”, In den Berg, H. M., Summerer, K. S., and Baarda, T. (eds) *Arabic and its alternatives: Religious minorities and their languages in the emerging nation states of the middle east (1920–1950)*. Leiden/Boston: Brill, pp.77–110.

- Şahin, G. (2010) 'Türkiye'de Yapılmış Toponomi Çalışmaları', *Adıyaman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, 3(4), pp. 134–156.
- Şahin, İ. (2013) 'Türkiye Yeradbiliminde Terim ve Tür Sınıflandırması Sorunları', *Avrasya Terim Dergisi*, 1(1), pp. 46–58.
- Şenel, M. (2013) *Elazığ İli Yer Adları*. Ankara: Manas Yayıncılık.
- Tarduş, İ. (2007) 'Navnasî (Onomastiques, Onomastic Science)', di Subaşı, K. û Geyik, R. (ed.) *Gotarên Zimannasiyê*. Stenbol: Nûbihar, rr. 237–241.
- Tent, J. and Slatyer H. (2009) 'Naming Places on the 'Southland': European Place-naming Practices from 1606 to 1803', *Australian Historical Studies*, 40(1), pp. 5–31.
- Thevenin, M. (2011) 'Kurdish transhumance: Pastoral practices in South-east Turkey', *Pastoralism: Research, Policy and Practice*, 1(23), pp. 1–24.
- Thomas, T. (2009) 'Topogenic forms in New Georgia, Solomon Islands', *Sites*, 6(2), pp. 92–118.
- Thornton, T. (1997) 'Anthropological Studies of Native American Place Naming', *American Indian Quarterly*, 21(2), pp. 209–228.
- Thornton, T. (2008) *Being and place among the Tlingit*. Seattle: University of Washington Press.
- Till, K. E. (2003) *Places of Memory*. In Agnew, J., Mitchell, K. and Toal, G. (eds) *A Companion to Political Geography*, UK: Blackwell.
- Topuz, M. (2008) *Rû û Kûr*. Stenbol: Avesta.
- Tuan, Yi-Fu (1991) 'Language and the Making of Place. A Narrative-Descriptive Approach', *Annals of the Association of American Geographers*, 81(4), pp. 684–96.
- Tulius, J. (2012) *Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai - Indonesia*. Unpublished PhD Thesis, Leiden University.

- Tunçel, H. (2000) 'Türkiye'de İsmi Değiştirilen Köyler', *Firat University Journal of Social Science*, 10(2), pp. 23–24.
- Türkoğlu, S. (2018) *Eleştirel Toponimi Bağlamında Toplumsal Hafızanın Mekandaki Kodları: Bomonti'de Yer İsimleri*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, İstanbul Teknik Üniversitesi.
- Türköz, M. (2018) *Naming and Nation-Building in Turkey. The 1934 Surname Law*. New York: Palgrave Macmillan.
- Ulugana, S. (2005) 'Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê', tê de Pertev, R. (ed) *Edebiyata Kurdiya Gelêrî: Dîrok, Teorî, Rêbaz, Lîteratur, Berawirdî l*. İstanbul: Avesta.
- Ulugana, S. (2012) *Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı (1926-1931)*. İstanbul: Perî Yayınları.
- Umar, B. (1993) *Türkiye'de Tarihsel Yer Adları*, İstanbul: İnkılap Kitapevi.
- Vali, A. (2017) Kürtler ve "Ötekileri": Parçalanmış Kimlik ve Parçalanmış Politika (Cabbar, F. A. and Davud, H. der.) *Kürtler: Milliyetçilik ve Politika*. (Emine Ayhan, çev.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Vansina, J. (1985) *Oral Tradition as History*. Wisconsin: University of Wisconsin Press.
- Vuolteenaho, J. and Berg, D. L. (2009) 'Towards Critical Toponymies', in L. D. Berg and J. Vuolteenaho (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*, Aldershot: Ashgate, pp. 1–18.
- Vuolteenaho, J. and Puzey, G. (2018) "Armed with an Encyclopedia and an Axe": The Socialist and post-Socialist Street Toponymy of East Berlin Revisited through Gramsci', in Rose-Redwood, R., Alderman, D., and Azaryahu, M. (eds) *The Political Life of Urban Streetscapes: Naming, Politics, and Place*. London and New York: Routledge, pp. 74–97.
- Wang, F. (2016) 'Theory study of urban memory', in *Beijing Urban Memory*. Singapore: Springer, pp. 1–10.

- Wanjiru, M. W., (2018) *Toponymy and the Spatial Politics of Power on the Urban Landscape of Nairobi Kenya*, Unpublished PhD Thesis, University Of Tsukuba.
- Webster, A. (2004) 'Coyote poems: Navajo poetry, intertextuality, and language choice', *American Indian Culture and Research Journal*, 28 (4), pp. 69–91.
- Webster, A. (2006) "Alk'idaa' Ma'ii jooldlosh, jini": Poetic devices in Navajo oral and written poetry, *Anthropological Linguistics*, 48(3), pp. 233–65.
- Wessing, R. (2001) 'Telling the Landscape: Place and Meaning in Sunda (West Java)', *Moussons*, 4, pp. 33–61.
- Wessing, R. (2001) 'Telling the landscape: Place and meaning in Sunda (West Java)', *Moussons*, 4, pp. 33–61.
- Wilkinson, M., Dr R. Marika and N. M. Williams (2009) 'This place already has a name', in *Aboriginal Placenames: Naming and Re-naming the Australian Landscape*. H. Koch and L. Hercus (eds), Aboriginal History Monograph 19, ANU E Press and Aboriginal History Incorporated, Canberra, pp. 403–462.
- Willems, K. (2000) 'Form, Meaning and Reference in Natural Language. A Phenomenological Account of Proper Names', *Onoma*, (35), pp. 85–119.
- Yalım, İ. (2002) 'Ulus Devletin Kamusal Alanda Meşruiyet Aracı: Toplumsal Belleğin Ulus Meydanı Üzerinden Kurgulanma Çabası', (Güven Arif Sargın, der.) *Başkent Üzerine Mekân Politik Tezler Ankara'nın Kamusal Yüzleri*. Ankara: İletişim Yayınları.
- Yeh, Y. T. (2013) "'Erased Place Names" and Nation-Building: A Case Study of Singaporean Toponyms', *Asia-Pacific Research Forum*, nr. 59, pp. 119–155.
- Yeni Tabii Yer Adları 1977*, Yeni, Eski ve İllere Göre Dizileri (1977) Ankara: İller İdaresi Genel Müdürlüğü Yayınları.
- Yeoh, B. S. (1992) 'Street names in colonial Singapore', *Geographical Review*, 82(3), pp. 313–322.

- Yeoh, B. S. (2009) 'Street-Naming and Nation-Building: Toponymic Inscriptions of Nationhood in Singapore', in Berg L. D. and Vuolteenaho, J. (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, pp. 71–84.
- Yıldırım F. ve Dursunoğlu B. (2012) 'Ad Alınır mı Verilir mi?: Bingöl'deki Soyadları Bağlamında Bir Çalışma', *II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu*, Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları, ss. 792–811.
- Yıldız, A. (2001) "*Ne Mutlu Türküm*": *Türk Ulusal Sınırlarının Etno-Seküler Sınırları (1919-1938)*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Yuval-Davis, N. (2011) *The politics of belonging: intersectional contestations*. London, United Kingdom: Sage.
- Yüce, C. B. (2019) "Identity Construction through Language: The Case of the Turkish Language Reform", *OMNES: The Journal of Multicultural Society*, 9(2), pp. 100–117.
- Yüksel, A. (2013) 'Trabzon Vilâyetinde Yer Adlarını ve İdari Yapıyı Değiştirme Girişimleri' içinde *Doğu Karadeniz Araştırmaları*, İstanbul: Kitapevi, ss. 1–24.
- Yüksel, M. (2011) *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960*. Unpublished PhD Thesis, University of Chicago.
- Yüksel, M. (2016) 'On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra' *Middle Eastern Studies*, 52 (4), pp. 656–676.
- Yüksel, M. (2019a) 'Dilşa'nın Babasına Ağıt: Ruslar, Dengbêjler ve Bulanık Savaşı', içinde Çağlayan, E. (ed) "*Burası Muştur*": *Tarih, Toplum, Kültür ve Edebiyat*. İstanbul: Pınar Yayınları, ss. 325–358.
- Yüksel, M. (2019b) 'Oral Poets in Conflict: Âşık Veysel and Dengbêj Reso on the Rope', *Journal of Folklore Research*, 56(1), pp. 71–103.

- Zelinsky, W. (1983) 'Nationalism in the American Place-Name Cover', *Names: A Journal of Onomastics*, 31(1), pp. 1–28.
- Zelinsky, W. (1997) 'Along the frontiers of name Geography', *The Professional Geographer*, 49, pp. 465–466.
- Zeydanlioğlu, W. (2012) 'Turkey's Kurdish language policy', *International Journal of the Sociology of Language*, 217, pp. 99–125.

Çavkaniyên Elektronîk

- Anderson, J. (2002) 'On the Grammar of Names' <http://www.fb10.uni-bremen.de/linguistik/dpng/pdf/Anderson2002OnTheGrammarOfNames.pdf> (15. 04. 2019).
- Cnnturk* (2015) 'Ağrı'da bazı mahalle ve cadde isimleri değiştirildi', 2 Adar. Berdest e: <https://www.cnnturk.com/haber/turkiye/agrida-bazi-mahalle-ve-cadde-isimleri-degistirildi> (Gihandin: 14.10. 2020).
- Hough, C. "What is onomastics?": <http://onomastics.co.uk/> (08. 04. 2019)
- Milliyet* (2016) 'Ağrı'da taksi duraklarının isimleri Türkçe ve Kürtçe yazıldı', 4 Adar Berdest e li: <https://www.milliyet.com.tr/yerel-haberler/agri/agri-da-taksi-duraklarinin-isimleri-turkce-ve-kurtce-yazildi-11247754> (14.10. 2020)
- Muhammed, H. (2015) 'Navnasî anku Onomastîk', *Zimannas*. <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/12/navnasi-anku-onosmatik/> (Gihandin: 17. 06. 2020)
- Nişanyan, S. 'Index Anatolicus: Türkiye Yerleşim Birimleri Envanteri' <http://www.nisanyanmap.com>
- NTV* (2009) 'Erdoğan: Atatürk de Norşin diyor!', 11 Tîrmeh. Berdest e li: <https://www.ntv.com.tr/turkiye/erdogan-ataturk-de-norsin-diyor,YRvTMaJO8UC-KfaacJWxpQ> (Gihandin: 11. 05. 2020).
- NTV* (2009) 'Güroymak Norşin olmak istiyor', 11 Tîrmeh. Berdest e li: <https://www.ntv.com.tr/turkiye/guroymak-norsin-olmak-istiyor,aWZCBW9UWkmOgOVvsf9ABw> (Gihandin: 11. 05. 2020).

Çavkaniyên Arşîvê

BOA, İ.DH. 1487.10 (03.04.1329)
BOA, DH.KMT. 918.8 (19.10.1322)
BOA, ŞD 1717.36 (02.06.1310)
BOA, ŞD 2223.25 (12.08.13.10)
BOA, I.DH. 1248.97802 (26.03.1309)
BOA, BEO 572.42879 (21.08.1312)
BOA, DH.KMT. 1978.92 (02/01/1310)
BOA, ŞD 1512.5 (02.12.1309)
BOA, AE.SAMD.III. 157.15.363 (29.06.1126)
BCA, 30.10.0.0/240.624.2 (01/08/1932)
BCA, 30.18.1./36.38.12 (23.05.1933)
BCA, 30.18.1.2/54.33.16 (04.05.1935)
BCA, 30.18.1.2/80.100.14 (10.12.1937)
BCA, 30.18.1.2/60.91.10 (29.11.1935)
BCA, 30.11.1.0/369.45.15 (08.09.1971)
BOA, HRT.h 445 (29.12.1333)

Karakilise Haritası (1327). İstanbul: Erkan-ı Harbiye-i Umumiye Matbaası. Arşiv No: HRT 00019. TBMM Kütüphanesi Mikro Film Arşivi.

‘Persia, Russia & Turkey in Asia’ [52r] (1/2), British Library: India Office Records and Private Papers, IOR/L/PS/12/3480, f 52, in Qatar Digital Library.

PÊVEK

A. Li ser navê Avzihayê hevpeyvîn bi Nenêya Reşîd re¹⁸¹

Avziha hebû, paleke aha aliyê rêya Çatê va ye. Yanê gişk çavkanî ne, şax in, ha navê wê jî Avziha ye. Ez bêjim eva şaxa jor da hatiye. (Pala li hember îşaret dike), ha şaxa Nizarê ça jor da hatiye, vê şaxê de av heye, vê da heye...

- Ê çima gotine Avziha?

- Navê wê Avziha bûye. Îşte evana Resûlê kurapê min û Cewê va (...) Bavê min Resûlê kurê kalikê min Îsmâîl wira ew bir, Cewê. Diya min sond dixwar digot guliya Cewê mêtrokî zêdetir bûye, sond dixwar. Mêtrok got hindik bû. Got Resûl Cewê hez dike, Cewê dibêje Resûl ez te nastînim. Tu genc î, ez jî qîz im. Ez te nastînim. Resûl jî dibêje tu bimirî ez ê te bistînim. Ew jî dibêje welleh tu bimirî qet îmkana ku bavê te were xwazgîniyê min, ez bêjim eva ez ê kurê te bistînim tune ye, ez te nastînim, *boşîne* serê xwe neêşîne.

- Ê paşê ça bû?

Wisa Resûl zikê xwe de dike kul. Soqaqekî de rastê keçikê tê, keçikê ra dibêje, keçik jê ra dide xebera. Nastînee... Dibe biharr...(Ez hatibûme vê malê haa, pey min ra).

Diçin qîz bûk, dibêjin em ê herin ji Avzihayê, caxê bînin. Avziha jî tam ciyê caxê bû. Te wan palan dinihêrî her tûmekî caxê gewr dikir, kînkork digirt serê wan... Aaa diçin caxa xwe diçinin. Bîst heb jin, sî heb, hê zef. Ji xwe ra diçinin, ji xwe ra qûç qûçî dibin, cem hev. Xwe ra her kes caxa xwe pûrt dike. Resûl pey wan diçe, diçe tanga Cewê, hema guliya Cewê digire, jêr va li milê xwe dialîne heta jorê. Ê por e, kaş dikî rihê merivan diçe. Kir nekir jina îmkana porê Cewê destê Resûl derê tune. Jin xwe digihîninê. Zîtola çekan li ser nahêlin, çekan gişkî qet qetî dikin. Şalê wî dikine du qetan jê dixin. Çakê wî, çekên wî..Tişte li ser namîne, heşa donê wî tenê. Tîne dikin nakin çare lê nabînin. Cewê hildide û diçe. (Min got ba li we bikeve hema ça darek li milê wî da bidayê Cewê ji destan derdiket...).

¹⁸¹ Ev xeberdana BJ-10 (Nenêya Reşîd) bersiva vê pirsê bû: "Navê çayîr û zozanên gundê we çi bûn?"

Weleh Cewê hildide diçe derdixê qevaxa Çatê. Qewax jî qarşî çatê va ye. Avziha aha valî rêya Çerkez e. Qewax walî aliyê Çatê ye. Dibe, diçe nava qewaxê, tezzî û rût e diha, wisa kirine zox kirine pirî danê. Dibe êvar, Cewê hildide dibe, diçe mala xaltiya min a Cemîlê. Kurro dibêje Resûl eva çi ye, te aniye? Wellehîn dibêje ez jê hez dikim, Cewê min nestand, min aniye. Rabin, dibêjin em herin mala Faqo (Fayîq). Dibêje ji Gapira werin wê te ji me bistînin, biherin. (Resûl) dibêje, welleh tu me dibî ku tu dizanî. Radibe hinek çek-mek xaltiya min didê, li xwe dike. Erebe merebe motor...

- Cewê wê çaxê nabêje çi?

- Cewê hildide, dibe, diçe. Cewê ketiye kap. Nabêje na.

Hildide, dibe diçe Gapira mala bavê min. Wî şevê li mala bavê min dimîne, xaltiya min a Cemîle jî pê ra diçe, li wira dimînin. Sibê Fayîq xeberê dişîne, dibêje bêje xalê Silo, Resûl qîza wî aniye mala me, çi dibêje anegorî wî qîza wî *dişinmîş* bin. Qîza wî hildidin dibin diçin, disene sibê. Cewê dibêje xaltiya Ciwahir, dibêje ha, qet dengê xwe nekin. Çima hûn ditirsin. Dibêje em ê sibê herin qereqolê, dibêje bavê min ê jî were. Dibêje qereqolê îfada min girt. Qîza min eviya te revandiye yan te ew revandiye? Tu li şexsê min mêze û tîpa wî mêze. Dibêje ez ê bibêjim ew tixayekî çar peran e, dikare qîzeke mîna min birevîne. Min ew revandiye.

- (W)isa dibêje?

- Erêê...

A dibe sibe, sibe Silo ewana ji Gapira diha merivên wan hebûne tîne. Keçikê hildidin, diçine qereqolê. Berê îfada keçikê digirênê. Dibêjin qîza min te eva şexsa revandiye yan wî te revandiye? Dibêje tu li şexsê min mêze û tîpa wî mêze. Ew tixayekî çar peran e, yê mîna wî dikare qîzeke mîna min birevîne. Hema Silo jor de dibêje teq dikeve erdê. Hema ça li wira got Silo *qelp qirîzî* kir kete erdê. Qet diya min digot deqekî nese kinî. Got welleh qet îfada gende jî negirtin... Cewê dane gende, me hilda bire malê. Bavê wê hildan birine Erziromê bi rê va mir. Hildan anîn.

Weleh diya min got me Cewê hilda anî hate mala xwe. Mehra wan birî, mele anî. Hefteyekî li mala me man. (...) Got welleh hefteke Silo tamam bû. Em rabûn, ez

xaltiya min a Cemîle, Fayîqê birayê min, Cewê, Ezedîn erebê wê çaxê motor bû, çi bû, siyar bûn got em çûne mala Silo. Selam aleykîm, aleykîm selam. Got millet walî valî çevan nihêrî. Diya wê got ez keça xwe bikujim. Ez ne dikarim qîza xwe bikujim, ne zavayê xwe bikujim. Qedera Xwedê bûye, gede hez kiriye, qîza min jî neçûye. Diha ku mecbûr pê ra çû, ku te tasek qûna wê erdê ket çingiya diha, toq davêje. Ku qîza min navê wê pê ra derket mecbûr qîza min ê bide pey. Bavê wê jî hezkirina Xwedê hebûye, bavê wê jî miriye. Ez qîza xwe navêjim derva ku. Mala Ezedîn wira got, Cewê neçû mala xwe. Hefteyekî mala Silo da ma. Şîn û mîna mêrik hinekî dût ket, çilê wî xilas kirin. Got qîza wan serbest dihate mal wan, Resûl jina xwe hildida diçû mala bavê xwe...

B. Kilama bi navê “Dosto” ya Dengbêj Şakiro¹⁸²

Ax de lê lê lê lê lê lê...

Bê de lo lo lo lo lo lo...

Sibe ye minê li dîharê **Xano**, di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**

Minê li dîharê **Xano**, di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**

Le ava **Xano**, di **Mano**, **Malxas**, **Axadeve**

Tê li orta **Boçikmasûriyê**, **Zado**, di **Mano**

Bi **Şariyanê** ra daw dibîne, **Mûradê** ra li hev dikeve

Saet li şeşê di şevê bû

Mi dî destekî sar û cemidî nava singê û berê mi çîlê

Mi başê, mi bozê, mi beyazê

Mi destê goştê bû

Ji mi turê ezrahîlê kulê, melekê mewtê bû

Mi dî destê teresê Dosto bû

Pirte pirta zikê Dosto bû

Fenanî kalê cezebe da

Fenanî hirça di çile da

Fenanî gayê qetil û ecelê wî bê

Gidîno bizivire ji xwe ra li kêra xwe binêre lo lo

Le Dosto sibe ye dilê mi kînekîn e

Zivistan e, çîlê erbaîn e

Tu rabe kûzê avê ji mal bîne

Ser qurênêka derî da welgerîne

Derî veke bila neke di çirîne

¹⁸² Güneş û Şahin (2019b: 405-407).

Heft birayê mi hene çûne raw nêçîrê, li malê nîne
 Pîre dayîka mi, kalê bavê mi ketîne xewê hay ji bayê felekê tunîne
 Tu rabe destê nivîn mi bi xwe ra bibe
 Herem odesiya me ya tewra di jorîn e
 Bikeve nava taxima sing û berê mi çîlê, mi başê, mi bozê, mi beyazê,
 Mi destê goştê, gul û sosinê di xas baxçê bavê te da wisa nîne
 Le Dosto digo de lê lê keçikê
 Dilê min hatinê heye, qam û qidûmê çokê mi tunîne
 Gava mi derî vekir derî dikire di çîrînê
 Minê Ezrahîlê kulê, melekê mewtê tev di piştê dêrî da dîne
 Bîst û çar tamarê nav mila mi mirine
 Tamara binê zimanê mi tenê wa dimîne
 Go le Dosto rebeno
 Stêrka tu dibêjî stêrka sibê nîne, stêrka karwanqirîn e
 Di orta wê û sibê da hê sê saet ji sibê ra ca dimîne
 Ew gelek canik camêrê fenanî te ji ber deriya
 Ji pişt xaniya ji xwe ra dizivirîne
 Go de lê lê keçikê dilê mi hatiyê heye, qam û qidûmê çokê mi tunîne

Go le Dosto rebeno sibeye vê sibengê eger tuyê têtî were
 Gava tu nayê bi sonda temam ji te ra ca sond bixwim
 Ezê ji te ra bi **Horyan Baba** kim
 Bi **Gurgur Baba** kim
 Bi **Uryan Baba** kim
 Bi **Gozel Baba** kim
Dede Mexsûd, Dede Mirad kim
 Ocaxa erdê **Bilîsê** kim
Mala Hecî Heyderî Kêrsê kim

Şêx Ehmedê **Amasiyê** kim
 Bi Seydayê **Taxê** kim
 Şêx Eliyê **Paliyê** kim
 Şêx Şabedînê erdê **Diyarbekirê** kim
 Ocaxa erdê **Xirte** kim
 Şêxê **Çoxreşiyê** kim
 Mala Seydayê **Nêhriyê** kim
 Şêxê **Tiloyê** kim
 Mala Seydayê **Nêhriyê** kim
 Şêxê **Tiloyê** kim
Şêx Eşûrê Erebi ewla seyîd e dostê Xwedê kim
 Şêx Badînê erdê **Dignûgê** kim
 Şêx Evdila şêxê **Milazgirê** kim
 Bi ocaxa **Şêrwêranê, Gogoxlanê, Qizqapanê**
 Şexsan û zaretê serê **Kosedaxê, Gilîdaxê, etegê Sînegê** kim
 Bi Încila Îsa kim, bi Tewrada Mûsa kim
 Bi Zebûra Dawid, bi Qurbana ser çokê Mihemed Mistefa kim
 Eger tuyê têtê were, gava tu nayê
 Herçî sondê min sond xwarine
 Berxê temami xenîmî can û bedenê te û dê û bavê te bi lo lo.

C. Kilama bi navê “Elî Xarza” ya Dengbêj Kerem¹⁸³

Yo, yo, yo, yo, yo,
Axawo bihar e, dilê min î delîl û dubêye
Dilê min î delîl û dubêye
Gulê gote Ruhê ye
Merumê hela rabe, gelo êla me êleke rengîne
Li **zozanê Mûsê** danîne
Hemze Begê go, Temo lawo bike bilezîne
Teng û berê Têcîrê bişidîne
Bajo, ji kela **Bazîda** jorîn nav girtiya cabekê bîne
Cika Elî Xarza heye, yan tunîne
Lo, lo, lo, lo.
Temo kurê Hemzo ye
Hemzo ji mala Şero ye
Ji desta Kor Husêyn Paşa ye
Li kavilya **Îranê** dimîne
Temo teng û berê Têcîrê dişidîne
Dajo dicedîne
Ji **Zozanê Beytê** ra, gelo li **Mûsê** ra
Gulseyîd ra, di **Remo** ra
Di wêrtaza gelo **Axgolê** ra
Axdûzê ra, gelo di **Texterevîr** ra
Di wêrtaza **Qerebaxacê** ra, **Zêrzewala** ra
Dajo dicedîne
Tanga wêrtaza **Kilîsekendê** ra, **Nado** ra

¹⁸³ Gültekin (2013: 215-226).

Dajo dicedîne

Tê wêrtaza **Başkendê**, li **Ortekendê** ra

Kestekê, **Gotqerê** ra, **Qircegolê** ra, **Tewla Hêsiyê** ra

Derkete nav çarsiya **Bazîdê**, serê Têcîrê digire

nav çarsiyê digêrîne

Elî Xarza di hundirê pencerê hepsê da nas dike,

nihêrî wê serê mehînê girtiye digêrîne

Bi eşaretê çeva go, lo-lo peyawo, siyaro, ji te ra

zêrekî qîçîk ji min ra çarsiyê titûnê bîne

Derdê wî titûn nîne

Pirs ke, cika xweyiyê mehînê li kû ye, ya li kû nîne

Temo serê Têcîrê digre pişt dîwarê hepsê dizvirîne

Go, lawo, navê min Temo ye, kurê Hemzo me,

mala min li **Qeleniya** rengîne

Bavê min gotiye, bajo nav kela **Bazîdê** cawekê bîne

Cika Elî Xarza heye, yan tunîne

Lo, lo, lo, lo.

Elî Xarza destê xwe bi kelepçê va nav çevê xwe dixîne

Hêsiya dibarîne

Go, here bêje Xalê minî Hemze Begê del û dîne

Ji boy Xwedê va bira xwe nexapîne

Madam ê ware min ji destê Bînbaşî derîne

Bira pênc roja bajo, ma pênc roj berê min

bide **Ezurma** rengîne

Em heftê yek girtîne

Di nav da ji giştî qamciya li min dixîne

Dibê, Kurdo, ha yûrî, xalê te mêrekî çê ye,
 bira te ware li **Deveboyna Ezurmê** vegerîne
 Serê Têcîrê digire di xanê ra dikişîne
 Zîn-pûsada lê hiltîne
 Kirasê tê wertîne
 Cewê wê dêwîmê xwe hiltîne
 Sibê ra du seet sibe dimîne
 Eynî dîsa siyar bû di riya xwe ra
 Ji **Kestekê, Gotqerê** ra, **Xirnegêdûkê** ra
 Di **Nado, Cemalwêrdîn** ra
 Di wêrtaza **Selema Qûliyê** ra
 Gelo dajo dicedîne di fêza **Kilîsekendê** ra
 Hat derkete **zozanê Mûsa** rengîne
 Gelo bavê wî Hemzo hate pêşiyê, go, Temo
 lawo, te xêr e, yan xêr nîne?
 Go, bavo, min xêr e, tişteki şerê tê tunîne
 Girtî heftê yek girtîne
 Yekî di nav da ye, simbêle reşe narînî lêye
 Stû li lelêye
 Destê wî kelepçêye
 Lingê wî li qeydêye
 Gotiye, bêje xalê minî Hemze Begê del û dîne
 Bira xwe nexapîne
 Ma pênc roj min ji **Bazîdê** rakîn, berê min
 bidin **Ezurma** rengîne
 Dibê xalê te mêrekî çê ye, bira ware te li
 Deveboynê vegerîne

Go, lawo, li êlê neke qêrîn û qêjîne
Siba me sibeke rengîne
Êla me êleke giran e, cî bi cî danîne
Mûso xelqê **Elaşgirê** beled e, ra **Mûso** ji bavê xwe ra bîne
Ahmo bîne, Gêncî bîne
Elo bîne, Mistefa bîne
Evan her pênc siyarê necîmzade maqûle mêrxasîne
Xwedê heye, xem tunîne
Pey tengaya ra firahîne
Lo, lo, lo, lo.

Evan her pênc siyara hiltîne
Ji bo navê Xwedê be, agirê kulê gelo li mala xwe dixîne
Dajo ji wêrtaza **Beytê** ra
Na walle di wêrtaza **Mûsê** ra, **Sazaxir** ra
Gelo **Texterewîr** ra, **Şêrikê** ra
Wêrtaza **Axdûzê** ra, **Wekîl** ra
Gelo gola wêrtaza **Xanê** ra
Sarîçima ra, **Mêrgamiya** ra,
Dajo fêza **Kilîsekendê** ra, **Kevirê Şamiya** ra
Serê **Gela** ra, **Pira Erdê** ra
Tanga **Gurdê** ra dajo dîcedîne
Du roj temam bû, derkete tanga **Taşlıçay**,
wira gundek heye, gundê Ecema **Alegor** e,
wê şevê li wir dimîne
Ewê şevê îstereheta xwe dibîne
Sibê ra du seet sibe dimîne

Radibe teng û bera dişidîne
Eynî di **Lêsko** ra, di **Gundê Pîrê** ra
Tîra Jorîn ra, **Mîrzexan** ra, di **Ava Mesiya** ra
Dajo dicedîne
Gelo di **Nado** ra, tanga **Sînegê** ra
Dajo gelo tanga **Çamûlê** ra
Di **Nawîk** ra gelo tanga **Aşqelê** ra
Di îza ra, di **Cimika** ra, **Kasorê** ra
Qeyabegê ra, binya **Xaçilê** ra
Di kela **Elaşgirê** ra, gelo **Şadya**
Remedana, di **Gapira** ra
Çû derkete orta **Parsînê**, gundek heye li **Çatê** dimîne
Lo, lo, lo, lo.

Li wê derê dajo dicedîne
Mûso go, lo-lo Hemzo, ez xulamê te me
Seyîsê bergîra te me
Te ez bi xwe ra anîme
Îşê me li riya şoşê tunîne
Mêrkê cendirmeyî mirtecîne
Ewê tamamê riya li me bibirin, xêra me bi şoşê tunîne
Emê xwe bavêne quntarî çiya, herne mala
Îbo Begê Condir Axa li **Parsînê** gelo li **Elferengê** dimîne
Ji êvara Xwedê da ji **Çatê** dajo dicedîne
Welgeriya **Parsînê**, evan gundê **Parsînê** ne,
Êltaşê ra, li **Melhamedê** ra, li **Hesenbegê** ra
Teknecixê ra, **Arpecayîrê** ra, **Êxurbuxirê** ra

Tanga **Xecxeliyê** ra, cû derkete **Parsîna jorîn**
 mala Îbo Begê li **Elferengê** dimîne
 Îbo mêrekî zorî zirbe ye, go, Hesên, lawo
 ji bavê xwe ra dûrbînê bîne
 Çar-pênc siyar ketine riya **Parsîna jêrîne**
 Jêl va tîrê, cika van siyara xêr e, yan xêr nîrê
 Îbo Beg dûrbînê li ber çavê xwe digêrîne
 Dûrbîn desta da dikeve li erdê dimîne
 Destê xwe li çonga xwe dixîne
 Go, lawo, van siyara xêr nîrê
 Tu sivik teng berê Rihanê çê bişidîne
 Rima donzde movikî ji bavê xwe ra bîne
 Eva heye, Hemze Begê qaxac e,
 mala wî li **Îranê** xelqê **Romê** nîrê
 Min deh sala mala wî da nîrê wî xweriye,
 qenciye wî li ser min hene, ezê qencîkî
 pê bikim, bila nebê **Parsîn** bêxweyî ye,
 qe kes tê da tunîne
 Teng û berê Rihanê çê dişidîne
 Bi bayê hespê selamê dide, Hemze Beg selama wî hiltîne
 Li dora Hemzo, siyara vediçelqîne
 Bi laqirdî rimê di ser Hemzo da dihejîne
 Go, te digo, ser min ra mîr kes tunîne
 Oro -go- Îbo, lawo, wextê da me ji destê hev gelek dîne
 Wexta min, te laqirdiya nîrê
 Mala te Xwedê ziyaret ke, mala min e, qe farq tunîne
 Îşev îstereheta xwe bibîne

Sibê bajo ji **Hesenqelê** nav girtiya cabekê bîne
 Cika Elî Xarza heye, yan tunîne
 Ewê şevê li mala Îbo dimîne
 Sibê radibe, Îbo li Têcîra Hemze Begê
 siyar dibe, teng û bera dişidîne Dajo ji **wêrtaza Daharê** ra
Xana Delal ra di **Koprîkoyê** ra, **Xuristan** ra
 Derkete **Hesenqela** rengîne
 Serê Têcîrê digire nav çarsiyê digerîne
 Elî Xarza serê xwe ser caxa pencerê dertîne
 Nihêrî Kurmancekî mehîna xalê wî girtiye,
 li çarsiyê digerîne
 Hêsira dibarîne
 Go, eva gelo **Hesenqela** rengîne
 Kifş e, **Romê** xalê min kuştiye, wê mehîna
 wî ji xwe ra anîne
 Lo, lo.
 Bi eşaretê çeva gelo gazî siyar kir, go, birawo,
 ji te ra du hew zêr, here ji min ra çarsiyê titûnê bîne
 Go, beg, derdê min titûn nîne
 Xweyiyê vê mehînê kû ye, ya li kû nîne
 Go, Îbo beg, mala te şewitiyo, navê min heye
 Elî Xarza ye, ez çend sala gelo li hepsa
Bazîdê da mame, hingê evî kurê kerê
 bînbaşî rakirime, berê min da **Ezurma** rengîne
 Em heftê yek girtîne
 Heftê girtî bi hemdê xwe tê, rika xwe kuta
 min, bi orxe bûna hespê qamçiya li min

dixe, mêjî di qafê min da tunîne
 Dibê, xalê te mêrekî çê ye, bira warê te li
 Deveboynê vegeirîne
 Madam xalê min mala te ye, bira xwe neêbişîne
 Ji êvar da bajo, belkê min ji destê vî gurî dertîne
 Îbo gelo serê Têcîrê digire, di xanekê ra dikişîne
 Ewê şevê îstereheta xwe dibîne
 Sibê teng û berê Têcîrê dişidîne
Hesenqelê ra, di **Xuristîn** ra
Xana Delal ra, **Tawîxonce** ra, **Emrekomê** ra
 Hat derkete **Parsîna Jêrîne**
 Hemze Beg li reqabê jorîn sekiniye, pêgermokê digirîne
 Dûrbînê davêje, nihêrî Îbo jêl va tê, usa bi telefîne
 Go, şukir caweka xêrê ji min ra bîne
 Hemze Beg xwe bi sola ra nagihîne
 Bi gora derket pêşiyê, go, Îbo te xêr e, yan xêr nîne?
 Go, begê min, şukir xêr e, tiştêkî şerê tê tunîne
 Min xarziyê te diye
 Yekî simbêl reşî gelo simbêleka narincî lêye
 Stû li lelêye
 Destê wî kelepçêye
 Lingê wî li qeydêye
 Xêncî îro ma pênc roj, gelo rakin,
 berê wan **Ezurma** rengîne
 Gotiye, bêje xalê min, madam ji **Îranê**
 derketiye, bira xwe nexapîne
 Belkê min ji destê vî zalimî dertîne

Hingê bi qirbaça li min xistiye, mêjî di qafê min da tunîne

Lo, lo.

Hemze Beg wê şevê îstereheta mehîne didê,

sibê radibe her pênc siyarê xwe hiltîne

Dikeve terqa rê, dajo dicedîne

Îbo li êla xwe kire qêrîne

Go, min deh sala nanê vî mêrkî li Îranê

xweriye, qencyê wî li ser min dimîne

Ez wî mêrkî tenê bişnime herbê, ez jî cem

jîna xwe runim, qe xîreta mêra bi min ra tunîne

Li defa hewarê dixîne

Pêncî pênc siyarî hiltîne

Li pey Hemze Begê dajo dicedîne

Dumanê erd û ezman hildaye, Elo, Mûso ji para

nihêrîn hesabê xweliyê heye, hesabê siyara tunîne

Go, Hemze Beg, dizgîna vê menegiyê bikişîne

Li milê rastê bizvire, dumanek ketiye terqa

rê ye, cika ba ye, bobelîsk e, van siyara xêr e,

yan xêr nîne

Dizgîna menegiyê dikişîne

Îbo xwe pê ra digihîne

Hemzo go, Îbo lawo, Xwedê oxira te li hev nîne

Te malxê mala top kirine, temam bi zorê anîne

Xelqê sibê nifira bike, mirazê minê nivê rê bimîne

Min lazimî siyarê zêde nîne

Xelqê vegeîne

Îbo go, Hemzo, ez xulamê te me, seyisê vê

bergîra te me, çevê min bi çevê te ketiye,
 li gola **Parsînê** mêr kes ser min ra tunîne
 Wekî ku ez te tenê bişînime herbê, cem jina
 xwe runim, xîreta mêra min ra tunîne
 Derdê min xarziyê te tenê nîne
 Ezê heftê yek girtî berdim, ya rebbî nevsê
 tengaya bira di tengaya da nemîne
 Rê bûne du riyane
 Hemzo xwe da riya şoşê **Deveboyna** rengîne
 Îbo xwe avîte riya çiyane
 Herda dan dizgînê menegiyane
 Îbo go, Hemze Beg, sibe tavidayînê
 Deng li tivinga te ket, ezê xwe te ra bigihînim,
 deng li tivinga min ket, tu xwe min ra bigihme
 Belkê ez van mêrka ji nav qeyd û zincîrê
 dertînim, ya rebbî nevsê tengayê bira di
 tengayê da nemîne
 Îbo xwe avîte riya çar e, pêncî pênc siyara
 va ketine heçargane
 Hemze Beg peya bû li **Deveboyna** rengîne
 Bala xwe dayê dumanek li **Hesenqelê** rabû,
 dûrbînê li ber cevê xwe digerîne
 Nihêrî sarî bînbaşî gelo Elî Xarza da pêşiya
 xwe, bi qirbaca lê dixê dikutîne
 Eva **Ezurma** rengîne
 Ka xalê te pêşiya min tunîne?
 Wexta nêzîk dayê, pê dike, gelo ew jî

dûrbînê ber çevê xwe digerîne
 Berê qeratê di binê pirê da dibîne
 Çonga wî sist bû, zengiyê naşidîne
 Caneka digahê ber pişta xwe dixîne
 Go, Hemze Beg gedekî pênc pera ne,
 xelqê Îranê ye, şixulê wî li vira tunîne
 Radibe ser zengiya xwe, qamcîkî din jî çîqa
 li Elî Xarza dixîne
 Fire-fira hêsira ji çevê Hemze Begê davêje
 Hemze Beg rabû ser pişta Têcîrê:
 Lo-lo, sarî bînbaşî, *ben senin aylene bêle êderem*
Seni it kibi êldirirem
Yetmiş bir qanlerî birden berat êderem
Senin yaxayî tuterem.
 Sê cara lê kire qêrîne
 Kafîr qe haj ji xwe nîne
 Hemze Beg gullekê davêje, qapaxa serê wî,
 fîno, gulikê wî hev va dixîne
 Laşê wî jor da weldigerîne
 Gelo pê dikeve, qeyd û zincîrê heftê girtî diqetîne
 Îbo xwe pê ra digihîne
 Ew heftê girtî temam berdide,
 nevsê tengayê di tengayê da namîne
 Xarziyê davê terkiya xwe, dajo dicedîne
 Bilek dajo dicedîne
 Îbo Beg mîna siyarê dewatê ji xwe ra li dorê diçelxîne
 Fîşenga şayî dişewitîne

Hemzo go, Îbo, lawo, tu eva dewata bavê te diya te nîne
 Li pêşiya me **Hesenqe**le, li pey me **Ezurma** rengîne
 Pê bikeve darê têla welgerîne
 Têlefûna biqetîne
Roma virek a şaltek a xayîne
 Axta bi hevra xeber de, ewê bê li rastê koka me bîne
 Xêra me tunîne
 Pê dikeve darê têtê weldigerîne
 Têlefûnê diqetîne
 Bilek dajo dicedîne
 Elî Xarza li terkiya xalê xwene
 Go, xalo, ez xulamê te me, siyartî xweş e
 li terkiya siyara, tiştêk nîne
 Ewî kurê kerê hingê bi qirbaca li min xistiye,
 mehîn binê te da dileyîze, mêtî qafê min da tunîne
 Dizgîna menegiyê bikişîne
 Qaşa zîn ji êvar da min diêşîne
 Bilek dajo dicedîne
 Gelo Îbo begê go, Hemze Beg, ez xulamê te me,
 li pêşiya me **Emrekom** heye
Gundê Êzdiya ne, kiyakî gund heye
 Hespekî wî Erebiştan heye
 Bajo, wî hespî ji xarziyê xwe ra bikire bîne
 Bira li terkiya te aciz nebe, heqê Xwedê nîne
 Ewî xarziyê xwe bilind dike, li terkiya Îbo datîne
 Eşaretê dide Têcîrê, xwe derê kiyayê gund ra digihîne
 Gelo pêncî pênc zêra dide ser destmalê,

dike nake kafîr hespê ji tewlê dernîne
Sed zêrî tamam dike, hespê ji hundir dernîne
Sed pêncî zêrî li pêşiyê datîne
Kiyayî gund go, mirina min heye, firotina
hespê min tunîne
Hemze Begê berê xwe da qulbê, sê gava
davêje, ya rebbî wexta min bi vî cambaziyê nîne
Gullekê lê dixê, laşê wî li derê malê weldigerîne
Hespê wî kiraskirî ji tewlê dertîne
Qîmeta Têcîrê li ba hespê wî tişte nîne
Xarziyê xwe li ser datîne
Tê du şeva li mala Îbo begê dimîne
Ewan siyarê zêde bi xwe ra nîne
Hema yek ew e, yek xarziyê wî ye, yek jî
Mûso beled e, ji êvar da dajo dicedîne
Eynî di riya xwe da; **Êrtaşê** ra, **Melhamedê** ra
Hesenbergê ra, **Teknecixê** ra
Alpeçayîrê ra, di **Êxirbuxurê** ra
Tê welgeriya welatê **Elaşgirê** gundek heye
li gêdûkê, navê gund **Çatê** ye, binya **Çatê** ra derbaz bûne
Gelo heyata hukumeta **Romê** darê xwe tîk kirine
Têlefûn lê alandine
Emir dane muxtarê gundane
Bira kese derbaz nebe li serê riyane
Ew ji bin **Çatê** ra derbaz bûn, gelo muxtarê
gund navê wî Mele Mistoyê topal e, kor e,
xêrê ji îmana xwe nebîne

Derketiye ser xanî, lo-lo, siyaro, hûn kîne?
 Suwal ji warê van siyara tunîne
 Destê xwe dixe hundirê kulekê tivingê hildikşîne
 Li taldê çîta gund da sekinî, gullekê davêje,
 Elî Xarza bi bayê hespê jor da weldigerîne
 Gelî cimaetê, sibe bû, li geliyê **Çatê** tav diziriqî
 Serê xarziyê li ser çoka xalê dixeriqî
 Eliyê Xarza go, xalo, dilê min kîne-kîne
 Wexta tu hatî bihar e, eva payîzd e,
 dar lê dixe dar çiloyê xwe diweşîne
 Ewî bezê min top ke, birîna min da dîne
 Egalekê li birîna min bibe bîne
 Xêra min ji te ra tunîne
 Ji boy Xwedê be, tase ev ji min ra bîne
 Bira xarziyê te emrê Xwedê bi cî bîne
 Tu jî here, bira hêsrê te li Îranê bê xweyî nemîne
 Ewê derê tasek av jê ra tîne
 Elî Xarza emrê Xwedê bi cî tîne
 Li **binê dara şîlanê** mexberê wî li wir hiltîne
 Ew Mûso va ji êvar da dajo dicedîne
 Serê **Şeryanê**, di **Ayîka** ra, di **Remika** ra
 Di **Gopala** ra, **Şareza** ra, **Xanzirê** ra, **Qiliçgedûkê** ra
Qumikê ra, di **Elxo** ra, di tanga **gundê Silêman Begê** ra
 Di **Batmîşkoyê** ra, gelo di wêrtaza
 gundê Sidîqê Keçel **Qoçqopiyê** ra
 Hat derkete **Merazgolê** ra, di **Xarikê** ra
 Di **Şekirbilaxê** ra, gelo herd **Devetaşa** ra

Di nava **Hemêda** ra, di **Gondirme** ra
Hat derkete gelo **Demzerî** jêrîne
Heta ew wêrtaza **Elaşgirê** xilas bû, wêrtaza rengîne
Ji wira derbaz bû, hat kete nav **Ebexê** gelo
li **Çaldiranê** gundek heye, navê gund
Xecxatûn e, li ber hidud dimîne
Ê1 tamam hat pêşiyê, go, Hemzo, te xêr e, yan xêr nîne?
Go, min xarziyê xwe aniye, mirazê min li
nîvê gêdûka **Çatê** dimîne
Li wê derê gullekê lê dixê, Elî Xarza li **Çatê** dimîne
Rom tê pêşiyê, li wira şerekî giran datîne
Rom lê dixê Hemze Begê dikuje, mexberê wî
li **Xecxatûnê** dimîne

D. Kilama “Wey Xozanê”¹⁸⁴

Xwezila îro şewitiya **Xozanê** gidîno bişewitiya li ba fêrika
lo lo lawo ca rabe
îro mi dî qîz û bûkê Kurêyşa tê da winda kirine berxê, kofiyê tev cênûga
Eyşan Xanimê digo Surmeli Memed Paşa mala te mîrat be
mi ji te ra nego berê van xorta mede **Xozanê**
bi ro hedûriya mi tune bi destê germê û germistanê
şevê nahevibim ca ji destê qêrînê çeçelan û van wawîka

dilêm yar yar dilê mi yar yar
ax dilêm yar yar wey **Xozanê**

Xwedê xirab bike belkî şewitiya **Xozanê** îro gelo li me yan da
mi dî li selefê siwarê Surmeli Memed Paşa, simêlreşa
li binê kurk û eba palik bada
Eyşo Xanimê digo Surmeli Memed Paşa
belkî mala min û te xirab bibe bi ser malan da
mi ji te ra nego berê me nede **Xozanê**
tu hetanî melê nîvro sêr bike sêsed siwarê te li ser pişta hespa rih û can da

dilêm yar yar dilêm yar yar
ax dilêm yar yar wey **Xozanê**

Xwedê tu xirab bike şewitiya **Xozanê** îro li devê dehlê
bayê samê li mi rebenê hatiye qira siwara li me anî

¹⁸⁴ Ev kilama Evdalê Zeynikê ye ku ji zarê Dengbêj Şakiro hatiye bernivîsandin (Güneş û Şahin, 2019b: 240-241).

eza nemînîm mîna qira wî salê

Eyşan Xanimê digo hey Sûrmelî Memed Paşa hey mala te mîrat be

li erdê **Xozanê** ji hezar û pêncsed siwarî heftê siwarê te saxî vedigere malê

dilêm yar yar dilê mi yar yar

ax dilêm yar yar wey **Xozanê**

Gidfno Xwedê xirab bike şewitiya **Xozanê**

bayê samê hev ra tê lawo bi awakî

Eyşan Xanimê digo Sûrmelî Memed Paşa mi nego berê me nede **Xozanê**

mi zanîbû tuyê îsal mala li mi xirab kî

herçi siwarê ku hûn sax mane berê we dikeve memleket

eger gundî tene pêşiya we, suwala wan siwara ji we bike

bê me di nava wan siwara da sê gul winda kirin

li **Deharê** Siltanê Elo

li **Şamiya** Feqî Eliyê Pîrê, Bavê Temo, Siwarê Belo

ez li **Misûra** dimirim îlam ji bona Bavê Xakî

dilêm yar yar dilê mi yar yar

dilêm yar yar wey **Xozanê**

Xwedê belkî bibire avê çem û kaniyê te wêranê te zozanê

ji îxbala mi pepûkê ra çi **Xozaneke** bê dîn e bê îman e

Sûrmelî Memed Paşa ez îro suwala siwarekî ji te bikim

rast ji mi ra bê selefê siwarê te Feqî Eliyê Pîrê

Bavê Temo, Siwarê Belo, xwedanê cubê hêşîn

destebirayê min ê axretê kanê

dilêm yar yar dilêm yar yar
ax dilêm yar yar wey **Xozanê**

Surmelî Memed Paşa digo Eyşo Xanim
bira ew ro reş be me berê xwe da **Xozanê** çadir kuta ser kaniyê
xwezila mi berê bi wê îmanê
paşê bi wî gavê siwar dihatin derbas dibûn
Feqî Eliyê Pîrê serê paçê çidara berdida ser panîyê
ez îro digirim bejna Eliyê Pîrê, Bavê Temo nedît
ez jî lehzekî rûniştim mam li hêviyê
mi nizanîbû feleka min û te xayîn e
Feqî Eliyê Pîrê, Bavê Temo, Siwarê Belo, xwedanê cubê hêşîn
destebirayê te yê axretê ma li **Xozanê** li xerîbiyê

dilêm yar yar dilêm yar yar
ax dilêm yar yar wey **Xozanê**.

E. Navê Gundên Agiriyê: Navên (Ne)guhertî¹⁸⁵

Navê Gundên Bazîdê								
	Gund			Gund			Gund	
	Tirkî	Kurdî		Tirkî	Kurdî		Tirkî	Kurdî
1	Aktarla	Gurgure	34	Güllüce	Gulîce	64	Somkaya	Zorava Herdoya
2	Aktuğlu	Tajdê	35	Gültepe	Gultepe	65	Subeşiği	Çalixê Zehtoya
3	Alintepe	Berbere	36	Güngören	Înek	66	Suluçam	Misûn
4	Aşağı Tavla	Tewla Xanşeref	37	Günyolu	Şemso	67	Taniktepe	Girgopa
5	Atabakan	Çilkotan	38	Gürbulak	Gurcîbilax	68	Telçeker	Silhana Jêrîn
6	Aşağıayrancı	Kelereşk	39	Hallaç	Helac	69	Topçatan	Kanîkork
7	Bardaklı	Taxilka	40	İncesu	Încesî	70	Tutak	Dutax
8	Barındı	Tapya	41	Kalecik	Qerecux	71	Tutumlu	Alûç
9	Başköy	Başkend	42	Karabulak	Qerebilax	72	Uzunyazı	Nêçoyê Jêrîn
10	Bereket	Berekat	43	Karaburun	Birnê Reş	73	Üçgöze	Bûbo
11	Besler	Silhana Jorîn	44	Karaca	Qerece	74	Üçmurat	Ecemê Şemo
12	Bezirhane	Bizirxane	45	Karakent	Qerekend	75	Üzengili	Meşar
13	Binkaya	Maseka	46	Karaşeyh	Qereşêx	76	Yağmurdüşen	Çalixê Çilêya
14	Bozkurt	Qulqapan		Kargakonmaz	Qereqonmez	77	Yalınsaz	Çalixê Şemsikî
15	Bozyayla	Qerê	47	Kazan	Qazana	78	Yanoba	Tewla Mêrko
16	Bölücek	Nazûk	48	Kızılkaya	Qizilqeya	79	Yayginyurt	Zorava Kir
17	Bulakbaşı	Kanîya Kewrana	49	Kucak	Qucax	80	Yeniharman	Kestek
18	Buyuretti	Noreşîn	50	Kutlubulak	Kanîya Resûl Axa	81	Yeniköy	Gundikê Teze
19	Çalı	Çalê	51	Melikşah	Mêrkişê	82	Yığınçal	Dûmo
20	Çetenli	Teperiz	52	Mescit	Meçîd	83	Yılanlı	Îlanî
21	Çitflik	Çiftlik	53	Ortadirek	Dizê	84	Yığıtyatağı	Zîndo
22	Çömçeli	Golesor	54	Ortaköy	Ortekend	85	Yukarıayrancı	Kelesork
23	Dağdelen	Qanûk	55	Örmeli	Kanîsark	86	Yukarıtavla	Tewla Hêsiyê
23	Dağdelen	Qanûk	56	Örtülü	Ortilî			
24	Dalbahçe	Korim	57	Pullutarla	Kirikmîrze			
25	Demirtepe	Celal	58	Sağdıç	Meyremane			
26	Dolaklı	Qemer dax	59	Sağlıksuyu	Arzep			
27	Dostali	Dostalî	60	Sarıbıyık	Sarîbîx			
28	Eskisu	Babxan	61	Sarıçavuş	Girberan			
29	Esnevez	Xarik	62	Sazoba	Qijik			
30	Gökçekaynak	Kundo	63	Seslitaş	Çalixê Xelîfe			
31	Göller	Gola						
32	Gölyüzü	Şêxulî						
33	Gözükara	Gotqere						

¹⁸⁵ Lîsteya navê gundan ji xebata Önen (2020) hatiye wergirtin. Di xebata Önen ne tenê navê gundan, herwiha navê mezrayan jî hebûn, lê ji bo vê xebatê tenê navê gundan hatin wergirtin. Hin navên gundan de serrastkirinên biçûk ên rastnivîsê çêbûn.

Navê Gundên Qereklîsê (navend)

	Gund			Gund			Gund	
	Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê
1	Ağılbaşı	Hacı Xano	37	Dedemaksut	Dedemexsût	73	Ozbaşı	Bîrka
2	Ahmetbey	Ehmed Beg	38	Doğutepe	Girekol	74	Özveren	Qerenewî
3	Akbulgur	Keşîşê Elîbegê	39	Dönerdere	Elomilo	75	Sabuncu	Sabûncî
4	Akçay	Tûjo	40	Dumanlı	Gezgezk	76	Sağırtaş	Kevirê Kerr
5	Altınçayır	Dodo	41	Eğribelen	Zado	77	Sarıca	Sarıç
6	Anakaya	Mele Ozman	42	Eliaçık	Navîk	78	Sarıdoğan	Poxana
7	Arakonak	Kasor	43	Esenköy	Botî	79	Sarıharman	Açme
8	Aslangazi	Qaziyê Zêtkî	44	Eskiharman	Kevirgewrka	80	Sarıtaş	Kevirê Kejo
9	Aşağıgağadeve	Axadevê Piçûk	45	Geçitalan	Gerger	81	Soğanköy	Soxana
10	Aşağıdürmeli	Dormeliya Jêrîn	46	Gümüşyazı	Sirdo	82	Soğanköy	Soxana Zêtkî
11	Aşağıkent	Extî Jêrîn	47	Güneysu	Xerbegul	83	Söğütlü	Qerecehenem
12	Aşağıkûpkîra	Kûpqîran	48	Güvendik	Ezraîl	84	Suçatağı	Demizxan
13	Aşağıpamukt	Zeyt	49	Güvenli	Şabo	85	Taştekne	Hemzikan
14	Aşağısaklıca	Weretegê Jêrîn	50	Hacîsefer	Hacî Sefer	86	Taypınar	Qisqançka
15	Aşağıyoldüzü	Darebîya Jêrîn	51	Hanoba	Qerê	87	Tellisirt	Cimka
16	Aşkale	Aşqele	52	Hıdır	Xidir	88	Tezeren	Amad
17	Badıllı	Badilî	53	Kalender	Qelender	89	Uçarkaya	Curuh
18	Balıksu	Ava Masiya	54	Karasu	Qeresû	90	Uzunveli	Ûzimalî
19	Balkaynak	Kanîsitûrî	55	Kavacık	Walîereb	91	Yakınca	Şêrwêran
20	Ballıbostan	Qezîr	56	Kavakköy	Qewax	92	Yalnızkonak	Awîzer
21	Baloluk	Keşîş	57	Kayabey	Qeya Beg	93	Yaylaköy	Bûbê
22	Başçavuş	Şeko	58	Kazlı	Qazî	94	Yazıcı	Yaçî
23	Başkent	Extî Jorîn	59	Kocataş	Kevirgewrka Şêxa	95	Yazılı	Mengeser
24	Beşbulak	Kanîsipî	60	Koçbaşı	Gundik	96	Yığıntepe	Yixnî
25	Beşiktepe	Kanîsû	61	Konuktepe	Babina	97	Yolluyazı	Tambat
26	Bezirhane	Bizîrxane	62	Kovancık	Hacî Dodo	98	Yolugüzel	Boşîk
27	Toztoprak	Xanereşk	63	Kumlugeçit	Cimka	99	Yoncalı	Oncelî
28	Bölükbaşı	Bêlûbaş	64	Mollaalî	Rebena	100	Yorgunsöğüt	Gijminîk
29	Cumaçay	Çemê Çeto	65	Mollaosman	Gomik	101	Yukarıdürmeli	Dormeliya Jorîn
30	Çakıroba	Sofyan	66	Murat	Zîro	102	Yukarıkûpkîran	Kûpqîranê Eyub
31	Çamurlu	Çamûrlî	67	Murathan	Miradxan	103	Yukarıpamuktaş	Ebûzêd
32	Çatalipaşa	Çata Elî Paşa	68	Oğlaklı	Korko	104	Yukarı saklıca	Weretegê Jorîn
33	Çayırköy	Qasê	69	Ortakent	Extî Ortê	105	Yukarıyoldüzü	Darebîya Jorîn
34	Çobanbeyi	Goma Dawo	70	Ortayokuş	Qoto	106	Yurtpınar	Mîrenga
35	Çukuralan	Hêlikxan	71	Otlubayır	Mezre	107	Ziyaret	Fêra
36	Çukurçayır	Yekmal	72	Ozanlar	Êranos			

Navê Gundên Panosê								
	Gund			Gund			Gund	
	Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê
1	Akçaören	Axcewêran	31	Edremî	Keta Yêxo	67	Özdemir	Hozdemir
2	Akdilek	Koz	32	Ergeçli	Kaxama	68	Pirömer	Pîromer
3	Aktepe	Axtepe	33	Eryılmaz	Xirbesork	69	Sağrıca	Kuçeka
4	Akyemiş	Qoro	34	Esenbel	Meciya	70	Sandibek	Kolik
5	Alatay	Garisa	35	Eskikonak	Kirakom	71	Suluca	Lîyêsor
6	Andaçlı	Babîya	36	Gençali	Gênceli	72	Susuz	Avtine
7	Armutlu	Armûtlî	37	Gökçeali	Extereşan	73	Tanyeli	Miç
8	Aşağıgöçm	Zomika Jêrê	38	Gökoğlu	Qubik	74	Taşkın	Taşxûna
9	Aşağıkemiş	Qamûşlîya Jêrê	39	Gönlüaçık	Qerewêt	75	Tepeli	Tepelî
10	Bağbaşı	Qerekilise	40	Güllüce	Gulîce	76	Usluca	Banzde
11	Baltacık	Mozelan	41	Günbeli	Kêsan	77	Uzunca	Ûzince
12	Baştarla	Gurgure	42	Gündüz	Çeqçeq	78	Uzungün	Bêçare
13	Bozoğlak	Nenecanî	43	Güvercinli	Eşara Jorê	79	Ûçoymak	Xweşîya
14	Budak	Bûdax	44	Hacılar	Xaçûlî	80	Ûrkût	Hûrkit
15	Çakırbey	Çaxirbeg	45	Hasandolu	Hesendolî	81	Ûzümlü	Xirbê Tirîya
16	Çamurlu	Çamûrlî	46	Hisarköy	Hesar	82	Yalçınkaya	Qizilqa
17	Çaputlu	Çaptîlî	47	Karatoklu	Qanîce	83	Yeşilhisar	Qancix
18	Çatmaoluk	Eşara Jêrê	48	Karbasan	Sekû	84	Yeşilyurt	Tezekend
19	Çavuşköy	Çawîş	49	Kaş	Qaş	85	Yukarı Damla	Acinîya Jorê
20	Çiçek	Çiçek	50	Kazanbey	Qazana	86	Yukarı Kamışlı	Qamîşlîya Jorê
21	Çimenli	Serdagul	51	Keçelbaba	Sofîkeçel	87	Yukarıgöçmez	Zomika Jorê
22	Çukurbağ	Kokin	52	Kızıltepe	Gundik	88	Yukarıkülecik	Tetka
23	Dağalan	Arzixak	53	Kızkapan	Qizqapan	89	Yurtöven	Belekurdka
24	Dedeli	Dedelî	54	Koçaklar	Marmûs	90	Yüncüler	Xirbekork
25	Değirmend	Gamêşvan	55	Konakbeyi	Sêvendelî	91	Yürekveren	Kanîsipî
26	Demirören	Daydok	56	Köseler	Kosa	92	Zincirkale	Avegan
27	Derecik	Derîcak	57	Kucak	Qûcax	93	Zirekli	Zirekli
28	Dizginkale	Dizgînqeale	58	Kuruyaka	Eşûr	94	Ziyaret	Ziyaret
29	Doğansu	Siltanmût	59	Kuşkaya	Qûşqa			
30	Düzceli	Pinaşya	60	Kürekli	Kurelî			
25	Değirmend	Gamêşvan	61	Meydandağı	Xirindas			
26	Demirören	Daydok	62	Mollaibrahim	Melebirahîma			
27	Derecik	Derîcak	63	Onbaşılar	Warinda			
28	Dizginkale	Dizgînqeale	64	Ortadamla	Acinîya Ortê			
29	Doğansu	Siltanmût	65	Oyacık	Şêrvanşêx			
30	Düzceli	Pinaşya	66	Örendik	Kurdegaz			

Navê Gundên Gîhadînê					
	Gund			Gund	
	Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê
1	Akçevre	Tapê Xêç	32	Kuşlu	Mamedxan
2	Akyolaç	Êzdo	33	Mollakara	Meleqer
3	Altinkilit	Qurd	34	Mutlu	Qerece
4	Aşağıakpazar	Kevirê Sipî	35	Oğuloba	Şawelet
5	Aşağıdalören	Bilîgana Jêrê	36	Omuzbaşı	Şikrok
6	Aşağıkardeşli	Xidika Jêrê	37	Pirali	Pîralîya
7	Aşağıtüttek	Çobana Axê	38	Rahmankulu	Rehmequlî
8	Atadamı	Girê Dêm	39	Saticılar	Bazîrgana Jêrê
9	Atayolu	Istûrka	40	Soğuksu	Beroj
10	Batibeyli	Zîvker	41	Sürenkök	Qor
11	Boyalan	Kurtika	42	Sürmelikoç	Soran
12	Budak	Bûdax	43	Şahinşah	Gundik
13	Burgulu	Gorana	44	Şekerbulak	Şekîrbûlax
14	Büvetli	Şikeft	45	Taşbasamak	Mîrzecan
15	Davutköy	Dawid	46	Taşkesen	Taşkesan
16	Dedebulak	Tûcîbazar	47	Tavla	Tewle
17	Delihasan	Delîhesen	48	Tazekent	Tezekend
18	Dibekli	Dîbeglî	49	Toklucak	Tolîcax
19	Dokuztaş	Kevîrgewrk	50	Ulukent	Ûlekend
20	Gedik	Gêdûk	51	Uysallı	Qelender
21	Göğebakan	Kapûzan	52	Yanıkçukur	Tendûrek
22	Gözüpek	Gomik	53	Yeniçadır	Bozo
23	Günbuldu	Meya	54	Yeşildurak	Tapî
24	Hacihalit	Hecîxalta	55	Yıldırım	Koço
25	Heybeliyurt	Cûcan	56	Yıldız	Mamed
26	Kapanca	Kanîreş	57	Yolcupınarı	Zeynel
27	Karapazar	Qerebazar	58	Yörükatlı	Darik
28	Karataş	Topê Sor	59	Yukarıakpazar	Axbazar
29	Kocaçoban	Bûbo	60	Yukarıdalören	Bilîgana Jorê
30	Kotanca	Kotancî	61	Yukarıtüttek	Tûteka Jorê
31	Kuşburnu	Caneqiz	62	Yuva	Mela

Navê Gundên Avkevîrê					
	Gund			Gund	
	Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê
1	Alakoçlu	Extîyar	20	Kağnılı	Mîraşe
2	Aras	Erez	21	Karagöz	Gomika Sawikê
3	Aşağıdumanlı	Geldûşa Jêrê	22	Kumlubucak	Qumulcax
4	Aşağı	Duzmeydana Jêrê	23	Kumluca	Qumilcî
5	Aşağîesen	Botîyê Jêrê	24	Samanyolu	Goma Êsê
6	Aşağıtoklu	Gundê Pîrê Jêrê	25	Tanriverdi	Mele Xwedêda
7	Balçîçek	Avdelîk	26	Tanyolu	Qizilziyaret
8	Bayıraltı	Dîdem	27	Taşteker	Dêr
9	Bayramyazı	Alekor	28	Yanalyol	Kornewroz
10	Boyuncak	Gomik	29	Yankaya	Goma Elê Xido
11	Çöğürlü	Lêşko	30	Yardımcılar	Xilfo
12	Çökelge	Mardîk	31	Yassıkaya	Xocîk
13	Dilekyazı	Girê Şera	32	Yeltepe	Az
14	Düzgören	Qubik	33	Yukarıdumanlı	Geldûşa Jorê
15	Geçitveren	Golesor	34	Yukarı Düzmeydan	Duzmeydana Jorê
16	Gözucu	Şêx Birahîm	35	Yukarîesen	Botîyê Jorê
17	Gündoğdu	Goma Şemê	36	Yukarıtaşlıçay	Avkevîrê Jorê
18	Güneysöğüt	Çerxîya	37	Yukarıtoklu	Gundê Pîrê Jorê
19	İkiyamaç	Mîrzexan			

Navê Gundên Xamûrê					
	Gund			Gund	
	Navê Berê	Navê Niha		Navê Berê	Navê Niha
1	Abdiçikmaz	Evdîçixmez	25	Karadoğu	Xinzîra
2	Adimova	Xididok	26	Karakazan	Korko
3	Alakoyun	Xaçûlî	27	Karaseyitali	Qereseydalî
4	Aşağıaladağ	Qola Jêrîn	28	Karlıca	Şoşik
5	Aşağıderedibi	Masteka Jêrîn	29	Kaynaklı	Pencerûk
6	Aşağıgözlüce	Mendelixê Jêrîn	30	Kılıç	Şehîda
7	Aşağıkarabal	Xano	31	Köşkköy	Koşk
8	Aşağıyenigün	Reboçîyê Jêrîn	32	Nallikonak	îsê
9	Ayvacık	Xîlka	33	Özdirek	Kaniya Herî
10	Baldere	Kara Pîro	34	Sarıbuğday	Paşwan
11	Beklemez	Keçela	35	Seslidoğan	Bûtka
12	Ceylanlı	Evdê	36	Seyithanbey	Seyîdxan Beg
13	Çağlayan	Eşûrgewrk	37	Soğanlıtepe	Gomik
14	Danakıran	Daneqıran	38	Süleyman kümet	Silêman kumbet
15	Demirkapı	Qerewil	39	Tükenmez	Malxas
16	Ekincik	Çivrik	40	Uğurtaş	Overka
17	Erdoğan	Şikeft	41	Yapılı	Şeynok
18	Esenören	Pîrzeynel	42	Yoğunhisar	Boçikmasûr
19	Gültepe	Gultepe	43	Yukarıağadeve	Axadevê Mezin
20	Gümüşkuşak	Sêvo	44	Yukarıaladağ	Qola Jorê
21	Hatunkomu	Goma Xatûnê	45	Yukarıgözlüce	Mendelixê
22	Kaçmaz	Gelûta	46	Yukarıyenigün	Reboçîyê Jorê
23	Kamışlı	Qamûşlî	47	Yuvacık	Milka
24	Kandildağı	Şêxtokil			

Navê Gundên Dutaxê					
	Gund			Gund	
	Navê Nû	Navê Berê		Navê Nû	Navê Berê
1	Adakent	Adekend	42	Esmer	Esmer
2	Ahmetabad	Xirbesork	43	Geçimli	Şemê
3	Akyele	Mele Şemdîn	44	Gültepe	Gultepe
4	Alacahan	Elecezan	45	Güneşgören	Qondîna
5	Aşağıkaraçalit	QerexalitaJêrê	46	Hadyusuf	Hacî Êsiv
6	Aşağıkargalık	Qerxelixa Şêx	47	Îkigözüm	Topê
7	Aşağıköşk	Koşka Êsiv Begê	48	İpekkuşak	Çarbera Jorê
8	Aşağıkülecik	Tahtika	49	isaabat	Dêrika Hacî Îso
9	Aşağıözdek	Erebalîya Şêr Begê	50	Karaağaç	Qerexaç
10	Atabindi	Nedeşêx	51	Karacan	Qerecan
11	Ataköy	Mûsik	52	Karahan	Qerexan
12	Azizler	Çirê	53	Karakuyu	Qereqû
13	Bahçe	Hêbo	54	Kaşönü	Rûta
14	Batmış	Batmış	55	Kesik	Kesûk
15	Baynıdır	Bendûrya	56	Kiliçgedik	Xanik
16	Beydamarlı	Bedo	57	Mızrak	Mizraqa
17	Bintosun	Berdav	58	Mollahasan	Mele Hesên
18	Bişe	Bişê	59	Ocakbaşı	Mirze
19	Bolaşlı	Seyîd	60	Oğlaksuyu	Milan
20	Bozkaş	Reşê	61	Ortayamaç	Qubik
21	Bulutpınar	Cemalvêrdî	62	Otluca	Kerrê
22	Bumubulak	Birinbilax	63	Ozanpınar	Mezrê
23	Çelebaşı	Çelebaşîya	64	Öndül	Gomik
24	Çırpılı	Birco	65	Palandöken	Paletokan
25	Çobanoba	Gomik	66	Sangöze	Çelo
26	Çukurkonak	Birûsko	67	Sincan	Sincan
27	Dağlıca	Şilopilo	68	Soğukpınar	Mûşîya
28	Daldalık	ŞêxZılan	69	Sorguçlu	Kanîdirêj
29	Damlakaya	Meter	70	Suvar	Sîwêr
30	Dayıpınarı	Nuxtilî	71	Şekerbulak	Kanîya Xinzira
31	Dereköy	GomaKazo	72	Taşbudak	Miledirêj
32	Dibelek	Kora	73	Uzunöz	Elxo
33	Dikbiyik	HacîBotî	74	Yayikli	Hoxan
34	Dikme	Tikme	75	Yenikent	Şeytanava
35	Doğangün	Dêrik	76	Yeniköy	Îngikoy
36	Dorukdibi	Hasûna	77	Yukarıkaraçalit	Qerexalita Jorê
37	Dönertaş	Kalê	78	Yukarıkargalık	Qerxelixa İbrahim
38	Döşkaya	Qewma	79	Yukarıköşk	Koşka Silêman
39	Ekincek	Sêvik	80	Yukarıözdek	Erebalîya Silêman
40	Erdal	Xêvê			
41	Ergeçidi	Kêsa			

Navê Gundên Zêtkî (Elaşgir)					
	Gund			Gund	
	Tirkî	Kurdî		Tirkî	Kurdî
1	Abdiköy	Evdê	32	İndere	Rûta
2	Akyumak	Avxark	33	Kanatgeren	Babina
3	Alagün	Esêb	34	Karabacak	Qerebacax
4	Alkuşak	Mila	35	Kayayolu	Çerkez
5	Arifbey	Gomika Tırka	36	Kokulupınar	Gomika Birûka
6	Aşağıcihanbey	Canbegayê Jêrê	37	Körpeçayır	Şanezer
7	Aşağıkopuz	Qopiza Jêrê	38	Mollahüseyin	Melehusêna
8	Aydintepe	Karpalo	39	Mollasüleyman	Mele Silêman
9	Aydoğdu	Bêdir	40	Oklavalı	Garisya
10	Çatalpınar	Sêvik	41	Öztoprak	Gomika Erebb
11	Çatkösedag	Çata Kosedaxê	42	Palakçayır	Gopala
12	Çetinsu	Geliya	43	Pirabat	Pîrebada
13	Çiftapınar	Çelê	44	Ramazan	Remedan
14	Dalkılıç	Dalqiliç	45	Sadaklı	Misûrya
15	Değirmengeçidi	Çilkanîya Xalvazê	46	Salkımlı	Melezada
16	Değirmenoluğu	Şamya	47	Sarıköy	Sarê
17	Dolutaş	Mardo	48	Söbetaş	Heysto
18	Düzağıl	Ayika	49	Sultanabat	Gêlo
19	Düzyayla	Hemzika	50	Süzgeçli	Remika
20	Ergözü	Tabo	51	Tahir	Dehar
21	Goncalı	Xaçil	52	Toprakkale	Kelê
22	Gökçayır	Kazka	53	Türkeli	Kurdalya
23	Gözyaydın	Gapira	54	Uludal	Pozmezina
24	Güneykaya	Ebûzêd	55	Uzunyazı	Xaşyan
25	Güvence	Çilkanîya	56	Yağmurlu	Şêxa
26	Hasanpınar	Kevirgewrk	57	Yanıkdere	Qîrka
27	Haydaroglu	Heyderoxlî	58	Yayladüzü	Bêlikbaşî
28	Hayrangöl	Heyrangol	59	Yelkesen	Mîranga
29	Hürriyet	Kole	60	Yeşilova	Çurûk
30	İkizgeçe	Memita	61	Yığıntaş	Şadya
31	İkizgöl	Aleqîça	62	Yukarıkopuz	Qopiza Jorê
			63	Yücekapı	Xanzir

F. Forma Rizamendiya Hevpeyvînê

Rêkeftina Agahdarkirî ya bi Dilxwazî

Beşdariya hevpeyvîna rû-bi-rû

Navê min **Ömer Delikaya** ye. Ez xwendekarê doktorayê me li Zanîngeha Bingolê di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî da. Sernavê teza min “**Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkîyeyê: Mînaka Agiriyê**” ye ku vekolîneke înterdisîplîner e li ser navê cihan û helwesta gel a li hember navên nû. Şêwirmendê vekolîna min Doç.Dr. M. Zahir Ertekin e ku tu xwe dikarî bi rêya vê e-mailê pê ra bikevî têkiliyê: -----@gmail.com. Ez tika dikim ku tu ji bo vekolîna min beşdarî hevpeyvînê bibî û pirsên amadekirî bibersivînî. Tu ji (15) kesan yekî ku min ji bo xebata xwe ya berdest hilbijartîye ku pê ra hevpeyvînê bikim.

Armanca hevpeyvînan eşkerekirina helwest û fikrên xwecihên li Agiriyê ku derheq guherîna navan de derdikevin holê. Di vê çarçoveyê de ez ê hin pirsan li te bikim û fikr û ramanên te hîn bibim. Ev xebat dixwaze bi rêya van hevpeyvînan zanyariyên etnografîk berhev bike û wan di beşeke taybet a tezê de binirxîne. Herwiha ez dixwazim bibêjim ku beşdariya te ya li vê hevpeyvînê bi temamî bi dilxwazî ye, kengê bixwazî dikarî ji hevpeyvînê vekişî. Tu zîrarê dê negihîje te ji ber beşdariya te ya li vê tezê de ji ber ku mehremiyet û anonîmbûna te wê bê parastin. Ji bo anonîmbûnê dikarî navnasekî ji bo xwe hilbijêrî de ku ji bo anonîmbûnê tu dilrihet bî. Zanyariyên ku tên berhevkirin, tenê yê ji bo vê xebatê bê xebitandin.

Navê Vekoler: Ömer Delikaya

Destnîşan.....Mêjû.....

RIZAMENDÎ Û RÊKEFTIN

Ez bi rizadilî beşdariyê li vê xebata navbirî dikim. Ez bi dilrihetî dibêjim ku beşdariya min bi temamî bi qayîlbûna min pêk hatiye. Min bi xwe destûr daye wekî ku vekoler dengê min qeyd bike di dema hevpeyvînê de. Serbarê ser, min destûr daye vekoler ku ji hevpeyvînê istifade bike tenê di xebata xwe ya navbirî da.

Destnîşana Beşdar:.....Mêjû.....

Destnîşana Vekoler:.....Mêjû.....

G. Nameya Ravekar bi tevî Transkrîpta Hevpeyvînê ji bo Beşdaran

Ömer Delikaya

Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî

Zanîngeha Bîngolê

Navê Beşdar

Adresa Beşdar

Bi helkeftina hevpeyvînê – her di xweşî û şadiyana de bî.

Ez serê berîn dixwazim spasiya te bikim ku te beşdariya li vê hevpeyvîna li ser guherîna cihnavên li Agiriyê qebûl kir û pirsên têkildar bersivan. Ez gelekî kêfxweş bûm ku min tu nas kirî. Zanyariyên ku te dan ên li ser fêhma nasname, helwesta li hember navên nû yên li Agiriyê, ji bo xebata min gelekî bi kêr hatin. Dixwazim xebera te pê bixim ku bersivên te dê bi rengekî nepenî li gel min parastî bin û dê tenê ji bo xebata berdest bên bikaranîn. Herwiha ji bo ewlehiya te, di xebatê de tu hurgiliyên takekesî wê neyêne ferqkirin. Ji bo vê yekê, navê te, adres û pişeya te wê parastî bimîne. Di dewsa navê te de, li gorî daxwaza te bernavkek wê ji bo te bête diyarkirin. Tu azad î her wexta ku tu bixwazî ji vê vekolînê vekişî heta ku nivîs bo xebatê hatin berhevkin.

Ez gelekî spasiya te dikim ku te wexta xwe ji bo vê vekolînê xerc kir û fikr û ramanên xwe bi min re parve kir. Ez ê nisxeyeke transkrîptê ji bo te bi rê bikim da ku tu halê nivîskî yê hevpeyvînê jî bibînî. Eger wekî din tiştêkî ku tu bixwazî bi min re parve bikî bi rêya e-mail an jî telefonê, ez her dem ji bo vê yekê amade me.

Ji bo pirsyarên xwe yên têkildarê xebatê, ji kerema xwe bi min re têkeve têtikiliyê li ser -----@gmail.com. Herwiha eger şayîşeke te hebe derbarê vê hevpeyvînê de tu dikarî bi şêwirmendê min Doç Dr. M. Zahir Ertekin re bikevî têtikiliyê: -----@hotmail.com. Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol
(Çewlîg)

Spasiya te dikim ku te alîkarî daye vê xebatê.

Ömer Delikaya

G. Qerarnameya serokkomar a li ser guhertina navê Qerekoseyê

T. C.
BAŞVEKÂLET
MUAMELÂT MÜDÜRLÜĞÜ

KARARNAME

Şube:

Sayı: 2

2460



1580 sayılı Belediye Kanununun 9 uncu maddesine göre merkezi Karaköse olan Bayazıt Vilâyeti adının (Ağrı) ya ve merkezi Bayazıt olan Karaköse Kazası adının da (Doğu Bayazıdı) na çevrilmesi, vilâyet belediye meclisi ve idare heyetinin kararına atfen Dahiliye Vekilliğinin 3/3/935 tarih ve 54I sayılı teklifi ve Surayı Devlet Reisliğinin 2/5/935 tarih ve 4232 sayılı mutaleanamesi üzerine İcra Vekilleri Heyetince 4/5/935 de onanmıştır.

4/5/935

REİSİCÜMHUR

K. Atatürk

Bş. V.

Y. İsmi

Ad. V.

S. Sarı

M.M.V.

K. Gök

Da. V.

S. Kara

Ha. V.

Ma. V.

H. Örsin

Me. V.

B. Ömer

Na. V.

A. Cankaya

İk. V.

C. Bayaz

S.İ.M.V.

S. R. Niyazi

G.İ.V.

Kanaatlıdan Mithat Yörük


Zr. V.

039 - 18 01 . 02 54 33 16

T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAİRE BAŞKANLIĞI (BOA) 4


DH.MKT.01978.00092.001

H. Xeta ser sînor ya Bazîd, Rewan û Makûyê û toponîmên pirzimanî¹⁸⁶



¹⁸⁶ 'Persia, Russia & Turkey in Asia' [52r] (1/2)

I. Nexşeya Qerekilîsê û toponîmên wê bi herfên erebî¹⁸⁷



¹⁸⁷ Karakilise Haritası (1327). İstanbul: Erkan-ı Harbiye-i Umumiye Matbaası. Arşiv No: HRT 00019. TBMM Kütüphanesi Mikro Film Arşivi.